



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**ADET Û RÎTÛELÊN TÊKILDARÎ  
MIRINÊ LI HERÊMA NISÊBÎNÊ**

Şükrü Yılmaz

14711033

Şêwirmend  
Doç. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn 2019

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**ADET Û RÎTÛELÊN TÊKILDARÎ  
MIRINÊ LI HERÊMA NISÊBÎNÊ**

Şükrü Yılmaz

14711033

Şêwirmend  
Doç. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn 2019

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Adet û Rîtuêlên Têkildarî Mirinê Li Herêma Nisêbînê” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.


/ /2019

Şükrü Yılmaz

## KABUL VE ONAY

Şükrü YILMAZ tarafından hazırlanan “Adet û Rîtuêlên Têkildarî Mirinê li Herêma Nisêbînê” adındaki çalışma, 26/06/2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[ İ m z a ]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

Dr. Öğretim Üyesi Şehab Vali

[ İ m z a ]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

Dr. Öğr. Üyesi Abderrahman DZMED

[ İ m z a ]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

Doç. Dr. Mustafa ASCAN

Ji Bo Bîranîna Dêya Min Tirkan Yılmaz...



## PÊŞGOTIN

Ji berê da mirovan hewl dane ku mirinên ku li der û dora wan qewimîne fam bikin, rave bikin û jê dûr bikevin. Lewra heger civak, bi hemû hêman û sazîyên xwe weke sîstemekê bê qebûlîkirin, mirina kesekî/ê di vê sîstemê da valahîyekê çêdike û civak hewl dide ku vê valahîyê di zûtirîn demê da dagire. Ji bo ku bikaribe vê valahîyê dagire jî, ji adet û rîtûelan sûd werdigire. Bêguman fonksîyona rîtûelê ne tenê dagirtina valahîyekê ye, ev tenê yek ji taybetîyên rîtûelê ye û ji bilî vê gelek fonksîyonên din yê rîtûelê hene. Ev adet û rîtûel li gorî şert û mercên civakê û ola ku jê tê bawerkirin teşe digirin û herweha derheqê şewaza jîyankirinê, nirxên civakî û jîyana çandî ya civakê da zanyarîyên girîng dihewînin. Lewma jî her ku mercên civakî tî guhertin, maneyên ku li mirinê tî barkirin û têgihîştin û sepandinên tîkildarî mirinê jî bi şeweyên cuda xwe nîşan didin.

Li nav kurdan û bi kurdî, li ser mirinê xebatên berfireh, birêkûpêk û li gorî rê û rêbazên zanistî hatine kirin kêm in. Ji ber vê rastîyê, me jî berhevkerin û teswîrkirina adet û rîtûelên tîkildarî mirinê yê li nav kurdên Nisêbînê weke mijara vê xebatê hîlbijart. Digel hemû kêmasîyan, em bawer dikin ku bi zêdebûna xebatên weha, dê civaka kurd ji nêz ve bê naskirin.

Di pêkhatina vê xebatê da alîkarî û keda gelek kesên hêja heye. Di serî da ez dixwazim spasîyên bêdawî pêşkêşî cenabê Doç. Dr. Mustafa Aslan bikim. Lewra ji dema dîyarkirina mijarê û heta dawîya xebatê, bi zanîn û tecribeyên xwe, bi rexneyên erênî her daîm digel min bû. Di çareserkirina pirsgirêkên ku di pêvajoya xebatê da derketin pêşîya min da, bi pêşniyarên xwe yê biqîmet rêya min ronî kir û digel karên xwe yê zêde jî dema xwe ya hêja ji bo min xerc kir.

Cenabê Shahab Vali, di zelalkirina hindek mijaran da zanyarîyên xwe yê hêja bi min ra parve kirin, ji bo alîkarîya wî gelekî spas dikim.

Dîsa, ji bo ku em hewandin mala xwe û derheqê mijarê da zanyarîyên xwe yê hêja bi me ra parvekerin ji çavkanîyên xwe yê zindî ra gelekî spas dikim. Ji bo

ku ez bikaribim li sehayê xebatê bi jinan ra hevpeyvînan bikim, Latifa Özsoy hertim ligel min bû, mala wê ava.

Ji bo ku di vê pêvajoya zehmet da bi dilsozî piştgirî dane min û digel wê dema ku min ji jîyana wan didizî jî bi xweşbînî sebir kirin, hevîna min Seher û zarokên min Lorîn Janya û Hüseyin spasîyeka mezin heq dikin.

Di dawîyê da, ji ber ku di her kêlîya jîyana min da hêz dane min, ez spasîyên xwe pêşkêşî bavê xwe û xweh û birayên xwe dikim.

Şükrü Yılmaz

Mêrdîn-2019



## KURTE

Berhevkingirina û teswîrkingirina adet û rîtûelên têkildarî mirinê yê kurdên Nisêbînê weke mijara vê xebatê hatîye hîlbijartin. Ji ber ku xebatên akademîk yê derheqê adet û rîtûelên şîn û sersaxîyê yê di çanda kurdî da kê in, di vî warî da valahîyek xuya dike. Tê hevkingirina ku xebata me ji bo dagirtina vê valahîyê bibe gaveka biçûk.

Armanca xebatê, destnîşankirina guhertinên ku di adet û rîtûelên navborî da çêbûne, tespîtkingirina fonksiyonên wan yê civakî û ravekingirina sedemên guherînan e. Têkildarî vê yekê, binyada civakî ya kurdên herêma Nisêbînê jî hatîye lêkolînkirin. Di vê çarçoveyê da daneyên ku ji sehayê hatin bidestxistin, bi çanda kurdî ra hatin berawirdkingirina û di adet û rîtûelên têkildarî mirinê da li şopa bawerîyên kurdan yê berê hatîye gerandin.

Weke rêbaz, digel çavkanîyên nivîskî, li gorî daneyên ku ji sehayê hatin bidestxistin, adet û rîtûelên têkildarî mirinê hatine analîzkingirin. Piştî van analîzan hate dîtin ku, guherînan ku di binyada civakî da çêdibin, di adet û rîtûelên têkildarî mirinê da jî guhertinan derdixin holê. Hate tespîtkingirin ku, herçiqas çanda îslamê li herêmê serdest e jî, digel hindek îstîsnayan kurdên êzidî, adetên xwe yê têkildarî mirinê li hemberî vê çanda serdest parastine. Herweha hate dîtin ku adet û rîtûelên têkildarî mirinê ku jî alîyê kurdên herêma Nisêbînê ve tîne sepandin, pêgirîyê bi çanda kurdî ya giştî ra dikin.

**Peyvên Sereke:** Çanda Kurdî, Mirin, Sersaxî, Şîn, Rîtûel.



## ÖZET

Nusaybin Kürtlerinin ölümle ilgili adet ve ritüellerinin derlenmesi ve tasvir edilmesi bu çalışmanın konusunu oluşturmaktadır. Kürt kültüründe yas ve taziye adet ve ritüelleri hakkında yapılan akademik çalışmaların azlığından dolayı, bu alanda bir boşluk söz konusudur. Çalışmamızın, bu boşluğu doldurmada küçük bir adım olacağı umulmaktadır.

Çalışmanın amacı, söz konusu adet ve ritüellerdeki değişiklikleri ve sosyal işlevlerini tespit etmek ve bu değişikliklerin sebeplerini ortaya çıkarmaya çalışmaktır. Buna bağlı olarak Nusaybin bölgesindeki Kürtlerin sosyal yapısı da incelenmiştir. Bu çerçevede, sahadan elde edilen veriler Kürt kültürüyle karşılaştırılarak ölümle ilgili adet ve ritüellerde eski Kürt inançlarının izlerinin tespit edilmesi hedeflenmiştir.

Yöntem olarak, yazılı kaynaklar ve saha çalışmasından elde edilen veriler ışığında ölümle ilgili adet ve ritüeller analiz edilmiştir. Yapılan analizler neticesinde sosyal yapıda meydana gelen değişimlerin, ölümle ilgili adet ve ritüellerde değişikliklere yol açtığı görülmüştür. Ayrıca her ne kadar bölgede İslam kültürü egemen olsa da, bazı istisnalarla birlikte Yezidi Kürtlerin bu hakim kültür karşısında ölüm adetlerini korudukları tespit edilmiştir. Son olarak Nusaybin bölgesindeki Kürtlerin takip ettikleri ölümle ilgili adet ve ritüellerin genel Kürt kültürü ile uyumlu olduğu gözlemlenmiştir.

**Anahtar Sözcükler:** Kürt Kültürü, Ölüm, Taziye, Yas, Ritüel.

## **ABSTRACT**

The subject of this study is compilation and description of Nusaybin Kurds' death customs and rituals there is a gap in this area due to the limited number of academic studies on mourning and condolence customs and rituals in Kurdish culture. It is hoped that our study will be a small step in filling this gap.

The aim of the study is to determine the changes and social functions of these customs and rituals and to find out the reasons for these changes. Accordingly, the social structure of the Kurds in Nusaybin region is also examined. In this context, aiming to identify the traces of the old Kurdish beliefs and rituals related to death the data obtained from the fieldwork were compared with the Kurdish culture.

As a method, in the light of the written sources and data obtained in the fieldwork, the customs and rituals related to death are analyzed. As a result of analyzes, it has been seen that the changes in the social structure lead to changes in the customs and rituals related to death. In addition, although Islamic culture is dominant in the region, it has been observed that with some exceptions, Yazidi Kurds maintain their death customs against this religious dominant culture. Finally, it is observed that the death customs and rituals practiced by the Kurds in Nusaybin region were compatible with the general Kurdish culture.

**Key Words:** Kurdish Culture, Death, Condolence, Mourning, Ritual.

# NAVEROK

	Rûpel
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>I</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>III</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>IV</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>V</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>VI</b>
<b>LÎSTEYA TABLOYAN</b> .....	<b>X</b>
<b>LÎSTEYA WÊNE Û NEXŞEYAN</b> .....	<b>XI</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>XII</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
MIJAR .....	4
GIRÎNGÎYA MIJARÊ .....	4
ARMANC .....	6
ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ Û SÎNORÊN XEBATÊ .....	7
RÊBAZ .....	7
PIRSGIRÊK Û ASTENGÎYÊN LÊKOLÎNÊ .....	10
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	<b>12</b>
<b>DANASÎNA SEHAYA XEBATÊ</b> .....	<b>12</b>
1.1.DÎROK .....	12
1.2.ABORÎ.....	14
1.3.GELHE.....	14
1.4.OL Û CIVAKÊN LI HERÊMÊ .....	15
1.4.1.Kurd .....	15
1.4.1.1.Kurdên Misilman .....	15
1.4.1.2.Kurdên Êzidî .....	16
1.4.2.Mihelmî.....	17
1.4.3.Suryan .....	17
1.4.4.Tirk.....	18
1.5.BîNYADA ÇANDÎ-CIVAKÎ.....	18

<b>BEŞA DUYEM .....</b>	<b>20</b>
<b>ÇARÇOVEYA TEORÎK Û TÊGEHÎ YA XEBATÊ .....</b>	<b>20</b>
2.1.XEBATA LÎTERATÛRÊ .....	20
2.2.TÊGEHÊN XEBATÊ .....	26
2.2.1.Mirin .....	26
2.2.1.1.Têgihîştina Mirinê Li Nav Kurdan.....	28
2.2.2.Rîtûel.....	32
2.2.2.1.Şîn .....	35
2.2.2.2.Sersaxî.....	36
2.2.2.3.Dûrik .....	37
<b>BEŞA SÊYEM.....</b>	<b>39</b>
<b>RÎTÛELÊN PIŞTÎ MİRÎNÊ .....</b>	<b>39</b>
3.1.RÎTÛELÊN BERÎ VEŞARTINÊ.....	39
3.1.1.Pêhisandina Mirinê .....	43
3.1.2.Dema Veşartinê.....	45
3.1.3.Şuştin .....	48
3.1.4.Qewêtîyên Mirîyî/yê .....	52
3.1.5.Kefenkirin .....	53
3.1.6.Berdêla Şuştin, Kefenkirin û Kolana Gorê .....	54
3.1.7.Nimêja Mirîyî/yê.....	55
3.1.8.Birina Goristanê.....	56
3.1.9.Veşartin .....	61
3.1.9.1.Rîtûela Veşartinê ya Kurdên Misilman.....	61
3.1.9.2.Rîtûela Veşartinê ya Kurdên Êzidî.....	64
3.1.10.Xwendina Telqînê.....	67
3.2.RÎTÛELÊN PIŞTÎ VEŞARTINÊ .....	71
3.2.1.Genim Hejandin .....	71
3.2.2.Mewlûd .....	73
3.2.3.Bîranîna Mirîyan.....	74
3.2.3.1.Sêroka Mirîyî/yê.....	74
3.2.3.2.Çilroka Mirîyî/yê.....	76
3.2.3.3.Xwarina Salê .....	77
3.2.3.4.Şîva Mirîyî/yê .....	78
3.2.3.5.Rojên Din .....	79

3.2.4.Xêra Mirîyî/yê.....	80
3.2.5.Xêr û Taetên Ji Bo Mirîyan .....	83
3.2.6.Cil û Firaxên Mirîyan .....	83
<b>BEŞA ÇAREM .....</b>	<b>86</b>
<b>SERSAXÎ Û ŞÎN.....</b>	<b>86</b>
4.1.SERSAXÎ .....	86
4.1.1.Cihên Sersaxîyê .....	86
4.1.2.Mideta Sersaxîyê.....	90
4.1.3.Pêkanîna Sersaxîyê .....	92
4.1.4.Gotinên Ku Li Cihên Sersaxîyê Tê Gotin.....	94
4.1.5.Îkramên Ji Bo Mêvanan .....	98
4.1.6. Xwendina Diyan Li Cihê Sersaxîyê.....	100
4.1.7.Alîkarîyên Xwedîyan .....	101
4.1.8.Sersaxî û Têkilîyên Civakî.....	103
4.2.ŞÎN.....	106
4.2.1.Mirinên Ku Mirov Gelekî Pê Têşin .....	107
4.2.2.Bertekên Şîne Yê Pêşî.....	108
4.2.3.Qusandina Por û Kezîyan .....	110
4.2.4.Dûrik .....	112
4.2.5. Nîşanên Şîne .....	117
4.2.6.Helwesta Civakê Di Serdema Şîne Da .....	122
4.2.7.Paşxistina Dawet û Şahîyan .....	124
4.2.8.Cejna Pêşî .....	125
4.2.9. Pêvajoya Şîne.....	127
4.2.9.1. Ji Alîyê Nasname û Rewşa Yê/Ya Mirî Ve .....	128
4.2.9.2. Ji Alîyê Yê Mayî Ve .....	129
4.2.9.3. Ji Alîyê Awayên Mirinê Ve .....	130
4.2.9.4. Ji Alîyê Guherîna Binyada Civakî Ve.....	131
4.2.10. Rakirina Şîne.....	134
4.3.GOR Û GORISTAN .....	135
4.3.1. Rewşa Gor û Goristanên Herêmê .....	136
4.3.2.Ziyaretkirina Gor û Goristanan.....	138
4.3.3.Gor û Ziyaretên Pîroz .....	140
<b>ENCAM.....</b>	<b>142</b>

<b>ÇAVKANÎ</b> .....	<b>145</b>
Tablo 1: Lîsteya Kesên Çavkanî.....	153
<b>PÊVEK</b> .....	<b>156</b>
Pêvek-1: Ferhenga Mirinê Ya Gelî .....	157
Pêvek-2: Telqîna Kurdên Misilman.....	158
Pêvek-3: Qewlekî Kurdên Êzidî.....	162
Pêvek-4: Wêneyin Ji Sehaya Xebatê.....	165
Pêvek-5: Nexşeya Nisêbîn û Gundên Wê.....	172



# LÎSTEYA TABLOYAN

**Rûpel**

<b>Tablo 1:</b> Lîsteya Kesên Çavkanî .....	153
---	-----



## LÎSTEYA WÊNE Û NEXŞEYAN

	<b>Rûpel</b>
<b>Wêne 1:</b> Hevpeyvîn Bi Abdullah Tunç Ra (Gundê Cibilgirawê) .....	165
<b>Wêne 2:</b> Hevpeyvîn Bi Fevziye Su Ra (Gundê Talatê).....	165
<b>Wêne 3:</b> Darbest.....	166
<b>Wêne 4:</b> Ferşê Şuştinê.....	166
<b>Wêne 5:</b> Piştî Ku Mirî Hat Bicihkirin Kepçe Axê Tavêje Hundirê Gorê.....	166
<b>Wêne 6:</b> Jin Di Ziyareta Pêşî Da Li Ser Gorê Yasînan Dixwînin û Dia Dikin.....	167
<b>Wêne 7:</b> Dîmenek Ji Cihê Sersaxîyê û Hewşa Wê (Ya Li Taxa Dîcleyê).....	167
<b>Wêne 8:</b> Jin, Li Cihê Sersaxîyê Quranê Dixwînin û Tizbehan Dikişînin.....	168
<b>Wêne 9:</b> Li Cihê Sersaxîyê Sêroka Mirîyî/yê Tê Xwarin.....	168
<b>Wêne 10:</b> Êvara Înîyê Li Goristanê Şêranî Li Zarokan Tê Belavkirin.....	169
<b>Wêne 11:</b> Dîmenek Ji Ziyareta Goristanê Ya Êvara Cejnê.....	169
<b>Wêne 12:</b> Goreka Kurdên Misilman.....	170
<b>Wêne 13:</b> Goreka Kurdên Êzidî.....	170
<b>Wêne 14:</b> Dîmenek Ji Goristana Mohriz Ya Li Navenda Bajarî.....	170
<b>Wêne 15:</b> Dîmenek Ji Goristana Tilyaqûbê (Misilman).....	171
<b>Wêne 16:</b> Dîmenek ji Goristana Hesên Begê Ya Mezrika Mihoka (Êzidî).....	171
<b>Nexşe-1:</b> Nexşeya Nisêbîn û Gundên Wê.....	172



## KURTEBÊJE

<i>Amd.</i>	Amadekar
<i>Çev.</i>	Çeviren (Wergêr)
<i>Ed.</i>	Editör (Edîtor)
<b>B.Z.</b>	Berî Zayînê
<b>P.Z.</b>	Piştî Zayînê
<i>Wer.</i>	Wergêr
<i>hwd.</i>	Her wekî din
<i>ynd.</i>	Yên din

## DESTPÊK

Bûyera mirinê serdemeka derbasbûnê ya jîyanê ye û li ser nêrîn û têgihîştina jîyanê ya mirovan pêkera herî bi bandor e. Baudrillard mirinê weke xêzikeka di navbera “zindî” û “mirî”yan da pênasê dike û dibêje ji ber vê yekê, mirin hem bandorê li zindîyan û hem jî li mirîyan dike (Baudrillard, 2008: 223). Mirin tiştêkî weha ye ku bivênevê dê bê serê hemû zindîyan û tu kes nikare jê xelas bibe. Lewma ji berê da mirovan hewl dane ku, mirinên ku li der û dora wan qewimîne fambikin, rave bikin û jê dûr bikevin.

Constance Jones weha dibêje:

“Kêm tiştên weke mirinê hene ku dê bê serê hemû mirovan. Dibe ku mirin rastîya herî tirsnak ya jîyanê be... Bandor li ol, sîyaset, huner, zanist, aborî, şêweyên helwestên civakî û her tiştên jîyana rojane kirîye. Li vê dinyaya ku em lê dijîn heta niha perdeya sirê ya mirinê nehatîye hilanîn. Mirovahîyê jî bi mebesta yekkirina jîyan û mirinê, ji bo ku bikaribe pêvajoya mirinê kontrol bike rêyên curbicur dîtine.” (Jones, 2004: 7)

James G. Frazer radigihîne ku, ji bo ku bikaribin xwe ji mirinê biparêzin, mirovan hewl dane ku derketina rihê ya ji laşî asteng bikin û heger derketibe jî rihê çûyî li laşî vegehrînin (Frazer, 2004: 121). Van hewldanên ji bo ravekirina mirinê pêşî berê mirovan daye mîtan, dûvre ol bi hawara wan ve gihane. Olan bi fonksiyona xwe ya civakî ji bo laş û rihê mirîyî/yê hindêk rîtuêl derxistine holê. Bi rêya van rîtuêlan jî hêlaye ku mirin bibe bûyereka civakî.

Em di wê qenaetê da ne ku eger dîyardeyeka weke mirinê tenê bi rêbazên disîplînekê bê vekolîn dê ew dîyarde bi hemû aliyên xwe ve neyê famkirin. Lewma jî pêdivî bi xebateka înterdisîplîner heye. Teolojî, anrtolojî, folklor, civaknasî û psîkolojîyê bi nêzîkahîyên cuda mijara mirinê û encamên wê lê kolane. Digel ku gelek zanistên din jî li ser vê mijarê sekinîne jî em dê di vê xebata xwe da ji van zanistên navborî û heta ji dîrokê jî (dîroka olan) sûd werbigirin û xebata xwe li gorî perspektîfên van zanistan bihûnin.

Lêkolînên folklorê, mirinê weke rîteka derbasbûnê derdixin pêş û pêvajoya sepandinên wê yên di civakê da lê dikolin û teswîr dikin. Di perspektîfa civaknasîyê da mirin ji zanistê heta bi teknolojîyê, ji bîrdozîyê heta bi sîyasetê, ji teorîyê heta bi pratîkê gelek şaxên cuda dihewîne (Sağır, 2017: 312). Lêkolînerekî din dibêje “Civaknasî zanyarîyên ku bi rêya çavênîyan berhev dike berawird dike, dabeş dike û rave dike.” (Günay, 2008: 24). Burcu û Akalın jî derbareyê vê mijarê da weha dibêjin: “Xebata civaknasîyê ya mirinê ew lêkolîn e ku, pênasekirina cureyên rû û dîmenên mirinê û dema ku mirov li mirinê rast tên plansazîya çalakî û kirinên wan ya ku serî lê didin çî ye, rave dike.” (Burcu û Akalın, 2008: 34).

Zanista antropolojîya civakî manedayîn û eleqenîşandayîna çandên berê û yên îro ya ji bo dîyardeya mirinê lê dikole û bi berawirdkirina çandan dîyardeya mirinê vedikole. Zanista psîkolojîyê, aliyên mirinê yên şexsî û rihî lê dikole, bêtir jî li ser xwedûrxistina ji mirinê ya ferd û civakan û li ser tirsên mirinê radiweste (Burcu û Akalın, 2008: 34). Ji aliyê teolojîyê ve jî mirin, weke merasîmekê, dikare ji perspektîfa rêbaza têkilîdanîna di navbera mirov û hêzên kozmîk-Xwedayî da bê lêkolînkirin (Demirci, 2013: 50).

Ji bo vê xebatê em dê di warê olên kurdan yên berê û îro da ji zanista dîroka olan, di warê nêrîna olan ya li mirinê da ji zanista teolojîyê, di warê berawirdkirina têgihîştin û nêrîna kurdan ya berê û îro da ji zanista antropolojîyê, di warê tesbîtkirin û teswîrkirina rîtûelên mirinê da ji zanista folklorê, di warê bandora mirinê ya li civakê û li guhertina binyada civakî da ji zanista civaknasîyê û di warê bertek û helwestên ferd û civakê yên şînê da ji zanista psîkolojîyê sûd werbigirin.

Turner dibêje windahîya ku bi mirinê çêdibe ne tenê windahîya laşê ferdekî ye, girîngîya wê ew e ku ev windahî ji bo laşê civakî weke xerabûnekê ye û vê yekê weke windahîya parçeyekî ji komê ango ji civakê pênase dike. Herweha Blauner jî dibêje mirin di jîyana civakî ya herikbar da “valahîyeka civakî” derdixe holê û ev yek ji bo civakê encama herî xerabker e (veguhêzer Burcu û Akalın, 2008: 34). Ji bo şûna vê valahîya ku piştî mirinê derketîye holê dagire her civakê rîtûelên curbecur afirandine. Kastenbaum dibêje ji vê yekê armanc ew e ku pergala civakî kêlî berî kêlîyekê jinûve bê sazîkirin û bêewlehîya ontolojîk bi laşê mirîyê/yê ra bê sînorkirin (Kara, 2009: 222). Yanî merasîmên piştî mirinê ji bo jinûveavakirina piştevanîya

komê ya hejîyayî û pêşxistina moralê komê alavên herî bi bandor dabîn dikin  
(Malinowski, 1990: 49)

Armanca pêkanîna adetên piştî mirinê Örnek weha destnîşan dike:

“Em dibînin ku adet û kirinên derbareyê mirîyî/yê da di sê koman da tîn berhevkin:

1-Adetên ku ji bo hêsankirina çûna yê/ya mirî ya dinyaya din tîn kirin; yê ku ji bo di çavên yê şûndemayî da weke mirîyekî/a bextewar bê dîtin tîn kirin û yê ku ji bo dabînkirina bextewariya mirîyî/yê ya li dinyaya din tîn kirin,

2-Adetên ku ji bo astengkirina şûndevegerîna mirîyî/yê, ji bo astengkirina zerardayî û xerabîkirina mirîyî/yê ya bi xwedîyên xwe tîn kirin,

3-Adetên ku ji bo başkirina rewşa rihî ya xerabûyî ya xwedîyên mirîyî/yê; ji bo sererastkirina têkilîyên xwedîyên mirîyî/yê yê civakî yê hejîyayî û ji bo jinûvevevlêkirina wan ya nav civakê tîn kirin.” (Örnek, 1971: 108).

Ji bo naskirina binyada civakî jî ev rîtûel gelekî sûdewer in. Abuzar binyada civakî weha pênase dike: “Binyada civakî weke dîyardeyeka ku, têda têkilîyên civakî teşe digirin, jîyana rojane tê dîyarkirin û meşandin, ji alîyê ferdên civakê ve tê qebûlkin û dewamîya civakê tê dabînkirin, derdikeve pêşberî me.” (Abuzar, 2010: 263). Ji bo wekhevî û cudahîyên binyadên civakî raxin ber çavan, ji alîyê şêweyên rîtûelan ve, ji alîyê bandora ku li civakê dike ve û ji alîyê maneyê ve mirin yekûneka hêmayan e (Kara, 2009: 221-222). Heta Karaman (2010) di cudakirina civakekê ji yê din da rîtûelan weke pênasekerên nasnameyê bi nav dike (Karaman, 2010: 232). Ji bo çand û hişmendîya civakekê û guhertinên ku di herikîna demê da di jîyana wê civakê da çêbûne bînan famkin, mirin û rîtûelên ku li dora wê derketine holê, organîzasyonên cihî û merasîm û hwd. hêmanên girîng in (Sağır, 2012: 922). Lewra her ku mercên civakî tînan guhertin, maneyên ku li mirinê tînan barkirin û têngihîştin û sepandinên tînkildarî mirinê jî bi şêweyên cuda xwe nîşan didin (Sağır, 2017: 36). Lewma divê rûyê mirinê yê ku tê guhertin weke rengvedaneka guherîna civakî bê xwendin (Demir S. T., 2017: 191). Heta rîtûel dikare weke rêyeka taybet ku têkilîyên civakî têda tînan sazkin bê dîtin (Bell, 2009 a: 39).

Ji dema ku mirov hene û heta îro mirin jî heye. Lewma jî tînkilîyeka xurt di navbera mirin û mirovahîyê da heye. Nexwe ji bo ku binyada civakî bê famkin divê

nêrîna wê civakê ya li mirinê bê zanîn. Bauman dide zanîn ku heger mirovan nizanîba ku dê bimirin, bi ihtîmaleka mezin dê çand jî nebaya (Bauman, 2012: 45). Herweha Sağır jî dîyar dike ku tevî çandê, jêderka hemû berhem û helwestên civakî mirin e (Sağır, 2016: 279).

## **MIJAR**

Mirin ji bo kesê/a mirî weke dawîya jîyanê ye, lê ji bo malbat û xwedîyên wan ji ber rîtûelên ku li dora dûrik, şîn û sersaxîyê hatine sazîkirin, bûyereka çandî û civakî ye. Heger civak bi hemû hêman û sazîyên xwe weke sîstemekê bê qebûlîkirin, mirov jî parçeyek ji vê sîstemê ye û tê da rol û fonksîyoneka wî/wê heye. Nexwe mirina kesekî/ê di vê sîstemê da valahîyekê çêdike û civak jî hewl dide ku vê valahîyê kêlî berî kêlîyekê dagire. Civak ji bo dagirtina vê valahîyê ji adet û rîtûelan sûd werdigire. Bi vê pêrspektîfê, ji bo ku çand û binyada civakekê bê famkirin rîtûelên mirinê yên wê civakê girîng in. Ev rîtûel derheqê şêwaza jîyankirinê, nirxên civakê û jîyana çandî ya civakê da qenatekê bi mirov ra çêdikin. Her rîtûel rol û fonksîyoneka xwe heye, guherîna van rîtûelan di heman demê da guherîna hiş, nirx, bîr û bawerîyên civakê ne jî.

Berhevîkirin û teswîrkirina adet û rîtûelên têkildarî mirinê yên li nav kurdên Nisêbînê mijara vê xebatê ye. Herweha destnîşankirina taybetîyên van adet û rîtûelan, berawirdkirina wan ya bi yên berê ra û ravekirina sedemên guherînan jî alîyekî mijara me ne.

Ji bo paşxaneya adet û rîtûelên îro yên kurdên sehaya xebatê bê famkirin lêkolîna olên kevin yên kurdan û çanda kurdî ya giştî jî di nav mijara me da cihê xwe digire.

## **GIRÎNGÎYA MIJARÊ**

Derbareyê folklorê kurdî da, van salên dawî hindêk lêkolînên berfireh tên kirin, lê hejmara wan pir hindik e. Philip Kreyenbroek û Christine Allison balê dikişînin ser vê “hindikbûnê” û weha dibêjin: “Piranîya neteweyên Asyayê pê serbilind in ku pirtûk û gotarên derheqê çanda wan da bi qasî ku pirtûkxaneyeka

biçûk dagirin, gelek in. Lê kurd, mecbûr in qîma xwe bi koleksiyoneka ku tenê ji refekî pêk tê, bînin.” (Kreyenbroek û Allison, 2008: 12)

Necat Keskin balê dikişîne ser karê berhevkarîyê û weha dibêje: “Ji ber ku şer, pevçûn, pîrsgirêkên sîyasî gelek caran derî li ber karên bi vî rengî, yanî berhevkarî û arşivkirin, digire, û di dawîyê da jî gelek tiştên jibîrkin an jî winda dibin” (Keskin, 2017: 10). Nisêbîn nimûneyeka berbiçav e, lewra berî bi sê salan nivê bajarî xerabû û weke xaniyan gelek tiştên din jî pêra xerabûn û çûn. Yıldırım, Pertev û Aslan vebûna hin enstîtuyên kurdolojîyê ya di bin banê zanîngehên dewletê da, ji bo çand û zimanê kurdî pêşketineka girîng dibînin û derbareyê mijarê da weha dibêjin: “Ev jî derfetan çêdike ku mamoste û xwendekarên van beşan li ser folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî li gorî rê û rêbazên zanistî xebatên akademîk û birêkûpêk bimeşînin.” (Yıldırım, Pertev û Aslan, 2013: 183).

Li Tirkîyeyê, derbareyê mirinê da xebatên akademîk kêma in û di vî warî da valahîyek heye. Di nav kurdan da xebatên derheqê mirin û rîtûelên girêdayî wê da hatine kirin pir hindik in û yê heyî jî ji pîvanên zanistî dûr in, ji hûrgilî û analîzan bêpar in. Li zanîngehên Tirkîyeyê van salên dawî ji aliyê lêkolînerên weke Metin Eren û Mustafa Hakkı Ertan ve derheqê çanda mirin, sersaxî û şîne ya kurdên misilman da xebatên balkêş hatine kirin, herweha hindê gotar jî hatine nivîsîn. Ji aliyê berhevkarîyê ve karekî baş kirine, lê hem zimanê wan tirkî ye û hem jî van adet û rîtûelên tirkîdarî mirinê bi çand û olên tirkî yê serdemên berê ve girê didin. Yanî di van adetan da li şopên çanda tirkî yê berê digerin û van adet û rîtûelan weke parçeyek ji çanda tirkî dihesibînin.

Weke ku em dê di beşa xebatên lîteratûrê da jî destnîşan bikin, dema ku mirov li xebatên heyî yê derbareyê çanda giştî ya Nisêbînê da hatine nivîsîn dinêre, dîyar dibe ku ji aliyê şîrove, analîz û nirxandinên zanistî ve lawaz in. Ji ber van sedeman me adet û rîtûelên tirkîdarî mirinê yê li herêma Nisêbînê kirine mijara vê lêkolînê. Divê bê gotin ku li herêma gelek civak hebûna xwe didomînin, lê me çarçoveya xebatê bi kurdên herêma ra bi sînor kir. Ji ber ku ev xebat bi awayekî akademîk û bi rêbazên zanistî vê mijarê vedikole, girîng e. Digel vî qasî bi vê xebatê ra dê bîblîyografyayeka mirinê ya kurdî jî derkeve holê. Lewra di beşa xebata

lîteratûrê da heta ji destê me hat berhemên têkildarî mirinê da hatine nivîsîn me bi awayekî rexneyî şirove kirin.

## ARMANC

Propp dibêje “Folklor di nav gerînê da ye û hertim diguhere; ev gerîn û guherîn di nav taybetmendiyên folklorê da ne.” (Propp, 1998: 18). Heta Richard M. Dorson îdîa dike ku di hundirê çend salan da dê tiştekî bi navê folklorê nemîne û ji ber wê yekê dê pêdivî bi folklornasan jî nemîne (Dorson, 2011: 69). Ji ber vê rastîyê armanca me ya pêşî tespît û teswîrkirina van adet û rîtûelên têkildarî mirinê yên îro û berê ye. Bi pênasekirina Connerton, me xwest bibin “tomarkerekî biinyad” yê paşerojê û bi vî awayî wan ji windabûnê rizgar bikin, bi rêya nivîsê wan biparêzin û ji bo çanda kurdî û bi taybetî jî ji bo çanda Nisêbînê dîyarî bikin (Connerton, 1999: 26).

Bi vê xebatê hat xwestin ku bersiva pirsên weke “Adet û rîtûelên têkildarî mirinê çi ne û çawa tên kirin, di van adet û rîtûelan da çi guherîn çêbûne, çi adet û rîtûelên nû derketine holê, sedemên van guherînan çi ne” bên lekolînkirin û dûvre jî bi rêya analîzan bên ravekirin. Herweha hat xwestin ku rol û fonksiyona van rîtûelan ya di jîyana şexsî û civakî da ji aliyê aborî, bajarvanî, çandî, civakî, siyâsî, olî, psîkolojîk û hwd. ve jî bê tespîtîkirin û ravekirin. Mebest ji vê yekê ew bû ku rengvedanên mirinê yên di nav civaka kurdên Nisêbînê da li ber çavan bên raxistin.

Weke ku tê zanîn, ji bo famkirina çand û binyada civakekê, rîtûelên derbareyê merhaleyên jîyana mirovan (weke jidayîkbûn, sinnetkirina zarokên mêr, zewac, hwd.) da gelekî girîng in. Di vê çarçoveyê da me xwest bi berhevkirin, şirovekirin û nirxandina rîtûelên derbareyê mirinê da em binyada civakî ya kurdên Nisêbînê nas bikin û bidin naskirin.

Ji bo paşxaneyê adet û rîtûelên têkildarî mirinê bê famkirin me xwest nêrînên olên kurdan yên li ser mirinê û têgihîştina mirinê li nav kurdan ji çavkanîyên nivîskî lê bikolin. Ji vê yekê mebest ew bû ku em bikaribin adetên kurdên Nisêbînê bi yên civaka kurdî ra bidin hev û manendiyên wan destnîşan bikin. Armanceka din jî

lêgerîn û tespîtkirina şopên bawerîyên olên berê yê kurdan, di adet û rîtuêlên kurdên herêmê da ye.

## ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ Û SÎNORÊN XEBATÊ

Sehaya xebatê bi bajarê Nisêbînê û gundên wê ve hatîye sînorkirin. Ji civakên li herêmê jî bi tenê civaka kurd bûye mijara lêkolînan. Li vê herêmê me li ser adet û rîtuêlên bi mirin, sersaxî û şînê ve têkildar lêkolîna sehayî kir. Divê bê gotin ku ji bilî dûrik û tiştên ku di dema sersaxîyê da tên gotin, edebîyata gelêrî li derveyî mijarê hatîye hiştin.

Nisêbîn herêmeka pir olî û pir çandî ye. Digel kurdên misilman û kurdên êzidî, mitirb û seyidên ku li herêmê dijîn jî weke parçeyek ji civaka kurdî, bûne mijara lêkolîna me. Lê mihelmî ango erebên bajarî û xirîstîyanên ku li çend gundên Nisêbînê dijîn li derveyî çarçoveya lêkolînê hatin hêlan. Tenê dema ku sedemên guherînên adet û rîtuêlên mirinê yê civaka kurd tên şirovekirin, dema ku hewce kir behsa rola çanda mirinê ya van civakan hat kirin.

Ji bilî mezrayan 68 gundên Nisêbînê hene. Li gorî erdnîgarî û çanda Nisêbînê, ji bilî bajarî, me sehaya xebatê kir 8 beş. Me ev dabeşkirin li gorî çend pêkeran pêk anî. Gundên di çiyayî da, gundên berîyê, gundên li ser rêya Midyad û Serê Avê, gundên alîyê Mêrdîn û Qosarê, gundên nêzîk û dûrî rêyê, gundên ku xirîstîyan û misilman bi hevûdun ra lê dijîn, gundên êzidîyan, gundên alîyê Cizîrê. Bi tevahî li navenda bajarî û 16 gundan lêkolîn û hevdîtin hatin kirin. Li gorî bawerîya me, ji bo ku em bigihîjin darazeka giştî ev rêje têrê dike.

Encam û darazên ku em gihîştinê jî tenê bi hevdîtin û çavnêrîyên me sînordar in. Ev hevdîtin û çavnêrî jî tenê li navenda bajarî û van gundan hatine kirin.

## RÊBAZ

Di destpêkê da me hewl da ku em çavkanîyên nivîskî yê derbareyê mijara xwe da berhev bikin. Ji bo vê yekê me xebateka lîteratûrê kir. Heta ji destê me hat pirtûk, gotar, tezên lîsansa bilind û doktorayê, danezanên sempozyûm û panêlan û berhemên din me berhev kirin. Ji bo vê yekê berhemên dîrokî, olî, çandî, civakî,



antropolojîk, û hwd. hatin vekolîn. Divê bê gotin ku derheqê mirin, çarçoveya teorîk û têgehî ya têkildarî mirin, sersaxî û şînê da tu berhemên akademîk ên kurdî nehatin bidestxistin. Ji bo vê yekê jî me berê xwe da çavkanîyên tirkî. Derheqê folklorê kurdî da me çend çavkanî peyda kirin lê di wan da agahîyên derbareyê mijara me da zêde nebûn.

Ji bilî çavkanîyên nivîskî bi rêya xebata sehayê me derbareyê mijarê da gelek zanyarî berhev kirin. Ekici xebata berhevkarîyê weha rave dike:

“Berhevkirina qadî ji bo folklorê ew kar e ku derbareyê mijarekê da, di demeka dîyar da, li cihekî dîyar, ji aliyê wan kesên ku bi pisporî an jî bi amatorî eleqeyê nîşanî folklorê didin û hin alav û rêbazên dîyar bikar tînin ve, ji kesên ku berhemên folklorê diafirînin, vediguhêzin û îcra dikin, bi awayên devkî, nivîskî û dîtbarî tînin tomarkirin û keresteyên madî tînin bidestxistin.” (Ekici, 2015: 25-26)

Ji ber ku bîngeha vê xebatê, ji zanyarîyên lîteratûrê wêdetir, li ser zanyarîyên sehayê ye, piştî lêgerîna lîteratûrê, me dest bi xebata sehayê kir. Ji bo hevdiîtinên sehayê me lîsteyeka pirsan amade kir. Ji bo amadekirina vê lîsteyê me ji van çavkanîyan sîd wergirt: Pirtûka Sedat Veyis Örnek ya bi navê “Anadolu Folklorunda Ölüm” (Örnek, 1971), pirtûka Metin Ekici ya bi navê “Halk Bilgisi (Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri” (Ekici, 2015), pirtûka Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev û Mustafa Aslan ya bi navê “Folklorê Kurdî” (Yıldırım û yê din, 2013) û teza doktorayê ya Metin Eren ya bi navê “Van Gölü Havzası Ölüm Gelenekleri ve Türk Kültür Ekolojisi İçerisindeki Yeri” (Eren, 2010). Digel pirsên ku ji van çavkanîyan hatin girtin, li gorî taybetîyên mijara xwe me hin pirs li lîsteya xwe zêdekirin.

Ji bo destnîşankirin û têkilîdanîna kesên çavkanî me alîkarî ji mamosta û mixtarên gundên ku xebata sehayê lê hat kirin, stand. Herweha kesên din ên ku şênîyên wan gundan nasdikin jî alîkarî dan me. Bi piranî me kesên temendirêj tercîh kirin. Herweha kesên ku jîyana wan bêtir li gundî derbas bûye, yê ku meraqa wan li ser mijara me hebû jî weke çavkanî hatin hilbijartin. Ji ber ku di rîtûelên têkildarî mijara me da jin roleka sereke dilîzin, ji bo tomarkirina zanyarîyên derbareyê van adet û rîtûelan da me serî li çavkanîyên jin da. Ji bo adetên îroyîn mele, mixtar,

mamosta, ... û hwd. jî ketin nav lîsteya çavkanîyên me. Bi vî awayî, heta ji me hat me hewl da ku em xwe bigihînin gelek kesên çavkanî.

Berî ku em biçin gundên êzidîyan me derheqê adetên wan da çavkanîyên nivîskî xwendin û notên xwe girtin. Di hevpeyvînan da pêşî me pirsên di lîsteya xwe da ji wan kirin. Dûvre li gorî wan notên ku ji çavkanîyên nivîskî hatin bidestxistin, me hin pirsên din jî ji wan kirin. Ji ber vê yekê jî di vegotina adetên êzidîyên Nisêbînê da me tenê tiştên ku li cem wan hatin tespîtkirin, nivîsîn.

Ji bo ku em zanyarîyan bi awayekî rast tomar bikin me mekîneya tomarkirina dangan û mekîneya fotografan bikar anî. Digel van alavan lîsteya û pêncê me jî her tim bi me ra bû. Ji bo ku em bikaribin cih û rîtûelên mirinê bê kêmasî rave bikin, li gorî derfetan me hewl da ku fotografên wan bikişînin. Piştî amadekirina lîsteya pirsan, peydakirina alavên tomarkirinê û destnîşankirina gundî û kesên çavkanî me dest bi xebatên sehayê kir. Me di nîsana 2018an da dest bi xebatên sehayê kir û ev xebat heta dawîya meha hezîranê dom kirin. Herçiqas hevpeyvînen ku bingeha vê xebatê pêk tînin di sê mehan da hatibin kirin jî dikare bê gotin ku heta çapkirina teze jî dan û standinên bi kesên çavkanî ra dewam kirin.

Ji bo berhevkirina zanyarîyên li sehayê di xebata xwe da me du rêbazên sereke bi kar anîn. Yek jê çavênîya bi beşdarî û ya din jî hevdiîtin ango hevpeyvîn bû. Berî ku em biçin gundan me civanê xwe bi çavkanîyan ra datanî û li gorî vê yekê em diçûn. Piştî ku em vedigerîyan malê jî me ew çavênîyên xwe di kompîtira xwe da tomar dikirin. Ji ber ku hemû jîyana me li vî bajarî derbas bûye em beşdarî rîtûelên veşartin û sersaxîyê yên gelek gund û civakan bûne. Lewma jî di xebata xwe da me ji çavênîyên xwe yên van zîyaretan jî sûd wergirt.

Piştî ku me karê berhevkirinê qedand, zanyarîyên ku me ji qadê dan hev û yên ku me ji çavkanîyên nivîskî peyda kiribûn, me dan ber hev, şirove kirin û taybetîyên adet û rîtûelan destnîşan kirin. Digel vê destnîşankirinê me yên berê û yên niha berawird kirin û heta ji me hat sedemên guherînan, pêkerên ku di guherînê da rola xwe lîstine û bandor lê kirine jî me analîz kirin. Di vê çarçoveyê da me adet û rîtûelên mirinê yên di çanda kurdî da jî ji çavkanîyên nivîskî lêkolan û manendî û

cudahîyên wan bi yên kurdên Nisêbînê ra berawird kirin. Bi vî awayî me hewl da ku em bikaribin xwe bigihînin darazên giştî.

Mijara me ji alîyê têgehan ve pir dewlemend e. Ji bo her têgehekê çend peyv ango rêzepeyv tîk bikaranîn. Lewma jî di beşa çarçoveya teorîk û têgehî da, têgehên ku me di xebatê da tercîh kirine û awayê nêzîkahîya me ya li van têgehan hat ravekirin. Digel vîqasî, di dawîya xebatê da weke pêvek me cih da ferhengekê ku me ew wekî “Ferhenga Mirinê Ya Gelî” bi nav kirîye.

## **PIRSGIRÊK Ê ASTENGÎYÊN LÊKOLÎNÊ**

Pirsgirêka sereke di nav kurdan da kêmasîya lîteratûrê ya derbareyê mirinê da bû. Lewra bi qasî ku me lê kola heta îro derheqê adet û rîtûelên mirinê yên kurdan û bi taybetî kurdên Nisêbînê da xebatên akademîk nehatine kirin. Ji ber vê kêmasîyê berawirdkirin jî li gorî zanyarîyên ku me ji kesên çavkanî wergirtin hat kirin.

Ji ber ku me bi soranî nizanîbû û derfetên me nebûn ku em xwe bigihînin lîteratûra zanîngehên herêma Kurdistanê, nehate tespîtkirin bê ka li wê herêmê xebatên tîkildarî mijara me hatine kirin yan na. Ev jî weke kêmasîyekê derket pêşberî me.

Derheqê kurdên êzidî û ola êzdayetîyê da van salên dawî gelek pirtûk û gotar hatine nivîsîn û derheqê adet û rîtûelên mirinê da jî hindêk lêkolîn hatine kirin û zanyarî hatine dayîn. Lê divê bê gotin ku ev zanyarîyên ku ji alîyê kesên cuda ve hatine dayîn hevûdin nagirin û jixwe piştî xebatên me yên sehayê derket holê ku pîranîya van zanyarîyan li yên sehayê xebatê jî nayên. Lewra em dikarin bibêjin ku me ji van çavkanîyên derheqê êzidîyan da zêde sîd wernegirt.

Ji bo famkirina têgihîştina mirinê ya kurdan me xwest ku derheqê olên kurdan da lêkolînekê bikin. Li ser olên kurdan û bi taybetî jî li ser olên wan yên berê rêkeftinek di navbera lêkolîner û akademîsyenên kurd da nehat dîtin. Ji bo manendî û cudahîyên mirinê yên kurdên Nisêbînê û yên kurdên berê bîr berawirdkirin pêdivî bi vê yekê hebû lê divê bê gotin ku di vê mijarê da zelalîyek nehat dîtin. Ji bo çareserîya vê pirsgirêkê me jî çavkanîyên heyî dan ber hev û li gorî qenaeta ku bi me ra çêbû me mijara xwe nirxand.

Ji ber ku kurdên êzidî serdemekê di bin zexta cîranên xwe da mane, nedixwestin ku derheqê jîyana xwe ya rojane û ola xwe da biaxivin û zanyarîyan bidin me. Bi rêya kesên nêzîkî wan heta astekê me ev pirsgirêk çareser kir. Divê bê gotin ku hindekan jî daxwaza me ya hevpeyvînê qebûl nekir. Jixwe li herêmê xelkê me yê êzidî hindik mane, bi ser da ev pirsgirêkên weha jî derketin, yekcar zehmet bû.

Ji ber hesasîyeta mijarê derfetên me yên kişandina vîdyo û fotografan zêde tunebûn. Jixwe di dema hevpeyvînan da, wexta ku behsa mirîyên xwe dikirin çavkanîyên me xemgîn dibûn, carna hêstirên wan diherikîn û em disekinîn û me navber dida axaftinê. Herweha di dema veşartin, sersaxî û şînê da jî me nikarîbû tişteki ji xwedîyên mirîyî/yê bipirsîn û tenê me dikarîbû çavnêrîyê bikin.

Pirsgirêkeka din jî hevpeyvînên bi jinan ra bûn. Ji bo ku em bikaribin bi jinan ra hevpeyvînan bikin piraîya caran me jinek bi xwe ra dibir hevpeyvînan. Bi vî awayî heta radeyekê me dikarîbû pirsên xwe ji jinan bikin. Lê dîsa jî hindek jê ji bo hevpeyvînê ne dildar bûn.

Astengîyeka din ya ku derket pêşberî me rewşa sîyasî ya li herêmê bû. Lewra piştî bûyerên ku di sala 2016an da qewimîn mirovînan nedixwest derheqê mijarê da biaxivin û daxwaza me ya hevpeyvînê qebûl nedikirin. Heta ji me hat me dilê wan rehet fikir û me digot ku em dixwazin xebateka akademîk bikin. Herçiqas em li herêmê dihatin naskirin jî gelek çavkanîyên me xwestin ku navên wan yên rastî di xebatê da neyê nivîsîn.

# BEŞA YEKEM

## DANASÎNA SEHAYA XEBATÊ

Berî ku lêkolîner dakeve sehayê û xebatên xwe bike, divê derheqê wê herêmê da xwedî agahî be. Ekici dîyar dike ku naverok û afirandina keresteyên folkorîk bi awayekî dîyar bi taybetîyên erdnîgarîyî yê herêmê ra têkildar e (Ekici, 2015: 61). Wekî din ji bo ku di karê xwe da rastî rewşên neyînî nebe divê yê/ya lêkolîner berî ku dest bi xebatê bike, derheqê binyada civakî, dîrok, perwerdehî û civakên herêmê da zanyarîyan peyda bike. Di vê beşê da em dê sehaya xebatê bidin nasîn.

### 1.1.DÎROK

Nisêbîn navçeyeka girêdayî wîlayeta Mêrdînê ye û li tejaneya Dicle-Firatê ya Mezopotamyaya Jorîn ava bûye. Ji quntara piştî derçika Mêrdîn-Midyadê ya ku weke Tur Abidin tê naskirin û ber bi çola Sûrîyeyê ve li deştekê hatîye avakirin (Günay, 2009: 445). Li rojhilatê wê wîlayeta Şernexê, li bakur-rojavayê wê navçeya Mehsertê, li bakurê wê Midyadê, li rojavayê wê Qosar û navçeya navendî Artukluyê û li başûrê wê jî dewleta Sûrîyeyê heye.

Berî ku em derheqê dîroka Nisêbînê da zanyarîyan bidin pêşî em dixwazin li ser navê bajarî bisekinin. Navê Nasibina weke ku li ser hindek polikên\* kevin şiklê xwe yê NEΣIBI parastîye, di hindek çavkanîyan da bi awayê Nitibin, Nitibeni, Nizzibi, Nsepi, Nsebin, Nisibis, Nesebis û hwd. derbas dibe (Tuncel, 2007).

Di dema Hamurabîyê qiralê Babîlê da ji bo Nisêbînê bi maneya “cîhê bax û baxçeyan” navê Aramis hatîye dayîn. Mîtannîyan navê Naspinaizella bi kar anîye. Ereban bi maneya “du qismet” navê Nasibeyn daye vî bajarî. Piştî ku herêm ket bin desthilatdariya tirkan vî navî weke Nusaybin û Nisibin hebûna xwe domandîye. Îro

---

\* Diravên ku ji hesin, zîv, zêr hatî çêkirin.

di fermîyetê da navê Nusaybinê û di nav gelî da jî navê Nisêbînê tê bikaranîn (Erpolat, 2009: 136).

Nisêbîna ku li deşteka rast hatîye avakirin, yek ji wan wargehên herî kevin yê li Mezopotamyaya Jorîn e. Nisêbîna îroyîn, li kêleka kaviên Nisibisa kevin hatîye avakirin. Nisibis wargeheka kevin e û dîroka wê heta dema Sûmerîyan (B.Z.2270) diçe (Erpolat, 2009: 135).

Ji ber ku bajar ji serdemên kevin da li ser rêyên bazirganîyê ye û ji aliyê leşkerî ve li cihekî girîng hatîye avakirin (Laflı, 2009: 19) hertim bûye qada şerî û rêveberîya bajarî hertim ji destê dewletinan ketîye destê dewletinên din. Asûrî, Medî, Babîlî, Persî, Makedonyayî (di dema Îskenderê Mezin da), Partî, Ermenî, Romayî, Dewleta Îslamê (di dema Xelîfe Omer da), Bîzansî, Hamdanî, Merwanî, Ukaylî, Artukluyî û Eyûbî hin ji van dewletan in (Tuncel, 2007). Rûdaneka din ya ku girîngîya Nisêbînê zêde dike ew e ku, ji sedsala 4an û pêda, piştî Antakya û Êrfayê bûye sêyemîn navenda herî mezin ya teolojîya xirîstîyanîyê (Çevik, 2009: 66), lewra P.Z. di sala 328an da li Nisêbînê Dêra Mor Yaqûbî hatîye avakirin û ev dêr di demeka kin da bûye dêreka sereke (Dalkılıç û Halifeoğlu, 2009: 421).

Belâzurî radigihîne ku Nisêbîn di dema xelîfe Omer da, di sala 639an da ketîye bin desthilatdarîya Dewleta Îslamê (veguhêzer Cöhce, 2009: 97). Navçeya ku di sala 1100î da ketibû bin serwerîya Selçukîyan (“Tarihi ve Coğrafî Yapısı,” 2018) di serdema Yavuz Sultan Selim da, di dawîya sala 1515an da kete nav axa Osmanîyan (Tuncel, 2007). Bi piranî girêdayî mîrektîya Dîyarbekirê (herweha girêdayî Mêrdînê) bûye û carna bûye nehîye, carna qeza û carna jî bûye midûrîyeta nehîyeyê. Nisêbîn di serdema Komarê da di nav sînoren Tirkîyeyê da maye û navçeyeka girêdayî Mêrdînê ye (Günay, 2009: 443-445).

Piştî ku di sala 2012an da Mêrdînê statûya şarederîya bajarê mezin stand, gundên girêdayî Nisêbînê veguherîyan taxê. Îro li Nisêbînê 16 jê taxên navenda bajarî bi tevahî 84 tax û nêzîkî 30 mezrikên girêdayî van taxan hene (“Sosyal ve Ekonomik Durum”, 2018).

## 1.2.ABORÎ

Nisêbîn li ser rêyên girîng yê bazirganîyê ye û malên ku ji peravên Deryaya Spî ber bi welatên Rojhilata Navîn ve tên şandin di ser Nisêbînê ra tên veguhastin. Ev bazirganî û veguhastina ku têkildarî derîyê Xabûrê ye û di ser rêya îpekê ra tê kirin ji bo aborîya bajarî derfeteka girîng e. Bi xêra derîyê di navbera Nisêbîn û Qamişloyê da ji berê da li sînora bazirganî tê kirin. Lê ji dema ku di sala 2011an da li Sûrîyeyê şerekî navxweyî rû da û heta îro ev derî girtî ye. Li rojhilatê bajarî derîyekî nû û transît hatîye çêkirin lê heta îro ev derî nehatîye bikaranîn. Tê payîn ku ev derîyê transît vebe û ji bo aborîya bajarî derfetên nû derxe holê.

Aborîya navçeyê bi giştî li ser çandinî, barkêşî û bazirganîyê ye û li navenda bajarî hejmareka mezin ya esnafan jî heye. Erdên Nisêbînê %60 ji bo çandinîyê guncaw in û çandinî hem li erdên avî û hem jî li yê bêav û baxçeyan tê kirin (“Sosyal ve Ekonomik Durum”, 2018). Li bajarî pîşesazî (senayî) zêde pêş neketîye.

Li bajarî rêjeya bêkarîyê di asteka bilind da ye. Lewma jî xort diçin bajarên mezin û li wir di karên însaetan da dixebitin û herweha li gorî demê ji bo karên weke findeq, mişmiş, kartol û hwd. berê xwe didin bajarên mezin.

Li bakurê Nisêbînê, li derdora gundê Bawernêyê santrala hîdroelektrîkê ya Çağ Çağê hatîye avakirin û hindêk elektrîka ku li herêmê tê bikaranîn ji vê barajê tê bidestxistin (Nusaybin Belediyesi, 2001: 75). Herweha ava vexwarinê ya bajarî jî ji vê barajê tê bidestxistin û van salên dawî bi rêya borîyên mezin Mêrdîn û Qosar jî ji vê avê sûd werdigirin.

## 1.3.GELHE

Nisêbîn bajarekî dîrokî ye û Şeşen dîyar dike ku di serdema Eyûbîyan da kurdên êzidî û misilman, ereb, suryan, cihû, ermen û peywirdarên tirk li herêmê jîyan dikirin (veguhêzer Demir A., 2009: 99). Li gorî salnameya 1894-95an jî Nisêbîn wê demê qeza ye û misilman, suryan, cihû û êzidî lê dijîyan (İzğöer, 1999: 210).

Gelheya navenda bajarî di sala 1927an da 2.851 kes bû û piştî sala 1950yî bi derbekê da zêde bûye. Tê dîtîn ku ji ber bajarvanîyê û hin sedemên din, nemaze piştî

salên 1985an gelheya kesên ku li gundan dijîn kêr bûye û ya kesên ku li bajarî dijîn zêde bûye (Günay, 2009: 458). Di salên 1980yî da gelheya navenda bajarî, ya gundan derbas dike û ev guherîn heta roja îro her ku diçe xurttir dewam dike.

Li gorî daneyên Sazîya Statîstîkan ya Tirkîyeyê (Türkiye İstatistik Kurumu) gelheya navçeyê di sala 2014an da 116.068 kes bû, lê ji ber bûyerên civakî di sala 2016an da daketîye 102.007 kesan û îro jî gelheya bajarî 105.856 kes e (“Nusaybin Nüfusu”, 2019). Di roja îroyîn da gelheya bajarî bi piranî ji kurdan pêk tê û yên mayî jî ereb û suryan in (Nusaybin İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü, 2019).

## **1.4.OL Û CIVAKÊN LI HERÊMÊ**

Nisêbîn ji alîyê ol û civakan ve cihekî gelekî dewlemend e. Misilman, êzidî û xirîstîyan; kurd, ereb, suryan û tirk li Nisêbîn û gundên wê dijîn. Heta nîvê sedsala 20an li herêmê cihû jî hebûn lê piştî ku dewleta Îsraîlê ava bû, tevde çûn wê dewletê. Herweha di paşeroja bajarî da serdemekê ermenan jî li vî bajarê qedîm jîyan kirîye (Kütük, 2018: 240). Li jêr em dê behsa wan civakan bikin ku îro li herêmê hebûna xwe didomînin.

### **1.4.1.Kurd**

Em dê kurdên bajarî di bin du sernavan da vebêjin. Ev dabeşkirin dê ne di warê zimanî da lê di warê olê da bê kirin. Lewra kurdên herêmê hemû bi kurdîya kurmancî diaxivin. Lê ji alîyê olê ve hindêk misilman in û hindêk ji wan jî êzidî ne.

#### **1.4.1.1.Kurdên Misilman**

Li Nisêbînê civaka herî mezin ya kurdan e û herçiqas rêjeyeka fermî li ber destê me nebe jî bi qasî ku me li sehayê lê kola ji %70-80 kurdên misilman in. Jixwe kurdên misilman jî hemû şafî ne. Digel êlên weke Mirsiniyan, Bûbilanan, Temika, Omerî û Koçeka (Tan, 2011: 326) di nav komên bajarî da kurdên koçer, botî, torî, û hwd. jî cih digirin. Dikare bê gotin ku îro ji hemû êl û gundan mirov li navenda bajarî bi cih bûne.



Li herêmê seyid jî hene, tê zanîn ku seyidê yekem Seyid Bilal di sala 1446-47an da hatîye herêma Tûrabdînê û seyid ji wir li herêmê belav bûne (Tan, 2011: 370). Divê em bibêjin ku di vê xebata xwe da em dê seyidan jî weke parçeyek ji civaka kurdên misilman bihesibînin. Keskin dibêje seyidîti ne nasnameyeka etnîkî ye û seyidan di nav nasnameya kurdî da ji xwe ra cih dîtine (Keskin, 2014: 184). Jixwe ew bixwe jî, xwe weke kurd dibînin û li gund û bajarî di nav kurdan da jîyana xwe didomînin.

Herweha komeka din ya ku em wan weke endameka civaka kurd dibînin jî mitirb in. Herçiqas derheqê etnîka wan da nêrînên cuda hebin jî weke ku Keskin jî radigihîne bi hindêk taybetîyên xwe, vê civakê îro di nav nasnameya kurd da cihê xwe girtîye (Keskin, 2015: 63). Qet nebe ji bo mitirbên Nisêbînê ev yek bi rehetî dikare bê gotin, jixwe di xebatên sehayê da jî ev rastî bi awayekî aşkere hat dîtin. Nayê zanîn bê kengî hatine bajarî û ji kengî da di nav kurdan da bi cih bûne. Bazîdî di pirtûka xwe ya ku berî 160 salî nivîsîye da behsa wan dike û dibêje ku mitirb di nav kurdan da dijîn (Bazîdî, 2010: 88). Lewra me ev civak jî di nav kurdên misilman da dan naskirin.

#### **1.4.1.2. Kurdên Êzîdî**

Derheqê hatina êzîdîyan ya herêmê da zanyarîyên zelal li ber destan tunene (Tan, 2011: 345) lê êzîdîyên herêmê dibêjin ji heft bavikan wêdetir e ku em li vir dijîn (Ç28). Kurdên êzîdî ne li navenda bajarî lê li çend gundan bi cih bûne. Êzîdî li gundên weke Mezrika Mihoka, Gelîyê Sora, Efşê, Berhokê, Qolika û Fisqînê xwe bi xwe, li gundê Bîrgurîya tevî misilman û xirîstîyanan û li gundê Badibê jî tevî Xirîstîyanan dijîn.

Piştî salên heştêyî ji ber rewşa neyînî ya li herêmê, ji bo wan şert û mercên jîyanê dijwar bûn. Piranîya wan, dev ji gund û warên xwe berdan û berê xwe dan welatên Ewropayê û gelek ji wan çûn Elmanyayê. Li gorî zanyarîyên ku Ahmet Turan dide, di sala 1985an da li gundên Nisêbînê 2963 êzîdî dijîyan. Turan dibêje, min ev zanyarî ji qeydîyên fermî yên dewletê bi dest xistine (Turan, 2015: 36, 68). Li gorî agahîyên ku Ahmet Taşğın dide me di sala 2000î da li 4 gundên Nisêbînê bi tevayî 72 êzîdî dijîyan (Taşğın, 2001: 739).

Berî çend salan, ji ber ku rewşa sîyasî hindekî xweş bû, hindek êzidî vegeŕîyan û gundên xwe jinûve ava kirin. Li gorî agahîyên ku me ji kesên çavkanî yên êzidî wergirtin îro li gundên Nisêbînê bi tevahî zêdeyî 100 êzidîyî dijî.

### **1.4.2.Mihelmî**

Derheqê eslê mihelmîyan da gelek zanyarîyên cuda hene lê Yeşilmen dîyar dike ku mihelmî bi eslê xwe ereb in û zimanê wan jî erebî ye (Yeşilmen, 2016: 34). Ew xwe weke ereb dibînin lê divê bê gotin ku erebîya wan bi gelek awayan ji ya welatên ereban cudatir e. Derheqê hatina mihelmîyan ya bajarî da daneyên zelal nebin jî Kütük dibêje ereb ne di dema fethên îslamê da lê di serdema dewleta Partî da hatine vê herêmê (Kütük, 2018: 240). Mihelmîyên ku hene hemû li bajarî dijîn lê divê bê gotin ku li gundê Binerdka jî çend malbatên mihelmîyan hene. Wekî din li herêmê gundên mihelmîyan tunene.

Mihelmîyên bajarî bi giştî misilman in. Li gorî berê hejmara mihelmîyên bajarî kêr bûye, lewra hindek jê çûne Mêrdînê û hindekan ji wan jî berê xwe dane metropolên Tirkîyeyê.

### **1.4.3.Suryan**

Suryan ji kevin da li navenda bajarî û li gundan dijîn û bi zimanê suryanî diaxivin. Lê divê bê gotin ku îro ji malbata ku berevanîya Dêra Mor Yaqûbê dike pêve tu kes li navenda bajarî nemaye, lê li herêmê çend gundên weke Merbabê, Gundikşikro û Sêderîyê ku suryan lê dijîn hene (Ç67). Di sala 1985an da li gundên Nisêbînê bi tevayî 4805 suryan dijîyan, ev hejmar di sala 2001ê da daketibû 204an (Taşğın, 2009: 387). Lewra di vê navberê da gelek gundên Suryanan vala bûbûn lê van salên dawî li gundên xwe vedigerin û gundên xwe ji nûve ava dikin. Suryanên Nisêbînê ji alîyê bawerîyê ve xirîstîyanên ortodoks in. Yek jê li navenda bajarî çend dêrên wan li herêmê hene û perisîn jî di wan da tê kirin.

#### **1.4.4.Tirk**

Ji bilî karmend, polîs, leşker, bijîşk, mamosta, û hwd. û malbatên wan li herêmê tirk tunene. Dema ku peywira wan ya mecbûrî xelas dibe ji herêmê vediqetin û diçin.

#### **1.5.Binyada Çandî-Civakî**

Gelê Nisêbînê bi kevneşopîyên xwe ve girêdayî ye, hin adetên xwe yê kevin heta îro jî didomînin. Bi taybetî di adetên mirinê da ev yek tê dîtin. Gelek kes ji der û dorê koçî bajarî dikin û herweha ji bajarî ber bi metropolan ve gelek kes diçin. Ev yek di guherîna çanda bajarî da pêkereka girîng e. Xweşbînîya olî ji berê da di nav şênîyên bajarî û gundan da heye û ev yek heta îro jî dewam dike. Lewma welatîyên êzidî û suryan li gorî bîr û bawerîyên xwe di nav aramîyê da li bajarî dijîn.

Di salên 1960î da rêyên di navbera gund, navçe û wîlayetê da û wesayîten ragihandinê tunebûn, van jî rê li ber pirsgirêk û astengîyan vedikirin. Bê çawa di veguhestinê da pirsgirêk hebûn, di vê serdemê da di ragihandinê da jî pirsgirêk hebûn. Di vê serdemê da hemû gund ji derfetên ragihandina nûjen bêpar bûn. Di roja îroyîn da gundên bê telefûn nemane û li piranîya gundan tora înternetê heye (Günay, 2009: 459). Îro herweha li bajarî 3 rojnameyên xwecihî û 2 çapxane hene (“Ulaşım”, 2018).

Heta sala 1943yan tenê dibistanek hebû û ew jî li navenda bajarî bû (Günay, 2009: 451). Rêjeya kesên nexwende di sala 1950yî da li navendê %82,3 û li nehîye û gundan %98.9 bû lewma jî li gundan piranîya jinan nexwende bûn û bi tirkî jî nizanîbûn (Noyan, 2009: 249). Îro li navçeyê dibistanên maderî, dibistanên seretayî, dibistanên navîn, lîse, kurs û dibistanên taybetî di nav da, bi tevahî 125 dibistan hene. Li gorî daneyên Sazîya Statîstîkan ya Tirkîyeyê (Türkiye İstatistik Kurumu) di dawîya sala 2017an da rêjeya kesên xwende ji bo mêran %97.07 û ji bo jinan %85,33 e û bi tevahî jî %91,21 e (Türkiye İstatistik Kurumu, 2019).

Dem a ku Kaya salên 1970yî vedibêje behsa hebûna sînemayên havînî û zivistanî yê Aslan, Baraj û Munganê û herweha behsa kulûba bajarî jî dike. Dibêje

mihelmî, bajarî, suryan, ermen, cihû, gundî û êzidî li bajarî dijîn û vê yekê weke bêndera çand, ziman, ol û civakan pêname dike (Kaya, 2006: 46-47). Hejmara suryan û mihelmîyan li gorî berê kêr bûye û li bajarî çanda kurdî di her qada jîyanê da serdest e. Di vê serdestîyê da bandora şaredarîyê zêde ye, lewra şaredarîyên van salên dawî xebatên derbareyê ziman û çanda kurdî da zêde kirine.

Şopên gelek şaristanîyan li navenda bajarî û gundên wê xuya dikin. Gelek dêr, mizgeft, keleh û cihên dîrokî li bajarî û gundên wê tên dîtin. Girnewaz, Dêra Mor Yaqub, Dêra Mor Evgin, Cihê Selmanî Pak, Keleha Marîne, Mizgefta Zeynelabidînî û gelek deverên din hene û her sal ji aliyê gelek turîstan ve serdana van cihan tê kirin.

Şaredarîya bajarî van çend salên dawî ji bo jinan gelek xebatan dike û yek ji van xebatan vekirina malên jinan e. Weke nimûne Mala Jinan ya Gulşîlavê di 24.10.2009an da hat vekirin, ji vî cihê mebest ew bû ku jin di warê aborî, civakî û çandî da bi awayekî aktîf beşdarî jîyanê bibin (Nusaybin Belediyesi, 2010: 42).

Navenda Çandê Ya Mîtanîyê di sala 2008an da ji aliyê şaredarîyê ve hat vekirin (Nusaybin Belediyesi, 2010: 36). Bi vebûna vî cihê ra gelek kurs hatin vekirin û xebatên mûzîk, dans, şano û hwd. hatin kirin. Keç û xortên meraqdar di van xebatan da cihê xwe girtin û xwe bi pêş xistin. Di van salên dawî da gelek komên şanoyê tên û lîstikên xwe pêşkêş dikin. Heta berî bi 3 salan lîstikên kurdî jî dihatin pêşkêşkirin. Herweha filmên sînemayê û konsêrên muzîkê jî li vê derê tên lidarxistin.

Li navenda bajarî “Nusaybin İlçe Halk Kütüphanesi” heye. Heta berî 3 salan “Pirtûkxaneya Ekîn Ceren” ya li Navenda Çandê ya Mîtanîyê vekirîbû û beşek jê ji bo pirtûkên kurdî hatibû veqetandin.

Pişti ku dewletê mafê dersên kurdî yêrî bijarte da zarokên kurd, li gelek dibistanên navîn yêrî bajarî dersên kurdî hatin hilbijartin. Ev, yekem car bû ku li Tirkîyeyê ji bo zimanê kurdî derfetek weha dihat dayîn. Herweha ji aliyê komeleyan ve jî gelek kursên zimanê kurdî hatin vekirin û şênîyên bajarî di van kursan da fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bûn. Lê divê bê gotin ku piştî bûyerên ku di sala 2016an da li bajarî qewimîn xebatên kurdî jî hindêrî kêr bûne.

## BEŞA DUYEM

### ÇARÇOVEYA TEORİK Î TÊGEHÎ YA XEBATÊ

Berî ku em derbareyê têgehên xebatê da zanyarîyan bidin em dê derheqê xebata xwe ya lîteratûrê da agahîyan bidin. Di beşa lîteratûrê da em dê pêşî behsa wan çavkanîyan bikin ku di naveroka wan da behsa kurdan û adetên wan û bi taybetî jî behsa adetên mirinê tê kirin. Dûvre jî em dê cih bidin wan çavkanîyên ku derbareyê Nisêbînê, gelên herêmê, çanda gel û adetên mirinê da hatine nivîsîn.

#### 2.1.XEBATA LÎTERATÛRÊ

Dema ku em behsa folklorê kurdî bikin divê em navê Mele Mehmûdê Bazîdî qet ji bîr nekin û em dê di serê vê beşê da pêşî behsa xebatên wî bikin. Lewra digel gelek xebatên wî yê hêja hindêk pirtûkên wî rasterast derheqê folklorê kurdî da ne. Yek ji wan “Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye” ye û di xebata xwe da em dê gelek çarçoveyên serî lê bidin (Bazîdî, 2010). Ev xebat derbareyê civaknasî, etnografî û folklorê kurdan da ye. Bazîdî di vê pirtûka xwe da bi awayekî berfireh behsa adetên mirinê yê kurdan jî dike. Ji ber naveroka van xebatan Mele Mehmûdê Bazîdî weke pêşengê folklorê kurdî tê dîtin (Yıldırım û ynd., 2013: 54).

Celadet Elî Bedirxan her çiqas weke kesekî zimanzan tê naskirin jî ew bi xwe kesayetekî pîralî ye. Di kovara “Hawar”ê da gelek berhemên folklorîk weşandine. Hin ji wan berhemên jî derbareyê mirinê û şînê da ne (Cewerî, 1998). Di wan nivîsan da em hindêk adetên kurdan ên derbareyê mirinê û şînê da jî dibînin. Ji ber ku ew nivîs ne nivîsên edebî, lê yê agahdarîyê ne ji bo me jî gelekî sûdewer in. Lewra behsa mirina hin kesayetên û rîtuêlên piştî mirina wan dike. Herweha divê bê gotin ku Bedirxanî di van nivîsan da mexles bi kar neanîye û navê xwe yê rastîn lêkirîye. Li pêş dema ku hewce kir em dê behsa van zanyarîyan bikin.

“Şerefname”ya Şerefxan jî yek ji çavkanîyên me ye (Şerafeddin Han, 2009). Bi rastî derheqê rîtûelên mirinê da pir hindik zanyarî dane ku em dê behsa wan bikin. Bêtir wekî bajarekî behsa Nisêbînê tê kirin û bi kurtasî jî behsa kurdên êzidî tê kirin.

Aristova, li nav kurdan digere, li arşîv, fonên mûzeyan, çavkanîyên lîteratûrê lêkolînan dike û encamên van xebatan di pirtûka xwe ya bi navê “Kürtlerin Maddi Kültürü” da bi me ra parve dike (Aristova, 2002). Dema ku pirtûkê tê xwendin, tê dîtîn ku nivîskar derheqê kurdên Tirkîye, Sûriye, Îraq, Îran, Qafqasya, Xorasan û heta derheqê kurdên Efxanistanê da jî agahîyan dide û ji ber vê yekê jî xebateka pir girîng e. Aristova di pirtûkê da bi tevahî li ser keresteyên madî yê çandê (weke bicihbûn, xanî, cilên neteweyî, xwarinên kurdan û alavên xwarinê) sekinîye û derheqê van tiştan da bi hûrgilî zanyarî dane. Lê derheqê mirin û adetên mirinê da tu zanyarî nedane. Tenê behsa gorên kurdên misilman û êzidî kirîye û derbareyê wan da hin zanyarîyên girîng dane. Digel ku derheqê çanda cil û xwarinê da gelek hûrgilî hatine dayîn jî behsa xwarina mirîyî/yê û cilên ku di şînê da tên lixwekirin nehatîye kirin.

Çavkanîyeka din pirtûka bi navê “Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkileri” ye (Yalçın-Heckmann, 2006). Dema ku ev pirtûkê tê xwendin xuya dike ku berhem derheqê kurdên ku li çend gundên Colemêrgê dijîn da ye û di beşeka pir biçûk da behsa adetên şîngirtin û dûrikan yê li wan gundan tê kirin.

Mehrdad R. Izady di pirtûka xwe ya bi navê “Kürtler” da, di beşa “Kültür ve Sanat”ê da di bin sernavê “Bayramlar, Törenler ve Takvim” da bi kurtasî behsa pratîkên piştî mirinê yê kurdan dike (İzady, 2011).

Divê em behsa pirtûka Philip Kreyenbroek û Christine Allison ya bi navê “Kürt Kimliği ve Kültürü” jî bikin (Kreyenbroek û Allison, 2008). Di vê pirtûkê da li ser dûrikên êzidîyan, taybetîyên van dûrikan û fonksiyona wan hatîye sekinandin. Derheqê bawerîya reenkarasyonê ya di êzdayetîyê da û herweha derbareyê bawerîya rihî û maneya mirinê ya li nav kurdên yarsanî da jî hindik zanyarî hatine dayîn. Lê belê divê bê gotin ku nivîskarê pirtûkê derheqê adetên mirinê yê êzidîyên Nisêbînê da tu zanyarî nedane.

Mahmut Barık di pirtûka xwe ya bi navê “Kevneşopiyên Kurdan” da karekî berhevkerinê kirîye û têda bi kurtasî behsa adetên sersaxî û şînê dike (Barık, 2003).

Müslüm Yücel, herçiqas di pirtûka xwe ya bi navê “Kına ve Ayna: Kürtlerde Ölüm ve İntihar” da hindêk zanyarî ji çavkanîyinan girtibin jî bi piranî çavnêriyên xwe veguhastine (Yücel, 2006). Dema ku nerînên xwe parve kirine ji objektîfîyê dûr e û bi awayekî hestiyarî nêzikî bûyeran bûye. Hewl daye ku zimanekî wêjeyî bi kar bîne, carna nivîsa xwe weke çîrokekê hûnaye û heta carna bi zimanekî qerfokî nêzikî mijaran bûye. Nivîskar kesekî rojnamevan e û ji dêvla ku li gorî rê û rêbazên zanistî xebatên sehayê bike, bi refleksên rojnamevanîyê tevgerîyaye û hewl daye ku ji deverên ku zîyaret kirine û ji bûyerên ku şahidîya wan kirîye darazên giştî derbixe. Weke nimûne di rûpelê 55. yê pirtûkê da cihên ku êzidî lê dijîn dijmêre lê behsa êzidiyên Nisêbînê nake. Ev tiştên weha jî nîşan didin ku nivîskar ev mijar zêde lê nekolaye, xebata wî tenê bi cihên ku çûye û dîtîye sînordar e. Lê dîsa jî li deverinan behsa adetên mirinê yên kurdên misilman û êzidî dike û derheqê telqîn, veşartin, kefenkirin û şuştina mirîyan da zanyarîyinan dide.

Li vir divê behsa pirtûka Sedat Veyis Örnek ya bi navê “Anadolu Folklorunda Ölüm” jî bê kirin, lewra ev ji wan pirtûkên pêşî yên ku li Tirkîyeyê hatîye nivîsîn e ku bi tevahî li ser mirinê sekinîye (Örnek, 1971). Örnek di vê xebatê da wekî her deverên Tirkîyeyê behsa adetên mirinê yên bajarên kurdan jî dike û zanyarîyinan dide.

Derheqê adetên mirin û şînê yên kurdên misilman da hindêk gotar û tezên lîsansa bilind û doktorayê hatibin nivîsîn jî ev adet bi çanda tirkî ve tîr girêdan û di bin banê çanda tirkî da tîr şirovekirin. Gotara Mustafa Hakkı Ertan ya bi navê “Sosyolojik Açından Batman ve Yöresindeki Taziye Geleneği ve Bu Geleneğin Anadolu Taziye Kültürü ile Karşılaştırılması” (Ertan, 2012), gotara Yusuf Ziya Keskin ya bi navê “Şanlıurfa Halk Kültüründe Ölüm” (Keskin, 2006), teza doktorayê ya Metin Eren ya bi navê “Van Gölü Havzası Ölüm Gelenekleri ve Türk Kültür Ekolojisi İçerisindeki Yeri” (Eren, 2010) hindêk ji van xebatan e. Ev lêkolînerên navborî di xebatên sehayê da hindêk adet û rîtuêlan tespît dikin û dibêjin vaye di çanda tirkî ya berê da yan jî di olên tirkî yên berê da tiştêkî ku dişibe van heye. Dema ku li bîbliyografyaya xebatên wan tê nêrîn, tê dîtîn ku çavkanîyên wan tenê

derheqê çanda tirkan û olên tirkan da ne. Yanî di xebatên xwe da li bersiva vê pirsê negerîyane: “Gelo di ol û çandên gelên cîran da rîtûelên ku dişibin van hene yan na?” Lewra weke ku Malinowski jî dîyar dike rîtûelên mirinê li hemû cîhanê dişibin hev (Malinowski, 1990: 37-38). Örnekek vî fikrî parve dike û weha dibêje: “Di navbera bawerî, adet û kirinên têkildarî mijarê yê wan civakên ku binyadên wan ne weke hev in û ji aliyê erdnîgarî û çandî ve jî cudahîyên wan hene da piranîya caran manendîyên ku mirovan şaş dikin tîn dîtin.” (Örnekek, 2000: 207). Herweha Dikmen jî dibêje ku di nav gelên cuda û olên cuda da jî rîtûelên ku dişibin hev, heta yê wekhev jî tîn dîtin (Dikmen, 2015: 459). Lewra li gorî me rêbaza van kesên navborî şaş e û bi me ji çend rîtûelên ku dişibin hev mirov nikare bigihîje darazên giştî.

Christine Allison di pirtûka xwe ya bi navê “Yezidi Sözlü Kültürü” da derheqê çanda devkî ya êzidîyên Îraqê da gelek agahî dane (Allison, 2007). Allison di vê pirtûka xwe da beşek ji bo mirin û dûrikan veqetandîye. Di vê beşê da behsa mirinê dike û tevî çîrok û taybetîyên wan, cih dide gelek dûrikên kurdên êzidî.

Abdülkadir Güler di pirtûka xwe ya bi navê “Mardin Folkloru Gelenekler-Görenekler” da derheqê adetên mirinê yê Mêrdîn û Qosarê da hindek zanyarîyan dide (Güler, 1998). Herçiqas di pirtûkê da behsa adetên kurdên Nisêbînê nayê kirin jî, ji ber ku ev berhem berî sala 1991ê hatîye amadekirin û derheqê adetên mirinê yê şênîyên herêmê da zanyarîyan dide, me xwest di vir da behsa wê jî bikin.

Engin Sarı di pirtûka xwe ya bi navê “Mardin’de Kültürlerarasılık” da behsa adetên mirinê yê gelên ku li navenda Mêrdînê dijîn, dike (Sarı, 2010). Nivîskarê pirtûkê kesekî akademîsyen e pirtûk bi rêbazên zanistî hatîye amadekirin. Di pirtûkê da cih dide adetên berê û niha yê ereb, kurd û suryanan û bi awayekî berawirdî wan rave dike, manendî û cudahîyên di navbera adetên wan da dîyar dike.

Emre Ece bi navê “Monografiya Çanda Gel A Dêrika Çiyayê Mazî” tezeka lîsansa bilind nivîsiye û di teza xwe da digel gelek zanyarîyên dewlemend herweha cih daye adet û rîtûelên mirinê yê Dêrikê û ew teswîr kirine (Ece, 2017).

Sadettin Noyan di pirtûka xwe ya bi navê “1950 Mardin İlinin Monografisi” da behsa civak û olên li Nisêbînê dike û derheqê aborî, erdnîgarî û dîroka bajarî da



zanyarîyanan dide (Noyan, 2009). Nivîskar tenê van agahîyan dide lê derheqê adetên mirinê da tu zanyarîyan nade.

Pirtûka “Tarihin Tanîgi Nusaybin” ji aliyê şaredarîya bajarî ve hatîye amadekirin û derheqê bajarî da gelek zanyarîyan dide (Nusaybin Belediyesi, 2001). Lê divê bê gotin ku zimanê vê pirtûkê tirkî ye û piştî çapbûna wê bi 4 salan ev pirtûk hindekî din hatîye berfirehkirin, hindek beş lê hatine zêdekirin, deverin jê hatine guherandin û bi navê “Kaniyek Ji Mezopotamyayê – Nisêbîn” ji aliyê Eslîxan Yıldırım Tanhan ve bi kurdî hatîye nivîsîn (Yıldırım Tanhan, 2005). Yıldırım Tanhan di pirtûkê da gelek agahîyên girîng dide. Girîngîya vê pirtûkê ew e ku di sala 2005an da hatîye nivîsîn û derheqê çanda bajarî da jî gelek zanyarîyan dihewîne. Lê rêbaza xebatê ne zanistî ye. Ji aliyê mijarê ve çarçoveya xebatê gelekî berferh e û bi navê şînê jî beşek heye ku ji du rûpelan pêk tê. Lê divê bê gotin ku ev beş tenê derheqê şênîyên navenda bajarî da ye û berê wê jî pir teng e. Herweha nayê famkirin bê ka ev zanyarîyên hatî dayîn yên kurdan in yan yên mihelmîyan in, lewra hin zanyarîyên ku hatine dayîn li nav kurdên bajarî nehatin dîtin.

Digel van çavkanîyan di hin sempozyûm û panêlan da jî behsa Nisêbînê hatîye kirin ku yek ji wan jî pirtûka sempozyûma “Geçmişten Günümüze Nusaybin” e (Taş, 2009). Gotarên vê pirtûkê derheqê dîrok, erdnîgarî, çand û hemû mijarên têkildarî Nisêbînê da hatine nivîsîn. Di çend gotarên pirtûkê da hindek zanyarîyên derbareyê adetên mirinê yên êzidîyên Nisêbînê da jî hene.

Digel ku kurdên misilman ji aliyê lêkolînerên tirk ve weke parçeyeka civaka tirk tên dîtin jî kurdên êzidî wekî civakeka cuda tên dîtin. Vê civakê bala hindak akademîsyenên cihanê û yên Tirkîyeyê kişandîye. Ahmet Turan pirtûkek bi navê “Yezidiler” nivîsandîye û têda behsa êzidîyan û bi taybetî jî behsa êzidîyên Tirkîyeyê dike (Turan, 2015). Digel ziman, etnîk û ola wan derheqê çand û adetên wan da jî zanyarîyanan dide. Heta ji bo nivîsandina vê pirtûkê çûye Nisêbînê jî û bi êzidîyên wir ra jî hevpeyvîn çêkirine. Lewma di pirtûka xwe da derheqê adetên mirin û şînê yên êzidîyan da kêş jî be hindak zanyarî dane. Lê herçiqas kesekî akademîsyen jî be car caran hestîyar tevdîgere û weke melayekî ola îslamê dev tavêje ola êzdayetîyê û derheqê êzidîyan da helwesteka cuda û ji zanistê dûr nîşan dide. Wan kêş dike, ola

êzdayetîyê weke oleka bêbingeh bi nav dike, hin zanyarîyên şaş dide û ev yek jî bivênevê qîmetê xebata wî kêm dike.

Ahmet Taşğın yek ji wan akademîsyenan e ku derheqê êzidîyan da xebat kirîye. Ew jî li nav êzidîyên Tirkîyeyê gerîyaye û bi navê “Geri Dönüş: Yezidilerde Ölüm” gotarek nivîsîye (Taşğın, 2005). Herçiqas bingeha vê xebatê êzidîyên Wêranşara Êrfayê bin jî derheqê adetên mirinê yên êzidîyan da zanyarîyên girîng têda hene.

Xebateka din ya girîng jî lêkolîna Berivan Can Emmezê ya bi navê “Batman Ezidîlerinin Defîn Pratikleri Üzerine Etnografik Değerlendirmeler” e (Can Emmez, 2015). Can Emmez jî bo vê xebatê nêzîkî salekê li gundên êzidîyên Batmanê hevpeyvîn û çavênîyan dike, beşdarî merasîmên veşartinan dibe û van xebatên xwe weke gotar diweşîne. Ev xebateka baş e lê weke ku li sehayê me ji çavkanîyên xwe jî bihîst adetên êzidîyên Batmanê û yên Nisêbînê hemû ne weke hev in û hindek cudahî hene. Jixwe divê bê gotin ku ev xebata navborî ne zêde berfireh û têrtijî ye.

Teza lîsansa bilind ya bi navê “Mardin Yezidileri, İnanç, Sosyal Hayat ve Coğrafi Dağılım” ya Yusuf Öz hindek zanyarîyan dide me (Öz, 2007). Lê dema ku mirov li naveroka wê dinêre, tê dîtîn ku zanyarîyên derheqê adetên mirinê da pir hindik in û ew zanyarî jî ne ji xebatên sehayê lê ji wan pirtûk û gotarên ku derheqê êzidîyan da hatine nivîsîn hatine wergirtin. Nivîskarê tezê li gundên Nisêbînê tenê bi du kesan ra hevpeyvîn çêkirîye û di vê hevpeyvînê da jî derheqê mirinê da tenê 4-5 pirs kirine. Nivîskar derheqê ewlehîya zanyarîyên ku wan kesan danê da bi guman e û jixwe di vegotina xebatê da jî cih nedaye van zanyarîyan û tenê ji çavkanîyên nivîskî sûd wergirtîye.

Ahmet Kütük ji teza xwe ya lîsansa bilind (Ortaçağda Nusaybin) û teza xwe ya doktorayê (Bizans Döneminde Nusaybin) sûd wergirtîye û pirtûka xwe ya bi navê “Nisibis(Nusaybin) Kadim Bir Şehrin Hikayesi” nivîsîye (Kütük, 2018). Nivîskar di vê pirtûka xwe da bêtir behsa dîrok û girîngîya cihê Nisêbînê dike, lê derheqê çanda bajarî û bi taybetî jî derheqê adet û rîtûelên mirin, sersaxî û şînê da tu zanyarîyan nade.

Wekî din di kovar, rojname, broşûr, bûlten û sîteyên înternetê yê bajarî da derheqê herêmê û çand û adetên wê da hindêk gotar û nivîs hatine weşandin. Jixwe em dê hemû çavkanîyên ku me ji wan sîd wergirtîye di dawîya xebata xwe da rêz bikin. Herweha em dê di vegotina mijara xwe da jî cih bidin zanyarîyên wan çavkanîyan. Herçiqas di kurdî da hindêk monografi û xebatên cuda hatibin kirin jî di lêkolîna me da xebateka ku bi taybetî li ser mirinê hatîye nivîsîn nehat dîtin.

Weke ku li jor me pirtûk û xebatên derheqê mirin, sersaxî û şînê da hatine nivîsîn dan nasîn, hat dîtin ku derheqê adet û rîtûelên mirinê yê kurdên Nisêbînê û gundên wê da xebateka berfireh nehatîye kirin. Ji ber ku ola wan cuda ye derheqê kurdên êzidî da hindêk xebat hebin jî ev xebat pir qels in. Bi qasî ku me lê kola derheqê adetên kurdên misilman yê li Nisêbînê da tu lêkolîn û xebatên akademîk nehatine kirin.

## **2.2.TÊGEHÊN XEBATÊ**

Weke ku di xebatên sehayê da jî hat dîtin, mijara me ji alîyê têgehan ve pir dewlemend e û ji bo her dîyarde yan bûyerekê gelek têgehên cuda tên bikaranîn. Ji ber ku gelek têgehên têkildarî mirinê li gorî ola gelî teşe girtine, di nav civakê da ji bo her têgehekê gelek nav tên bikaranîn. Di vê beşa xebata xwe da em dê çend têgehên sereke yê têkildarî mijara lêkolînê rave bikin. Bi vê ravekirinê ra em dê navên têgehan yê ku me di vegotinê da tercîh kirine û sedema hilbijartina van navan destnîşan bikin. Wekî din dê li vir bê ravekirin bê ka ev têgeh bi çi maneyê, bi çi armancê û ji kîjan alîyê ve hatine bikaranîn.

### **2.2.1.Mirin**

Herçiqas Bauman dibêje “pênasekirina mirinê ne pêkan e..... û dema ku mirin hat ez dê ne li vir bim, ez dê wê tecrîbe nekim.” jî em dikarin bibêjin ku mirin, dawîlêhatina fonksîyonên jîyanî ye (Bauman, 2012: 11-12). Bi gotineka din mirin bûyera veqetîna rihî ya ji laşî ye. Di ferhenga “Türk Dil Kurumu” da mirin weha hatîye pênasekirin: “Bi temamî û bi teqezî dawîlêhatina jîyanê ya di mirov, ajal yan jî riwekekê da ye.” (Türk Dil Kurumu, 2019).

Çandên kevin mirin ne weke dawîya jîyanê, lê weke destpêka jîyaneka din dîtine (Hökelekli, 1991: 153). Yanî dihat bawerkirin ku ji bo laşî mirin weke xelasekekê ye lê rih dê heta hetayê hebûna xwe biparêze.

Aydın dîyar dike ku di latînî da peyva “humanitas” (mirov) ji rehê peyva “humando” (veşartin) tê û mirov bi maneya “yê ku dikare mirîyê/ya xwe veşêre” tê bikaranîn. Dûvre pêda diçe û dibêje ihtîmaleka mezin e ku di navbera peyvên mirin û mirov yên kurmancîyê û merde û merdim/mordem yên dimilkîyê da têkilîyeka etîmolojîk û semantîk hebe (Aydın, 2016: 3). Farqînî jî di ferhenga xwe da cih dide peyva “ölümlü” (bimirin: yê/ya ku dê bimore) ya tirkî û maneya wê ya kurdî jî weke “mirov, meriv, bergorn” dide (Farqînî, 2000: 906). Xuya ye ku li gorî wî jî peyva “mirov” ji reha “mir” tê.

Di kurdî da gelek peyv yan jî rêzepeyvên ku di şûna mirinê da tên bikaranîn hene. Hin ji wan ev in: rihjêçûyîn, rihsiptina Xwedê, wefatkirin, çûyîn, emrê Xwedê kirin, serêxwedanîn, rehmekirin, ... û hwd. Bi maneya ku “ji dinyayekê çû dinyayeka din” gotinên weke “koçkirin, barkirin, çûna mala heq, bi rêya Xwedê da çûyîn, mala xwe guhastin, ketina rêya axretê, ... û hwd.” tên bikaranîn. Herweha di nav êzidîyan da gotina “kirasguherîn”ê jî tê bikaranîn û xuya ye ev têgeh ji bawerîya tenasûhê ya ola êzdayetîyê tê. Her kîjan têgeh bê bikaranîn jî berî ku kurd peyva mirinê bînin zimanî teqez gotina “*dûr ji vada*” ji devê wan derdikeve.

Ji kesên ku dawî li jîyana wan hat ra peyva “mirî” tê bikaranîn. Divê bê gotin ku peyva *mirî* ne tenê bi maneya “laşê ku rih jê çûye” tê bikaranîn, di heman demê da weke ku şexsîyet û rêzdarîya xwe winda nekiribe bi maneya “kesayet” jî tê bikaranîn. Weke nimûne dema ku tê gotin ku “Xwedê mirîyê/ya we efû bike.” Tiştê ku efûkirina wê tê xwestin ne laş e. Digel ku ji bo mirî peyvên weke “cenaze, laş, cendek, term, meyit, cesed, ... û hwd.” tên bikaranîn jî di vê xebatê da li gorî konteksê û herweha li gorî ku di axaftina gelî da cihê xwe girtîye em dê li cihinan peyva “mirî”, li cihinan “laş” û li cihinan jî peyva “cenaze”yê bi kar bînin.

### 2.2.1.1. Têgihîştina Mirinê Li Nav Kurdistan

Mirovan ji roja roj da hewl dane û xwestine ku rastîya mirinê fam bikin. Her civakê li gorî erdnîgarî, binyad, çand, ol û bawerîyên xwe maneyek daye vê dîyardeya mirinê, bi nîşan û rîtûelên cihêreng kirine parçeyek ji jîyane xwe ya rojane. Divê bê gotin ku li vir pêkerên herî girîng ol û sîstemên bawerîyê ne. Ji ber ku bi giştî hemû olên derbareyê rih û têgihîştina dinyayeka din da xwedî nêrîn in, mirin bi benekî stûr bi olê ve girêdayî ye. Kurd di serdemên cuda da ketine bin bandora olên cuda û li gorî van olan jî nêrîna wan ya li ser mirinê hatîye guhertin. Ji ber vê yekê em dê di vê beşê da hindêkî behsa olên kurdan û nêrîna van olan ya li mirinê û jîyana piştî mirinê bikin da ku bi giştî têgihîştina kurdan ya li ser mirinê bê famkin.

Li vir pirsar “Gelo ola kurdan ya herî kevn kîjan e?” tê hişê mirov. Di vê bareyê da mirov dikare bibêje ku gengeşîyek heye û jixwe berî niha di binbeşa “pirsgirêkên mijarê” da em hindêkî li ser vê rawestîyabûn. Lê dîsa jî zanyarîyên ku me di lêkolînên lîteratûrê da bi dest xistin em dê li vir parve bikin.

Efşarî dibêje dînekî pir kevn hebûye ku wekî berîya dîrokê tê nîşandan û ji aliyê civakeka cotkar ve hatîye bawerkirin. Herweha dîyar dike ku alîgirên wê ev ol weke “Durust Dîn”<sup>\*</sup> nîşan didan û îdîa dike ku yarsan jî vê rêyê dişopînin (veguhêzer Vali, 2018: 29). Omarkhali jî êzidîyan weke wan kesên ku piştî hatina îslamê ola xwe neguhertine dide naskirin û êzdayetîyê weke ola kurdan ya berî îslamê nîşan dide (Omarkhali, 2014: 128). Izady behsa oleka gelekî kevin dike ku îro navê wê ji aliyê mirîdên wê yê nûjen ve nayê zanîn. Dibêje ev ola herî kevin ya kurdan e û navê wê jî “Kulta Ferîşteyan” yan jî “Yezdanî” ye. Herweha îdîa dike ku sê şaxên vê ola kevin xwe gihandine roja me û ew jî êzdayetî, alewîtî û yarsanî ye (Izady, 2014: 503-504). Kreyenbroek dibêje bandora fikrên olî yê îranî yê berîya îslamê di çanda kurdî da heye (Kreyenbroek, 2008: 144). Digel van zanyarîyên ku me dan, derheqê vê ola kurdan da tiştêkî zelal tune ye û jixwe derbareyê têgihîştina wan ya li hemberî mirinê da ji aliyê van kesan ve zanyarîyên zêde jî nehatine dayîn.

---

\* Yê ku ji dîne rast bawer dîkin.

Izady dibêje Kurdistan bi dorê ketîye bin bandora zerdûştî, cihûtî, manîtî, xirîstîyanî û îslamê (Izady, 2014: 497). Şerefxan dema ku behsa olên kurdan dike tenê behsa kurdên misilman û yên êzidî dike (Şerefxan, 2009: 31). Herweha Bazîdî jî di vê bareyê da zanyarîyanan dide me û ew jî weke Şerefxan jî kurdên misilman û êzidî pêve behsa yên din nake (Bazîdî, 2010: 86). Li gorî encamên ku bi lêkolînên xwe em gihîştinê îro di nav kurdan da cihûtî (Ammann, 2014: 405,411,426), xirîstîyanî (Izady, 2014: 541), misilmanî, yarsanî, alewîtî û êzdayetî heye û tevî ola berî îslamê ya kurdan zerdûştîyê em dê li jêr behsa nêrîna van olan ya li ser mirinê bikin. Divê bê gotin ku digel îdîayên ku yarsanî û alewîtî mezheb ango şaxên ola îslamê ne jî bêtirê lêkolîneran yarsanî (Hooshmandrad, 2014: 106) û alewîtîyê (Omarkhali, 2014: 21) weke oleka serbixwe nîşan didin.

Mirovan di dîrokê da her car ev pirs ji xwe û ji der û dora xwe kirine: “Gelo piştî mirinê çî ji rihê mirovan tê?” Lewma jî hemû olan ji bo vê pirsê bersivek daye. Li gorî piranîya olan tiştê ku dimire laş e, ne rih e; lewra rih dê her zindî bimîne. Li gorî vê bawerîyê jî ev ol behsa dinyayeka din ya piştî mirinê dikin û dibêjin ku her mirov li gorî kirinên xwe yên li vê dinyayê dê bê xelatkirin yan jî cezakirin. Ev bawerî di olên weke îslam, xirîstîyanî, cihûtî û zerdûştîyê da jî heye.

Lê têgihîştina ola êzdayetî û yarsanîyê ji ya van olên navborî cudatir e. Di ola yarsanîyê da bawerîya reenkarnasyonê heye û li gorî vê bawerîyê piştî ku mirovek dimire rihê wî/wê di laşê mirovekî/a din da careka din tê dinyayê (Moradi, 2014: 461). Yarsan ji vî tiştî ra “dûnadûn” ango “kirasguherîn” dibêjin û li gorî bawerîyê piştî guherîna hezar û yek dûnî koçkirina rihî bi dawî dibe (Vali, 2018: 44). Ji vê guherînê armanc ew e ku piştî hezar û yek guherînê rih bêqisûr bibe û beşdarî çavkanîya îlahî bibe (Mir Hüseyini, 2008: 187).

Lewma di ola yarsanîyê da têgeheka dinyayeka din, wek ya îslamê û olên din tuneye (Vali, 2018: 31-32), herweha yarsan cenet û cehenema piştî mirinê red dikin û bawer dikin ku ji bo mirovan cenet û cehenem li vê dinyayê ye (Moradi, 2014: 461). Li gorî vê olê, têkildarî kirinên wan, rihê mirovan ne tenê dikare têkeve gelek laşên mirovan, di heman demê da dikare têkeve yê ajalan jî, her weha yê gîya û tiştên bêtevger jî (Vali, 2018: 40).

Di ola êzdayetîyê da jî bawerîya tenasûhê heye (Taşgîn, 2005: 197). Li gorî vê bawerîyê piştî ku mirov dimirin, rihê wan ji laşê wan derdikeve û piştî demekê dikeve laşekî din. Êzidî jî vê koçkirina rihî weke *kirasguherînê* bi nav dikin (Omarkhali, 2014: 130). Ev bawerî di Kîtaba Cîlwe (pirtûkeka pîroz ya ola êzdayetîyê ye) da weha hatîye vegotin: "...lê heger ez bixwazim, ez dikarim du caran, sê caran yan jî hîn zêdetir wî/wê li vê dinyayê vegebinim, rihê wî/wê bixim nava laşekî din." (Guest, 2012: 351). Chabot dibêje, tê bawerkirin ku li gorî qencî û xerabîyên mirovan dê rihê wan derbasî laşê mirovekî/ê yan jî ajalekê bibe (veguhêzer Turan, 2015: 109-110). Ji bo ku rihên xerab cezayê xerabîyên xwe bikişînin dikevin laşê ajalên pîs yên weke beraz, ker û kûçikan. Piştî ku cezayê xwe kişandin vediguherin mirovên baş. Digel ku koçkirina rihî di vê olê da heye jî herweha bawerîya dinyaya din, cenet û cehenemê jî heye. Vê bawerîyê di Kîtaba Cîlwe da jî cihê xwe girtîye (Guest, 2012: 351-352).

Di ola zerdûştîyê da jî rih namire û piştî mirinê jî heye (Kurdo, 1993: 53), herweha bawerîya dinyaya din, cenet û cehenemê jî heye (Jones, 2004: 185). Yanî dikare bê gotin ku bawerîya dinyayeka din, cenet û cehenemê ji ola yarsanîyê pêve di hemû olên kurdan da tê dîtin.

Bi qasî ku me lê kola, kurd ji berê da mirîyên xwe vedişêrin. Lewra rîtûela veşartinê weke hemû rîtûelên din têkildarî olê ye. Weke îstîsna mirov dikare behsa ola zerdûştîyê û kurdên zerdûştî bike. Di vê olê da mirin ew tişt e ku laşê mirovî ji alîyê iblîs ve tê dagirkirin û ji ber vê yekê jî şewitandina laşî dibe sebaba lewitîna hewayê, veşartina laşî jî dibe sebaba lewitîna ax û avê. Lewma jî dema ku mirovek dimir, laşê wî/wê li serê girekî bilind dihat danîn da ku goştê laşê wî/wê ji alîyê teyr û kûçikên dirinde ve ji hestîyan bê jêkirin û xwarin. Piştî hestîyên ji ber ajalan mayî dihatin veşartin (Jones, 2004: 152). Yanî di dawîya dawî da zerdûştîyan jî bermayîyên laşê mirîyî/yê vedişartin. Jixwe kurdên misilman, êzidî, yarsan, alewî, cihû û xirîstîyan mirîyên xwe vedişêrin û dikare bê gotin ku veşartina mirîyan di nav kurdan da rîtûeleka hevbeş e.

Xwendina telqînê yan jî xwendina tiştên bi vî rengî di nav piranîya kurdan da rîtûeleka hevbeş e. Lewra kurdên misilman, êzidî û yarsan piştî veşartina mirîyên xwe telqînê dixwînin. Herçiqaş cihû û xirîstîyan telqîneka weke ya misilman û

êzidiyan naxwînin jî ew jî piştî veşartina mirîyî/yê diayan dikin û ji pirtûkên pîroz ên ola xwe deverinan dixwînin (Jones, 2004: 31, 35). Bêguman kurdên endamên van olên navborî jî van xwendinan dikin. Lewra dikare bê gotin ku xwendina tiştêkî (telqîn, dia, beşin ji pirtûkên pîroz, û hwd.) ya piştî veşartina mirî rîtûeleka hevbeş e di nav kurdan da.

Me li jor gotibû ku ev rîtûel û merasîm li gorî ola civakê û binyada civakî ya wê demê teşe digirin. Jixwe divê bê gotin ku têgihîştina olê ya rih û dinyayeka din, li ser mijara mirinê jî pêkereka bandorker e. Herçiqas li gorî ola îslamê mirin derbasokeka di navbera vê dinyayê û dinyaya din da ye û şîna giran hatibe qedexekirin jî endamên vê olê jî piştî windahîyên xwe şîne dikişînin û xwe ji tam û kêfên dinyayê dûr dixin. Herweha di olên cihûtî, xirîstîyanî û êzdayetîyê da jî mirov şîne digirin. Di ola zerdûştîyê da şîngirtina piştî mirinê qedexe ye (Ringren-Ström, veguhêzer Aksoy, 2006: 155). Divê bê gotin ku rewşa herî cuda li cem yarsanan tê dîtîn. Li gorî yarsanîyê tu sebeb tune ku mirov li ser mirîyan bigirî, lewra weke ku di nivîsên pîroz yê vê olê da jî tê dîtîn mirov namirin, tenê laşên xwe diguherin (Moradi, 2014: 461). Ji ber vê bawerîya koçkirina rihê yarsan li pey mirîyên xwe şîne girênadin (Izady, 2014: 519). Ji ber vê yekê jî merasîmên veşartinê hindêkî bêdeng tîdî lidarxistin (Kreyenbroek, 2014: 55). Heta Hooshmandrad dibêje ku di merasîmên şîne da muzîk jî tê bikaranîn ango li muzîkê jî tê xistin (Hooshmandrad, 2014: 114). Dibe ku şîn di olinan da nayê girtin ango qedexe be jî, divê neyê jibîrkin ku mirov xwedî hest û dilî in. Lewma dema ku mirov yekî/a nêzîkî xwe winda dike li ber dikeve, xemgîn dibe û bivênevê şîna wî/wê dikişîne.

Di olên kurdan da mijareka din ya hevbeş kulta pêşîyan ango perisîna pêşîyan e. Li gorî vê bawerîyê gelek civak, bawer dikin ku mirîyên wan li dereka ku mirî lê ne, dijîn û bandorê li ser bûyerên dinyaya me dikin (Jones, 2004: 192). Ola îslamê kesên ku şehîd dikevin weke mirî qebûl nake. Jixwe ev tişt di Quranê da jî weha tê vegotin: “Ji wanên ku di rêya Xwedê da hatine kuştin ra nebêjin: Ew mirî ne! Nexêr, ew sax in, lê belê hûn pê nahisin û tînegihîjin.” (Êsî, Girdarî û Bêrkevanî, 2014: 23). Mirov dikare nimûneya gorên pîroz (gorên ku di nav gelî da biqîmet in) bide. Li gelek deverên ku kurd lê dijîn, li serê girikan yan jî li ber rêyan gorên şêx, seyid, mişayîx û qencên Xwedê hene û gelek kes wan deran zîyaret dikin û hêvîya



qebûlkirina daxwazên xwe ji wan dikin. Herweha gel bawer dike ku heger bêrêzîyekê li hemberî van goran bikin dê ew mirî zerarê bidin wan. Di zerdûştîyê da tê bawerkirin ku di mihricana hemû rihan da, rih berêvarî vedigerin mala xwe ya berê û bi destpêka roja nû jê derdikevin û diçin (Boyce, veguhêzer Aksoy, 2006: 107). Jixwe ji ber bawerîya tenasûh û reenkarnasyonê di ola êzdayetî û yarsanîyê da rih di laşekî din da dîsa tèn dinyayê. Di ravekirina hin adet û rîtûelên mirinê da, li pêş di cihên pêwîst da em dê serî li van zanyarîyan bidin.

### 2.2.2.Rîtûel

Derheqê derketina holê ya rîtûelan da Malinowski weha dibêje: “Mirovan li hember mirinê hest bi dilnên cuda kirine û hewl dane ku wê fam bikin û maneyekê bidinê. Tevgerên ku di encama van hewldanan da derketine holê piştî demekê veguherîyane sepandinên qalibgirtî û taybetîyên rîtûelî standine.” (Malinowski, 1990: 42). Göka jî balê dikişîne ser fonksiyona rîtûelên mirinê û weha pêda diçe:

“Ji bo ku bikaribin psîkolojîya xwe ya piştî windahîyan vebêjin her çandê, her zimanî li gorî xwe awayên derbirinê û peyv peyda kirine û ji bo windahîyên ku bi mirinê derketine holê hindêk rîtûel û merasîmên biêş yên bîranînê li dar xistine.” (Göka, 2010: 148).

Rîtûel, bûyerên ku ne mimkin e bi tu awayên din bînan vegotin rave dikin, bi vî awayî jî çareserîyekê ji bo metirsî, guman û nedîyarîyê pêşkêş dikin (Schuyt û Schuijt, veguhêzer Karaman, 2010: 233). Bi rîtûelên mirinê di navbera laşê mirîyî/yê, rihê mirîyî/yê û jîndaran da têkilî tèn danîn (Emiroğlu û Aydın, 2003: 658).

Li vir pirsek tê hişê mirov: “Rîtûel çi ye?”. Gelek pênaseyên rîtûelê hatine kirin. Weke nimûne di ferhenga sosyolojîyê da Marshall rîtûelê weha pênase dike: “Şêweyeka tevgerê ye ku di demên guncaw da tê pêkanîn, dikare nîşan jî têda bînan bikaranîn û bi piranî tê dubarekirin.” (Marshall, 2005: 623). Di ferhenga antropolojîyê da rîtûel weha hatîye pênasekirin: “Rêzebûyerên ku ji alîyê kevneşopîyan ve hatine saz kirin û bi gelemperî ol yan jî efsûnê dihewînin.” (Emiroğlu û Aydın, 2003: 100).

Connerton pênaseya rîtûelê ji Lukes weha neqil dike:

“Ew çalakîyên ku wesfên nîşaneyî di xwe da dihewînin û ji alîyê rêgezên ve tînan birêvebirin û herweha bala yênan ku wan bi kar tînin dikişînin ser tiştên tîkildarî wan hest û ramanên ku li gorî wan girîngîyeka wan ya taybet heye.” (Connerton, 1999: 70).

Rappaport jî rîtûelê weke “Ji alîyê lîstikvanan ve li gorî rêzeka teqez pêkanîna wan tevgerên dîyar û gotinên nehatî nivîsandin û hîç nehatî guhertin.” pênase dike (Rappaport, 2006: 187).

Weke ku ji pênaseyan jî xuya dibe mirov dikare behsa hindek taybetîyên rîtûelan bike. Yek jê ew e ku rîtûel tînan dubarekirin û weke Connerton gotî ev dubarebûn bi bîra mirovan tîne ku paşeroj bînavber dewam dike (Connerton, 1999: 72). Demirci dibêje heger rîtûel li gorî adetê neyên pêkanînan hem encama ku tê xwestin dê bi dest nekeve û hem jî dê zerarê bide xwedîyên xwe (Demirci, 2013: 51-52). Di dewama nivîsa xwe da dîyar dike ku bi vê dewambûnê adet tînan parastin. Li gorî van nêrînan rîtûel weke benekî, paşerojê bi roja îroyînan ve û îro jî bi pêşerojê ve girê dide (Karaman, 2010: 227). Connerton dibêje yênan ku beşdarî rîtûelê dibin maneya wê pesend dikin (Connerton, 1999: 71). Rappaport jî vî fikrî parve dike û dibêje rîtûel nîşandayîna rêkeftina civakî ye (Rappaport, 2006: 190). Dibe ku hemû beşdarvanên rîtûelê maneya wê pesend nekin, lê Bell dibêje mebest ji rîtûelê ew e ku, feraset û tevgerên şexsî li gorî yênan civakê bînan duristkirin (Bell, 2009 b: 20).

Jan Snoek di pirtûka xwe da tîgeha rîtûelê ji gelek alîyan ve dinirxîne û radigihîne ku 24 taybetîyên rîtûelê hene û van taybetîyan weha rêz dike:

1. Bi çandê ra ava bûye, bi kevneşopiyê hatîye pesendkirin,
2. Tevger, xûy, performans û bizavên laşî yan jî zimanî ne,
3. Beşdar di heman demê da guhdar e,
4. Li dijî jiyana rûtînan e,
5. Di dem û cihên taybet da pêk tê,
6. Kolektîf e û ji gel ra vekirî ye,
7. Li gelek cihan tê kirin,
8. Sazûmankar û çêkerê civakê ye,
9. Ciyawazîyê çêdike,
10. Ji bo beşdaran armançeka wê ya taybet heye,
11. Dubarebûyî ye,

12. Standardîze bûye û hatîye provakirin,
13. Olî, pîroz û sereke (dominant) ye,
14. Bûye klîşe û ji guhertinê ra asê ye,
15. Tê dubarekirin,
16. Ji bo beşdarîyan sembolîk û bi mane ye,
17. Peywendîyê saz dike,
18. Ne Enstrumental e,
19. Senaryoya wê ya taybet heye,
20. Formî ye,
21. Sêwirandî ye,
22. Nimûne ye, fermanî ye, rêzdar û xwedî qayîde ye,
23. Pêjn û hestên mirovan kanalîze dike,
24. Rêbertîya “bîr”ê (hişê mirovan) dike.” (Snoek, 2006: 11).

Honko dibêje di civaknasîyê da di navbera merasîm û rîtûelê da cudahî heye û weha pêda diçe: Ji bo merasîmê civakeka ku ji yek kesî zêdetir pêk tê pewîst e, lê rîtûel dikare bi awayekî kolektîf jî û ji aliyê kesekî tenê ve jî bê pêkanîn (Honko, 2014: 201). Örnek (1995: 216) jî merasîmê weke civîneka ku ji çend rîtûelan pêk tê pênase dike. Emiroğlu û Aydın dibêjin ku rîtûel bi pîrozîyê ra û merasîm bi sekûlerîyê ra têkildar e (Emiroğlu û Aydın, 2003: 101). Di vê xebatê da em dê cudahîyekê nexin navbera van herdu têgehên û li gorî ku hat ber devê me em dê peyvên rîtûel û merasîmê bi kar bînin.

Herçiqas li jor me got ku têgeha rîtûelê paşerojê tîne bîra mirov jî em di wê bawerîyê da ne ku ji bo têkilîyeka xurt ya di navbera îro û paşerojê da, li cihinan dê ev peyv têrê neke. Lewma ji bo rêzeçalakîyên ku ji aliyê kesekî yan komekê ve tîne pêkanîn û ji peyv û tevgeran pêk tîne, em dê têgeha rîtûel yan jî merasîmê bi kar bînin. Û ji bo yekûna bawerî û sepandinên têkildarî mirinê jî em dê têgeha “adet”ê bi kar bînin. Herweha divê bê gotin ku li sehaya xebatê em rastî tu peyva ku di dewsa têgeha rîtûelê da dihat bikaranîn nehatin. Li jêr em dê çend rîtûelên têkildarî mijarê rave bikin.

### 2.2.2.1.Şîn

Piştî bûyera mirinê xwedîyên mirîyî/yê xemgînî û liberketina xwe bi tevger û helwestên curbicur nîşan didin û ji vî tiştî ra jî bi giştî şîn tê gotin. Lêkolînerên ku li ser mijara şînê xebat kirine ev têgeh bi awayên cuda pênase kirine.

Örnek şîn weha pênase kirîye: “Şîn ew tişt e ku êş û xemgînîya piştî mirina mirovên ku ji alîyê civakê ve ji bo me weke kesên girîng tên pênasekirin û piştî mirina xwedîyekî/ka me yê/ya nêzîk, di nav qalibên civakî da tê ravekirin.” (Örnek, 1971: 222). Li gorî Hacıgörkmen “Di demên herî bêçare yên mirovan da, bi xemgînîya windakirina xwedîyên xwe, bi hesta êşa veqetîne, digel girî û lixwexistinê hin rîtûelên ku tên kirin û hin peyvên ku li hember vê bûyerê tên gotin” weke şînê tên pênasekirin (Hacıgörkmen, 2013: 394). Zisook û Zisook şîngirtinê weha pênase dikin: “Hemû bertekên tevgerî, bîyolojîk û psîkolojîk yên têkildarî windakirina kesekî/ke ku mirov jê hez dike tên nîşandan.” (veguhêzer Cesur, 2012: 4). Jones dibêje şîngirtinê şeweya nîşandayîn û derbirîna hestan e. Şîn dikare şexsî jî û komî ango civakî jî bê girtin (Jones, 2004: 369).

Butler di pirtûka xwe da bi dû bersiva vê pirsê dikeve: “Jîyanek bi çiyê xwe hêjayî şîngirtinê ye?” Bersiva wê jî dîsa ew dide. Dibêje li gorî ku me winda kirîye, nexwe em xwedîyê wê bûn, me ew xwestibû û me jê hez kiribû. Jixwe dibêje mirov ji alîyê civakê ve hatine sazîkirin û têkilîyên me bi her alîyê civakê ra hene. Lewma dîyar dike ku dema ku yekî nêzîkî me dimire ew têkilîyên me jî winda dibin û em li ber wan dikevin. Di dewama pirtûka xwe da dîyar dike ku eger şîna jîyanekê neyê kişandin ew weke jîyanekê nayê qebûlîkirin û ne hêja ye (Butler, 2005: 35-36, 49).

Di vê xebatê da ji hest û dilînen di dilê mirovan da wêdetir, derbirîn û nîşandayîna van hestan girîng e û jixwe li sehayê jî em ketin pey vê şopê da. Weke Aydın gotî, şîn bi rîtûelan mimkin dibe û em dê ji alîyê rîtûelan ve li ser mijarê rawestin (Aydın, 2016: 8).

Şîn ne tenê ji bo mirina kesekî/ê tê kişandin, herweha ji bo mirina ajalekê, ji bo windakirina regezê, ji bo bûka ku ji mala bavê xwe vediqete û ji bo gelek tiştên

din jî tê kişandin. Lê di vê xebatê da em dê tenê li ser şîna piştî mirina mirovan rawestin.

Dema piştî mirinê, weke pêvajoya şîne tê binavkirin û ji aliyê pispor û lêkolînerên mijarê ve hindêk teorîyên girîng hatine pêşxistin. Her teorîyê ji bo vê pêvajoyê hindêk qonax dîyar kirine. Li gorî wan ji bo ku pêvajoya şîne bi awayekî serkeftî bê derbaskirin divê mirov di wan qonaxan ra derbas bibe.

Ji ber ku em dê ji aliyê rîtuêl û nîşanên şîne ve nêzîkî mijarê bibin em zêde bi nav van teorîyên ku mijarê ji aliyê psîkolojîk ve rave dikin da naçin. Tenê ji bo ku sedemên tevger û nîşanên şîne bîr naskirin, em dê bi kurtasî behsa van teorîyan bikin. Ji ber ku ev qonaxên van teorîyan bi piranî dişibin hev, em dixwazin tenê sernavên yekê ji wan bidin. Rycroft dibêje psîkanalîz serdema şîngirtinê di bin sê qonaxan da dabeş dike: 1-Serdema protesto û înkare, 2-Serdema teslîmbûn, qebûlkirin û bêhêvîyê, 3-Serdema jêdûrketinê (veguhêzer Sağır, 2017: 107).

Ev jêdûrketin nayê maneya jibîrkinê. Göka dîyar dike ku armanca pêvajoya şîne ne jibîrkirina mirîyî/yê ye, li gorî wî tiştê tê xwestin ew e ku xwedîyên mirîyî/yê, wî/wê di hiş û dilê xwe da li derekê bi cih bikin û li jîyana xwe ya nû vegerin (Göka, 2010: 196).

Li sehayê digel têgeha şîne peyva heznê jî tê bikaranîn. Lê hem ji ber ku li sehayê têra xwe tê naskirin û berbelav e û hem jî ji ber ku ji aliyê Bazîdî (Bazîdî, 2010: 52) û Bedirxanî (Bedirxan, 1998: 223) ve jî hatîye bikaranîn me têgeha şîne tercîh kir. Lê di vegotinê da biwêj yan jî gotinên pêşîyan yên ku peyva heznê di wan da hebe dê neyên xerakirin û weke xwe bîr nivîsîn.

#### **2.2.2.2.Sersaxî**

Piştî ku xwedî, heval û cîran bi bûyera mirinê dihisin, ji bo ku xemgînî û liberketina xwe ji xwedîyên mirîyî/yê yên nêzîk ra ragihînin, diçin mala mirîyî/yê yan jî diçin cihê sersaxîyê. Jixwe peyva “sersaxî”yê jî ji gotina “serê we sax be” tê. Weke ku Farqînî (Farqînî, 2000: 1109) û Îzolî (Îzolî, 2000: 802) jî di ferhengên xwe da dinivîsîn têgeha “serxweşî”yê jî li sehayê me ya xebatê tê bikaranîn. Herçiqas Farqînî (Farqînî, 2000: 1109) û Barîk (Barîk, 2003: 65) têgeha “hewarî”yê jî bi kar

tînin jî ji ber ku li sehayê em rastî vê peyvê nehatin me di xebata xwe da ev peyv bi kar neanî. Dîgel ku peyvên weke “serxweşî, hewarî, teazî, meazî, ... û hwd.” hene jî ji ber berbelavbûn û bikaranîna wê ya li sehaya xebatê me peyva “sersaxî” û “sersaxî dayîn”ê hilbijart û bi kar anî.

Di ferhenga Türk Dil Kurumu da sersaxî weke serxweşîdayîna ji bo xwedîyên mirîyî/yê tê vegotin (Türk Dil Kurumu, 2019). Serokatîya karên dîyanetê jî di rêbera xwe ya bi navê “Cenaze Hizmetleri Rehberi” da pênaseya sersaxîyê weha daye: “Sersaxî, bi derbirîna gotinên dilxweşkirinê, nîşandayîna parvekirina xemgînîya xwe ya bi xwedîyên mirîyî/yê ra ye.” (Dîyanet İşleri Başkanlığı, 2008: 59). Parin, Bilgili û Menak maneya vê peyvê ji Doğan weha neqil dikin: “Di dema felaketan da, serxweşî dayîn û dilxweşkirina xwedîyên mirîyî/yê, derbirîna gotinên ku xemgînîyê kêr dikin.” (Parin, Bilgili û Menak, 2012: 214). Sami sersaxîyê weke “hêzdayîna manewî ya ji bo xwedîyên mirîyî/yê, dilxweşkirina wan, parvekirina êşa wan û şîretlêkirina wan ya bi gotinên xweş” pênase dike (Sami, 2017: 472).

Yanî dikare bê gotin ku sersaxî ji aliyê kesên derve yên weke xwedî, heval û cîranan ve tê dayîn. Lewma em dê rîtûelên ku ji bo pêşwazîkirina mêvanan û tevger û gotinên ku di wê demê da tînin kirin di bin sernavê sersaxîyê da rave bikin. Bertekên piştî bûyera mirinê yên xwedîyên mirîyî/yê jî em dê di bin sernavê şînetê da rave bikin.

### **2.2.2.3.Dûrik**

Bi bihîstina xebata mirinê ra xwedîyên mirîyî/yê yên nêzîk, yên weke dê, xweh, metik, xaltîk û hwd. hestên xwe bi awayekî helbestkî û strankî tînin zimanî. Elçin dûrikê weha pênase dike: “Dûrik ew stranin ku mirov piştî mirinekê yan piştî windakirina tiştêkî xwe yê zindî yan jî yê bêrih, di nav tirs, metirsî, telaş û kelecane da xemgînî, hawar, îsyar û bextreşîyên xwe bi gotin û stranên birêkûpêk yan bêrekûpêk derdibirin.” (Elçin, 2004: 290). Boratav dûrikê weha pênase dike:

“Dûrik, awayekî stranan e ku bi gelemperî piştî mirîyekî/kê, carna jî piştî bûyerên ku bandoreka mezin li kesên yan jî li civakê dikin tê gotin û derheqê serborîyên kesên tînkildar û kesayetîya wan da agahîyan dide, li gorî hin rêgezên diyar yên adetî bi newayeka diyar tê gotin û qafîye û lihevanîneka wê ya taybet heye.” (veguhêzer Türbedar, 2011: 186).

Ev cure stran di nav kurdan da gelekî berbelav e. Li nav kurdan ji bo vê cureyê têgehên weke zêmar (Farqînî, 2000: 43), lawik, lawij, dûrik (Îzolî, 2000: 479) tên bikaranîn. Yek ji wan kesên ku herî zêde li ser vê cureyê xebitîye Allison e û ew di xebateka xwe da dinivîse ku li nav kurdan peyvên weke dîlok, stranên şînê, kilamêd şînê, dîrok, girîn û girîyan tên bikaranîn (Allison, 2007: 297). Allison di pirtûkeka xwe ya din da vedibêje ku li herêma Barzanê ji bo dûrikê peyva şînê tê bikaranîn (Allison, 2008: 74). Lê em vê peyvê guncaw nabînin, lewra şîn ne tenê ji bo stranên piştî mirinê, lê ji bo hemû bertekên piştî mirinê tê bikaranîn.

Li sehayê xebatê bi qasî ku me lê kola ji bo vê têgehê peyv û gotinên weke “dûrik, stran, dilo (kurdên êzidî vê têgehê bi kar tînin), avêtina ser mirî” tên bikaranîn. Hem ji bo ku li sehayê tê bikaranîn û hem jî ji bo ku di nav kurdan da jî tê naskirin di vê xebatê da em dê têgeha “dûrik”ê bi kar bînin. Li vir divê em bibêjin ku di lêkolîna xwe da em rastî têgehekê nehatin ku ji bo wan kesên ku dûrikan dibêjin tê bikaranîn. Lê dîsa jî em dê wan weke jinên dûrikbêj bi nav bikin.

# BEŞA SÊYEM

## RÎTÛELÊN PIŞTÎ MIRINÊ

Em dê adet û rîtûelên piştî mirinê di bin du sernavan da dabeş bikin; rîtûelên berî veşartinê û rîtûelên piştî veşartinê. Rîtûelên berî veşartinê di demeka kin da tên kirin, lewra divê laşê mirîyî/yê bê amadekirin û di demeka kin da bê veşartin. Lê ji bo yên piştî mirinê demeka teqez tune.

### 3.1.RÎTÛELÊN BERÎ VEŞARTINÊ

Di vê beşê da em dê ji berî mirinê dest pê bikin û heta merasîma veşartinê biçin. Di vê navberê da çi adet û rîtûel hebin em dê wan rave bikin.

Dema ku nexweşî giran bû û hat famkirin ku dê nexweş bimire, xwedî û zarokên wî/wê yên li dûr tên agahdarkirin da ku bên û bi saxî nexweşên xwe bibînin û li hevûdin helal bikin. Ku mirovek dikeve ber mirinê, axaftin kê mî dibe, mad zer dibe, ling diwerimin, dest û ling dicemidin, awir sabit dibe. Heger ev tişt di nexweş da hatin dîtin, tê zanîn ku mirin nêzîk bûye û ji bo ku şeytan wî/wê bi avê nexapîne û îmana wî/wê jê nestîne peşîk av li devê nexweş tê kirin (Ç15). Lewra mirov ditirsin ku şeytan di bêhna dawî da nexweşên wan bi avê bixapîne û ew kes bê îman biçin dinyaya din. Ji ber vê yekê dema hat famkirin ku dê nexweş bimire, yanî di dema sekeratê da dişînin pey melayî (Ç15; Ç26).

Mela tê û li balê dişehidîne û tobeya xwe tîne zimanî da ku nexweş jî dengê wî bike û ew jî weke wî bibêje. Heger mela ne hazir be yekî/a din jî dikare vî tiştî bike. Ji ber vê yekê mirov tenê li cem nexweş gelek caran dubare dike da ku ew jî bêje û îmana wî/wê xelas bibe (Ç8; Ç26; Ç64). Li gorî ola îslamê heger mirov di bêhna xwe ya dawî da bişehidîne li ser îmanê diçe û dê biçê cenetê û heger neşehidîne li ser kufrê diçe û dê biçê cehenemê.



Bê çawa di nav kurdên misilman da berî mirinê mela tê vexwendin, kurdên êzidî jî bangî şêxên xwe dikin. Şêx kêlîya dawî tê ber serê nexweş û li gorî xwe diayinan dixwîne. Divê bê gotin ku rîtûeleka bi vî rengî di ola zerdûştîyê da jî hebû. Dema dihat famkirin ku dê kesek bimire du rahîb dihatin ber serê yê/ya nexweş û li ber serê wî/wê dia dikirin (Kurdo, 1993: 55).

Herweha misilman li ber serê nexweşên xwe sûretê yasînê jî dixwînin (Ç15; Ç64). Hîn ku hişê yê/ya nexweş li serê wî/wê ye jê tê pirsîn bê ka tu qewêtîyên wî/wê hene yan na.

Dem a ku yê/ya nexweş nema kêferat kir û dest û lingên wî/wê nema lebitîn, bangî wî/wê dikin bê ka dê bertekê nîşan bide yan na. Yê li dorê dest û guhê xwe datînin ser sînga wî/wê û lê dihisînin bê ka dilê wî/wê lê dixê yan na. Herweha li hilma wî/wê jî dinêrin (Ç7; Ç8; Ç64). Hin nîşanên mirîyan jî ew in ku çav û devên wan vekirî dimîne, lêva wan ya jêr dikeve bin ya jor (Ç8; Ç64).

Lê îro herçiqas ev nîşanên ku li jor me behsa wan kirîye di nexweş da xuya dikin jî xwedîyên nexweş dixwazin wî/wê bibin nexweşxaneyê. Hingî di televîzyonan, radyo, rojname û filîman da û herweha di nav gelî da jî tê behskirin bê çawa bi mesaja dilî mirî dîsa li jîyanê hatine vegerandin, weke hêvîyeka dawî gel dixwaze nexweşên xwe bigihînin nexweşxaneyê. Nemaze ku yê/ya nexweş ciwan be teqez wî/wê digihînin nexweşxaneyê.

Di xebatên sehayê da hat dîtin ku mirina li malê weke “mirina xweş” tê qebûlkirin. Jixwe îro mirov bêtir li nexweşxaneyan dimirin (Ç1; Ç10; Ç34; Ç43; Ç44). Ji alîyekî ve nexweşî zêde bûne, ji alîyekî ve qezayên hatûçûyê zêde bûne û digel van tiştan li Nisêbînê van salên dawî kuştin jî zêde bûye. Ne nexweşekî gelekî yixtîyar û ji hal da ketî yê ku textoran hêvîya xwe jê qut kiribe be, dikare bê gotin ku di roja îroyîn da piranîya mirovan li nexweşxaneyan, di qezayan da yan jî bi kuştinê dimirin.

Dem a hat famkirin ku nexweş mir, berî her tiştî heger çavê wî/wê vekirî bin, mirovek destê xwe ji anîyê ber bi jêr ve di ser çavên mirîyî/yê ra dibe û çavên wî/wê digire (Ç6; Ç12; Ç14; Ç29; Ç64). Bi taybetî jî tê bawerkirin ku heger xwedîyên

mirîyî/yê li wir hebin, ew çavên wî/wê bigirin baştir e (Ç6). Carinan çavên hindekan nayên girtin û vekirî dimînin (Ç8; Ç30). Wê demê tê gotin ku hin xwedîyên wî/wê li dûr in, dixwest wan bibîne lê ew nedîtin, dîtina wan jê ra bû hesret û ji ber wê yekê jî çavên wî/wê vekirî man (Ç1; Ç28; Ç36). Heger çavên mirîyî/yê neyên girtin, desmalek li ser çavên wî/wê tê girêdan da ku çavên wî/wê vekirî nemînin (Ç28; Ç29).

Piştî girtina çavan heger taximê diranan di devê mirîyî/yê da hebe, divê ji devê wî/wê bê derxistin (Ç36). Li ser girtina devê mirîyan li sehayê me zanyariyên cuda berhev kirin. Pîranîya çavkanîyan gotin ku heger derfet hebe, devê mirîyî/yê tê girtin (Ç7; Ç8; Ç29; Ç64). Ji bo ku di dema şuştinê da av nekeve devê mirîyî/yê û zenî danekeve û mirî nexweşik xuya neke devê wî/wê tê girêdan. Lê ji bo girtina devê mirîyî/yê ya bi qinabê yan bi tayî, hin kesên çavkanî gotin ku me qet nedîtîye ku ji bo girtina devê mirîyan, zenîya wan bi tayî hatîye girêdan (Ç10). Lê hindekan jî gotin ku ji bo girtina devê mirîyan em qinabekê di bin zenîya wan ra dikişînin û li ser serê wan girê didin (Ç8).

Dema ku mirovek piştî birîndariyê miribe, laş û cilên wî/wê bi xwîn bin, cilên wî/wê bi tişteki diqedînin û jê dikin. Lê heger tişteki weha nebe cilên mirîyî/yê naqedînin û hêdîka ji wî/wê jê dikin (Ç6; Ç33; Ç36).

Destên mirîyan di ber wan ra dirêj dikin, serê wan rast dikin û li ser piştê dirêj dikin (Ç6; Ç12; Ç14; Ç28). Dema ku kesek dimire, wê kêlîya pêşî laşê wî/wê hîn germ e. Ji ber wê yekê hîn ku laşê mirîyan germ e çav, dev, dest û lingên wan diedilînin, dereng nahêlin. Jixwe heger wê kêlikê needilînin laş hişk dibe û dûvre qet nayê edilandin (Ç8; Ç12).

Heger cilên wan jê kirin û dest û lingên wan jî edilandin, çarîkek be, newresîmek be, parçeyek hîzar be, cilîkek be, bi ser rûyê mirîyan dadikin û betanîyekê jî bi laşê wan dadikin (Ç8; Ç26; Ç36). Heger havîn be û dinya germ be ji bo ku mirî newerime kêrekê datînin ser zikê wan. Lê heger zivistan be û dinya sar be tişteki danayînin ser zikê mirîyan. Ne tenê kêr, carna eynik, meqes, hesin jî datînin ser zikê mirîyan (Ç1). Ç52yê sebaba vî tiştî weha rave kir: “Berê, dema ku jineka ducanî dimir, berî ku bê veşartin hesinek ango tişteki weha giran tanîn û datanîn ser

zikê wê. Mebest ji vî tiştî ew bû ku zaroka di zikê jina ducanî da jî bimire da ku ew zarok bi saxîti neyê veşartin.”

Heger kesek di ber sekeratê da zêde kêferatê bike (Ç1;Ç10), barbarê bike (Ç10), zû rih jê neçe (Ç1; Ç10), madê wî/wê reş bibe, wechê wî/wê gelekî xerabibe (Ç10) mirov bawer dikin ku ew kesekî/a gunehkar e. Ji alîyekî ve jî tê gotin ku yên ku gelekî li ber xwe didin û gelekî di ber sekeratan da dimînin, ew tişt ji wan kesan ra dibe kufaret yanî gunehên wan bi vî awayî tîne efûkirin. (Ç6). Li gorî hindekan jî ewên ku zêde di ber sekeratê da dimînin zilim li henekan kirine, dilê wan hiştine û heta ku ew mirov neyên û heqê xwe li wan helal nekin rih ji wan naçe (Ç1; Ç48). Ç36ê got ku heger cihê nexweşên ku gelekî li erdê dimînin, êş û azarê dikişînin û zû namirin bê guhertin dê rih ji wan biçê. Ç6ê got ku mirov zêde li rûyê mirîyan binêre nebaş e û nexweşîya zerikê jê çêdibe.

Mirovên ku di ser nimêjê da, di rêya Hecê da, li Hecê yan jî di rêya mizgeftê da dimirin weke kesên cenetî tîne dîtin û ji bo wan biwêja “xwezî bi wî/wê” tê gotin (Ç8).

Derheqê dema mirinê da jî di nav gelî da hin baweriyên balkêş hene. Li gorî zanyariyên ku me ji sehaya xebatê peyda kirin; tê bawerkirin ku, ew kesên ku di êvara îniyê da yan di rojîyê da dimirin pirs jê nayên kirin û Xwedê daye van kesên weha. Li cem êzidiyan jî mirina êvara îniyê baş tê dîtin (Ç28; Ç30). Di nav gelî da gelek çîrokên ku amajeyê bi girîngîya mirina êvara îniyê dikin tîne gotin.

Herweha ji bo wan kesên ku di rojîyê da dimirin tê gotin ku “Rojî wî/wê dispêre rojîyê” yanî heta rojîya sala din ezab jê ra tune ye û gunehên wan yê salekê tîne efûkirin. Û ji bo wan kesên ku êvara îniyê dimirin jî “Êvara îniyê ew siparte êvara îniyê” tê gotin (Ç1; Ç36).

Dema ku yek dimire û wî/wê dibin goristanê, heger baran bibare, jin dibêjin “Maşala baraneka xweş dayê, dinya hînik bû, ji wir xuya ye ku ev mirî qencekî Xwedê bû, nûr li wechê wî barîya.” Heger di wê kêlîya hilgirtina darbestê ango di dema veşartinê da ba û bablîsok rabe, dinya nexweş bibe, wê demê jî gel dibêje “ka vî/vê kesî/ê çi guneh kiribû heta ku Xwedê teala îro ev ecêb çêkir?” (Ç2; Ç11; Ç36).

### 3.1.1.Pêhisandina Mirinê

Berê hin mirovên ku ji zû ve nexweş bane, guhê mirovan li ser wan bû, yanî bi awayekî em bibêjin ku li hêvîya mirina wan bûn. Ji ber vê yekê herkes zû bi mirina wan dihisîya (Ç15; Ç34; Ç51). Lê yên ku ji nişkê ve dimirin, gel zû bi mirina wan nedihisîya. Berê înternet û telefûn tunebûn, xebera mirina mirovan zû belav nedibû. Dema ku li gundî yan li taxeka bajarî kesek miribaya cîran li hawar û girîyê xwedîyên mirîyî/yê derdiketin û bi vî awayî bi mirinê dihisîyan (Ç8; Ç15; Ç24; Ç34; Ç41; Ç33). Yên ku pê hisîyabana jî cîran û xwedîyên xwe agahdar dikirin.

Li bajarên baya, li gundan baya, dema ku mirov bi mirina hindêkan dihisîyan di cih da dev ji karên xwe berdidan û xwe digihandin mala mirîyî/yê û hezkirîyên mirîyî/yê hemû li wir kom dibûn. Xwedî û dostên li gund û bajarên jî bi rêya xwedîyê bi mirinan dihisîyan. Bo nimûne em bibêjin keç, kur, xweh, bira, xaltîk, metik, kurap, keçap, xal, ap, û hwd. xwedîyên mirîyî/yê li gund û bajarên bane, xeber ji wan ra dişandin (gelek caran kurekî xwe dişandin) û wan jî ji gundîyên xwe ra digotin. Bi vî awayî xebera mirinê li nav gelî belav dibû. Ji ber ku erebe kêr bûn yan peya diçûn yan jî bi ker û hespan diçûn. Lewma ev ne di demeka kin da pêk dihat, carna vê pêvajoyê bi mehan dewam dikir û gel dereng pê dihisîyan (Ç10; Ç12; Ç16).

Berê gelî mirîyên xwe li ser darbestê dikirin û dibirin goristanê. Bi vî awayî mirovên ku haya wan jê tunebû jî bi mirinê dihisîyan û beşdarî vê rîtûela birina goristanê dibûn (Ç8; Ç39).

Li nav bajarî û piranîya gundên Nisêbînê dema ku mirovek dimire, mela di hoparlorê da selayê nade. Li gundinan jî, dema ku yek dimire, melayê mizgeftê di hoparlorê da bang dike û dibêje “Filankesê/a kurê/keça/bavê/dêya filankes (heger hebe leqebê wan jî dibêjin) filan demê (vê sibehê/şevê din) çûye rehmetê. Ji bo kolana gorê bere herkes rahêje bêr û bivirên xwe û bê nav goristanê. Nimêja mirîyî/yê dê filan saetê bê kirin.” (Ç26; Ç14; Ç18). Heger bi şev miribe û neyê veşartin, wê şevê di hoparloyê da gel pê nahisînin û li hêvîya sibehê dimînin (Ç8; Ç15). Ku dibe sibeh jinûve di hoparloyê da gelî pê dihisînin. Dema ku mirovek li bajarên Tirkîyeyê yan jî li Ewropayê dimire, li wan gundan dîsa di hoparloyê da gel

pê dihisînin û dibêjin: “Wê mirî filan saetê bigihê gund, ji kerema xwe ra ji bo hazirîya tîrbê werin alîkarîyê.” (Ç19; Ç26).

Lê îro derfetên ragihandinê gelekî zêde bûne, teknolojîya ragihandinê gelekî pêş da çûye. Alava ragihandinê ya herî zêde têrbelavbûyî jî telefûna destan e. Dema ku yek ji malekê dimire, bi rêya telefûnê di cih da xwedî û dostên xwe pê dihisînin. Ne tenê yên li gundî yan li bajarî, herweha xwedîyên li bajaran û heta yên li Ewropayê jî tîr agahdarkirin (Ç14; Ç24; Ç26; Ç34; Ç41).

Ji bilî telefûnê tiştên wekî whatsapp, facebook, sîteyên înternê, û hwd. jî derfetên mezin derxistine holê. Malbatinan ango bavikinan komên whatsappê ava kirine, hemû endamên malbatê ango yên bavikê xwe yên xwedî telefûn di wê komê da tomar kirine. Di wê komê da her cure agahî tîr parvekirin. Ne tenê mirin, herweha nexweşî, dawet û tiştên din jî di cih da tîr parvekirin û endamên malbatê hemû pê dihisin. Dema ku xwedîyekî/a wan dimire di komê da parve dikin û herweha telefûna xwedîyên mirîyî/yê jî dinivîsin da ku yên li dûr û nikarin bîr sersaxîyê bikaribin li xwedîyên mirîyî/yê bigerin û sersaxîyê bidin wan (Ç8; Ç37; Ç39; Ç41). Li gundinan jî, ji bo agahîyên gundî sîteyekê vedikin û di vê sîteyê da her cure xeber tîr weşandin û şênîyên gundî li ku derê bin dikevin sîteyê û pê dihisin (Ç24; Ç41).

Digel malbatan; partî, komele, STK, sendîqa, şîrket û hwd. jî bi rêya komên whatsappê, bi rêya facebook, SMS û hwd. mirina endamekî xwe yan jî mirina xwedîyên endamekî xwe bi hemû endamên xwe ra parve dikin (Ç39; Ç43). Kurdên êzidî di facebookê da bi sernavê “Goristanê Hesên Begê” rûpelek vekirine. Dema ku yek ji wan dimire ji fotograf û vîdyoyên wî/wê klîbekê çêdikin û tavêjin vî pelî û hemû gelên êzidî bi mirina wî/wê kesî/ê dihisin. Ji bilî wê jî dema ku yek dimire, rîtûela veşartinê ji serî heta dawî bi kameravanekî zana dikişînin vîdyoyê û di sîteyê da parve dikin. Çi kesên ku dikevin vî pelê facebookê, vê vîdyoyê dibînin (Ç27).

Van salên dawî li Nisêbînê di sîteyên înternetê yên nûçeyan da îlanên mirinê tîr dayîn. Xwedîyên sîteyê dibêjin dema ku hevaleyek, dostek, ehlekî me yan kesekî xuya û navdar dimire em ji berxwe ve îlana mirina wan didin. Dibêjin carna jî xwedîyên mirîyan digerin û daxwaza îlana mirinê ji me dikin. Rojnamevan dibêjin ji

bo vê îlanê, em pereyan ji kesekî nastînin û weke xizmetekê bi dildarî em van îlanan didin. Lê dibêje heger li Nisêbînê 100 kes dimire, encex em îlana mirina 5 kesan didin. Di van îlanan da carna fotografên mirîyan jî tên weşandin da ku gel wan nas bike. Bi vî awayî mirin di nav gelî da zû belav dibe. Heta carna berî ku cîran pê bihisin li bajaran û li Ewropayê bi mirinê dihisin (Ç39).

Li vir divê bê gotin ku, dema ku xebera mirinê didin xwedîyên mirîyî/yê yên nêzîk, gelekî hay ji peyvên xwe hene û piranîya caran di telefûnê da jî nayê gotin. Ew bi gotinên weke “filankes nexweş e û dixwaze te bibîne û hwd.” tên vexwendin û piştî ku hatin rû bi rû û bi zimanekî nerm xebera mirinê ji wan ra tê gotin. Carna jî xebera mirinê ji kesên di hepsan da û ji yên li leşkerîyê ra nayê gotin da ku mitala nekin û ev xeber heta hatina wan ya malê tê paşxistin.

### **3.1.2.Dema Veşartinê**

Di nav gelî da bawerîyek heye ku mirî çiqasî zû bê veşartin hewqasî baş e (Ç1; Ç6; Ç8; Ç12; Ç14; Ç22; Ç24; Ç29; Ç31; Ç41; Ç44). Dibêjin heger zû neyê veşartin guneh e û dê ezab bikeve stukra mirîyî/yê û dibêjin çiqasî zû bê veşartin jî xêr e (Ç1; Ç24). Lê heger tirsî fitneyê nebe yanî heger laşê mirîyan xera nebe, newerime û genî nebe destûr heye ku mirov mirîyên xwe li hêvîya hin xwedîyên mirîyan (weke keç, kur, dê, bav, xweh, bira) yên deverên dûr bihêlin û zû veneşêrin (Ç6; Ç52; Ç64). Piranîya van kesên ku mirî li hêvîya wan tê hiştin, ji zû ve yê/ya mirî nedîtine, berî ku bê veşartin dixwazin cara dawî wî/wê bibînin. Ev sekinandin tenê bi qasî çend saetan e û mirî tu carî rojekê li hêvîya kesekî nayên hiştin (Ç24; Ç28). Jixwe heger ji bo rîtûela veşartinê gelek kes kom bûbin û mirov ji deveran hatibin wê demê yekî rihspî ricayê ji xwedîyên mirîyî/yê dike û dibêje “Milet helak bû û mirî jî gunehkar bû bi vê seknê.” û bi destûra xwedîyên mirîyî/yê dest bi merasîma veşartinê dikan (Ç7; Ç10; Ç24). Berê xerîbî zêde tunebû, gel ji hev bela nebûbû, mirov hemû li gund û bajarên xwe bûn, kêmkî çûbûn Ewropa û bajarên Tirkîyeyê, hemû li cem hev bûn. Ji ber vê yekê jî kesên ku mirî li hêvîyê hiştibana zêde nebûn (Ç1; Ç37).

Berê hem derfetên ragihandinê û hem jî yên çûnûhatinê pir kêmkî bûn, ji ber vê yekê jî xwedîyên dûr hem dereng pê dihisîyan û hem ku pê hisîyabana jî derfetên

wan tunebûn ku di çend saetan da bên û xwe bigihînin ser mirîyî/yê. Ji ber wê yekê jî mirîyên xwe zû vedişartin û li hêvîya kesekî nedihîştin. Îro xebera mirinê zû belav dibe û mirov di çend saetan da bi balafirê dikarin xwe bigihînin deverên dûr.

Dema ku kesek bi şev dimire, heger xwedîyên mirîyî/yê pêra bigihin yanî ku bikaribin mirîyê/ya xwe bişon û gorê bikolin, gel pê dihisînin û mirîyên xwe wê şevê vedişêrin (Ç15; Ç20; Ç29). Û heger zanibin ku nagihin wê şevê veşêrin, tu kesî agahdar nakin û mirîyên xwe heta sibehê dihêlin. Ji ber ku berê derfet kêmbûn, kolana goran zehmet bû, piranîya caran mirovan mirîyên xwe dişûştin, kefen dikirin û heta sibehê li malê dihiştin (Ç1; Ç6; Ç7; Ç22; Ç24; Ç26; Ç31). Îro kolana goran pir hêsan bûye, piranîya caran kepçeya şaredarîyê yan jî kepçeya kesan tê û gorê dikole û piştî veşartinê gorê dinixumîne jî. Di demeka kin da û bi kedeka hindik rîtûela veşartinê diqede, ji ber vê yekê jî kêmbûn kes mirîyên xwe dihêlin sibehê.

Lê carna jî heger mirovek li mala xwe miribe, xwedîyên mirîyî/yê dixwazin ku mirîyê/ya wan şeva dawî di nav wan da, li cem wan bimîne û naxwazin wê şevê veşêrin (Ç1; Ç36). Lê divê bê gotin ku daxwazên bi vî awayî di nav civakê da pir kêmbûn in. Heger derfetên şûştin û kolana gorê hebin xwedîyên mirîyan jî dixwazin di zûtirîn demê da mirîyên xwe bi cih bikin. Dema ku mirîyên xwe bihêlin sibehê, yan wan li mala mirîyî/yê dihêlin (Ç8; Ç10; Ç26; Ç31; Ç34; Ç37) yan jî wan dibin mizgeftê û li wir dihêlin (Ç14; Ç19). Heger mirî wê şevê veneşêrin û li malê bihêlin, wî/wê li odeya wî/wê ya hercar datînin û heta sibehê di nav cihê wî/wê da dihêlin. Zarok ne têda, heta sibehê li wê malê tu kes ranaze, hemû hişyar dimînin (Ç1; Ç10; Ç18; Ç26; Ç34; Ç45).

Tê bawerkirin ku xwendina Quranê û diayên ku tên kirin hemû fêdeyê li mirîyan dikin (Ç6; Ç52; Ç64). Herçiqas hindek bêyî ku mirîyên xwe bişon li serê dixwînin jî gelek kes pêşî mirîyên xwe dişon û dûvre li serê dixwînin. Lewra alimên herêmê dibêjin heta ku xusla mirîyî/yê neyê hilanîn xwendin bi kêr nayê (Ç6; Ç8; Ç64). Mirî şevê jî û saetekê jî li malê bimîne xwedîyên mirîyî/yê yên Quranxwên li dorê dicivin, li ber serê wî/wê rûdinin û li serê dixwînin.

Heger mirî bi şev li malê bimîne xwendevanên wê malê bin, yên xwedî û cîran bin, yên ku dixwazin tên dora mirîyî/yê û heta sibehê yasîn û Quranê dixwînin

û diayan ji bo mirîyî/yê dikin (Ç1; Ç8; Ç10; Ç12; Ç14; Ç18; Ç26; Ç34; Ç36; Ç37). Heger xwedîyên mirîyî/yê nizanibin carinan bangî melayekî yan jî bangî hin kesên Quranxwên dikin da ku li ser mirîyên wan bixwîne û piştê jî tiştinan didin wan û dilên wan xweş dikin (Ç31). Heger yê Quranxwên zêde bin, cizokên Quranê li wan parve dikin, ji bo ku di demeka kin da Quranê xitim bikin. Bi vî awayî heta sibehê gelek xitme li ser mirîyên wan tên xwendin (Ç1; Ç26; Ç51).

Heger wê şevê mirî li mizgeftê bihêlin, dîsa yê ku dizanin Quranê bixwînin diçin mizgeftê û heta sibehê li ser mirîyî/yê dixwînin. Hindek jê berê sibehê berî ku mirî bê veşartin xitmeyên xwe teslîmî rihê mirîyî/yê dikin (Ç19; Ç26; Ç31) û hindek jê jî heta êvara înyê pêşî xwendina cizokan li malê û li cihê sersaxîyê didomînin û hemû xitmeyan, êvara înyê teslîmî rihê mirîyî/yê dikin (Ç1; Ç35; Ç38).

Ç45ê derheqê xwendina Quranê ya li ser mirîyî/yê da ev agahî dan me:

“Heta berî 50-60 salî jî wexta ku yek miribaya seydayê (mela) gundî feqeyên xwe tanîn û heta berê sibehê li ser mirîyê me bê navber Quran dixwendin. Piştî veşartina mirî me li cem tîrbê kolîkek çêdikir, seyda û feqeyên xwe, xwendina xwe li wir dewam dikirin. Xwedîyên mirî ji bo xizmeta wan xortin hazir dikirin da ku av, çayê û xwarina wan bidin wan û hemû pêdivîyên wan pêk bînin. Heta êvara îna pêşî wilo dixwendin, êvara îne wexta ku melayê esrê bang dida xwendin betal dikirin û xitmeyên ku kirine hemû teslîm dikirin. Ji bo vê xwendina wan xelkê zad, pere û xwarin didan wan. Lê ji wexta ku em hatine bajêr em hew vî tiştî dikin û me jî xwe tebayî xelkê bajêr kir.”

Bazîdî jî derheqê vî tiştî da hindek zanyarî dane me û gotîye ku li gorî qeweta xwedîyên mirîyî/yê mehekê–panzdeh rojan ev xwendin dewam dikin (Bazîdî, 2010: 53).

Kurdên êzîdî jî weke yê misilman heta ji wan tê mirîyên xwe zû vedişêrin. Ew jî carna heta çend saetan mirîyên xwe li hêvîya hin xwedîyên xwe dihêlin lê ne ku bi şev miribe û gor ne hazir be tu carî mirîyên xwe nahêlin roja din. Dema ku mirîyên xwe dihêlin sibehê, wê şevê wî/wê naşon û heta sibehê mirîyên xwe bi tenê nahêlin û heger xwendevanên wan hebin li ser wan qewlan dixwînin. Hindek jê ji bo ku sebra mirîyî/yê û malbata mirîyî/yê bê hedîseyan dibêjin yanî dilê xwedîyên



mirîyî/yê xweş dîkin û heta sibehê devê wan nakeve hev. Heta sibehê qewl û hedîse tèn gotin û axaftin dewam dike û wesfê mirîyî/yê tê dayîn (Ç29; Ç30).

Li jor me behsa nexweşxaneyan kiribû û me destnîşan kiribû ku van salên dawî mirov bêtir li nexweşxaneyan dimirin. Dema ku mirovek li nexweşxaneyê dimire, li gorî daxwaza xwedîyên mirîyî/yê, li wir tê şûştin û kefenkirin. Hindek jê jî mirîyên xwe dibin mizgeftê û li wir didin şûştin. Herweha li nexweşxaneyê mirîyî/yê dixin tabûtê jî. Yek ji xwedîyên mirîyî/yê ji bo kolana gorê li şaredarîyê digere, şaredarî jî di cih da kepçeya xwe dişîne û gorê dide kolan. Mirîyî/yê bi erebeya mirîyan yan jî bi ambûlansê dibin û li devê derîyê mala mirîyî/yê çend deqeyan disekin. Carna jî mirîyî/yê dibin hundirê mala wî/wê, xwedîyên mirîyî/yê girêka serê wî/wê vedikin, lê dinêrin, wî/wê maç dîkin û dîsa girêka serê wî/wê digirin û ji malê derdixin û ji bo nimêjê, wî/wê dîsa li erebeyê siwar dîkin û dibin mizgeftê. Yanî mirovekî/a ku li nexweşxaneyê miribe, îstîsna ne tê da tu carî nahêlin sibehê û wê şevê vedişêrin. Yan jî piştî şûştinê, wê şevê mirîyên xwe dixin morga nexweşxaneyê û sibehê ji wir derdixin. Ji alîyê sekinandina mirîyî/yê ve adetên kurdên êzidî û yên misilman weke hev in.

### 3.1.3.Şûştin

Li herêmê dema ku mirovek dimire, teqez tê şûştin û tu carî bê şûştin nayê veşartin. Zarokê/a ku di zikê dêya xwe da ser û laşê wî/wê dîyar bûbe, teqez tê şûştin (Ç6; Ç52; Ç64). Heta regezeka mirovî jî bi awayekî jê bûbe ew jî weke usûla mirîyan tê şûştin. Ç9ê di vê bareyê da weha got: “Şekir li xesiwa min da, lingekî wê jê kirin. Bê mirîyek çawa tê şûştin, ew lingê jêkirî jî wilo şûştin, kefen kirin, tirb jê ra çêkirin û veşartin.”

Berê jin baya mêr baya piranîya mirîyan li malan dihatin şûştin, lê îro mirovên ku li mala xwe dimirin heger mêr bin bi piranî li mizgeftê (Ç10; Ç12; Ç31) û heger jin bin bêtir li malê tèn şûştin (Ç6; Ç10; Ç12; Ç31; Ç33). Li sehayê ji bo vî tiştî çend sebeb hatin gotin. Sebebek jê ew bû ku berê li gelek mizgeftan cihê şûştinê tunebû lê îro gişt li hemû mizgeftan cihê şûştin û kefenkirinê hatine çêkirin. Yek jê jî; berê ceyran tunebû û herkesî li mala xwe agir dîkir û ava mirîyî/yê amade dîkir, lê îro bi alavên ku li ser ceyranê dişuxilin ava mirîyî/yê germ dîkin. Heger ceyran qaçax

be naxwazin bi wê ceyranê ava mirîyên xwe germ bikin. Dibêjin mirî bi wê avê helal nabin û ew av ji mirîyan ra dibe ezab. Heta Ç26ê got ku heger ava wan qaçax be avê jî ji kanîyê tînin. Yê ku mirîyên xwe li malê dişon teqez vê xalê li ber çavan digirin û ava xwe li ser qazanên avê dikêlin. Jixwe av û ceyrana mizgeftê ji kîsî dewletê ye, yanî ne qaçax e û bi piranî kefen jî li wir peyda dibe. Ji ber van sedeman mirov bêtir dixwazin mirîyên xwe bibin mizgeftê û li wir bişon (Ç1; Ç8; Ç24; Ç26). Yê ku li nexweşxaneyan dimirin jî bi piranî li nexweşxaneyê tên şuştin û kefenkirin, lê kê mîrov jî hene naxwazin mirîyên wan li nexweşxaneyê bîn şuştin, mirîyên xwe yan dibin malê yan jî li mizgeftê didin şuştin (Ç44).

Herçiqas mela dibêjin ku ji alîyê xwedîyên mirîyan ve bîn şuştin baş e jî (Ç6) hem bi wan zor tê û hem jî herkes nizane mirîyan bişo (Ç1). Ji ber wê yekê heger mirî mêr be ji alîyê melayî ve yan jî ji alîyê yekî Quranxwên û nimêjker ve tê şuştin (Ç12). Heger mirî jin be; yan jina melayî wê dişo yan jî jineka seyid, yeka hecî, yeka Quranxwên û zana wê dişo (Ç1; Ç12). Yanî mêr, mêran dişon û jin jî jinan dişon. Ji ber ku kesek bi tena serê xwe nikare mirîyî/yê bişo, 3-4 kesên din jî alîkarîya wî/wê dikin. Gelek çavkanîyên me gotin ku wan bixwe jî mirî şuştine (Ç8; Ç9; Ç10; Ç19; Ç24) lê teqez yekî/a zana pêşengîya wan dike. Jixwe li nexweşxaneyan kadroya melayan heye û mirîyê ku mêr be ew dişo (Ç44; Ç50). Herweha li şaredarîyê jî melayê xwedî kadro heye û dema ku xwedîyên mirîyan dixwazin, şaredarî wî melayî ji wan ra dişîne (Ç61). Li malê be, li mizgeftê be yan jî li nexweşxaneyê be bi piranî xwedîyên mirîyî/yê di şuştina mirîyên jin da alîkarîyê dikin. Li nexweşxaneyan piştî ku mirî tên şuştin bangî xwedîyên wan dikin û dibêjin yê ku bixwazin bere bîn mirîyê/ya xwe bibînin.

Berê mirovên ku mirîyên xwe nedibirin mizgeftê, yan li hundirê xanîyî dişuştin yan jî li hewşê yanek datanîn, perdeyek li dorê dipêçan û weha dişuştin, yanî mirî teqez li cihekî parastî dihat şuştin (Ç1).

Ji bo şuştina mirîyî/yê hin alav tînin bikaranîn. Ji wê beroş ango qazana mezin ya ku ava serê mirîyî/yê tê da li agirî dikin ra “dist” tê gotin. Ew çemçik yan heska kûr ya bi destik ku pê misînan dadigirin jî “yendo” ye. Digel van herdûyan herî kê mî du “misîn” jî divin. Du “kîsik”ên çapan yan jî hîzar didirûn û sabûnê dixin yekî ji wan û yê din jî ji bo ku bixin destê xwe û mirîyî/yê pê bişon vediqetînin. Ji bilî van

galon, sîtil û firaxên din jî tèn bikaranîn (Ç1; Ç24; Ç33). Ji bo cihê ku li mizgeftan mirîyan li serê dişon jî çend nav tèn bikaranîn; “textê şuştinê” (Ç15), “ferşê şuştinê” (Ç8), “şahn” ango “textê xasila” (Ç6). Ne misêwa ye, hindekî meyl danê, da ku av di ser ra biherike (Ç8). Hindek jê ji mermer in û hindek jê weke maseyekê ne û hindek jê jî di şiklê derîyan da ne (yên berê bêtir weha bûn) û dema ku hewce dike datînin ser çend pirîkêtan û mirîyî/yê li ser dişon.

Pêşî hemû firaxên ku av di wan da tê germkirin û firaxên şuştinê tèn helalkirin (Ç1; Ç19; Ç24). Ava mirîyan divê qenc bê kelandin, piştî ku qenc kelandin dûvre wê avê sarogermo dikin. Herçiqas mela dibêjin ne hewce ye jî dûvre yê ku dê mirîyî/yê bişo û alîkarên wî/wê hemû destilmêj digirin (Ç19; Ç24). Sabûnê hûr hûr dikin û dixin hundirê kîsikekî, destê xwe yê rastê jî dixin hundirê wî kîsikî û qenc girê didin da ku kîsik ji destê wan nekeve. Kîsikê din jî dixin destê xwe yê çepê û qenc girê didin da ku destê wan negihe laşê mirîyî/yê. Heger nexweşîyeka mirîyî/yê hebe da derbasî yên ku wî/wê dişon nebe, kîsikan dixin destên xwe (Ç6).

Berî ku serê mirîyî/yê bişon pêşî cilikekê bi cihê avreta wî/wê da dikin û dûvre destilmêja wî/wê digirin. Nêta xuslê li mirîyî/yê tînin û xusla wî/wê jî tê kirin. Sê caran ji serî heta jêr alîyê rastê tê şuştin, sê caran jî alîyê çepê tê şuştin. Dûvre cihên mayî hemû tèn şuştin. Piştî ku serê mirîyî/yê hat şuştin, piştî stûyê wî/wê dixin destê xwe yê rastê, wî/wê rûdinênin, kaboka xwe didin piştê û hêdîka sê caran destê xwe di ser navê ra dibin. Heger destava wan ya mezin hebe, da derkeve vî tiştî dikin. Heger tişteker derket dê bê paqijkirin û careka din aveka paqij li mirîyî/yê tê kirin. Hindek jê kafûr, misk yan jî şampûnê dixin nav ava ku di dawîyê da bi mirîyî/yê da dikin û hindek jê jî piştî ku şuştin xelas bû bêhnên xweş bi laşê mirîyî/yê da dikin, li gundinan jî ev adet tuneye. Heger birînen fişekan hebin an qulin di laşê mirîyî/yê da vebûbin piştî ku şuştin xelas bû ew qulik bi pembû tèn girtin. Wekî din hindek jê cihên din bi pembû digirin û hindek jê jî pembû bi kar naînin. Piştî şuştinê laşê mirîyî/yê zuwa dikin. Di dema şuştinê da hin jê salewatan li ser pêxember tînin û hindek jê dişehidînin (Ç3; Ç6; Ç8; Ç12; Ç19; Ç33; Ç52).

Ji ber ku divê ava mirîyan qenc bê kelandin, carna dema ku li malê, ava li ser agirî gelekî dikele, dibêjin zû agir vemirînin yan na dê hindek ji mala me bimirin (Ç24). Hindek jî dibêjin jina ku di ser wê ava ku mirîyan pê dişon û diherike ra

biqevêze, nema zarokên wê çêdibin. Divê pêşî wê avê biherikînin û derbas bikin, dûvre mirov di wir ra biçin. Ava ku mirî pê hat şûştin jî divê nerijînin qelezyonan, divê birijînin devereka paqij (Ç1; Ç24; Ç36). Dibêjin sabûna ku ji ber şûştina mirîyî/yê dimîne jî dermanê xuşrikê\* ye. Tê gotin ku heger wê avê di serê nexweşên xuşrikê bidin, wê ew nexweşî di cih da jê biçe (Ç1).

Ç31ê mitirb, derbareyê şûştina mirîyan da ev agahî dan me:

“Carna ji bo şûştina mirîyên xwe em heta sibehê digerin heta ku bi zorê em melayekî dibînin da ku mirîyên me bişoyê. Dema ku mela mirîyên me dişon jî em pereyan didin wan, hindek ji wan pereyan digirin û hindek jê ji pereyan qebûl nakin.”

Dema ku me sebeba vî tiştî pirsî got civaka me, me kêr dibîne, me biçûk dibîne. Got ji ber ku ji aliyê madî û manewî ve tu hêvîya wan ji me tune, mela jî zêde nêzîkî mirîyên me nabin.

Weke kurdên misilman, yên êzidî jî mirîyên xwe dişon. Heger mirî bi şev miribe û negihin ku veşêrin, wê şevê mirîyên xwe naşon, dihêlin sibehê û hingî dişon. Heger şêx û pîrên wan amade bin ew mirîyan dişon, heger ew ne amade bin wê demê hindeke zana dişon. Dibêjin jinên şêxan jî şêx in, lewma dema ku jinek dimire jina şêx wê dişo. Yanî li cem êzidîyan jî jin jinan, mêr jî mêran dişon. Ji ber ku şêx û pîrên wan li Nisêbînê nemane (hemûyan bar kirine Ewropayê û li wir dijîn) li gundî, yên ku dizanin vî karî bikin mirîyan dişon.

Êzidî hemû mirîyên xwe li malê dişon. Niha çêkirina cihê sersaxiyê dewam dike ku ew jê ra dibêjin “mala êzidîya”. Dixwazin cihê şûştinê jî tê da çêbikin da ku mirîyên xwe li wir bişon. Ji bo berlêgirtina werimîna laşî û bêhna nexweş êzidî jî piştî şûştinê bêhnên xweş yên weke kolonyayê bi mirîyên xwe da dikin. Ji bo ku bêhna hundirû xweş bibe li cihê şûştinê mûman jî pêdixin (Ç29; Ç30).

Dema ku mirov adetên şûştina mirîyan yên berê û yên îro dide ber hev tê dîtin ku tu guhertinên mezin çênebûne. Herçiqas xaniyên îro xweştir û mezintir in û ji bo şûştinê serşokên wan gelekî guncaw in jî, mirov bêtir mirîyên xwe li mizgeftan yan jî

---

\* Nexweşiyeka weke keçeliyê ye, pizik di serî da çêdibin

li nexweşxaneyan didin şûştin. Sebebeka wê ceyrana qaçax e, yek jê çêkirina cihên şûştin û kefenkirinê ya li hemû mizgeftan e. Sebebeka din jî ew e ku mirîyên ku li nexweşxaneyê dimirin li wir tên şûştin. Di nav adetên êzidî û misilmanan da jî bi qasî ku me lê kola ji alîyê şûştina mirîyan da cudahîyeka berbiçav tune.

### 3.1.4. Qewêtîyên Mirîyî/yê

Berî ku mirî bîn kefenkirin yên ku dixwazin qewêtîyên mirîyên xwe bi cih tînin. Lê di bicihanîna van qewêtîyan da gelek jê fikra melayî distînin û li gorî gotina wî tevdigerin. Hindek jê jî hewceyî bi melayî nabînin û li gorî zanebûna xwe qewêtîyên mirîyên xwe pêk tînin.

Hindek jê hineyê distirin û berî ku mirîya xwe kefen bikin hineyê di serê wê didin. Tenê jin qewêtîya hinekirina porê dikin. Ji tirsê lewitîna kefenê serê mirîyê hemûyî hine nekin jî piçekî ji pora wê hine dikin û qewêtîya wê tînin cih. Herweha jinên jê jî dixwazin ku çavên wan kil bikin û weha wan veşêrin (Ç1; Ç11).

Jinên dixwazin hungilîska wan ya hecê di destê wan da bimîne û ji destê wan dernexin û wan tevî hungilîskê veşêrin (Ç24). Li deverinan, berê jinan dixwestin ku 7 heqîqetan\* bi tayekî ve bikin û bixin stûyê wan. Xwedîyên wan jî ew qewêtîya wan pêk tanîn lê îro ev adeta heqîqetan rabûye (Ç25).

Mirovin jê di saxîtiya xwe da ji melayî dixwazin ku kaxetekê ji wan ra binivîse da ku di gorê da rehet bikaribe bersiva xwe bide û netirse. Dixwazin ku berî kefenkirinê kaxeta wan bixin destê wan (Ç1). Li deverinan, ji vê kaxetê ra dibêjin “cewaba mirîyî/yê” û mela hemû pirs û bersivên telqînê di wê kaxetê da dinivîse. Li deverinan jî wê kaxetê naxin destê mirîyî/yê, kaxetê dixin şûşeyekê an fişkekê û dema ku mirîyî/yê dadixin gorê wê jî datînin ber serê mirîyî/yê û pê ra vedîşêrin (Ç10).

Êzidî bê sinetkirin mirîyên xwe venaşêrin. Mêrên êzidî biçûk bin mezin bin dema ku mirin divê bîn sinetkirin. Ji ber wê yekê berî ku mirîyê xwe kefen bikin

---

\* morîkên xweşik yên ku ji hecê tanîn.

teqez wî sinet dikin û dûvre kefen dikin. Ev ne li gorî qewêtîya mirîyî/yê ye, ev riknekî ola êzdayetîyê ye, lewra tu kes bê sinet nayê veşartin (Ç28; Ç30).

### 3.1.5.Kefenkirin

Piştî mirî hatin şuştin û laşê wan hat zuwakirin wan li ser kefenî datînin. Rengê kefenî spî ye û yan ji çapan e yan jî ji hîzar e. Ç34ê got ku hîzar li malekê hebe ne baş e, lewra dibe ku tiştên xerab biqewimin. Li gorî zanyarîyên ku me ji sehayê peyda kirin li deverinan, yê ku dewlemend bin kefenê wan ji hîzarê ye û yê ku feqîr bin kefenê wan ji çapanê ye, heta hin çavkanîyan gotin kefenê dewlemendan ji yê feqîran bêtir e jî (Ç1; Ç3; Ç6; Ç15). Li gorî kesên çavkanî li herêmê heta îro tu kes bê kefen nehatîye veşartin.

Kefenê mêran sê parçe ye. Parçeyê ku ji qirikê pêve heta dadikeve ber lingan “qemîz” e. Yê ku ji navikê heta jê ra kabokê weke etekê ye “îzar” e. Yê herî mezin ku talî li mirîyî/yê dipêçin û girê didin jî “lîfaf” e. Destê mirîyan di ber wan ra dirêj dikin û weha kefen dikin (Ç6; Ç10).

Kefenê jinan pênc parçe ye û hemû jî ji qumaşê kefen tèn çêkirin; derpî, çarîk, pêçavk, pêşmalk û kiras (Ç1; Ç18; Ç24). Pêşî derpîyê mirîyî/yê lê dikin. Derpî weke bêcemeyekî ye, li hindekan dikin û li hindekan jî nakin. Hin jê ji derpî ra dibêjin gore. Çarîkê didin serê mirîyê. Pêçavk weke terîşkekê ye û di ser çarîkê ra li anîya mirîyê dipêçin. Pêşmalkê jî li noqa wê dipêçin. Kiras parçeyê mezin e ku herî dawî lê tê pêçan û dûvre jî bi terîşkan tê girêdan. Hindek jê zendikên weke yê nimêjê jî ji wan ra çêdikin û dixin çengê wan. Ji wan ra destik û lepik jî tê gotin (Ç1; Ç24). Li deverinan gotin ku îro tune ye, lê berî bi 30-40 salî me kum jî ji wan ra çêdikir û dixist serê wan (Ç18; Ç25). Carna jinan jî weke mêran dixin nav sê parçe kefen û vedişêrin. Dema ku zendik, derpî û kum tèn çêkirin teqez didirûn lê wekî din kefen nayê dirûtin, kêl lê nakevin. Tenê bi sê terîşkan ber serî, noq û bin lingên mirîyê tèn girêdan (Ç1; Ç6; Ç8; Ç14; Ç15; Ç24; Ç26; Ç36). Dibê heger hindek heft girêkan li wî tayê ku kefen pê tê girêdan bidin, ew kes tayê nagirin û natirsin (Ç24).

Piştî ku terîşka serî girê dan, êdî tu têkilîya mirîyî/yê bi dinyayê ra namîne. Ji ber vê yekê ye ku di nav gelî da weha tê gotin: “Heta kîskê serê min girê din ji bîra

min naçe”.(Ç1). Li deverinan, li gorî qewêtîya mirîyî/yê piştî ku hat kefen kirin, bêhnên xweş yan jî ava zezemê pê dadikin da ku bêhna xweş ji wan bê (Ç1; Ç6).

Êzidî jî eynî weke misilmanan heta ku mûyek ji laşê mirîyan xuya neke wan kefen dikin û ew jî mirîyên xwe tu carî bê kefen venaşêrin. Îro kefenê wan bêtir ji hîzarê ye. Kirasekî ji hîzarî heta ser kabokê ji mirîyan ra çêdikin û li wan dikin. Ji vî parçeyî ra “qelqele” yan jî “pêsîr” tê gotin. Û ji heman qumaşî derpîyekî jî çêdikin û li mirîyên xwe dikin. Goreyekê ji wî qumaşî çêdikin û dixin lingên wan. Herweha desmaleka spî (ya jinan çarîkek jî çêdibe) jî didin serê mirîyan. Herî dawî jî parçeyê mezin lê dipêçin û jora serê wan girê didin (Ç28; Ç30). Berî ku mirî bîn kefenkirin hindek axa ku ji gora Şêx Adî ya li Laleşê hatîye anîn bi ser dev û rûyê wan werdikin û ji vê axê ra “Beratê Şêx Adî” tê gotin (Ç27).

Bi bawerîya gelî divê kefenê mirovan bi pereyên helal bê kirîn. Berê xwedîyên mirîyan kefenê mirîyên xwe dikirîn. Hindekan jî di saxîtiya xwe da kefenê xwe dikirîn û datanîn malê yan jî hindek pere didan jina xwe û digotin “Heger ez mirim kefenê min bi van pereyan bikin.” Heger hindeke feqîr mirîbaya, dê kesek ji ba xwe bi dizî çûbaya sûkê û têra mirîyî/yê kefen anîbaya û gotiba “Bere xêra min be.” Lewma ji bo yên weha feqîr gelî digot “Kefenê wî/wê ji mala wî/wê naqedê” (Ç1).

Îro çî li gundan, çî li bajarî li piranîya mizgeftên Nisêbînê û li nexweşxaneyên dewletê kefen peyda dibe. Lewra mirovên xêrdîn, ji bo kefenkirina mirîyan, ji kîsî xwe topên hîzar yan çapan dikirin û dibin mizgeft û nexweşxaneyan. Herweha rêveberîya nexweşxaneyê jî ji bo kefenî qimaş dikire. Ne li nexweşxaneyê û ne jî li mizgeftan ji bo kefen tu pere ji xwedîyên mirîyan nayê standin (Ç8; Ç19; Ç44; Ç50). Lewma îro tu kes li kefenê xwe namîne heyirî.

### **3.1.6. Berdêla Şûştin, Kefenkirin û Kolana Gorê**

Ji bo şûştin, kefenkirin û kolana gorê tu kes doza pereyan li xwedîyên mirîyan nake. Ji ber ku ev xizmetên navborî hemû, li gorî ola îslamê û ola êzdayetîyê weke xêr tên dîtin. Lewma gelek mirov bi dildarî van karan dikin. Bazîdî jî destnîşan dike

ku li Kurdistanê ji bo kolana gorê, şuştin û kefenkirina mirîyan tu pere ango tiştên weha nayên dayîn û ev tişt ji alîyê xêrxwazan ve tên kirin (Bazîdî, 2010: 77).

Herçiqas kes doza pereyan nake jî xwedîyên mirîyî/yê naxwazin ku heqê tu kesî bikeve stûyê mirîyên wan û bi awayekî dilê wan xweş dikin. Hindek jê cil û firaxên mirîyên xwe yên xweşik û bikêrhatî didin wan. Gelek caran jî li gorî qewêtîya mirîyî/yê hungulîsk, guhar, qimaş, saet û tiştên wan yên bi qîmet didin kesên ku mirîyan dişon (Ç47; Ç48; Ç59). Hindek jî tiştinan amade dikin û dibêjin dema ku em mirin kî me bişoyê van tiştan bidin wan. Jixwe bi piranî kesên ku mirîyan dişon kefenê wan jî li wan dipêçin. Heger mirî li nexweşxaneyê hatibe şuştin jixwe tu kes behsa heqê şuştin û kefenkirinê nake lê dîsa jî xwedîyên mirîyî/yê dixwazin dilê wan kesên ku mirîyên wan dişon, xweş bikin.

Berê li gundan ji melayê xwedî kadro zêdetir melayên zikatê dixebitîn. Hindek ji wan gelekî feqîr bûn û ji bo şuştina mirîyan heq distandin. Ne ku wan tişteke dixwest, lê çavê wan li destê gelî bû. Dema ji bo ku ked bi mirîyên wan ra dîtîye xwedîyên mirîyan pereyin xistibane berîka wan jî red nedikirin (Ç26). Heq bistînin jî û nestînin jî xwedîyên mirîyan ji wan kesan dixwazin ku ked û heqê xwe li mirîyên wan helal bikin.

### **3.1.7. Nimêja Mirîyî/yê**

Ji ber ku kurdên Nisêbînê yên misilman ji mezhebê şafi ne rîtûela nimêja mirîyî/yê jî li gorî vê mezhebê tê kirin. Tê gotin ku zarokên ku ji dêya xwe ketibin û deng ji wan nehatibe nimêja wan nayê kirin, lewra mirî çêbûne. Wekî din li ser herkesî nimêj tê kirin (Ç6). Tenê mêr beşdarî nimêja mirîyî/yê dibin û heta îro nehatiye dîtin ku jinan nimêja mirîyî/yê kirine (Ç1; Ç3; Ç10; Ç14; Ç24). Nimêja mirîyî/yê dikare li mizgeftê jî bê kirin û dikare li goristanê jî bê kirin. Ji ber rehetîya mizgeftê, nimêja mirîyî/yê bi piranî li mizgeftê tê kirin. Lewra zivistanî dinya sar e, carna şilî ye, ba û bahoz e; havînî jî germa herêmê pir dijwar e û goristanin jê jî li serê girikan e û ji bo nimêjê ne guncaw in. Lewma nimêja li goristanê ji bo beşdarvanan tadeyeka mezin e. Dema ku li goristanê nimêj dikin, heger erd zuwa be hindek jê şekalên xwe jê dikin û desmalkeka paqij yan jî ferşekî helal dixin bin



lingên xwe û hindek jê jî tevî şekalan beşdarî nimêjê dibin (Ç1; Ç8; Ç10; Ç14; Ç19; Ç22; Ç34).

Mela bangî gelî dike û dibêje: “Rehmel bavê we, yên ku bi destilmêj bin bere bên nimêjê”. Lewra ji bo mirovek bikaribe beşdarî nimêja mirîyî/yê bibe divê bidestilmêj be. Di nav gelî da mirî rêzbar e, lewma divê mirî li pêşîya herkesî bimeşe. Li mizgeftê dema ku nimêj tê kirin mirî li pêşîya melayî û cemaetê li erdê tê danîn. Heger mirî jin be berê serê wê didin aliyê rojava û heger mêr be berê serê wî didin rojhilat. Cemaet li aliyê serê mirîyî/yê sefên xwe digirin. Dibêjin pêxember gotîye heger sê sef li ser mirîyî/yê nimêj bikin ew mirî teqez tê efûkirin, lewma deh kes jî bin, dibin sê sef û nimêja mirîyî/yê dikin. Jixwe ji bo nimêja mirîyî/yê sînorek tune, yanî du kes jî bin nimêj tê kirin (Ç6; Ç52; Ç64). Li gorî civakê, hejmara beşdarvanên nimêja mirîyî/yê çiqas zêde be, ji bo mirîyî/yê hewqasî baş e û yên ku li ser mirîyî/yê nimêj dikin jî xêreka mezin qezenc dikin û ew jî tîn efûkirin (Ç1; Ç8; Ç10; Ç14; Ç19; Ç22; Ç34).

Piştî sefgirtinê yên amade nêta xwe lê tînin. Ji ber ku ev nimêj her roj nayê kirin tê jibîrkirin. Lewma berî nimêjê mela awayê nêtlêanîn û kirina nimêjê ji cemaetê ra rave dike. Nêta nimêja mirîyî/yê weha ye: “Ya Rebî, ez bi nêt im, ez ferz û kifayeta vî/vê mirîyê/ya ha bikim bi îmametî (heger mela be dê weha bibêje) – tebayî îmam (ji bilî mela yên din dê weha bibêjin).” Nimêja mirîyî/yê şipê tê kirin û tê da rukû û sucde tune, bi tevahî 4 tekbîr in. Piştî tekbîra pêşî sûretê fatîhayê tê xwendin. Piştî tekbîra duwem salewatan li pêxemberî didin. Piştî tekbîra sêyem dia ji mirîyî/yê ra tê kirin (mirov dikare ji xwe ra jî dia bike). Piştî tekbîra çarem jî silav tê dayîn û nimêj tê xelaskirin (Ç6; Ç52; Ç64).

Li cem kurdên êzidî nimêja mirîyî/yê tune. Piştî kefenkirina mirîyan ew mirîyên xwe dibin goristanê û bêyî nimêjê, wan vedişêrin.

### **3.1.8. Birina Goristanê**

Di birina mirîyan ya goristanê da li gorî berê hindek cudahî hene. Berê gelî mirîyên xwe teqez li ser darbestê dikirin û li ser milan dibirin goristanê. Îro jî mirovên ku li malê dimirin, peya jî bibin bi erebeyê jî bibin teqez li ser darbestê

datînin. Berî ku mirîyî/yê deynin ser darbestê lihêfek yan jî betanîyekê li serê rast dikin. Dûvre zembelîşek yan balgihekî biçûk û nû datînin ser û mirîyî/yê tevli kefenê wî/wê li serê dirêj dikin. Betanîyeka sipehî, nû û hîna nehatî bikaranîn bi ser mirîyî/yê dadikin (Ç42; Ç48). Li kêlekên darbestê çinçal hene û piştî ku mirî li serê hat bicihkirin, terîşkan di wan çinçalan ra derbas dikin û mirîyî/yê li ser dişidînin da ku jê da nekeve.

Mirîyên ku ji nexweşxaneyan yan jî ji bajar û dewletan tînin teqez di tabûtan da ne. Bê çawa mirîyên ser darbestê dinixumînin da ku kefenê wan xuya neke herweha tabûtê jî dinixumînin û rût nabin goristanê (Ç8; Ç10; Ç34). Ji bo tiştên ku bi ser darbestê ango tabûtê da dikin li sehayê me zanyarîyên cuda berhevkin. Berî ku ez van zanyarîyan parve bikim ez dixwazim behsa adetên kurdan yên berî 160 salî bikim. Derbareyê vê mijarê da Bazîdî weha nivîsîye:

“Ew mirî heger mêr e, libasekê wî bi qîmet, mesela qaput û kûrk weyaxwo şalê bi biha davêjîne ser cenazeya wî û heger jin e, dîsanê libasekê wê zî qîmet davêjîne ser cenazeyê û dibene qebrê.” (Bazîdî, 2010: 52).

Li gorî ku me ji sehayê berhev kirîye heger ya mirî keçikeka ciwan be, şerpeyek ango yazmayeka (Ç36ê got ku heger di çeyîzê wê da hebe ji wir derdixin) bi gul ya xweşik tavêjin ser darbestê yan jî tabûtê (Ç1; Ç8; Ç26; Ç36). Heger bûk be bûkanîyekî spî tavêjin ser, zarok be betanîyeka zarokan pê da dikin. Yê/ya ku seyid be paçikek yan jî cilikeka kesk tavêjin serê (Ç5; Ç8; Ç10; Ç35). Heger ji aliyê hêzên ewlekarîyê yên dewletê ve di pevçûnê da hatibe kuştin, cilikeka kesk û sor û zer bi tabûta wî/wê dadikin. Ji bo mirîyên din jî yan cilikeka kesk ya ku nivîsa erebî li ser e, yan jî sicadeyekê bi ser darbest û tabûtê da dikin (Ç1; Ç5; Ç8; Ç10; Ç34). Yanî dema ku mirov li darbest yan jî li tabûtê dinêre, derheqê temen, zayend, zewac û statûya yê/ya mirî da fikrek bi yekî ra çêdibe. Ji bo ku bi tabûtê da bikin di erebeyê mirîyan da cilikek heye û dema ku tabûtê dixin hundirê erebeyê wê cilikê tavêjin ser tabûtê. Ji zanyarîyên ku Bazîdî dide me xuya dike ku ev adet ji berê da di nav kurdan da heye û îro li nav kurdên Nisêbînê jî dewam dike.

Goristan dûr baya yan nêzîk baya; erebe hebaya yan nebaya heta berî bi 10-15 salan gelî mirîyên xwe peya û li ser milan dibirin goristanê (Ç8). Hîna jî li gelek

gundên ku goristanên wan nêzîk in, gel mirîyên xwe li ser darbestê datînin û peya dibin goristanê (Ç10; Ç14; Ç15; Ç22; Ç26; Ç34). Mela jî dibêjin û gel jî weha bawer dike ku mirov mirîyên xwe li ser milan bibin goristanê xêrtir e û xêra wê gelekî mezin e (Ç6; Ç52). Lewma li gundan yê ku dibîne mirî hat birin, dev ji hemû karên xwe berdide û piranîya mêr û jinên gundî tevde beşdarî vê rîtûelê dibin û bi hilgirtinê êş û liberketina xwedîyên mirîyî/yê parve dikin. Yê ku beşdar nebe jî teqez radibe ser xwe û heta ku mirî derbas nebe rûnane.

Tê bawerkirin ku, dema ku mirî di ber malekê ra derbas dibe heger li wê malê zarokên razayî hebin divê bên hişyarkirin. Lewra sehwa mirîyan giran e û heger zarokên razayî neyên hişyarkirin, dê giranî bikeve ser wan (Ç19).

Hilgirtîyên darbestê berê serê mirîyî/yê didin pêş û bêyî ku yên dora wan dengê wan bikin di ber xwe da tekbîran tînin û salewatan didin (Ç14; Ç33; Ç34). Li gorî şîretên melayan ne bi bazdanê lê bi meşeka xurt diçin (Ç6). Yê ku kete bin darbestê da, heta ku kesekî din neyê û daxwaza guherîna jê neke, nikare dev jê berde. Hem ji bo ku mirov zêde nebetilin û hem jî ji bo ku xêra gelek mirovan pê bikeve hindeke ku di ber darbestê ra dimeşin serê çend gavan daxwaza guhertinê li yên derdora darbestê dikin (Ç8). Dema ku darbestê dibin, jin jî çend gavan ji mêran dûrtir di pey mirîyî/yê ra dimeşin (Ç4; Ç11; Ç13; Ç32; Ç34; Ç42).

Li gundan pêhisîna mirinê hêsan bû, lê ji ber mezinbûna bajarî xebera mirinê zû nedigihîşt her deverê û herkesî. Ji ber vê yekê dema ku mirî li ser milan dibirin goristanê kesên ku pê nehisîyabûn jî ji mirinê agahdar dibûn. Ji mirovên dora darbestê dihat famkirin bê mirî ji kîjan malbatê ye, dema ku beşdarî hilgirtina darbestê dibûn ji yên dora xwe dipirsîn bê ma kî mirîye. Dikandarên ku darbest didîtin bi qasî çend deqeyan dikanên xwe digirtin û neh-deh gavan diketin bin darbestê û dîsa vedigerîyan dikanên xwe (Ç4; Ç8). Kesên ku diketin bin darbestê, bi dengê nimz û di ber xwe da tekbîr tavêtin û salewat li pêxember tanîn.

Van salên dawî, li bajarî mirîyan nema li ser milan dibin goristanê. Dema ku mirovek dimire, xwedîyên mirîyî/yê li şaredarîyê digerin û erebeyaya mirîyan dixwazin. Şaredarî hem ji gundan ra û hem jî ji nav bajarî ra erebeyên xwe dişîne. Heger erebe nebin li ambûlansê digerin û ew jî mirîyan dibe goristanê. Mirîyên xwe

lê siwar dikin, dibin mizgeftê, nimêjê jî dikin û ji wir dibin goristanê. Dema ku yê/ya mirî bi erebeyê yan jî bi ambûlansê dibin goristanê, xwedî û nasên mirîyî/yê jî bi erebeyên xwe li pey diçin, lê nadin pêşîya erebeya mirîyan. Yanî ev jî dişibe rîtûela ku mirîyan li ser milan dibin goristanê. Li gundan piştî ku mirîyan datînin ser darbestê, wan bi erebeyekê (pîqab, dolmîş, terekto, û hwd.) dibin goristanê.

Yên ku li nexweşxaneyan dimirin yan ji bajar û dewletan tînin, ji bo nimêjê bi erebeya mirîyan yan jî bi ambûlansê dibin mizgeftê û ji wir jî ji bo veşartinê dibin goristanê. Lê berî ku mirîyan bibin mizgeftê, wan li devê derîyê mala wan kêlîkekê disekinînin da ku cara dawî mala xwe bibînin (Ç44; Ç50). Evên ku li nexweşxaneyan yan li bajar û dewletan dimirin ji zû ve ji alîyê xwedîyên xwe ve nehatine dîtin. Ji ber wê yekê jî carna xwedîyên mirîyî/yê qîma xwe bi vê tenê nayînin û tabûtê dixin hundirê malê, dibin odeya mirîyî/yê. Tabûta wî/wê vedikin, yê ku destilmêja wan jê naşike wî/wê maç dikin û yê din jî lê dinêrin. Careka din kîsikê serê wî/wê girê didin û devê tabûta wî girê didin û ji malê derdixin (Ç4; Ç36). Bi wî şertê ku ji usûlê dernexin melayên herêmê dibêjin ev tişt ne guneh e (Ç6; Ç52).

Dema ku mirîyan bi balafirê ji bajaran yan ji Ewropa tînin, xwedîyên wan bi çend erebeyan diçin balafirgehê û mirîyên xwe bi erebeya mirîyan tînin (Ç14; Ç26; Ç34; Ç37). Erebeyên dost û xwedîyan jî li ser rêyê, li cihekî guncaw li hêviya erebeyê dimînin. Dema ku erebe giha cem wan, ew jî didin dû erebeyê. Mirovên din jî li mala mirîyî/yê yan jî li dora mizgefta gundî, heger li bajarî be li dora mizgefta nêzîkî mala mirîyî/yê disekinînin. Yê feqîr bin yan yê ku balafir bi dest wan nekeve, mirîyên xwe yan bi erebeya mirîyan yan jî bi ambûlansê ji bajaran tînin.

Êzîdîyên Nisêbînê hemû li gundan dijîn. Wan jî berê mirîyên xwe bi darbestê û li ser milan dibirin goristanê. Lê îro ew jî bi erebeya mirîyan, ambûlans û terekto dibin. Dema ku êzîdîyek dimire xwedîyên wî/wê yê li Ewropa jî tên û 40-50 erebe li dû erebeya mirîyan diçin. Erebeyên din nadin pêşîya erebeya mirîyan lê erebeya ku kameravan têda ye carna dide pêşîya erebeya mirîyan jî. Lewra rîtûela veşartinê ji serî heta dawî dikişînin kamerayê û ji xwedîyên mirîyî/yê yê li Ewropayê ra dişînin. Berê, berî ku darbestê hilgirin ser milên xwe, li erdê sê caran bi qasî noqê radikirin û datanîn erdê. Îro jî berî ku li erebeyê siwar bikin heman tiştî dikin. Dema ku darbestê yan tabûtê li goristanê dadixin, bi derbekê ra danaxin erdê û

dîsa sê caran radikin û dadixin. Dibêjin li gorî ola me mirî pir bi qîmet in û ji bo vî qîmetî em mirîyên xwe bi carekê ra danaxin erdê û em bi vî awayî qedrê wan digirin. Di dema rakirin û danîna sê caran da gotinên weke “Ya Allah û ya Xwedê”, “Ya bi izna Xwedê û Tawisî Melek” û “Holhola Tawisî Melek”<sup>\*</sup> dibêjin (Ç27).

Gundîyên ku mirîyên xwe li ser milan dibin goristanê jî digotin ku “Heger goristana gundê me dûr baya me yê jî mirîyên xwe bi erebeyan biribane.” (Ç10; Ç14; Ç15; Ç19; Ç26). Mela dibêjin ku mirov li ber xêrên gelî nebe asteng baştir e (Ç6; Ç52; Ç64), lê ji ber daxwaz û israra civakê nikarin xwe li ber guherîna ragirin. Jixwe van salên dawî mela jî dibêjin heger goristan dûr be ji bo ku gel nebetile mirov mirîyên xwe bi erebeyekê bibe baştir e. Yanî herçiqas li gorî melayan xêra wan zêde be jî, gel di hin tiştan da li rehetî, tenduristî û aborîya xwe dinêre û adetinan li gorî rewş û pêdivîyên xwe diguhere. Yanî daxwaza guhertinê ji gelî tê, di serî da alimên olê hindekî li ber xwe didin, lê dema dibînin ku rê jê naçe fitûyekê dibînin û rê li ber guhertinê vedikin.

Li jor me got ku di rîtûelên êzidiyan da erebeya ku kamera têda ye dide pêşîya erebeya mirîyan û konvoyê dikişînin kamerayê. Herçiqas li cem êzidiyan mirî gelekî hêja ye jî erebeya kamerayê dide pêşîya erebeya mirîyan. Kes jî vî tiştî rexne nake û ev tişt betal jî nabe. Lewra li bajaran û li Ewropayê xwedîyên mirîyan yên ku nikarin beşdarî vê rîtûelê bibin hene. Ji bo ku herkes bikaribe rîtûelê temaşe bike ev tişt tê kirin. Digel ku ev tişt îro li cem kurdên êzidî tiştêkî ji rêzê ye jî, li cem kurdên misilman ev ne tiştêkî guncaw e. Yanî her civak li gorî şertên xwe yên taybet hêdî yan xurt di adetên xwe da guhertinan çêdikin.

Birina wan kesên ku ji alîyê hêzên ewlekarîyê yên dewletê ve, di pevçûnê da tînin kuştin hindekî cuda ye. Ev kes bi piranî li ser darbestê tînin birin û di kortêjê da jî jin li dû mêran dimeşin. Lê sînorekî teqez di navbera jin û mêran da tune ye û dikare bê gotin ku gelek caran tevlihev in. Heta carna darbest tenê ji alîyê jinan ve tê hilgirtin. Wêneyê mirîyî/yê di destê wan da ye û bi rê da dirûşman tavêjin, dilîlînin, li çepikan dixin û sirûdan dixwînin. Ev tişt ji alîyê gel ve jî zêde balkêş nayê dîtin û

---

<sup>\*</sup> Em hemû yên Tawisî Melek in.

rexne lê nayên girtin. Divê bê gotin ku piştî bûyerên ku di sala 2016an da qewimîn hêzên ewlekariyê rê nadin ku laşê wan li ser darbestê û bi girseyî bê birin.

### **3.1.9. Veşartin**

Heta ku ji xwedîyên mirîyî/yê tê, hewl didin ku beşdarî merasîma veşartinê bibin. Lewra xwedîyên mirîyî/yê di wê kêlikê da dixwazin hemû xwedî û dostên xwe li gel xwe bibînin û bi gotineka herêmî tê gotin ku “çavê me li wan gerîya”.

Ji ber ku cudahîyên mezin di navbera rîtûelên veşartinê yên kurdên misilman û kurdên êzidî da hene ev mijar dê bi du binbeşan bê vegotin.

#### **3.1.9.1. Rîtûela Veşartinê ya Kurdên Misilman**

Bi bûyera mirinê ra xwedîyên mirîyî/yê bi destan yanî bi bêr û biviran yan jî bi kepeçyê gorê didin kolan. Berî ku mirîyî/yê bînin goristanê gor tê amadekirin, di binê gorê da rêzek yan du rêz pirîkêt tîn danîn û cihê mirîyî/yê di gorê da tê çêkirin. Heger erda gorê hişk be piştî ku gor hat kolan ji dêvla ku pirîkêtan deynin bi qasî ku laşê mirîyî/yê tenê bikevîyê, hindekî din tê kolan û cihê mirîyî/yê tê çêkirin (Ç15; Ç19). Ev tişt bêtir li gundên çiyayî tê dîtin, lewra axa wan deran piştî metreyekê teht e yan jî pir hişk e.

Li herêmê, misilman bi piranî mirîyên xwe bê tabût vedişêrin. Berê digotin sinet e ku jin bi tabûtê bîn veşartin, lewma gelek caran jin bi tabût dihatin veşartin lê îro ne ku qewêtiya yê/ya mirî hebe tu kes tevî tabûtê nayê veşartin. Li gorî zanyariyên ku Bazîdî dide me jin bê tabût nedihatîn veşartin û mêr jî heger dewlemend bane bi tabût û heger feqîr bane bê tabût dihatin veşartin (Bazîdî, 2010: 77). Ç15ê got “Tabût li wê dinyayê bargiranî ye û dê mirî li wir tabûta xwe li ser serê xwe hilgire.” Dema ku laşê mirîyî/yê parçe bûbe, bêhn pê ketibe, bi awayekî xwîna wî/wê nesekinîbe hingî mêr be jin be ferq nake, mirî tevî tabûtê tê veşartin (Ç10; Ç17). Weke berî niha ku me behsa wê kiribû ji bilî cewaba mirîyî/yê, heqîqetên jinan û gustîlkên jinan ku jixwe ev jî tiştên îstîsnayî ne ji kefen pêve tişteki bi mirîyan ra venaşêrin.

Piştî ku mirov li goristanê kom bûn û peya yan jî bi erebeyê mirî anîn goristanê, rîtûela veşartinê dest pê dike. Divê bê gotin ku birêvebirina rîtûela veşartinê di destê melayî da ye û xwedîyên mirîyan teqez melayekî jî bi xwe ra dibin goristanê. Lewra mela li gorî mirovên din bêtir beşdarî rîtûelên veşartinê bûye yanî xwedî tecrîbe ye û hem jî piranîya tiştên ku li wir tên kirin li gorî rêgezên olî ne. Mêr hemû li dora gorê cihê xwe digirin, lê jin hindekî dûrî gorê disekin. Heger goristan mezin be di nav goristanê da li derekê disekin, lê heger goristan biçûk be, li derveyî goristanê bêdeng disekin (Ç5; Ç42; Ç51). Heger bigirîn jî, di ber xwe da digirîn da ku dengê wan neçe mêran. Dema ku me sedema vî tiştî pirsî çavkanîyan got ku ev ji ber qedexeya ola îslamê ye (Ç4; Ç6; Ç22). Lewra gotin ku li gorî şerîetê divê jin û mêrên xerîb neyên bal hevûdin. Sebebeka din jî, ji ber ku jin dikin hawar û qêrîn mela dê nikaribe bi rehetî telqîna xwe bixwîne. Lewma jî dibêjin heye mirî bersivên xwe xweş nede û biçê cehenemê (Ç19; Ç53). Ji bo ku mirîyên wan neçin cehenemê jin jî ji bo hatina ser gorê zêde israr nakin. Lê carna berî ku mirîyî/yê daxin gorê hin jinên xwedîyên mirîyî/yê (xweh, keç, dê) zêde laveyan ji mêran dikin da ku cara dawî mirîyên xwe bibînin. Gelek caran jî bi destûra melayî rê didin û jin tên li rûyê mirîyî/yê dinêrin (Ç9; Ç22; Ç24).

Darbestê yan jî tabûtê li cem gorê, bi piranî jî li rojhilatê gorê datînin erdê (Ç6). Heger hebin, hêdîka li ser çend pirîkêtan datînin. Heger mirî jin be, desmalekê yan şaşîkekê dixin bin lingê wê, yekê dixin bin noqa wê û yekê jî dixin bin sînga wê û bi alîkarîya hevûdin wê dadixin gorê (Ç8; Ç37). Li gundinan berî ku jinê ji tabûtê yan ji nav betanîyê derxin, ji bo ku yê xerîb wê nebînin çend kes betanîyekê yan perdeyekê li dora wê dipêçin (Ç15; Ç19). Berî ku mirîyê daxînin gorê, çend kesên ku jê bidestilmêj nakevin dadikevin gorê û bi alîkarîya hevûdin wê dadixin cihê wê. Heger yê mirî mêr be pêdivî bi tiştêkî weha nayê ditîn (Ç1; Ç3; Ç7). Dema ku yê/ya mirî dadixin gorê, wî/wê li ser kêleka rastê datînin û berê wî/wê didin qubletê. Lewma berê serê mirîyî/yê li rojava ye, berê lingê wî/wê li rojhilat e. Ji ber ku gorên misilmanan li gorî ku mirî bi alîyê rojava-rojhilat ve bînin dirêjkirin tên kolan. Di gorê da tevî girêkên din girêka serî jî vedikin (terîşkan dernaxin), kevîrekî pahn û biçûk dixin bin rûyê wan (carna kulmek ax jî dixin bin rûyê mirîyan) û careka din kefenê wan bi wan da dikin, lê girê nadin. Jixwe sebaba vekirina girêka serî ew e ku, bi çavê xwe bibînin ku berê mirîyî/yê li qublet e û dilê xwe bikin cih (Ç6; Ç10; Ç24; Ç52).

Heger mirî di tabûtê da bê veşartin wê demê devê tabûtê tê vekirin, di hundirê tabûtê da heman tiştên kirin û dîsa devê tabûtê tê girtin.

Heger di kolana gorê da hestîyên hin mirîyên din derkevin, wan hestîyan didin hev, dixin naylonekê yan kîsîkekî û piştî ku mirîyê/ya nû bi cih kirin, wî kîsîkî datînin kêlekê û careka din vedişêrin (Ç5; Ç21; Ç22).

Piştî bicihkirina mirîyî/yê, dor tê nixumandina gorê. Ç19ê got ku berê kê kevîrê li gorî gorê li deverêkê dîtibaya tanî nav goristanê û ji kê ra lazim bûbaya, ew kevîr bi kar tanî. Dûvre pirîkê derketin û mirovan bi pirîkêtan ser mirîyên xwe girtin û îro jî ji bo vî karî gel ferşên betonî bi kar tîne (Ç5; Ç7). Piştî ku ferş danîn, li gundinan naylonekê bi ser ferşan da dîkin, li deverinan jî qulikên di navbera ferşan da bi herîyê digirin da ku ax nekeve ser mirîyên wan. Berî ku bi bêrê ax bê avêtin mela 2-3 kulm ax bi hundirê gorê da werdike û bi vê werkirinê ra weha dibêje: “Xwedê dibêje me hûn ji vê madenê xuliqandine, em ê we vegeîrin vê madena axê û careke dî ya talî jî em ê we ji vê axê derxînin” (Ç6). Dûvre mîrên dora gorê bi bêran pêşî hêdî hêdî, dûvre xwe xurt dîkin û axa dora gorê tavêjin hundirê wê. Ji bo ku li gorî bawerîyê ev xêreka mezin e, mîr bêran ji dest hevûdin digirin û bêyî ku tu kes bibetile hemû dora xwe dîkin. Berê li gundinan gelî mirîyên xwe bergor dîkin. Yanî pêşî gor dikolan, dûvre di binê gorê da bi qasî ku mirî bikevîyê da, ber bi qublet ve weke qubaleyekê çêdîkin û mirîyên xwe dixistin wê derê. Piştî ku mirîyên xwe dixistinê ew qubale bi kelpîçan yan jî bi kevîran digirtin û gora ku vala dima jî bi axê dadigirtin. Ji vê ra bergorkirin yan jî bergorkirin dihate gotin (Ç10; Ç14; Ç15).

Weke ku li jor hat gotin, van salên dawî gor bêtir bi kepçeyê tînin kolan. Heger goristan li serê girîkekî be û kepçe nikaribe bikeve nav goristanê, wê demê ji neçarî gor bi destan tînin kolan. Herçiqas ji aliyê melayan ve tê gotin ku xêra kolana goran gelekî mezin e jî gel ji bo kolana goran ya bi kepçeyê pir kêfxweş e. Lê heman kêfxweşî ji bo nixumandina gorê ya bi kepçeyê nayê dîtin, heta rêjeyeka mezin ya gelî ji vî tiştî gelekî aciz e. Gelek kes xwe ji mela û aliman aciz dîkin û dibêjin “Ev sûncê alima ye, heke melayan rê nedabana xelkê û fitû dernexistibana, tu kesî nikarîbû ji ber xwe ve ev tişt kiriba” (Ç8; Ç36).



Bi nixumandina gorê ra êdî dor tê edilandina wê. Dora gorê bi pirîkêtan tê pêçan, ji bo kêla gorê jî du pirîkê li ber serê mirîyî/yê tîk tîn rakirin. Dûvre rêzek kevirên biçûk ji ber serê mirîyî/yê heta ber lingê wî/wê li ser gorê tîn danîn û ji bo ku axa gorê belav nebe bi misînekî hindek av lê tê reşandin. Rêzkirina kevirên biçûk li her devera herêmê hat dîtin lê sedema danîna wan keviran ji aliyê gelek kesan ve nedihat zanîn (Ç5; Ç13; Ç15; Ç22; Ç24; Ç31). Di vê bareyê da agahiyên ku ji sehayê hatin berhevkerin weha ne:

“Her kevirê ku tê danîn sûretê îxlasê pêra tê xwendin. Ji ber zêdebûna mirovên li dora gorê, zêdebûna keviran nabê zehmetî. Ji ber ku heryek ji wan carekê vî sûretî bixwîne têra hemû keviran dikê. Ji vî tiştî ra tesbîh tê gotin û ew rêza keviran jî ji dêvla tizbehan tê bikaranîn.” (Ç8; Ç19).

Hindekan jî gotin pêxember weha kirîye, lewma jî gel van keviran li ser gorê rêz dikin.

Di hin rîtûelên li goristanê da xwedîyên mirîyî/yê fotografekî mirîyî/yê yê biçûk bi sînga xwe ve dikin (Ç1). Ev tiştên weha van salên dawî derketine û di kêmerasîman da tîn dîtin.

### **3.1.9.2. Rîtûela Veşartinê ya Kurdên Êzidî**

Berê gorên êzidîyan bi destan dihatin kolan lê îro yên wan jî bi kepçeyê tîn kolan. Gor bi qasî bilindahîya sînga mirovekî tê kûrkirin. Berî ku yê/ya mirî bibin goristanê gor tê kolan, qûm, çemento û bist tîn amadekirin (Ç27). Piştî kolanê, di hundirê gorê da ji binî ve, her çar aliyên gorê heta serî weke xanîyekî bê ban û bi qasî ku tenê tabût bikevîyê da fereh û dirêj, bi pirîkêtan tê lêkirin. Heger erda gorê hişk be yan jî kevir be pirîkêtan nayên danîn.

Dema ku erebeya mirîyan dikeve nav goristanê çî mêr çî jin hemû mirovên wir ber bi erebeyê ve diçin. Dema ku derîyê erebeyê tê vekirin û tabût tê daxistin jinên ku heta hingî li goristanê bêdeng sekinîbûn bi derbekê ra dest bi lîlandin, girî û diloyan dikin. Di ber lîlandinê ra mêrin jê sîlehan berdidin. “Dema ku yekî bi heyf û bi qîmet dimirê li nav goristanê sîleh tîn berdand. Sîleha kê hebê, kî dil bihêlê û kî

qedir bidê mirîyê/ya me sîlehê berdidê.” (Ç28). Dema ku em çûm nav goristanên wan, li nav goran gelek fîşekên vala hatin dîtin.

Êzidîyan berê mirîyên xwe bê tabût vedişartin. Dema ku laşê mirîyî/yê dadixin gorê divê birayê axretê li wir amade be. Jin jî dikarin bibin xweha axretê û herweha dikarin birayê axretê jî ji xwe ra bigirin. Xweha axretê yan birayê axretê ji yekî/ê zêdetir çênabe (Ç28). Heger di saxîfîya xwe da derfet nedîtîbin ku li hevûdin helal bikin divê li ser gorê yê/ya sax li yê/ya mirî helal bike. Li cem êzidîyan jin be, mêr be hewce nake ku xwedîyên wê/wî, mirîyî/yê daxin gorê. Piştî ku daxistin gorê, heger mirî mêr be şêx û heger jin be jî jina şêx girêka serê mirîyî/yê vedike. Heger şêx nebe birayê axretê jî dikare girêka serî veke (Ç29; Ç30). Tenê girêk tê vekirin lê serê mirîyî/yê ji hundirê kefen nayê derxistin yanî nahêlin ku serê mirîyî/yê xuya bike. Berê gorên êzidîyan jî weke yên misilmanan ber bi rojava-rojhilat ve ye. Dema ku mirîyan di gorê da dirêj dikin berê serê wan li rojava ye û berê lingên wan jî li rojhilat e. Mirîyên xwe li ser piştê dirêj dikin û balgihekî dixin bin serê wan, da ku berê rûyê wan bikeve rojhilat (Ç27; Ç28; Ç29).

Dema ku jin dimirin kezîyên wan dihûnin, dikin bin serê wan û weha di gorê da yan di tabûtê da dirêj dikin. Dema ku bûkek yan jineka nûzewicî dimire bûkanîya wê û hemû tiştên wê yên biqîmet datînin ser sînga wê û tevlî wan tiştan wê vedişêrin. Carna jî ji dêvla zêran kareba (morîkên xweşik in, dişibin heqîqetên ku berê dixistin stûyê jinên misilmanan) dixistin stukra jinan da. Heger jin di tabûtê da veşartibane ev tişt dixistin hundirê tabûta wê. Berê zêr û tiştên wan jî bi wan ra dixistin gorê, lê îro dibêjin ji dêvla ku em tiştên wan bixin gorê, em didin xêra wan û weha çêtir e (Ç28; Ç29). Ç30î got ku îro nema tu tiştî dixin gorê û di vê guhertinê da bandora şêx û pîrên wan tuneye.

Li gorî hevpeyvîna ku Guest bi pêşengên ola êzdayetîyê yên li Şengalê ra kirîye êzidî mirîyên xwe bê tabût vedişêrin lê li cem êzidîyên Nisêbînê rewş cuda ye (Guest, 2012: 371). Herçiqas berê ji feqîrî û belengazî mirîyên wan bê tabût dihatin veşartin jî îro jin jî be û mêr jî be mirîyên êzidîyan bê tabût nayên veşartin (Ç29).

Tabûtê ji erebeyê derdixin û li cem gora kolayî datînin. Lê tabûtê ne bi derbekê da datînin, sê caran datînin û radikin. Ji ya misilmanan cudatir jin û mêr

hemû li dora gorê kom dibin û jinên wan bi dengê bilind û bê navber digirîn û tavêjin ser mirîyî/yê (Ç27; Ç28). Şelîtan bi çinçalên tabûtê ve dikin, heryek ji wan bi şelîtekê digire û tabûtê dadixin hundirê gorê. Weke ya misilmanan tu kes danakeve gorê lewra di gorê da ji cihê tabûtê pêve cihê tu tiştî tune. Dema ku tabûtê dadixin gorê, dîsa jin dilîlîyênin û mêr sîlehan berdidin. Piştî daxistina tabûtê bi bêran axê tavêjin ser tabûtê, heta ku tabût nema xuya dike, hindê jê jî axê naavêjin ser. Ferşên betonî yê ku ji bajarî dikirin û tînin, li ser tabûtê datînin (Ç29). Dûvre qalib li ser gorê rast dikin û bi bêran xercê tavêjin ser ferşan û di heman demê da çend bistan jî li ser ferşan dirêj dikin da ku gor saxlem çêbibe. Armanca din jî vê saxlebûnê ew e ku rê li ber vekirina goran bê girtin. Bi vî awayî nixumandina gorê ji bo wê rojê xelas dibe, heta ku gor qenc rûdine jî nû ve gora xwe çêdikin û bilind dikin.

Rîtûela veşartinê jî ji alîyê kameravanê ku xwedîyên mirîyî/yê ew anîne ve tê kişandin. Li goristanê carna fotografê mirîyî/yê di destê xwedîyên wî/wê da ne. Bi vî awayî hem dixwazîna rêzgirtina xwe ya ji bo mirîyî/yê nîşan bidin û hem jî da ku mêvanên hatî, yê/ya mirî nas bikin. Kesên ku nikarin beşdarî rîtûela veşartinê bibin (yên li Ewropa, yê li bajarên, yê jî bo beşdarîyê ne guncaw in) çelengan dişînin goristanê. Ji nivîsên li ser çelengan du nimûne li jêr in:

“Rehma Xwedê lê bê!”

“Tu ne li cem me yî, her tim dilê me da yî!”\*

Girtina wêneyê mirîyan ya di destan da û şandina çelengan ya nav goristanê ne adeteka kevin e. Ev weke adeteka ewropayîyan xuya dike û ji ber ku piraniya êzidiyan li Ewropayê dijîn, di bin bandora wan da mane û ev adetên wan anîne gundên xwe jî.

Li gorî berê îro xwedîyên mirîyî/yê ji bo guhastina mirîyî/yê ya goristanê, ji bo kolana gorê û ji bo veşartinê li xwe namînin heyirî. Lewra şaredariya bajarî ji bo van pêdivîyan alîkarîyê bi gelî ra dike û erebeyên mirîyan û kepçeyên xwe bi wan ve dişîne. Berê mirovan ferş û pirîkêten gorê bi pereyên xwe dikirîn, lê îro şaredarî van tiştan jî bêpere ji gelî ra dişîne. Lê bi qasî ku me lê kola şaredarî vê xizmetê tenê ji bo

---

\* Ji vîdyoyên rûpelê Goristanê Hesên Begê yê facebookê hatin girtin.

misilmanan dike û êzidî ferşên gorê bi pereyan dikirin. Ç50î derbareyê vê mijarê da ev agahî dan me: “Şaredarî ferşên êzidiyan ji wan ra nabê, ew bi pereyên xwe ferşan dikirin û ew tîrbên xwe jî bi heq dikolin.” Li gorî agahiyên ku rêvebirê şaredariyê Ç61 dan me, heger hindêk bixwazin, şaredarî melayê xwe yê xwedî kadro bi wan ve dişîne da ku karê şuştina mirîyî/yê û xwendina telqînê pêk bînin. Lê li sehayê haya kesên ku me bi wan ra hevdişîn pêk anî ji melayê şaredariyê tunebû.

Li gorî zanyariyên ku Jones dide li deverinan, ji ber bawerîya hebûna dinyayeka din, alavên ku mirovan li vê dinyayê bi kar tanîn, piştî mirina wan bi wan ra dihatin veşartin (Jones, 2014: 14). Dikare bê gotin ku veşartina alav ango tiştinan ya bi mirîyan ra li nav kurdan jî tê dîtin. Sağır di vê bareyê da dibêje alewîyên Pazarcîkê (kurd in) dema ku mirîyên xwe vedişêrin, li gorî demsalê alavên weke betanî, merş, bûkanî, û hwd. jî bi wan ra dixin gorê (Sağır, 2017: 189). Herweha di lêkolînên me da hat dîtin ku berê ev adet li nav kurdên êzidî yên li Nisêbînê jî hebû. Herçiqas ne weke yên êzidî jî be di nav yên misilman da jî tiştêkî weha dihat dîtin. Em dikarin veşartina heqîqetên jinan, kaxeta cewabê, hungulîska hecê, û hwd. weke nimûne bibêjin. Lê îro hem li cem kurdên misilman û hem jî li cem kurdên êzidî ev adet ji holê rabûye.

Merasîma veşartinê ya wan kesên ku ji aliyê hêzên ewlekarîyê yên dewletê ve di pevçûnê da tînin kuştin ji yên din cudatir e. Piştî veşartinê, xwedîyên mirîyî/yê û hindêk kesên ku endamên partî û sazîyên sîvîl in diaxivin. Dirûşm tînin avêtin, sirûd tînin xwendin û herweha rêzgirtin jî heye. Yanî ji bilî adet û rîtûelên olî, gelek rîtûelên dinyayî ango îdeolojîk jî tînin kirin. Van salên dawî hêzên ewlekarîyê rê nadin ku ev kes bi girseyî bînin veşartin. Merasîma wan, tenê bi çend xwedîyên mirîyî/yê tê kirin.

### **3.1.10.Xwendina Telqînê**

Li gorî bawerîyê piştî ku mirî di gorê da hat bicihkirin û cemaet ji ser gorê belav bû milyaket dadikevin cem yê/ya mirî û derheqê îmanê da pirsan jê dikin. Bi xwendina telqînê ku bersivên hemû pirsên milyaketan têda heye, alîkarîya mirîyan tê kirin. Hemû mîr radibin ser xwe, li dora gorê kom dibin, destên xwe li ber xwe datînin ser hev. Jin jî li cihê ku lê sekinîne radibin ser xwe. Mela li aliyê qubletê gorê, li ber serê mirîyî/yê rûdine û dest bi xwendina telqînê dike. Berê telqîn bi erebî

dihat xwendin lê van salên dawî bi piranî piştî çend gotinên erebî, bi kurdî tê xwendin (Ç7; Ç14; Ç22; Ç41). Di telqînê da bi navê dêya mirîyî/yê tê bangkirin. Telqîna kurdên misilman di Pêvek-2yê da hatîye pêşkêşkirin.

Bi kelasbûna telqînê ra mela dibêje “Li ser rihê pêxember aleyhisselam, li ser rihê mirîyên misilmanan tevde, li ser rihê mirîyî/yê el-fatîha” û mirovên li goristanê hemû destê xwe vedikin û di ber xwe da sûretê fatîhayê dixwînin (Ç6; Ç52).

Li her dera Nisêbînê nebe jî li deverinan berî ku mirov ji ser gorê veqetin mela yan jî xwedîyên mirîyî/yê ji cemaeta hazir ra dibêjin “Rehmel bavê we, Xwedê ji we razî bê taba xwe lê helal kin.” Ev helalkirin tenê ji bo keda wê rojê ye, lewma mirovan dev ji karên xwe berdane û hatine ser gorê, li ber germê yan jî sermayê sekinîne, hindekan gor kolane, hindekan mirî şuştine, bi bêrê ax avêtine gorê û gor serast kirine. Dema ku mela wê gotinê dibêje van tiştan li ber çavan digire (Ç41; Ç26; Ç31). Lê li herêmê li deverinan jî mela pirsê “Di heqê vî mirovî da hûn çi dibêjin, mirovekî çawa bû?” ji cemaetê dikin. Ç14 û Ç15ê li ser vê mijarê ev agahî dan me:

“Mela dibêje, hûn di heqê vî mirovî da çi dibêjin, mirovekî çawa bû, heqê kê lê hebê bera bêje em ê heqê wan bidin. Zarokên mirî jî dibêjin heqê kê li bavê me hebê bera bêjin em ê bidinê. Li gorî wicdanê xwe û li gorî emelê wî, mirov dibêjin: Rehma Xwedê lê bê, mirovekî cirxweş bû, ne zîyanok bû, ne fenok bû, ne bêbext bû, ne talibheram bû, seb li cem tunebû, ehlê taetê bû, cîrantîya wî xweş bû, heqê kesî ji me di stûyê wî da tune ye, yê kê hebê em rica dikin wî efû bikin, heqê xwe lê helal bikin.”

Berê piranîya melayên gundan yên zikatê bûn û ev pirs nedihat pirsîn. Lê ev çend sal in ku melayê xwedî kadro ji rojavayê Tirkîyeyê tên û li bajarî û li gundên Nisêbînê dixebitin. Ev mela ji mezhebê hanîfî ne û ev pirsê navborî jî di wî/wê mezhebî da tê pirsîn. Bi qasî ku me tesbît kir eva ku li kêm gundan ev pirsê tê kirin jî ber bandora melayên hanîfî ye.

Li gorî bawerîyê piştî ku cemaet ji ser gorê çû, wê kêlikê ferîşte dadikevin û dest bi pirsan dikin. Heta di nav gelî da bawerîyeka weha heye:

“Yê/ya mirî nizanê ku ew mirîye û di çaxê veşartinê da rihê wî/wê jî di nav cemaetê da ye. Dibêjin piştî ku cemaet belav bû, yê/ya mirî jî dikê ku rabê û herê, lê serê wî/wê li ferşan dikevê û nikarê rabê. Dibêjin jinûve fêm dikê û dibêjê: Wîî wele yê/ya mirî ez im û ditirsê û diricifê.” (Ç1; Ç10; Ç15; Ç48).

Ji bo ku mirî netirse û di bersivên xwe da şaş nebe mela ji xwedîyên mirîyî/yê dixwaze ku mêrek dido heta panzdeh deqeyan - niv saetê li ser gorê bisekinin û diayê tesbîte bixwînin. Diayê tesbîte weha ye: “Ya Rebbî, tu wî/wê di cewaba wî/wê da sabît bihêle, ya Rebbî tu wî/wê bi rastî bide xebardan.” (Ç6; Ç37). Dîsa tê gotin ku di dema pirsên ferîşteyan da şeytan li hemberî mirîyan disekine û dema ku ferîşte jê dipirsin bê ma rebbê te kî ye, dibêjin şeytan tilîka xwe bi xwe ve dike û dixwaze yê/ya mirî bixapîne (Ç6; Ç52).

Kurdên êzidî jî piştî nixumandina gorê, telqînê (ew dibêjin telqîn û asîn) dixwînin. Heger şêx hazir be dixwîne û heger ne hazir be telqîn nayê xwendin (Ç28; Ç29; Ç30). Digel xwendina telqînê, herweha qewlên wan jî hene û şêx carna qewlekî jî dibêjin. Divê bê gotin ku hemû telqîn û qewlên êzidîyan bi kurdî ne. Dema ku telqîn û qewlên xwendin jin û mîrên li dora gorê kombûyî şîpê disekinin û destên xwe li ber xwe datînin ser hev (Ç27; Ç30). Ji ber ku li Nisêbîn û gundên wê şêxên êzidîyan nemane ew derfeta ku em telqîn û qewlên wan ji çavkanîyan berhev bikin bi dest me neket. Lewma me nimûneyek bi navê “Telqîna Êzidîyan” ji kovara Hawarê wergirt. Ev telqîn weha ye:

“Mirid, keso! Ser te dar e, bin te dar e. Wê beye ser te melek Ezraîl û Cebraîl e. Wê ji te bike pirs û sewal e. Nebe nebe, tu jê bikî fikar e.

Mirid, keso! Telqîn e, asîn e. Wê beye ser te nikl û nikîn e. Wê pirs bike, bêje: tu ji kîjan dîn e. Tu bêje ez î êzdî me, bi şêx û bi feqîr û merebî me. Şêxê min şêx Adî ye, melek Ferxedîn, melek Secadîn e, Şêxê Xemsanîya, şêxê Şêxisna, şêxê Ebûbekra ye, şêxê Şêteriqa ye; her du kurên Sitîya Zîn e. Li ser kanîya sipî rûniştî ne, hec û tewafa mîrê êzdî ne.

Mirid, keso! Telqîn e, asîn e. Wê beye ser te nikl û nikîn e. Wê pirs bikê, bêjê tu ji kîjan dîn e. Tu bêje ez î êzdî me. Bi Mûsa pêxember ra derketime serê Çîya Tûresîn e. Bi Îsa pêxember ra çûme Quds û Xelîl e. Bi Mihemed pêxember ra çûme Meke û Medîne.

Mirid, keso! Ser te kevir e, bin te kevir e. Wê beye ser te melek Ezraîl û Cebraîl e. Deyne ber wan Mishefa-reş û nan û penîr e. Heger pê qaîl ne bûn, rabe bi gopalê feqîr e.

Mirid, keso! Ewil bi dev bû, paşî wê bibe bi ev. Wê rabê Madî, wê hilinê bang û selawatê, wê xirab bikê dêr û mizgeft û qadî; û kesek ne bejê bi Îsa û Mûsa û Mihemed. Gel wê bibêjê bi siltan Êzî û siltan şêx Adî.

Amîn, amîn Xwedê arîkarê dîn.” (Feqîrê Telqînbej, 1998).

Wekî ku li jor hat gotin êzidî rîtûela veşartinê ji serî heta dawî dixin kamerayê. Di vîdyoyeka ku li Goristana Hesên Begê ya gundê Mezrika Mihoka hatî kişandin da, ji aliyê şêxekî êzidîyan ve qewlek tê gotin. Di dema xwendinê da yên li dora gorê destê xwe datînin ser hev û li şêx guhdarî dikin. Şêx di serî da çend gotinan dike û dûvre dest bi qewlê xwe dike. Divê bê gotin ku qewlên êzidîyan bi rîtm û awaz in. Destpêka axaftina şêxî weha ye:

“Hûn bi xêr û silamet hatin, hûn li ser çava hatin,

Rabil alemîn xizmeta we qebûl bike,

Û aveke rehmê dilê malbata wa jî bike,

Xwedê û Tawisî Melek hêvî bike,

Em ê xêra navê Xwedê Şêx Hadî qewlekî bêjin,

Me hêvî heye hûn îxtirama qewlê Xwedê bigrin,

Ilmê Xwedê wextê hate gotin.”

Piştî vê pêşkêşê şêx dest bi xwendina qewlê xwe dike û em dê di Pêvek-3yê da cih bidin vî qewlî. Ev qewl pir dirêj e û ji ber ku dengê vîdyoyê ne safî ye me nikarîbû hemûyî tomar bikin. Ev qewl dişibe yê “Qewlê Seremergê” (ji vî qewlî ra carna telqîn û asîn jî tê gotin) lê divê bê gotin ku gelek cudahî jî di navbera van herdu qewlan da hene (Kreyenbroek & Reşow, 2011: 582). Ev qewl ji çêbûna mirovan heta hesabdayîna di gorê da, hemû jîyana wan vedibêje. Berî ku mirov ji ser gorê belav bibin yek ji xwedîyên mirîyî/yê spasîyên xwe pêşkêşî mêvanan dike û navê cihê sersaxîyê dibêje, heger xwarin bê dayîn cihê wê jî dibêje.

Telqîn ne bi vî navî û bi heman awa û fonksîyonê jî be di gelek olan û gelek civakan da tê dîtin. Weke ku Bazîdî jî vedibêje ev adet ji berê da di nav civaka kurdî da tê dîtin (Bazîdî, 2010: 77).

## 3.2.RÎTÛELÊN PIŞTÎ VEŞARTINÊ

Piştî veşartina mirîyan her civak li gorî bawerî û mercên civakî ji bo mirîyên xwe hindek rîtûel û merasîman pêk tîne. Di vê beşê da em dê behsa wan bikin.

### 3.2.1.Genim Hejandin

Ji bo nimêj û rojîyên ku li mirîyî/yê çûne û derewên ku kirine bên efûkirin, li herêmê genim tê hejandin. Ji bo vê rîtûelê *genim daleqandin* jî tê gotin. Dibêjin berî ku mirî bê veşartin genimê wî/wê bê dayîn baştir e, lewra heger barê mirîyî/yê yên giran hebin, da bi vî awayî barê wî/wê bê sivikkirin û tevî wan gunehan nekeve hesabî da (Ç1; Ç64). Sedema hejandinê jî ew e ku, heye qeweta xwedîyên mirîyî/yê negihê ku têra gunehên wî/wê genim bidin. Ji ber wê yekê du kes li hember hevûdin disekin û genim didin û distînin û bi vî awayî dihêlin ku ew genim têra gunehê mirîyî/yê bike. Ji bo hejandina genim Güneç di pirtûka xwe da dibêje ev weke listikeka bi hîle ye û ola îslamê vê rîtûelê hîç qebûl nake (Güneç: 196). Serokatîya Karûbarên Dîyanetê (Diyaret İşleri Başkanlığı) jî dîyar dike ku ev tişt di ola îslamê da tuneye û dibêje ku derheqê vê sepanîne da tu delîlên aqlî û olî jî tunene (Diyaret İşleri Başkanlığı, 2008: 58). Digel vê yekê jî di nav gelî da ev adet heta îro jî dewam dike.

Berê xwedîyên mirîyan genimê xwe dibirin binê darekê, bi şelîte tîr bi darê ve girê didan û genimê xwe dixistin tîrê û mela û yekî din ji hev ra tavêtin û bi vî awayî genim dihejandin (Ç9; Ç10; Ç12). Hindekan jî ji dêvla tîrê genim dixistin kîsan û didaleqandin (Ç14; Ç26). Li deverinan jî genim dixistin kîsekî, mela û yekî din bi guhê kîs digirtin, dibirin vî alî û wî alî û bi vî awayî genim dihejandin (Ç15). Li deverinan jî kîsek genim dixistin erebeya destan û dihejandin (Ç24; Ç34). Berê ji ber zehmetîyê ji dêvla ku genim hemûyî bihejînin kîsek tenê dihejandin û dûvre ew kîs li nav genimê xwe didan û tevî didan da li nav hemûyî belav bibe (Ç13; Ç15; Ç22; Ç26). Lê îro erebeyên mezin hene, genim dixin kîsan û hemû kîsên xwe li erebeya



dewaran, terekto, pîqab û tiştên weha bar dikan. Erebe diçe pêş û tê paş û bi vî awayî hemû genim bi derbekê ra tê hejandin (Ç14; Ç19; Ç62; Ç65).

Berî hejandinê xwedîyên mirîyî/yê, hemû genimî didin melayî û wî diwekilînin. Mela bangî 10 kesan dike, lewra li gorî mezhebê şafî dema ku mirov derewekê bike yan jî sûndekê bixwe û sûnda xwe neyîne cih, ji bo efûbûna wê, divê ew mirov zikê 10 feqîran têr bike yan jî 10 mirovên feqîr bi cil bike (Ç6). Ji ber wê ye ku mela bangî 10 mirovên feqîr û nimêjker dikan. Dûvre her deh kes yekî ji nav xwe diwekilînin. Piştî wekilandinan, mela û ew kesê wekilandî genim didin hev û distînin. Mela dahfekê li genim dixe û dibêje “Ev genim di ber kufareta sûnd û derewên filankes da min da te, qebûl bike.” Ç10ê got ku mela dibêje “Keza keza hakeza, ev dexla hanê min da te di ber rojî, nimêj û derewên vî mirovî da, qebûl bike.” Mêrê din genim distîne û weha dibêje: “Ev genim di ber kufareta sûnd û derewên filankes da min qebûl kir, seyda dîsa min ev da te”. Û bi vî awayî li gorî hesabê ku melayî kirîye hejandina genim dewam dike. Piştî ku hejandin, mela çend kîsan ji xwe ra dibe û heryekî kîsekî dide wan 10 kesên li cem xwe. Genimê ku ma jî didin malên ku sêwî lê hene û didin feqîran. Ç45ê got “Berê me genim dixist firaxan û heta ku gund hatiba xitimkirin me ew genim li gundî digerland.”

Dema ku li gundan genim tê hejandin mirovek bi dengê bilind bang dike yan jî di hoparlorê da bang dike û dibêje “Gelî gundîno wê genimê filankes daleqînin, yê ku bixwazê xêra xwe bixîyê da bere genimê xwe bîne devê mizgeftê (yan jî devê derîyê mala mirî)” (Ç10; Ç11; Ç14). Her mal li gorî qeweta xwe tenekeyek be, çiwalek be ji xwedîyên mirîyî/yê ra dibin. Xwedîyên mirîyî/yê dewlemend jî bin feqîr jî bin gundî vê alîkarîyê bi wan ra dikan. Lê ji ber ku li gundên çîyayî genim nayê çandin û tenê rez û fêkîyên wan hene ev adet li cem wan nehate dîtin. Yanî ji vê jî dîyar dibe ku erdnîgarî û derdor bandorê li adet û rîtûelên mirinê yên civakekê dikan.

Miqdara genimê ku dê bê hejandin li gorî qewetîya mirîyî/yê ye. Heger mirî qewetîya xwe nekiribe wê demê xwedîyên mirîyî/yê li gorî qeweta xwe genim lê dihêjin. Mirovin jê ji bo genimê xwe pereyan dihilînin û dibêjin “Piştî ku ez mirim bihayê van pereyan genim li min bidin.” (Ç15; Ç18; Ç22).

Li cem kurdên êzidî genim nayê hejandin û di lêkolînên me da adeteka bergindê wê jî nehate dîtin.

### 3.2.2.Mewlûd

Mewlûd bi maneya xwe herçiqas zayînê tîne bîra mirovan û naveroka wê derbareyê hatina dinyayê ya pêxemberê ola îslamê da ye jî îro misilman di rîtûelên têkildarî mirinê da jî mewlûdê dixwînin. Li gorî îlmîhala şafî mewlûd ne ferz e û ne jî sinet e û piştî wefata pêxember bi 300 salî ji aliyê misilmanan ve hatîye çêkirin (Günenç: 452). Lê gel bawer dike ku çî mala ku mewlûd lê bê xwendin, bereket dikeve wê malê (Ç12). Ne tenê di rojbûna pêxember da herweha ji bo mirîyan çî xwarin û vexwarin bèn dayîn teqez berî wê xwarin û vexwarinê mewlûdek tê xwendin. Lê xwendina mewlûdê weke tiştêkî ji rêzê nayê dîtin, lewma jî mewlûd di nav rîtûeleka taybetî da tê xwendin.

Li cihê ku dê mewlûd lê bê xwendin jin û mêr tevlihev rûnanin, yan hemû jin in yan jî hemû mêr in. Yê/ya ku dê mewlûdê bixwîne li odeyê rûdine, çend kes jî li dora wî/wê rûdinin. Berî ku mewlûd bê xwendin sifriyeka ku gelek tişt li ser rêzkirî ne tê amadekirin. Ji tiştên weke şeker, xwê, savar, birinc, fasolî, çayê, nîsk, simd, genim her yekî bihayê kevçiyekî xwarinê dixin binikên qedehên çayê û ji şeker, leymûndiz û avê jî şerbetê çêdikin û datînin ser sifriyê. Cilikekê bi ser sifriyê dadikin û li ber yê/ya ku dê mewlûdê bixwîne datînin. Berê mela yan jî jinên melayan mewlûd dixwendin lê îro ji bilî wan jî gelek mirov mewlûdê dixwînin. Hindek jê ji bo xwendina mewlûdê pereyan distînin û hindek jî bi xêra xwe dixwînin.

Mela dest bi xwendina xwe dike û yên li hundirû rûniştî jî bi baldarî lê guhdarî dikin. Di cihêkî mewlûdê da mela disekine û ji yên dora xwe dixwaze ku bixûrê pêxin û ew bixûr heta dawîya mewlûdê pêxistî dimîne. Herweha mela li deverinan disekine û tevli yên rûniştî bi yek dengî salewatan li ser pêxember tînin û mela dîsa xwendina xwe dewam dike. Ev tişt çend carên din tê dubarekirin. Piştî ku mela mewlûd xelas kir diayê di dawîya mewlûdê da dixwîne û yên rûniştî hemû bi hevra dibêjin “amîn!”. Peyra şerbetê vala dikin çend qedehan û bi wan tiştên ser sifriyê ra li yên mêvanên rûniştî digerin. Mêvan wê şerbetê vedixwin û hindekî didin zarokên xwe jî da ku şîfayê bibînin. Ji wan tiştên ser sifriyê çend liban tavêjin

devê xwe. Dûvre wê sifrîyê li ber mirovên derve jî digerin. Heger mewlûd li cihê jinan bê xwendin wê demê ji dêvla melayî jinek mewlûdê dixwîne, wekî din her tişt weke hev e (Ç1; Ç35; Ç36; Ç63).

Berê mewlûdên erebî dihatin xwendin lê van salên dawî kurd bêtir mewlûdên kurdî dixwazin û wan dixwînin (Ç35; Ç56; Ç60). Li pirtûkfiroşan gelek mewlûdên kurdî peyda dibin lê li Nisêbînê ya herî zêde ku tê tercîhkirin ya Mihemmed Emin Haydarî ye (Ç55; Ç56). Lewra zimanê wê hêsan e û devoka ku hatîye bikaranîn jî weke ya Nisêbînê ye. Ji ber ku zimanê wê weke yê alîyê Şernexê ye koçer û botîyên bajarî bêtir mewlûda bi navê Mevlid-i Nebi ya Hasan Ertûşî tercîh dikin û dixwînin. Mirîd û hezkirîyên şêxê terîqeta neqşebendîyê jî bêtir mewlûda bi navê Mewlûdinnebî ya Mele Şewqîyê şêxê dergehê dixwînin û tercîh dikin (Ç55; Ç56). Hem ji bo ku bi kurdî ne û hem jî ji ber ku hindêk jê bi tîpên latînî hatine nivîsîn xwendayên mewlûdan van salên dawî zêde bûne. Yanî bi qasî ku hat famkirin herkes li gorî zimanê xwe tercîha xwe dike û famkirina mewlûdê jî ji bo civakê girîng e.

Li cem êzidiyan mewlûd tune ye lê zanayekî wan jî berî ku dest bi xwarinê bikin diayekî dixwîne.

### **3.2.3. Bîranîna Mirîyan**

Li herêmê, mirov bi hin adet û rîtûelan mirîyên xwe bi bîr tînin û gelek caran van di rojên dîyar da dikin. Dîgel ku adetên cuda jî hebûn lê li vê derê me cih da yê hevbeş ku ji alîyê pîranîya civaka kurd ve tînin qebûl kirin.

#### **3.2.3.1. Sêroka Mirîyî/yê**

Roja sêyan ya sersaxîyê ji bo mirîyan xwarineka mezin tê dayîn û jê ra “sêroka mirîyî/yê” tê gotin. Li gelek deveran ji bo zarokan ev xwarin nayê dayîn, lewra dibêjin zarok jixwe cenetî ne û ne bi xêra vê xwarinê ne (Ç18; Ç22). Derheqê sebebê dayîna vê xwarinê da Ç1 û Ç36ê ev agahî dan me:

“Dibêjin ji bo ku devê yê/ya mirî ji axê derkevê ev xwarin tê dayîn. Yanî dibêjin ku yê/ya mirî ji zû ve nexweş bê û jizûve xwarin nexwaribê, heye yê/ya mirî ji zû ve nikaribê

xwarinê bixwê û birçî çûbê. Wextê ku sêroka wan tê dayîn, ew xwarin digihê ber devê wan û ew ştexaliya ku dibêjin *devê wî/wê ji axê derket* tê gotin.”

Ji ber ku berê sersaxîyê ji sê rojan bêtir dewam dikir ev xwarin jî di hefteyekê-deh rojan da dihat dayîn lê dikare bê gotin ku îro li her deverê roja sisîyan sêroka mirîyî/yê tê dayîn. Ev xwarin di heman demê da weke îlankirina bidawîhatina sersaxîyê ye jî, lewra dema gel dibihîze ku sêroka mirîyî/yê hatîye dayîn tê famkirin ku sersaxîya wan hatîye rakirin (Ç4; Ç12; Ç14).

Berê ji bo çêkirina xwarina sêroka mirîyî/yê çend jin û çend mêr dihatin peywirandin (Ç33; Ç65). Di beroşên mezin da goştê sor, savar yan birinc û tîrşîka fasolîyan çêdikirin û datanîn ber gelî. Ev bûbû weke adetekê û ji bo vê xwarinê li her derê ev tişt dihatin çêkirin. Divê bê gotin ku teqez mewlûd li ser vê xwarinê jî tê xwendin û heta li hin deveran ji bo vê xwarinê “xwarina mewlûdê” jî tê gotin. Îro xwedîyên mirîyan ji bajarî aşpêjan tînin cihê sersaxîyê yan binê konan û vê xwarinê li wir didin çêkirin. Hindek jî bi xwaringehê ra li hev tên û xwarina ku li xwaringehê tê çêkirin bi erebeyan tînin cihê sersaxîyê. Ji ber nexweşîyên zêde îro di ber xwarinê ra şînahî jî tê anîn.

Dema ku sêroka mirîyî/yê tê dayîn li gundan herkes tê xwarinê, li bajarî jî xwedî û dostên mirîyî/yê hemû ji bo xwarinê tên vexwendin. Heger mizgeft nêzîkî cihê sersaxîyê bin yekî dişînin mizgeftê û cemaet hemû ji bo xwarinê tê vexwendin (Ç31). Tê bawerkirin ku çiqas mirov ji vê xwarinê bixwin xêra mirîyan hewqasî mezin dibe. Yê/ya ku xwarin xwar û rabû ji xwedîyên mirîyî/yê ra dibêje “Xwedê qebûl bikê, Xwedê bigihîne ber destê mirîyê/ya we.”

Îro li bajarî û hemû gundên herêmê sêroka mirîyî/yê tê dayîn, lê li hin deveran hat gotin ku berê ev xwarin nedihat dayîn, vê dawîyê ji fêhtîya dinyayê ew jî neçar mane ku vê xwarinê bidin (Ç10; Ç11; Ç26; Ç45). Gelek kesan gotin ku herçiqas ne bi dilê me bû jî, ji bo ku civak me şermezar neke me jî dest bi dayîna vê xwarinê kir. Gotin ku cîran û dostan em vedixwendin van xwarinan, ji bo ku dilê wan nemîne em jî diçûn. Dûvre dema ku mirîyekî me çêdibû çavên wan jî li rê bû ku em jî wan vexwînin, lewma ji bo ku em nekevin ber fêhtîyê, me jî dest bi dayîna sêroka mirîyî/yê kir (Ç10; Ç12; Ç45).

Êzîdîyên Nisêbînê jî êvara înyê pêşî xêra mirîyên xwe didin lê jê ra nabêjin sêroka mirîyî/yê. Mirîyên wan kîjan rojê bimirin bila bimirin, teqez li hêvîya êvara înyê dimînin û wê rojê xêra mirîyên xwe didin. Lewra li gorî êzîdîyan êvara înyê pîroz e (Ç28). Li gorî derfetên xwe hindêk xwarinê li malê çêdikin û hindêk jî xwarina hazir ji bajarî tînin û bangî mêvanan dikin. Piştî ku mêvanan xwarina xwe xwarin û çûn, xwarina mayî jî li gundî tê belavkirin (Ç28; Ç29; Ç30).

Berê xwarin ji ber mêvanan radikirin û di tepsikan da diedilandin û careka din li ber hin mêvanên din datanîn. Îro ji aliyê hijyenê ve pêşketin çêbûye. Îro tepsik, kevçî, çetel, nan, av û dewên herkesî cuda ne, xwarina ku ji ber hindêkan ma nadeynin ber tu kesên din.

Jones dibêje ku di gelek çandan da piştî mirîyan xwarin tê dayîn (Jones, 2004: 40). Weke ku li jor me nivîsî ev adet hem di nav kurdên misilman û hem jî di nav kurdên êzîdî da tê dîtin.

### **3.2.3.2.Çilroka Mirîyî/yê**

Li herêmê ji bo mirîyan di roja 40î da xêrek tê dayîn. Di roja çilî da hindêk tiştên weke helawê şêrîn belav dikin. Hin jê nanê şêrîn çêdikin û li gundî û cîranan belav dikin (Ç1; Ç4; Ç13; Ç60). Ev nan, weke kulîçeyên ereban e lê ferqa wê ew e ku ereb wî nanî di roja sêyem ya sersaxîyê da digerrînin lê kurd di roja çilî da belav dikin. Adeta belavkirina şîranîyê ji berê da heye û îro jî dewam dike. Lê berê ji dêvla nanê şêrîn ard diqelandin, şekir di nav avê da dikelandin û berdidan navê û dikirin helawî û li gundî û cîranan digerrandin (Ç1). Îro li gelek deveran helawa hazir dikirin, nanekî firnê datînin ber û belav dikin. Ji dêvla nanê firnê hindêk nanê hişkeva jî bi helawê ra belav dikin. Li gundinan roja çilî şekir, piskewît û tiştên şêrîn tînin kirîn, mewlûd li ser wan tê xwendin û li nav goristanê li zarokan tê belavkirin (Ç24). Ç4ê derheqê şîranîyê da weha got:

“Berê genim di teştan da dihat qelandin, sorkirin û bi destaran dihat hêran. Ji ber ku bi destar dihat hêran libên êrd hinekî gir bûn, ne weke ardê êş hûr bûn. Me dims û rûn li ardê xwe dikir û bi vî awayî me helawîya xwe çêdikir. Me gelek çêdikir û me li gundên derdorê jî belav dikir.”

Li deverinan roja çilî pezek tê şerjêkirin, mêvan ji bo malê tîn vexwendin û mewlûd li serê tê xwendin (Ç24; Ç33). Li bajarî hin malbatên ku berê adeta çilrokê li cem wan tunebû jî hatin dîtin (Ç10; Ç23; Ç45). Lê wan got ku piştî hatin bajarî ji derora xwe bandor girtin û dest bi dayîna çilrokê kirin (Ç45).

Roja çilî êzidî jî xêrekê li mirîyên xwe didin. Yan dê xwarinê çêkin û gundî û cîranên xwe vexwînin, yan jî dê goşt û savarê çêkin, goştê xwe li ser savarê deynin û nanekî nequlkirî jî deynin ser û mal bi mal bigerînin (Ç30).

Bi qasî ku ji xebatên sehayê me fam kir, kurd di belavkirina tiştên şêrîn da di bin bandora mihelmîyan da nemane, lewra Bazîdî di pirtûka xwe da behsa dayîna helawê dike (Bazîdî, 2010: 53). Jixwe mihelmî di roja sêyan da nanê şêrîn belav dikin lê kurd helaw û her cure şêranîyê belav dikin û vê şêranîyê jî bêtir di roja çilî da digerînin. Lê dixwaze tişteki şêrîn be dixwaze jî xwarin be gişt li her deverê Nisêbînê ev adet dewam dike.

### **3.2.3.3.Xwarina Salê**

Dema ku salek di ser mirinê ra derbas dibe, li malê xwarin tê çêkirin û gundî û cîran tîn vexwendin (Ç1; Ç4; Ç10; Ç13; Ç22; Ç24; Ç33). Ji vê xwarinê ra xwarina salê tê gotin û li herêma di dayîna vê xwarinê da îtîfaq heye. Berî ku xwarin bê xwarin, li odeya ku mêvan rûniştine mewlûd tê xwendin. Piştî xwendina mewlûdê xwarin tê xwarin. Hindek jê ne tenê di salvegera mirinê da her sal di roja mirinê da xwarinekê didin (Ç4; Ç10; Ç24). Ev xwarin ne tenê ji bo ku xêr ji mirîyî/yê ra biçin tîn dayîn herweha ji bo bîranîna mirîyan jî ev xwarin tê dayîn. Ç4ê got ku rojên nexweş nayên jibîrkirin û yên ku ji mirîyê xwe hez bikin, dê di her rojên xuyayî da wan bi bîr bînin.

Di sepandina vê adetê da berê li deverinan hin tiştên din dihatin kirin. Ç45ê weha got:

“Berê dema ku sal qulipîba me li malê nanê genimî yê kuncîkirî çêdikir, me dibir nav tirba û li wir me dida gundî, koçer û şivanan. Me bixwe nanê ceyî dixwar, lê ji bo qedrê mirîyan wê rojê me nanê genimî çêdikir. Nan li nav tirba nedixwarin û dibirin malê. Ev nan ne tenê ji bo mirîyên me bû, ji bo mirîyê wî mezeli hemûyî bû.”

Hin çavkanîyên me jî ev agahî dan me:

“Êvara eydê nanê mirîya tê gerandin. Berê nanê sêlê dihat gerandin, dûvre nanê tenûrê û îro jî nanê firnê tê gerandin. Hin kes jî teştekek ard û xwê digerînin. Ev nan hem ji bo mirîyên nû û hem jî ji bo mirîyên kevin tê gerandin û ev adet heta îro jî dewam dike.” (Ç1; Ç36).

Li cem êzidîyan jî xwarineka weke vê tê dayîn lê ew jê ra dibêjin “xêra salê”. Lê êzidî xwarina salê ne di salvegera mirinê da didin. Ew vê xwarinê yan di meha 7an da, yan di ya 9an da û yan jî di ya 11an da didin. Sebeba wê jî weha rave dikin: “Li cem me 7 pîroz e, ji ber ku milyaket di 7 rojan da hatine. Ji ber ku fer ketîye heftan lewma illeh divê fer be, ne cot be. Sal jî 12 meh e û 12 jî cot e, ji ber wê jî em xwarina salê hingê nadin.” (Ç28).

#### **3.2.3.4.Şîva Mirîyî/yê**

Heta sala mirîyan biqede her êvar şîva wan tê derxistin (Ç24; Ç36; Ç59; Ç63). Şîva malê çî be, ji wê xwarinê têra kesekî/ê tê amadekirin û tê derxistin. Heger şîv nebe jî ji bo ku şîva mirîyên xwe derxin têra şîvekê xwarinê çêdikin û derdixin. Şîv her şev ji malekê ra tê birin, hindêk jê jî çend malên feqîr tesbît dikin û bi dorê ji wan malan ra dibin. Şeva ku sala xwarinê diqede wan firaxên ku xwarin têda dibirin (sifrî, kevçî, çatal, qedeh û çî yê din hebe) ji mala dawî ra dihêlin (Ç1; Ç9; Ç18; Ç47).

Ç4ê got berî ku biçin karê findeqan bi qasî ku têra du mehan bike xwarinê çêdikin û li malan belav dikin. Ji ber ku li findeqan dê nikaribin xwarina mirîyên xwe derxin, bi vî awayî şîva mirîyên xwe didin. Dîsa li deverinan xwarina salê di hundirê 9-10 rojan da tê dayîn. Di vê bareyê da Ç26ê weha got: “Çend jinên gundî û cîran li mala mirîyî/yê dicivin û alîkarîya wan dikin. Têra 40-50 kesî xwarinê çêdikin û li gundî û cîranan belav dikin. Bi vî awayî di hundirê 9-10 rojan da têra salekê xwarinê derdixin.”

Yên ku rewşa wan ya aborî nebaş be û derxistina şîva mirîyî/yê ji wan neqede her şev şîva mirîyên xwe dernaxin. Lê evên weha herşev nikaribin jî heta ku ji wan bê êvarên îniyan ew jî şîva mirîyên xwe derdixin.

Bi qasî ku me li qadê dît, gel li gorî rewşa xwe di sepandina adetan da rêyên nû dibîne û li gorî rewşa xwe tevdigere. Yanî adetan ji holê ranakin lê li gorî rewşa xwe, di şewazên adetan da guhertininan çêdikin û dîsa berpîrsîyarîya xwe ya ji bo mirîyên xwe bi cih tînin. Herweha jin jî di pêkanîna van tiştan da alîkarîya hev dikin. Li cem êzidîyan şîva mirîyî/yê nayê derxistin.

### 3.2.3.5.Rojên Din

Di sala pêşî da gel, gelek xêran li mirîyên xwe dide. Mirin çiqasî kevin dibe xêrên ku tên kirin jî kêmtir dibin. Piştî ku sal qedîya yên ku bixwazin her êvara îniyê şîva mirîyên xwe derdixin (Ç24; Ç45). Li gorî bawerîyê êvarên îniyan çavê mirîyan li rê ye ku xwarina wan bê derxistin. Dibêjin yên ku şîva wan bê derxistin wê êvarê tên mala xwe (Ç4; Ç9; Ç13). Êvarên îniyan tiştên şêrîn (weke piskewît, şekir, liqûm) tên kirin û yan li zarokên sikakê yan jî li zarokên goristanê tên belavkirin. Rojên qendîlan yan goşt yan jî tiştên şêrîn tên kirin û ji bo xêra mirîyan tên belavkirin. Dema ku goşt tê dayîn mewlûd jî li serê tê xwendin lê heger şekir û gofret û tiştên weha bên belavkirin mewlûd lê nayê xwendin.

Li gundinan, berê ji bo xêra mirîyan mergeya nokan ya bi goşt dihat çêkirin. Ji ber ku tama goşt xweştir bû ev merge payîzî dihat çêkirin. Sibehê zarokên gundî hemû tevlî sîtila xwe dihatin devê derîyî. Sîtila zarokan dihat dagirtin û li gorî mergeya di sîtila wan da nan jî dihat dayîn. Zarok li gundî digerîyan û bi heska xwe merge belav dikirin û her malekê nanek jî didan wan. Piştî ku gund dihat xitimkirin behra zarokan jî dihat dayîn. Ev ne ji dêvla xêra mirîyî/yê da bû. Dema ku payîz dihat û derfetên wan çêdibûn, mirovan dixwestin ku xêrekê li mirîyên xwe bidin (Ç15; Ç18; Ç65).

Êzidî di her cejn û rojên girîng da mirîyên xwe bi bîr tînin û xwarinekê li wan didin. Ji van rojan yek jê Çarşema Sor e û wê rojê xêrekê li mirîyên xwe didin (Ç28; Ç30). Li gorî zanyarîyên ku Ç28ê dan me, di ola êzdayetîyê da cejna herî mezin Cejna Êzîd e. Ev ji bo êzidîyan rojeka pîroz e û êzidî wê rojê jî xêrekê li mirîyên xwe didin.



Cejna Batizmîyê di navbera herdu çeleyan da ye, heft rojan dewam dike û di du rojên pêşî yê vê cejnê da “nanê mirîyan” tê dayîn. Nanê mirîyan ji goşt, savar, kek, û hwd. pêk tê. Di van du rojan da gelek kes xwarinê didin mêvan û cîranên xwe. Tê bawerkirin ku ev xêr dê fêdeyekê li mirîyên wan bike (Ç28; Ç29).

Digel van rojan, meha heştan, dema ku fêkî çêdibe jî êzidî dîsa xêrekê li mirîyên xwe didin. Herweha dema ku benderên xwe dihilînin yê ku dixwazin xêran li mirîyên xwe didin. Yanî êzidî ne tenê di rojên girîng da kengî derfetên wan çêdibin xêran li mirîyên xwe didin û wan bi bîr tînin (Ç29; Ç30).

Li gorî rêbera Dîyanetê, derheqê xitme û mewlûdên ku di rojên dîyar da tên xwendin da ne di Quranê da û ne jî di sinetê da tu zanyarî û pêşniyar tunene (Dîyanet İşleri Başkanlığı, 2008: 62). Digel vê yekê jî ev adet û rîtûel di nav kurdên misilman da hebûna xwe didomînin. Herweha kurdên êzidî jî di van rojan da xwarinê didin.

Izady di pirtûka xwe da behsa rojên piştî mirinê yê sêyem, heftem, çilem û roja salvegera mirinê dike û dibêje mirî di van rojan da tên bibîranîn (Izady, 2011: 424). Kurdo jî dîyar dike ku di ola zerdûştîyê da her pênc rojên dawîya salê ji bo rihê mirîyan dihatin pêşkêşkirin û di van rojan da hindê xebat dihatin kirin û herweha stranin ji Avestayê dihatin xwendin (Kurdo, 1993: 56). Xuya ye kurd ji berê da di hin rojan da, rîtûelînan ji bo mirîyên xwe li dar dixin û îro jî adetên weha tên dîtin.

### **3.2.4.Xêra Mirîyî/yê**

Navê wê “xêra mirîyî/yê” be jî, yê ku bixwaze dikare di saxîfîya xwe da jî vê xêrê bide. Lewra tenê carekê tê dayîn, heger mirovekî/ê di saxîfîya xwe da xêra xwe dabe, piştî mirina wî/wê careka din ev xêr nayê dayîn. Tê bawerkirin ku heger xêra mirîyî/yê bi saxîfî bê gerandin xêra wê zêdetir e. Xêra mirîyî/yê bi du awayan tê navandin: Heger yê/ya mirî zarok be navê wê “heqîqe” ye û pezekî (mih yan bizin) ku salek bêtir kiribe tê gurandin (Ç10; Ç24). Heqîqe di saxîfîya zarokan da nayê dayîn, kengî zarok mirin wê demê heqîqeya wan tê dayîn. Ji bo mirovên mezin çêlekek, golikek yanî sewaleka mezin (golik yan çêlek) tê gurandin û navê wê jî “dehî” ye. Bawerîyek di nav gelî da heye û tê gotin ku heta dehî yan heqîqeya

mirîyî/yê neyê dayîn devê wan di axê da ye û piştî dayîna xêra wan devê wan ji axê derdikeve (Ç1; Ç4; Ç9).

Berê digotin xêrtir e û lewma jî ji bo xêra mirîyî/yê, goştê kelandî dihat belavkirin. Herweha xwedîyên mirîyan têra malekê ji xwe ra jî goşt dihêlan (Ç11; Ç18; Ç23). Êvarî, yekî xwende lîsteyek çêdikir bê ka dê xwarin li kê bê belavkirin. Li gorî mezinbûna gundî, yan li gorî mezinbûna cihê ku dê xêr lê bihata belavkirin, lîsteya xwe dikir çend beş û her lîsteyek dida xortekî. Ji bo alîkarîyê, her xortekî çend keçikên xort û çend zarok bi xwe ra dibirin. Goşt û birinc-savar di mersefan da û li ser sifriyêkê datanîn û keçikên xort sifri li ser serê xwe dikirin. Tirşika fasolîyan jî dixistin sîtilan û didan destên zarokan. Yê ku lîste di dest da, keçik û zarok hemû bi hevra xêra mirîyî/yê li malan digerlandin. Piştî ku karê belavkirinê diqedîya, ji bo ku tu kes ji xêra mirîyî/yê bêpar nemîne di hoperlora mizgeftê da bang dikirin û weha digotin: “Xwedê ji we razî bê, heçî me xêra mirî nebiri bê ji wan ra, yekî ku me ji bîra kiribê, bere xêra mirîyê me kê nê nemînê; ne eyb e, ji bo Xwedê bîn û behra xwe bibin”. Piştî ku xwarin dihat belavkirin, xwarina mayî li ser sifriyan datanîn û xort û zarokên ku xwarin digerlandin li ser sifriyê rûdiniştin û xwarin dixwarin (Ç11; Ç15; Ç59).

Îro xêra mirîyî/yê bêtir xav tê belavkirin. Ji bo her malekê behrek tê amadekirin. Di wê behrê da kîloyek goşt, kîloyek fasolî, kîloyek birinc, kîsikek xwê û nanek heye (Ç13; Ç15; Ç31). Li deverinan van salên dawî lîtreyek rûn û qotîkeka nîvkîlo ya ava bacanan jî lê tê zêdekirin (Ç18; Ç34).

Ji ber çend sedeman îro xêra mirîyî/yê xav tê belavkirin. Dema ku xwarin li malê tê çêkirin û gel tê vexwendin tenê mêrên malê beşdarî xwarinê dibin û jin û zarokên malê jê bêpar dimînin. Lê dema ku xav tê belavkirin mêr, jin û zarok tevde ji wê xêrê sûd werdigirin û xêra wê jî zêdetir dibe. Heta carna karê mêran heye yan ne guncaw in û ji wê malê tu kes beşdarî xwarinê nabe û xwarina çêkirî îsraf jî dibe (Ç18; Ç26). Sedemeka din jî paqijî û hîjyen e. Lewra li gorî berê îro paqijî û hîjyen ji bo mirovan xaleka pir girîng e. Herkes xwarina herkesî naxwe, hin jê pir hesas in. Digel vê yekê, vê serdemê nexweşîyên weke tansîyon û şeker zêde bûne. Lewma ji ber van nexweşîyan hindêk tiştên şor, hindêk yê şêrîn, hindêk goştê sor, û hwd. naxwin. Ç18ê di vê bareyê da weha dibêje:

“Apê zarokan bi weremê bû û li cem me dima. Me jî nizanîbû ku nexweşîya wî weke şewbê derbasî mirovan dibê û me xwarina şûna wî dixwar û me dida zarokên xwe jî. Ji ber wê yekê 3 keçikên min jî wilo bi menencikê ketin. Di hundirê 25 rojan da hersê keçikên min çûn (mirin). Ji ber wê yekê jî xelkê xwe ji mala me dûr digirt. Mela got, hûn xêra wan xav bigerînin çêtir e, heke hûn xwarinê bikelînin û bigerînin jî wê xelk wê xwarinê birijînin û naxwin. Me jî goştê xwe xav gerand û ji wê rojê û vir da ev 40 sal in ku li gundê me, xelk xêra mirîyên xwe xav digerînin.”

Weke ku di vê nimûneyê da jî tê dîtin adetên mirinê ji aliyê şewazê ve esnek in. Gel li gorî rewşa dinyayê, li gorî rewşa xwe carna di adetan da guherînan çêdike. Gelek caran jî berî ku biryara guherîna bidin fikrê mela û aliman distînin da ku dilê wan bikeve cih. Lê carna jî ew bixwe bêyî ku fikra tu kesî bipirsin van guherînan pêk tînin.

Dema ku zarok dimirin şekir û tiştên şêrîn dixin şerbikekî, sêveka sor jî dixin devê şerbik û didin zarokên sêwî. Tê bawerkirin ku li wê dinyayê dema ku dê û bavê wan zarokan diçin, zarok wî şerbikî tije ava cemidî dikan, şerbik li milê xwe dikan û dibin pêşîya wan û didin wan (Ç18; Ç24; Ç36).

Berê li cihinan jê sêroka mirîyî/yê û xêra mirîyî/yê bi hevûdin ra dihat gerandin. Yanî xwarin dihat çêkirin, mewlûd li ser hemû xwarinê dihat xwendin û mirov dihatin vexwendin. Hindek ji bo mêvanên vexwendî dihat veqetandin û hindek jî ji bo gerandina malan dihat veqetandin. Piştî ku mêvanan xwarina xwe dixwarin û radibûn, xwarina din di sênîkan da li gundî dihat belavkirin (Ç26; Ç33).

Heger gund gelekî mezin be gund nayê xitimkirin (Ç26), lê heger gund biçûk be xêra mirîyî/yê li gundî hemûyî tê gerandin û gund tê xitimkirin. Bi hev ra neaxivin jî, ne li hev bin jî, teqez divê xêra mirîyî/yê ji wan ra jî bibin yan na gund nayê xitimkirin.

Xêra mirîyî/yê berê piştî ku mêvanên sersaxîyê xelas dibûn, bêhna fereh dihat gerandin lê îro ew jî di hundirê hefteyekê-deh rojan da tê gerandin. Lewra dibêjin hîn ku mêvanên me belav nebûne em bigerînin da ku ew jî ji xêra mirîyî/yê sûd werbigirin (Ç12; Ç15; Ç24).

Ji bo xêra mirîyî/yê li deverinan, kîsikên xwê tên belavkirin, lewra tê bawerkirin ku gunehê mirîyan bêtir bi xwê diçe (Ç24; Ç31).

### **3.2.5.Xêr û Taetên Ji Bo Mirîyan**

Piştî ku mirovek dimire, heger hebin pêşî qewêtîyên wî/wê tên bicihanîn. Li gorî ku melayên herêmê dibêjin û di nav civakê da jî weha tê bawerkirin, ji dêvla mirîyan ve rojî tê girtin, hec tê kirin, zikat tê dayîn lê nimêj nayê kirin. Lewra tê gotin ku barê nimêjê giran e (Ç6; Ç7; Ç13; Ç52; Ç64; Ç66). Dema ku mirovek dimire ji bo ku heca wan bê kirin, hindek ji dêvla wan tên şandin (Ç34). Hindek jî ji dêvla mirîyên xwe rojî digirin (Ç13).

Herweha berî ku mirî bên veşartin divê deynên wan ji stukra wan bên derxistin (Ç6). Li gorî Ç1 û Ç4ê heger deynên mirîyan hebin û bêyî ku deynên wan bên dayîn ew kes bên veşartin, ferîşte naçin ser wan. Weke ku me di beşa veşartinê da jî gotibû li ser gorê jî xwedîyên mirîyan ji mirovên wir ra dibêjin ku heger deynên hindekan li yê/ya mirî hebin bere bibêjin da ku deynê wan bidin. Gelek caran dema ku deynekî biçûk û bêqîmet li mirîyan hebe gel behs nake û tê dibihûre. Lê heger deynekî gelek be piştî bi 3-4 rojan diçin cem xwedîyên mirîyî/yê û bi zimanekî xweş doza dayîna deynên xwe dikin (Ç41).

Êzidî jî xêran li mirîyên xwe didin. Berê zêr û tiştên biqîmet bi mirîyên xwe ra vedişartin lê îro weha nakin û berginda wan tiştan, xêran li mirîyên xwe didin (Ç28; Ç29).

Her êvara înyê yan li ser gorê yan jî li malê sûretê yasîne tê xwendin û ji bo rihê mirîyan tê dîyarîkirin. Lewra tê bawerkirin ku ev dê fêdeyekê li rihê mirîyên wan bike. Wekî din gel ji bo mirîyên xwe sedeqeyan didin, feqîran têr dikin, alîkarîyê didin mizgeftan, û hwd. Yanî li herêmê mirî nayên jibîrkirin û herkes li gorî qeweta xwe xêran li mirîyên xwe didin.

### **3.2.6.Cil û Firaxên Mirîyan**

Divê bê gotin ku ji fotografên mirîyan pêve tu tiştên wan di malê da nayên hêlan, lewra mela dibêjin ku mirov wan bide xêra mirîyan çêtir e (Ç6; Ç9; Ç16). Ç1

dibêje dema ku tiştêkî mirîyan di hundirû da dimîne çavê wan di peyda ye û herweha bi dayîna tiştên wan “xêra mirîyan dimeşe” (Ç15). Lê xwedîyên mirîyî/yê gelek caran ji bo xatireya wan, tiştên weke hungilîsk, saet, mûçink, gopal, cûzdan, kêrik, kum, tizbeh û hwd. ji xwe ra dihêlin. Hindek jê van tiştan li xwe dikin û bi xwe ve dikin û hindek jî li cem xwe dihilînin (Ç34). Ç23yê got: “Tîyê min mir, jina wî hungilîska wî ya zîv ji destê wî kir û heta niha dixê tîliya xwe”.

Xwedîyên mirîyan cil û firaxên wan didin devereke ku rêya wan pê nekeve (Ç14; Ç15; Ç18; Ç20; Ç41). Lewra hem îro kêma mirov cilên mirîyan li xwe dikin û hem jî çavên xwedîyên mirîyan bar nabe ku cilên wan li ser hindeke din bibînin. Ç15ê di vê bareyê da weha got: “Hevalekî bavê min hebû, piştî ku bavê min mir, me çakêtê wî dayê. Her ku dihat mala me, me çakêtê bavê min lê didît, bavê min dihat bîra me û kela girî dikete qirika me”. Xwedîyek yan jî dostekî xwedîyên mirîyan li cihêkî dîr be, hemû tiştên yê/ya mirî li hev tînin komkirin û jê ra tînin şandin da ku li wir bînin belavkirin. Hindek kes cil û firaxên mirîyên xwe didin hev û didin melayî (Ç33), hindek dibin mizgeftê (Ç31), hindek dibin cihên weke Weyselqeranî (Ç14) û hindek jî didin şivan û gavanan (Ç22).

Carna jî yê ku yixtîyar û nexweşên li ber mirinê bin, berîya ku bimirin bi destên xwe cil û firaxên xwe belav dikin. Jinên pîr jî parçeyên qimaşî û cilên xweşik di saxtîya xwe da didin xêra xwe (Ç33). Hin jê jî qewêtîya xwe dikin û dibêjin “Heke ez mirim hûn ê tiştên min bidin filankes û filan deveran.” (Ç1).

Cil û firaxên mirîyan bêtir didin zarokên sêwî û dê û bavên sêwîyan (Ç17). Gelek caran jî di ber keda wan da didin yê ku mirîyan dişon û goran dikolin. Herweha didin mirovên feqîr û mihtac, heta ji wan tê jî didin mirovên nimêjker û Quranxwên. Li deverinan jî ji bo ku carê xitmeyan û êvarên inîyan jî yasînan ji mirîyên wan ra bixwînin, cilên mirîyan didin hindeke Quranxwên (Ç1; Ç36).

Berê cil û firaxên mirîyan gelek caran didan melayan jî, lewra melayên gundan yê zikatê bûn û meaşê wan tunebû. Bazîdî jî behsa vî tiştî dike û dibêje kurd cilên mirîyan didin mela û jaran (Bazîdî, 2010: 52). Lê van salên dawî mela bûne xwedî meaş û pêdivîya wan bi van tiştên weha nemaye.

Xwehên xortên ku bi kuştinê çûbin, heta ku heyfa wan neyê hılanîn, cilên wan li xwe dikin (Ç36; Ç63). Cil û firaxên kevin jî yan tîn avêtin, yan tîn şewitandin (Ç10), yan jî li deverekê tîn veşartin da ku di bin erdê da birizin (Ç9).

Di belavkirina cilên mirîyan da di nav gelî da rêkeftinek xuya dike. Tê bawerkirin ku belavkirina cilên mirîyan xêr e û dê fêde li mirîyan bibe. Herweha hat dîtin ku berê mirovan cilên mirîyan qebûl dikirin û li xwe dikirin lê îro yên ku zanibin ew cil yên mirîyan in qebûl nakin û li xwe nakin. Ev jî bi dîtina me tîkildarî aborîya mirovên herêmê ye ku li gorî serdema berê îro baştir e.

Di lêkolînên me da di belavkirina cil û firaxên mirîyan da tu cudahî di navbera kurdên misilman û yên êzidî da nehat dîtin.

# BEŞA ÇAREM

## SERSAXÎ Û ŞÎN

Ev beş, dê di bin sê serenavan da bê ravekirin. Pêşî dê derheqê sersaxîyê da agahî bên dayîn û li gorî zanyarîyên ku ji sehayê hatine berhevkirin û yên ku ji çavkanîyên nivîskî hatine bidestxistin dê analiz bên kirin. Dikare bê gotin ku ji bo famkirina binyada civakî ya kurdên Nisêbînê dê encamên van analîzan ji bo me gelekî sûdewer bin. Piştî mijara sersaxîyê, dê behsa rîtûelên şînê bê kirin. Zanyarî û analîzên derheqê psîkolojîya şexs û civakê da dê di vê beşê da bên dayîn. Di dawî da jî ji rewşa gor û goristanan em dê hewl bidin ku nêrîna civakê ya li mirinê fam bikin.

### 4.1.SERSAXÎ

Li herêmê ji sersaxîyê ra qîmetekî mezin tê dayîn. Çavê xwedîyên mirîyan di wan rojên xemgîn da pêşî li xwedîyan, dûvre jî li heval û dostan digere, lewra bi dîtina wan, dilê wan xweş dibe û bêhna wan derdikeve. Dema ku ji jinan tê pirsîn bê bi ku da diçin, dibêjin sersaxîya filan malê heye “Em ê çin arî wan girîn” yanî tê zanîn ku ev barekî giran e û ew bi tenê nikarin ji bin vî barî rabin, lewma weha dibêjin. Li herêmê gotineka din heye ku dibêjin: “Dibêjin kê mirî rakir, dibêjin sersaxîyê rakir”, ji ber ku xwedîyên mirîyan bi mêvanan ra eleqedar dibin û hindekî xwe ji bîr dikin ev tişt tê gotin (Ç22; Ç36).

#### 4.1.1.Cihên Sersaxîyê

Cihê pêşî yê sersaxîyê goristan e. Piştî xwendina telqînê mêrên xwedîyên mirîyan li cihekî fereh û nêzîkî devê derîyê goristanê dibin rêz û beşdarvanên merasîma veşartinê hemû bi dorê sersaxîyê didin wan. Ev adet ji berê da li herêmê heye û heta îro jî dewam dike (Ç1; Ç5; Ç6; Ç8; Ç10; Ç13; Ç14; Ç18; Ç34)

Êzidî jî bi vî awayî li goristanê sersaxîyê didin hevûdin. Heger mirî ji Ewropa anîbin kesên ku beşdarî merasîma veşartinê bûne ji kamerayê ra diaxivin û sersaxîyê didin xwedîyên mirîyan yên li Ewropayê (Ç27; Ç28; Ç29; Ç30).

Divê bê gotin ku ev sersaxîya li goristanê di demeka kin da diqede û hindek ji wir diçin cihê sersaxîyê û hindek jî diçin malên xwe.

Berê xwedîyên mirîyan mêvan li malên xwe qebûl dikirin û mala mirîyî/yê weke cihê sersaxîyê dihat bikaranîn. Yên maldar zêde zehmetî nekişandibana jî yên feqîr gelekî diketin tengasîyê da. Lewra xanîyên wan biçûk bûn û têra pêşwazîkirina mêvanan nedikir, heta hindekan ji bo jinan xanîyên cîranên xwe bi kar tanîn (Ç14; Ç45; Ç50; Ç65). Bi ser da diçûn firaxên xwarinê û balgih û doşekên rûniştinê jî ji cem cîranan tanîn, lewra firaxên wan têra mêvanên wan nedikirin (Ç4; Ç10; Ç13; Ç15). Jinên malê bê sekn di xizmeta mêvanan da bûn. Digel ku berê mêvan kêm jî bûn vê rewşê xwedîyên mirîyan gelekî diwestand.

Gundî çûn bajar, têkilîyên wan bi mirovên bajarî ra çêbûn, dan û standina wan zêde bû. Herweha hejmara mirovên bajarî jî her ku çû zêde bû, derdora mirovan gelekî fereh bû. Di beşa pêhisandina mirinê da me gotibû li gorî berê îro mirov zûtir bi mirinê dihisin. Li alîyê din berê mirov yan peya yan jî li heywanekê siwar dibûn û diçûn sersaxîyê (Ç10; Ç15; Ç26). Îro erebeyên şexsî yên gelek kesan hene û digel vê yekê jî balafir hene û bi xêra wan mirov ji deverên dûr di hundirê çend saetan da xwe digihînin cihê sersaxîyê. Ji ber van herdu sedeman û gelek sedemên din îro di rojekê da bi sedan kes ji bo sersaxîyê tîna mala mirîyî/yê. Xanîyan nema têra sersaxîyê kir û hindekan ji bo sersaxîyê dikan, bodrûm, embar û qehwexane kirê kirin yan jî hindekan ev der ji bo xizmeta gelî bi xêra xwe dan (Ç8; Ç34; Ç37). Lê ev cih ji alîyê civakê ve zêde nehatin pejirandin. Herweha di apartmanên ku pêşî hatin çêkirin da jî, ji bo ku sersaxî lê bê danîn û civîn bîna lidarxistin cihên civînan hatin çêkirin jî ev armanc pêk nehat û mirovan sersaxîyên xwe li wan deran çênekirin.

Konên Sersaxîyê cara pêşî di salên 2002-2003yan da bi pêşengîya qaymeqamtîya bajarî ji Sûrîyeyê hatin anîn (Ç49; Ç50). Dûvre gelî jî dest bi kirîna wan konan kir û di demeka kin da hejmara konên sersaxîyê li bajarî zêde bû û herweha gundîyan jî ji wan konan kirîn. Bi derketina konan feqîr û dewlemend bûn



weke hev, lewra feqîran jî û dewlemendan jî sersaxîyên xwe li binê van konan dikirin (Ç50; Ç54). Ji bo konan kursî û sehpayên hazir anîn; ji bo xwarinê jî tepsik, çatal, kevçî û qedehên plastîk anîn. Bi vî awayî jinên xwedîyên mirîyî/yê ji şuştina firaxan xelas bûn û vê jî rehetîyeka mezin bi xwe ra anî. Mêvanên ku diçûn binê konî jî ji jêkirina şekalan xelas bûn.

Digel awantajên wê çend dezawantajên konê sersaxîyê jî hebûn. Xwedîyên mirîyan bi sazkirina wê ra pir diteibîn, lewra gelek parçeyên wê hebûn û heta ku hemû li hev dixistin gelekî diwestîyan (Ç20; Ç34). Xwedîyên mirîyan hem bi barkirina firaxên konî û hem jî bi barkirina kursî û sehpayan ra gelekî dibetilîn û ji alîyê madî ve dixisirîn. Kişandina ceyrana hundirê konî jî hindekî zehmet bû. Carna jî ji bo çûnûhatina gelî dibû asteng. Lewra herçiqas hewl didan ku konan di sikakên ku zêde nedihatîn bikaranîn da saz bikin jî gelek caran rêya gelî dihat girtin û ev yek dibû sedema acizîyan. Ji ber ku seyar bûn, li cihê çayxaneyê kêzîna avê tunebû ku ava lewitî têra biçe. Qlîmayên avê tanîn, lê dîsa jî havînan germ bûn. Cihê lûleyên sobeyan jî di konan da hebûn û herweha di hundirê wan da sobe jî dihatin daran lê dîsa jî sar bûn. Jixwe dema ku bayek rabûbaya mêvanên binê konî di nav toz û dûmanê da diman.

Piştî konên sersaxîyê di sala 2010an da cihê sersaxîyê yê yekem li ser Mizgefta Mala Hedlê hat çêkirin (Ç50). Ev cihê sersaxîyê yê pêşî û geleka din jî gelî bi pereyên xwe çêkirin, yanî pêşî gelî dest bi çêkirina cihên sersaxîyê kir. Dûvre şaredarîyê û walîtîyê çêkirina cihên sersaxîyê weke peywireka xwe ya bingehîn qebûl kirin û li gelek tax û gundan cihên sersaxîyê dan çêkirin.

Piştî xerabûna çend taxên Nisêbînê, dewletê ew tax ji nûve ava kirin û di van taxan da digel mizgeft, dibistan û binkeyên tenduristîyê herweha çend cihên sersaxîyê jî çêkirin. Yanî cihên sersaxîyê weke mizgeft û dibistanan bû hêmaneka girîng ya jîyana nû ya bajarî.

Divê bê gotin ku weke konên sersaxîyê, cihên sersaxîyê jî pêşî li bajarî derketin û dûvre çûn gundan. Niha li piranîya taxên bajarî û gundan cihên sersaxîyê hene, heta li hin gundên mezin du cihên sersaxîyê hatine çêkirin (Ç15; Ç26).

Li gorî konan gelek awantajên cihên sersaxîyê hene. Tevlî kursî û sehpayan hemû firaxên wê hene û pêdivî bi rakirin û danîne tuneye. Qlîmayên wan havînan hundirû dicemidînin û zivistanan jî germ dikin. Xwedîyên mirîyan heqê av û ceyranê jî nadin lewra ava wan ji kîsî şaredarîyê ye û ceyran jî ji kîsî şîrketa ceyranê ye. Midbex di hundirê wan da hene û çayê jî li wir tê çêkirin. Ji bo ku havînî ava cemidî bê vexwarin dolabên bûzê jî xistine hundirê wan. Tiwalet, cihê nimêjê û li hindekan jî cihê destilmêjê heye. Herweha gelek caran yên ku sersaxîya wan xelas dibe dolaban tije av dikin û têra rojekê çayê û şekir jî dihêlin. Ji ber wê yekê hewce nake ku xwedîyên mirîyan roja pêşî li av û çayê bipirsin û bikevin nav liv û tevgerê.

Mêr li cihê sersaxîyê rûdinin û jin jî li mala mirîyî/yê mêvanan pêşwazî dikin. Dema ku bi malbatî diçin sersaxîyekê mêr pêşî jinan li mala mirîyî/yê datînin û dûvre jî wir diçin cihê sersaxîyê. Di cihên sersaxîyê yên ku vê dawîyê hatine çêkirin da ji bo jinan jî cih veqetandine û li hindekan jê cihê xwarinê jî heye (Ç10). Lewma dema ku malbat diçin sersaxîyê bi hevûdin ra peya dibin û bi hevûdin ra vedigerin. Yanî ev jî bo mêvanan rehetîyeka mezin e. Lê divê bê gotin ku îro jî li gelek cihên sersaxîyê cihê jinan tuneye, lewma li gundînan, ji bo jinan konên sersaxîyê tên sazîkirin (Ç13).

Berê, dema ku li taxeka bajarî yan li gundekî yek dîmir ji bo sersaxîyê gel diçû mala wan. Lê dîtina mala mirîyî/yê carna zehmet dibû gelekî lê digerîyan (Ç8; Ç37; Ç57). Piştî çêkirina cihên sersaxîyê ev pîrsgirêk jî ji holê rabû. Lewra cihên sersaxîyê gelek jê bi mizgeftan ve ne û yên ku ne bi mizgeftan ve bin jî ji alîyê gel ve tên naskirin û dîtina cihên sersaxîyê gelekî hêsan e. Yanî weke tê dîtîna rehetî û awantajên cihên sersaxîyê ne tenê ji bo xwedîyên mirîyan in, di heman demê da ji bo mêvanan jî ne.

Divê bê gotin ku cihên sersaxîyê bi piranî li cihên herî xweş û berbiçav yên bajarî tên çêkirin. Li bajarî û gundan heger cih guncaw be ji bo cihê sersaxîyê hewşekê jî çêdikin. Cihê Sersaxîyê yê ku li Taxa Dîcleyê ya bajarî hatîye çêkirin yek ji van cihan e. Di hewşa wê da gelek dar û ber hatine çandin, parqa zarokan, alavên werzîşê û cih û kolikên rûniştinê hatine çêkirin. Li alîyekî wê dibistaneka seretayî heye, li alîyê din jî goristanek heye. Li alîyekî ji bo mirîyan peywira dawî tê kirin û li alîyê din jî mirov li parqê bêhna xwe berdidin û kêfa xwe dikin yanî cihê sersaxîyê di navbera mirin û jîyanê da hatîye çêkirin.

Mifteyên cihên sersaxîyê yê bi mizgeftan ve bi melayan ra ne û yê cuda bi mixtaran ra ne (Ç5; Ç7; Ç50; Ç57). Gel sersaxîyê bi piranî li yê nêzîkî mala xwe dike da ku mêvan bi rehetî bikaribin jinan deynin mala mirîyî/yê û biçin cihê sersaxîyê. Lê heger ne vala be, mela yan mixtar alîkarîya xwedîyên mirîyî/yê dike da ku cihekî din peyda bikin.

Heman pêvajoyê ji bo êzidiyan jî derbasdar e. Îro li gundên êzidiyan sersaxî li malên mirîyan tî çêkirin lê ew jî li gundên xwe dest bi çêkirina cihên sersaxîyê dikin û ew ji bo van cihan dibêjin “Mala Êzidiya” (Ç28; Ç29).

Bi qasî awantajên wê nebin jî çend dezawantajê cihê sersaxîyê jî hene. Li mala mirîyî/yê atmosfereka giran û xemgîn heye, lê li cihê sersaxîyê gelek caran mirov dengê henekan dike. Xwedî û hevalên ku ji zûde hevûdin nedîtine (Ç8; Ç19; Ç36). li wir digihin hev, li hal û wextê hev dipirsin, behsa malbatên xwe û kar û xebatên xwe dikin. Ev jî wê atmosfera giran û xemgîn ya li cihê sersaxîyê ji holê radike û gelek caran dibe sedema acizîyan jî.

#### **4.1.2. Mideta Sersaxîyê**

Weke gelek tiştan di mideta sersaxîyê da jî guhertin çêbûye. Berê mirovan sersaxîya xwe li mala xwe datanîn. Lewra dilê wan çiqasî bixwesta, heta ku mêvanekî wan hatiba sersaxîyê, sersaxîya wan hewqasî dewam dikir.

Îro ji ber çend sedeman sersaxî bi sê rojan ve hatiye sînorkirin. Sedemek jê ew e ku li gorî berê mirov zû bi mirinê dihisin û tî sersaxîyê. Yek jê jî zêdebûna derfetên çûn û hatinê ye. Berê mirov yan peya yan jî li ser heywanekê diçûn gundekî. Heger gund dûr baya, roja ku dibihîstin nediçûn sersaxîyê, kengî ketiba bara xwe da, kengî derfetek çêbûba wê demê diçûn sersaxîyê (Ç7; Ç13; Ç15; Ç26). Îro erebeyên şexsî yê gelek malbatan hene. Ji bilî wan otepoz, tirên, dolmîş û bi taybetî jî balafir pir in û mirov di demeka kin da dikarin xwe bigihînin cihê sersaxîyê.

Van salên dawî gelekî kêmbûne jî xwedîyên mirîyî/yê yê nêzîkî di pêvajoya sersaxîyê da dikanên xwe venakin. Li gorî berê girtina dikanan kêmbûne lewra kirîyên dikanan bilind in, mal di dikanan da xera dibe û gel debara xwe ji dikanên xwe dikin û girtina dikanan ji bo xwedîyên mirîyan barekî giran e (Ç15). Herweha

gundî jî diçin cihê sersaxîyê û ji karên xwe dimînin. Ji ber ku mirov ji karên xwe dimînin, dikanên xwe digirin û xwedîyên mirîyî/yê jî dibetilin, mela jî naxwazin ku sersaxî ji sê rojan zêdetir dewam bike (Ç14; Ç34).

Li cihê sersaxîyê ji bo mêvanan her nîvro û her êvar xwarin tê çêkirin. Her roj mesrefa xwarinê zêdetir dibe û yên feqîr dikevin zorê. Ji alîyekî ve jî ji ber pîrbûna mirovan mirin jî zêde bûye û bi taybetî li bajaran carna cihê sersaxîyê bi dest mirovan nakeve (Ç50; Ç57). Mela jî ji bo van sedeman şîretan li gelî dikin da ku sersaxîyê bi sê rojan ra bi sînor bikin (Ç1; Ç45). Herweha mela dibêjin ku pêxember gotîye ji sê rojan pêve sersaxî heram e (Ç4; Ç26; Ç45; Ç50).

Sedemeka din jî guherîna rewşa civakî û zêdebûna karker û karmendên kurd yên li bajarî ye. Yanî gelek kes yan di karên dewletê da û yan jî di karên gelî da bi heq dixebitin. Lewra nikarin li gorî dilê xwe dev ji karên xwe berdin û demeka dirêj li cihê sersaxîyê bimînin. Ev jî pêkereka girîng e di kinbûna dema sersaxîyê da.

Di vê mijarê da tu cudahî di navbera kurdên misilman û yên êzidî da tune. Jixwe îro gelî ev tişt qebûl kirîye û herkes dizane ku sersaxî heta sê rojan dewam dike û roja sêyan sêroka mirîyî/yê tê dayîn û sersaxî xelas dibe. Ji ber vê yekê jî heta ku ji mirovan tê di hundirê her sê rojên pêşî da diçin cihê sersaxîyê, lewra heger di wan sê rojên pêşî da negihabin ku biçin cihê sersaxîyê, mecbûr dimînin ku biçin mala mirîyî/yê. Lê divê bê gotin ku ne yên gelekî nêzîkî mirîyan û xwedîyên mirîyan bin ji bo sersaxîyê mirov naçin mala mirîyî/yê. Yanî divê bê gotin ku sersaxî bi cihê sersaxîyê ve ne sînordar e, piştî ku li wir xelas bû, sersaxî li mala mirîyî/yê dewam dike. Jixwe ji ber ku li gundên êzidîyan hîn çêkirina cihên sersaxîyê xelas nebûye, ew sersaxîyên xwe li malan dikin û lewma jî yên wan ji sê rojan dirêjtir dewam dikin.

Lê heger mirinên nû çênebin carna li gundan sersaxî heta hefteyekê jî li erdê dimîne. Carna jî li gundinan xwedîyên mirîyî/yê dibêjin hîna filan gundî nehatîye sersaxîya me, dibe ku pê nehisîyabin, û ji ber wê yekê jî li hêvîya hatina wan dimînin (Ç8; Ç12; Ç14).

### 4.1.3. Pêkanîna Sersaxîyê

Piştî sersaxîya li goristanê mêr diçin cihê sersaxîyê û jin jî diçin mala mirîyî/yê, konê sersaxîyê yan jî cihê sersaxîyê. Xortên xwedîyên mirîyî/yê, xortên gundî û cîranan li cihê sersaxîyê xizmetê dikin. Li cihinan jî ji bo çêkirin û belavkirina çayê çend kes bi heq tî girtin da ku tu kêmasî nekeve xizmeta mêvanan. Li alîyê din keçên xort li nav jinan heman xizmetan dikin.

Li cihên sersaxîyê, xwedîyên mirîyî/yê yê herî nêzîk; weke bav, kur, bira yan jî rîspîyên malbatê li hundirû li ber derî rûdinin. Yanî xwedîyên mirîyî/yê li çend kursîyên devê derîyî rûdinin. Ji bo melayî jî maseyeka biçûk amade dikin û mîkrofonekê jî datînin serê, yanî cihê melayî jî dîyar e (Ç13; Ç34; Ç57). Dema ku mêvan tî, yê li devê derîyî radibin serxwe, wan pêşwazî dikin û cihê rûniştinê nîşanî wan didin. Dema ku melayî dît ku mêvanên nû hatin û rûniştin di cih da ji bo xwendina fatîhayê weha dibêje:

“Xwedê xêra we qebûl bikê, Xwedê sersaxîya we sipehî bikê, Xwedê mirîyê/ya we efû bikê.\* Li ser rihê pêxemberê me aleyhîssalam, li ser rihê al û eshabîyên wî, li ser rihê mirîyên cemaeta hazir tevde û xusûsen li ser rihê merhûm(ê) el fatîha!”.

Heger mela yan jî kesekî zana li wir tunebe, yek ji wan bi kurtasî dibêje “Li ser rihê merhûm/ê el fatîha!”. Heger mela mêvanan ferq neke, yek ji wan melayî hişyar dike û jê dixwaze ku bedêlîya wan bike. Jixwe heger li cihê sersaxîyê mela jî nebe wê demê yekî zana peywira melayî dike (Ç4; Ç26). Piştî vê vexwendina melayî herkes destên xwe vedike û fatîhayê dixwîne. Dema ku xwendin xelas bû yê berê rûniştî di ber xwe da û yê nûhatî berê xwe didin xwedîyên mirîyî/yê û bi dengekî bilind sersaxîya wan dikin. Xwedîyên mirîyî/yê jî radibin serxwe û malavayîya mêvanan dikin û weha dibêjin: “Hûn bi xêr hatin, li ser seran û ser çavan hatin, Xwedê xêra we qebûl bikê” (Ç31; Ç43; Ç54). Dema ku mêvan dixwazin rabin jî daxwaza xwendina fatîhayê ji melayî dikin, fatîhayê dixwînin û li devê derîyî careka din sersaxîyê didin xwedîyên mirîyî/yê û diçin.

---

\* Bi piranî ev beş bi erebî tê xwendin. Erebiya wê weha ye: Ezemallahû ecrekum, we ehsene ezaekum, we xeferallahû lî merhûm(et)ikum.

Li cem xwedîyên mirîyî/yê peyvên weke rehmêtî, merhûm, ... û hwd. tèn bikaranîn. Nabêjin ma bavê te kengî mir, dibêjin ma kengî rehmêt kir yan jî kengî wefat kir. Lewra rûyê mirinê yê sar û tehl bi vî awayî tê veşartin û ev weke edebekê tê dîtin. Ev tişt ji bo mirinên nêzîk weha ye, lê dema ku mirin kevin bû peyva mirinê bi rehetî tê bikaranîn.

Li gundan, mela piştî nimêjên nîvro, esrê û eşayê di demên qerebalix da li cihê sersaxîyê rûdinin. Herweha dema ku gundî ji bo sersaxîyê diçin deverekê gelek caran melayê xwe jî bi xwe ra dibin. Ji bo ku mela bi awayekî tevahîya gundî temsîl dike, ji bo xwedîyên mirîyî/yê ev tê maneya qedirdayîne û bi hatina melayî kêfxweş dibin.

Dema ku sersaxîya jinan li cihê sersaxîyê yan li binê konê sersaxîyê be ev tiştên ku me li jor gotin ji bo cihê jinan jî derbasdar in. Lê heger sersaxî li mala mirîyî/yê be wê demê hindê guhertin çêdibin. Ji ber ku odeyek têra mêvanan nake ji bo sersaxîyê çend ode tèn raxistin (Ç1; Ç18; Ç36; Ç48; Ç63). Li her odeyekê hin ji xwedîyên mirîyî/yê rûdinin, yanî em bibêjin dêya mirîyî/yê li odeyekê, jina wî li odeyekê, xweh-keç-xaltîk-metik-jinap li odeyekê rûdinin da ku mêvan sersaxîya wan bikin. Her çiqas li her odeyekê xwedîyekî mirîyî/yê hebe jî mêvanên ku tèn berî ku ji mala mirîyî/yê veqetin, dixwazin semyana malê (dêya mirîyî/yê yan jî jina mirîyî) bibînin (Ç9; Ç38; Ç41). Jinên ku xizmetê dikin rê nîşanî mêvanan didin. Li nav jinan jî yên ku peywira melayî dikin û mêvanan vedixwînin xwendina fatîhayê hene û weke ya mêran li cihê jinan jî fatîha tê xwendin (Ç1; Ç4; Ç11; Ç38).

Roja pêşî xwedîyên mirîyî/yê bi şûştin, veşartin û karên cihê sersaxîyê ra gelekî dibetilin û herweha kerba wan jî zêde ye. Ji ber wê yekê jî şeva pêşî gelek caran mela yan jî rihspîyek ji mêvanan dixwaze ku wê şevê zû belav bibin da ku xwedîyên mirîyî/yê xwe rehet bikin (Ç17; Ç34). Roja sêyan sêroka mirîyî/yê tê dayîn û wê êvarê sersaxî xelas dibe, jixwe dema ku sêrok hat dayîn gel fam dike ku wê rojê sersaxî radibe.

Kesên ku dereng bihîstibin, piştî rakirina sersaxîyê, diçin mala mirîyî/yê û li wir sersaxîya wan dikin. Û yên ku nikaribin biçin sersaxîyê, yên li bajaran û Ewropayê bin, telefûnî xwedîyên mirîyî/yê dikin, lêborîna xwe dixwazin, mazereta

xwe dibêjin û sersaxîya wan dikin. Ji ber ku qezayên terefîqê zêde bûne, xwedîyên mirîyî/yê jî mazereta wan qebûl dikin û malavayîya wan dikin (Ç15; Ç24; Ç45). Lewma jî gelek caran li cihê sersaxîyê ji melayî ra tê gotin ku yek bi telefûnê gerîyaye û dixwaze ku bedêlîya wî/wê bê kirin û fatîhayek bê xwendin, mela jî vê daxwazê qebûl dike û fatîhayê dide xwendin.

Ji aliyê şewazê ve sersaxîyên êzidiyan jî weke yên misilmanan in. Li cem êzidiyan jî şex û pîrên wan li cihê sersaxîyê rûdinin û carna diayan ji bo mirîyan dikin. Xwedîyên mirîyî/yê yên nêzîk hemû cilên reş li xwe dikin da ku mêvan wan nas bikin. Mêr jî gumlek û bedlên reş li xwe dikin û carna jî paçikekî reş bi sînga xwe ve dikin (Ç28; Ç29; Ç30).

Kurdên êzidî û yên misilman diçin sersaxîyên hevûdin. Dema ku êzidî diçin sersaxîyên misilmanan heger mela hebe ji melayî û heger nebe ji yekî nas rica dikin da ku fatîhayekê ji dêvla wan bixwînin (Ç28). Misilman li sersaxîyên êzidiyan fatîhayê naxwînin (Ç37; Ç50).

Di sersaxîya wan kesên ku ji aliyê hêzên ewlekariyê yên dewletê ve tên kuştin da, wêneyê mirîyî/yê bi cihê sersaxîyê ve tê daleqandin. Dê, xweh û jinên nêzîkî mirîyî/yê terîşkeka kesk û sor û zer li serê xwe girê didin û carna wêneyê mirîyî/yê bi sînga xwe vedikin. Van salên dawî sersaxîya wan li mala mirîyî/yê tê danîn, lewra hêzên ewlekariyê nahêlin ku sersaxîya wan li cihê sersaxîyê bê kirin.

Berê melayan bi erebî vexwendina mêvanan ji bo xwendina fatîhayê dikirin. Lê ji ber bandora sîyaseta li herêmê û bilindbûna hişmendîya zimanê kurdî van salên dawî piraniya caran ne bi erebî lê bi kurdî mêvan ji bo xwendina fatîhayê tên vexwendin û civak jî bi vê yekê kêfxweş e. Carna jî di serî da bi erebî dest pê dikin û dewama wê bi kurdî tînin lê teqez kurdî dixin nav.

#### **4.1.4. Gotinên Ku Li Cihên Sersaxîyê Tê Gotin**

Sersaxî ji bo dilxweşkirina xwedîyên mirîyan tê kirin, lewra her tiştên ku tên gotin jî ji bo vê yekê ne. Herweha dilqewînîyan didin xwedîyên mirîyan da ku kerba dilê wan hînik bibe û bi vî awayî êşa wan parve dikin. Di sîteyên înternetê yên Nisêbînê da îlanên mirinê tên weşandin lê heta niha di sîteyan da peyamên sersaxîyê

nehatine weşandin û tu daxwaz jî nehatine kirin (Ç39). Gotinên sersaxîyê û dilxweşkirinê li gorî temenê mirîyan tîn guhertin. Dema ku mirovek dimire ji bo sersaxîyê bi giştî ev tişt tîn gotin:

- *Serê we sax bê (Ç15)*
- *Bere yê mayî sax bin (Ç23; Ç31)*
- *Rehma Xwedê lê bê (Ç24)*
- *Cihê wî/wê cenet bê (Ç14)*
- *Xwedê bi rehma xwe şa bikê (Ç59)*
- *Xwedê vê dinyayê neyînê bîra wî/wê (Ç4)*
- *Xwedê teala gunehên wî/wê efû bikê (Ç15)*
- *Xwedê wî/wê efû û mexfîret bikê (Ç57)*

Xwedîyên mirîyan jî van gotinan li mêvanan vedigerînin:

- *Xwedê ji te razî bê (Ç15)*
- *Xwedê îmanê bidê te (Ç15)*
- *Rehma Xwedê li mirîyên te jî bê (Ç22)*
- *Xwedê xêra te qebûl bikê (Ç24)*

Ji bo dilxweşkirinê û dilqewînîyan jî ev tîn gotin:

- *Jixwe ew çûye û em ê jî çin (Ç48)*
- *Em ê hemû vê şerbetê vexwin (Ç24)*
- *Em ê hemû bi peyda çin (Ç1)*
- *Mirin li pêşîya me hemûyan e (Ç24)*



- *Hûn jî tebayî herkesî (Ç2)*
- *Me zanîba ku wê bi girî vegerin, em ê hemû bigirîyana û em mehekê ji ser tirbê nedihatin (Ç24)*
- *Malê dinyayê bane me yê vegeranda, lê ev mirin e û tu kes nikarê vegerîne (Ç24)*
- *Ev rêya çûyîn û nehatinê ye (Ç24)*
- *Mirin qedera Xwedê ye (Ç42)*
- *Ev dinya ji me ra nabê mal û milk (Ç1)*
- *Em sed salî li dinyayê bimînin em ê jî bimirin (Ç24)*
- *Bela ji belayê mestir heye, wê Xwedê li we bigirê, Xwedê hefza me ji ya mestir bikê (Ç63)*
- *Ev dinya ya derewa ye (Ç1)*
- *Ev dinya ya fen û hîla ye (Ç1)*
- *Xwedê sebrê bidê we (Ç32)*
- *Xwedê sebrekê bavêjê ber dilê we (Ç22)*

Heger yê/ya mirî zarok be digel van gotinên jor ev gotinên taybetî jî tên bikaranîn:

- *Xwedê xelefê li we vegerîne (yanî Xwedê yekî/a din bide we û bikeve dewsa wî/wê) (Ç15; Ç24)*
- *Xwedê dewsa wî/wê şîn bikê (Ç36)*
- *Emrê wî/wê ji zarokê dî ra bê (Ç1)*
- *Wê dîsa zarokên we çêbin (Ç9; Ç15)*

- *Xwedê ji we ra bikê zewadê axretê (Li wê dinyayê ew zarok şerbikeki tije ava zemzemê ya cemidî dikin û sêvekê jî dixin devê wî şerbikî da û ji dê û bavê xwe ra tînin) (Ç24; Ç26)*

- *Bêhna xwe fereh bikin, ma ji dê û bavên we çêtir e? (Ç2)*

Heger mirî ciwan be ev tişt jî tên gotin:

- *Tixûb ji mirinê ra tuneye (Ç12; Ç31)*

- *Tu kesî tixûbê mirinê nas nekirîye (Ç31)*

- *Mirin ji mijgulê çavan nêzîktir e (Ç1; Ç7)*

Heger mirî yekî/a nexweş û yixtîyar be û ketibe ber destan weha tê gotin:

- *Çû, ji xwe ra xelas bû, oxira wî/wê ya xêrê bê (Ç36)*

- *Xwedê mistek ax dayê (Ç26)*

- *Kufletên wî/wê pê ra teibîn (Ç4; Ç22)*

- *Sed xwezî bi wî/wê, di nav zarokên xwe da û di nav cihê xwe da wefat kir (Ç13; Ç36)*

Heger yê/ya mirî xwe kuştibe, wê demê digel gotinên dilxweşkirinê carna gazin ji yê/ya mirî tên kirin. Weke “Çi heqê wî/wê li wî/wê û li we hebû? Heqê wî/wê li we nebû ku vî barî bavêjê ser milên we. Xwezî wilo nekiriba.” (Ç1; Ç31)

Û heger mirî bi kuştinê çûbe sersaxîyê didin xwedîyên mirîyî/yê û carna nifirên weha li kujeran dikin: “Xwedê teala heqê wî/wê ji wan ra nehêlê.” (Ç34)

Êzidî jî ji van gotinan geleskan jê bi kar tînin. Herweha ligel wan, çend gotinên weha jî dibêjin:

- *Rehma Xwedê û Tawisî Melek lê bê (Ç28; Ç30)*

- *Dinya bizrê mirinê ye, em ê jî li pey wan herin, dinya ji tu kesî ra namînê (Ç28; Ç30)*
- *Heçî hatiye dinyayê, weke dora êş e, wê ervanê xwe bar bike û ji êş bar bikê (Ç28; Ç30)*
- *Tu sed salî li dinê bî, tê rojekê mêvanê qebrê bî. (Ç27).*

#### 4.1.5. Îkramên Ji Bo Mêvanan

Ji bo mêvanan li cihê sersaxîyê tiştên weke çayê, lezo û avê tên gerandin. Herçiqas kêr jî be dema ku dinya germ dibe hindek jê lezoya cemidî (Ç8; Ç57), qola û fanta (Ç19; Ç26) jî digerin. Digel ku carna rastî rexneyên melayan jî tên van salên dawî şekirê cejnê jî dixin sênîkan û li ber mêvanan digerin (Ç1; Ç13; Ç34; Ç36; Ç41). Bi qasî ku me lê kola li bajarî û gundên wê mira<sup>\*</sup> nayê gerandin. Heta berî bi çend salan li cihê sersaxîyê çixare jî dihat gerandin, lê van salên dawî nema tê gerandin (Ç1; Ç8; Ç10; Ç21; Ç41). Van salên dawî nexweşî zêde bûne û bi taybetî jî nexweşên dil û astimê û her weha mirovên emelîyatkirî jî pir bûne. Asta perwerdehiyê li bajarî û gundan zêde bûye û bêtir jî bi xêra televizyon û internetê mirov di mijara çixareyê da serwext bûne. Lewma jî li gorî berê, îro hesasiyeta tenduristîyê di nav gelî da di asteka bilind da ye û li gorî berê, îro mirov bêtir li xwe miqate ne. Lewma jî ji ber hişyarîyên nexweş, mela û rihspîyên di nav civakê da îro li cihên sersaxîyê çixare nema tê gerandin û vexwarin.

Li cihê sersaxîyê ne tenê tiştên vexwarinê tên gerandin. Digel van tiştan ji bo mêvanan nivro û êvarî xwarin jî tê çêkirin û bi piranî li cihê sersaxîyê tê xwarin. Herweha xwarin ji bo jinan jî tê şandin. Heger mêvanên razanê hebin taştêya sibehan jî tê çêkirin. Berê jinên xwedîyên mirîyan xwarina mêvanan çêdikirin, lê van salên dawî hindek aşpêjan tînin û bi wan didin çêkirin û hindek jî bi xwaringehêkê ra li hev tên û di dema xwarinê da xwarina wan tînin. Berê jinan hem mêvan pêşwazî dikirin, hem sersaxî qebûl dikirin û hem jî xwarin çêdikirin. Dikare bê gotin ku li gorî berê, van salên dawî barê jinan siviktir bûye. Heta berî bi 15-20 salan xwarin ji bo herkesî

---

\* Qahweya tahl e, di sersaxîyên mihelmîyan da tê gerandin.

dihat çêkirin. Yanî kî hatibaya sersaxîyê, nedihat hêlan ku bê xwarin vegere. Ev yek ji bo xwedîyên mirîyan barekî giran bû û mesrefa wan gelekî zêde dikir. Lewra berê rê dûr bûn, çûn û hatin zehmet bû, lewma jî mirovên ku diçûn sersaxîyê neçar diman ku xwarinê li wir bixwin (Ç4; Ç15). Lê îro derfet zêde bûne, erebeyên gelek mirovan hene û dikarin di demeka kin da xwe bigihînin cihê sersaxîyê û vegerin. Lewra yê ku erebeyên wan hene yan di dema xwarinê da naçin (Ç12; Ç17; Ç41; Ç43) yan jî li cihê sersaxîyê xwarinê naxwin. Heta carna di hundirê çend saetan da mirov diçin sersaxîya çend deveran. Li gundan heta ji gundîyan tê li cihê sersaxîyê xwarinê naxwin û dema xwarinê diçin malên xwe da ku xwedîyên mirîyan zêde nexisirin (Ç19; Ç22). Li bajaran jî gelek mirov hay ji vî tiştî hene lê kesên feqîr jî hene ku her danê xwarinê diçin cihê sersaxîyê û li wir xwarina xwe dixwin. Di vê helwesta gelî da bandora mela û alimên olî jî heye, lewra ew vî tiştî ne weke peywireka olî lê weke adetekê bi nav dikin û ji bo rakirina vê xwarinê jî dengê xwe li civakê dikin (Ç10; Ç12; Ç22). Van salên dawî di sîteyên înternetê yê xwecihî û xudbeyan da jî miftû û peywirdarên olî banga rakirina vê xwarinê dikin.

Herçiqas mirov hewl didin ku li cihê sersaxîyê xwarinê nexwin jî hem xwedîyên mirîyan yê ku ji dûr tînin û hem jî xortên ku li cihê sersaxîyê xizmetê dikin xwarinê dixwin û di xwarinê da jî teqez goştê sor heye. Digel ku xwedîyên mirîyan bawer dikin ku xêrên vê xwarina ku didin ji mirîyê wan ra diçe (Ç19) jî ev xwarin ji alîyê madî ve ji bo wan bargiranîyek e.

Kurdên êzidî jî weke yê misilman li mala mirîyî/yê heman tiştan didin mêvanên xwe. Herweha yan ew bixwe, yan jî bi xwaringehê ra li hev tînin û her sê danan xwarinê ji mêvanan ra çêdikin. Lê ji bilî van tiştan adeteka êzidîyan ya cuda heye. Êzidî mêvanên hatî goristanê û beşdarî rîtûela veşartinê bûyî bê xwarin venagerînin. Berê li nav goristanê çend pez digurandin û bi darekê ve didaleqandin. Li wir agirê xwe jî dikirin û herkesî têra xwe goşt jê dikir û li ser agirî dibiraşt lê îro ev adet rabûye. Îro hindê kes, goşt û xwarina xwe li malê çêdikin û hindê jî xwarinê ji xwaringehê dixwazin û dibin goristanê. Bi xwarinê ra fêkî, simît, çixare, av û tiştên weha jî dibin goristanê. Lê divê bê gotin ku hindê jî xwarinê nabin goristanê û mêvanan vedixwînin mala xwe û li wir xwarinê didin wan. Heger

mêvanin jê bê xwarin biçin, êzidî gelekî aciz dibin û dilê wan dimîne (Ç27; Ç28; Ç29; Ç30).

#### **4.1.6. Xwendina Diayan Li Cihê Sersaxîyê**

Li cihên sersaxîyê ji alîyê melayan ve waz li mêvanan tên kirin. Mijarên wazan bêtir mirin û sebr in, herweha derheqê merhamet û efûkirina Xwedê da jî gelek waz tên kirin. Van salên dawî dayîna wazan gelekî kêmbûye. Di kêmbûna wazan da çend sedemên sereke hene.

Sedemek jê ew e ku gelek mêvan tên, çûn û hatin zêde bûye û ji bo kirina wazan dem namîne (Ç8; Ç34; Ç37). Hin rûdinin û hin radibin, carna di hundirê deqayekê da du caran mela fatîhayê didin xwendin. Ji ber vê qerebalix û çûn û hatina zêde, mela nema digihin ku wazan bikin. Lewra gelek caran axaftina wan nîvco dimîne. Heger mela bixwaze ku mêvanên nûhatî li hêvîya xelaskirina axaftina wî bisekinin jî gelek caran yê ku tên xwe ranagirin, gotina mela dibirin û ew bixwe fatîhayê didin xwendin.

Sedemeka din jî axaftina mêvanên cihê sersaxîyê ye. Ji ber ku gelek ji wan ji zû ve hevûdin nedîtine, dema ku li wir rastî hev tên li hal û wextê hevûdin dipirsin û kes guhê xwe nade wazan (Ç14; Ç19; Ç26; Ç34). Gelek caran ji bo ku di nav xwe da neaxivin mela mêvanan hişyar dikin jî lê fêde nake. Lewma jî mela naxwazin wazan bikin.

Sedemek jê jî guhertina statûye melayan e. Melayên berê bêtir yê zikatê bûn û kirina wazan ya li cihê sersaxîyê weke peywirekê didîtin û gelî jî ev hêvî ji wan dikir (Ç7; Ç10; Ç41). Îro bêtirê melayan bûne xwedî kadro û yê zikatê gelekî kêmbûne yanî ji alîyê aborîyê ve mela nema li destê civakê dinêrin. Dayîna wazan jî ne weke peywirekê lê weke tiştêkî dilxwazî dibînin û ji bo wê jî ne gelekî dildar in.

Mirovên ku meraqa tiştinan dikin carna pirsên xwe ji melayî dikin û mela jî bersiva wan dide (Ç26). Yanî ji bo fêrbûna qayîdeyên olî jî cihên sersaxîyê sûdewer in. Li nav mêran zêde Quran nayê xwendin. Heger carekê yekî hafiz hat, melayek yan jî miftîyek hat, tenê bi qasî 4-5 deqeyan Quranê dixwînin.

Li cihê jinan, ji alîyê dayîna wazan û tizbeh û xwendina Quranê ve rewş berovajî ya mêran e. Lewra berê jin dihatin cihê sersaxîyê, digirîn, fatîha dixwendin û diçûn (Ç36). Îro li cihên sersaxîyê yên jinan yeka zana heye, tizbehekî 1000 libî di destê wê da ye û xwendinên jinan yên salewat, yasîn û xitmeyan hesab dike, wan dike ser hev û dema ku giha hejmarekê jî wan teslîm dike (Ç36; Ç38; Ç42; Ç63). Li cihê jinan tizbehên 101 libî, cizokên Quranê û pirtûkçeyên yasînan di salikan da ne yan jî li ser sifrîyên biçûk in. Dema ku mêvaneka nû hat jina zana jê dipirse bê ka quranxwên e yan na, li gorî wê jî xwendina tiştêkî dixwe stûyê wê û ew jî dixwîne (Ç1; Ç9; Ç48). Jinên ku nû dikevin cihê sersaxîyê jî ji jinan dipirsin bê ka çi dixwînin da ku ew jî beşdarî xwendina wan bibin (Ç35; Ç63). Carna cizokên Quranê li yên quranxwên tên belavkirin û xitme tên xwendin, carna pirtûkçeyên yasînan tên belavkirin û xwendin, carna bi tizbehan salewat tên dayîn û carna jî “La îlahe îllallah” tê xwendin (Ç2; Ç4; Ç13; Ç38). Heta bi piranî rojê carekê mewlûd jî tê xwendin (Ç35). Kê çi xwendibe, berî ku rabe û biçê, ji jina zana ra dibêje, ew jî bi derzîka devgirtî di tizbehê xwe yê 1000 libî da nîşan dike. Hindek jê jî kaxet û pênûs li ber wan e, çi xwendibe li wir dinivîse û dixwe ser hev û teslîm dike (Ç9; Ç35; Ç38). Li nav jinan li gorî berê xwendina Quranê, tizbeh û salewat gelekî zêde bûne, lewra li gorî berê rêjeya jinên xwende zêde bûye.

Şêx, pîr yan qewalên êzidîyan jî li cihê sersaxîyê derheqê ola êzdayetîyê da û bi taybetî jî derheqê mirinê da zanyarîyan didin mêvanan û şîret û wazan li wan dikin. Herweha derheqê dîrok û jîyana pêxemberan û qencên Xwedê da jî agahîyan didin mêvanan (Ç28; Ç29). Li nav jinan girî zêde ye û yên ku dizanin diloyan dibêjin û tavêjin ser mirîyî/yê (Ç30).

#### **4.1.7. Alîkarîyên Xwedîyan**

Alîkarîyên xwedîyan yên ji bo mesrefên sersaxîyê barê xwedîyên mirîyan sivik dike. Berê ne tenê xwedîyên mirîyan kesên xerîb jî alîkarî didan mala mirîyî/yê û destvala nediçûn cihê sersaxîyê (Ç4; Ç7; Ç14). Yên ku çûbane sersaxîyekê li gorî qeweta xwe tenekeyek rûn, kêsek şeker, kêsek birinc, kêsek savar, pezek û tiştên weha bi xwe ra dibirin (Ç18; Ç21; Ç33; Ç65). Vê jî dilê xwedîyên mirîyan xweş dikir û ji alîyê madî ve barê wan sivik dikir. Bê çawa xwarina ji bo hemû mêvanan hêdî hêdî

rabû ev adet jî ji bo kesên xerîb rabûye, lê xwedîyên mirîyan hîn jî alîkarîyên weha dikin. Di vê rabûnê da bandora mela û aliman (Ç10; Ç12; Ç22) û herweha bandora malbatên dewlemend heye. Lewra malbatên dewlemend bi mehneya ku pêdivîya wan pê tune ye ev alîkarî nexwestin (Ç4; Ç10; Ç31). Lê ev adet li cem mitirb û êzidîyan hîn dewam dike (Ç31; Ç32).

Li gelek deverên herêmê roja pêşî li mala mirîyî/yê ji bo mêvanan xwarin nayê çêkirin (Ç1; Ç13; Ç15; Ç24; Ç25; Ç34). Berî ku cemaet ji goristanê vegere û belav bibe hin xwedîyên mirîyî/yê dengên xwe li cemaetê dikin û dixwazin ku bên mala wan xwarinê bixwin. Ne tenê xwedîyên mirîyî/yê vê pêşniyarê dikin, herweha gundî û cîran jî weha dikin û herkes li gorî qeweta xwe komekê dibe mala xwe û xwarinê dide wan (Ç12; Ç17; Ç34). Heger mezinekî gundî hebe nahêle tu kes biçe deverêka din û mêvanan hemûyan dibe mala xwe. Ev adet ji berê da heye û îro jî dewam dike.

Li gorî zanyarîyên ku Bazîdî dide, ev adet ji berê da li cem kurdan hebûye. Bazîdî dibêje heta sê rojan li mala mirîyî/yê xwarin nedihat çêkirin û cîranan xwarin çêdikirin û dibirin mala mirîyî/yê (Bazîdî, 2010: 52). Li gorî agahîyên ku çavkanîyên me dan me berê li deverinan heta hefteyekê jî li mala mirîyî/yê xwarin nedihat çêkirin (Ç1; Ç4; Ç24), cîranan mêvan dibirin malên xwe, xwarina wan didan wan û herweha hindêk xwarin dibirin mala mirîyî/yê jî. Lê îro tenê roja pêşî li mala mirîyî/yê xwarin nayê çêkirin, rojên din xwedîyên mirîyî/yê yan aşpêjan tînin û xwarina xwe bi wan didin çêkirin û yan jî xwarina hazir ji xwaringehê tînin û didin mêvanên xwe (Ç11; Ç13; Ç19).

Gundî û cîranan ne tenê ji bo xwarinê alîkarîya mala mirîyî/yê dikirin, pêra karên mala mirîyî/yê jî dikirin. Li gundan, gundîyan paleyîya mala mirîyî/yê dikirin, hêrana wan dikirin, bendera wan didêran, batoza wan dikirin, cotê wan dikirin, heywanên wan êm dikirin û karên wan yên din dikirin (Ç15; Ç24; Ç26). Heger mêvanên razanê hebana herkesî hindêk dibirin mala xwe û bi şev li mala xwe radizandin (Ç4; Ç12; Ç35). Li gundinan ne weke berê be jî, ev alîkarî hîn dewam dike.

Li gelek gundan û li bajarî, malbatên xwedîyan ji bo mesrefên sersaxîyê alîkarîya madî didin mala mirîyî/yê. Li deverinan, dema ku ji bavikekî yan ji malbatekê yek dimire, mezin yan rihspîyê wan peywira organîzasyona sersaxîyê dide yekî ji malbatê (Ç34; Ç37; Ç41). Hemû mesrefa sersaxîyê ew dike û li cem xwe dinivîse. Piştî ku sersaxî qedîya li hev rûdinin û mesrefê di nav xwe da parve dikin û bi hevra dixisirin da ku tade li mala mirîyî/yê neyê. Malbat çav li hev dikin û ev tişt her ku diçe di nav civakê da belav dibe. Ev alîkarîyên gundî, cîran û xwedîyan dilê mirovan xweş dikin, wan nêzîkî hev dikin û têkilîyên civakî xurt dikin.

Ev alîkarî di nav êzidîyan da jî heye û dema ku diçin sersaxîyekê hê jî tişteki xwarinê bi xwe ra dibin. Bi taybetî jî roja pêşî ji bo rîtûela veşartinê û xwarina li goristanê destevala naçin û teqez tişteki xwarinê bi xwe ra dibin (Ç28; Ç29).

#### **4.1.8.Sersaxî û Têkilîyên Civakî**

Heta ji mirovan tê, bi tena serê xwe naçin sersaxîyan, teqez hevalemî yan hevalinan bi xwe ra dibin û diçin. Lewra mirov çiqasî qerebalix biçin sersaxîyê hem ji bo wan wesfek e û hem jî xwedîyên mirîyan vê weke qedirdayînekê dibînin û pir kêfxweş dibin (Ç4; Ç14). Xwedî, gundî û cîran her roj diçin cihê sersaxîyê, li cihê sersaxîyê gelekî rûdinin û zû ranabin, heta hindê jê rojê çend caran diçin (Ç20; Ç34; Ç57; Ç66). Yên ku nêzîkî yê/ya mirî bin qerebalix diçin û jinên xwe jî bi xwe ra dibin, lê yên xerîb jinan bi xwe ra nabin (Ç14; Ç38). Piştî ku sersaxî qedîya xwedîyên mirîyî/yê li hev rûdinin û ji hevûdin dipirsin bê ma kî hat û kî nehat sersaxîya wan. Yên ku nehatine sersaxîyê tesbît dikin û biryarê didin ku heger yek ji wan bimire ew jî dê neçin sersaxîya wan, lê vê yekê nadin rûyê wan û xwe ji wan naxeyidînin (Ç4; Ç10; Ç15). Lewra çûyîna sersaxîyê di nav civakê da weke deynekî tê dîtin (Ç2; Ç10; Ç14). Heger mirovek hatibe sersaxîya yekî/ê, teqez divê ew jî biçe ya wî/wê, heger neçe jî teqez divê sedema neçûyîna xwe ji wan ra vebêje û lêborîna xwe bixwaze. Lewra heger berî ku mazereta xwe bibêjin û lêborîna xwe bixwazin li deverekê rastî hev bî gelekî li ber xwe dikevin. Derheqê vê mijarê da li herême gotineka weha heye: “Mirov bi du tiştan ji ber hev dikevê: yek sersaxî ye û ya din jî dawet e.” (Ç54). Lewra dema ku malbatek neçe sersaxîya xwedîyên xwe, ew xwedî jî nayên sersaxîya wan û bi vî awayî jî ew mirov ji hevûdin qut dibin.



Sersaxîyin jê qerebalix in û hin jê jî ne weha ne. Bi taybetî ya malmezinan, ya dewlemendan, ya kesên xuya û navdar gelekî qerebalix e (Ç22; Ç24; Ç31; Ç39; Ç43; Ç50). Ji ber du sedeman ev qerebalix çêdibe; yek jê, ji ber ku têkilîyên van kesan bi gelek mirovan ra hene û alîkarîya wan gihaye gelek mirovan, weha ye. Û ya din jî ew e ku mirovên ku pêdivîya wan bi xwedîyên mirîyî/yê heye û karê wan bi wan diqede diçin, yanî hindêk ji bo menfaeta dinyayê diçin (Ç24; Ç31; Ç50).

Heta li gorî dîtina gelî mela jî ferqîyê dixin nav sersaxîyên dewlemend û feqîran. Tê gotin ku di sersaxîyên dewlemendan da carna çend mela pevra rûniştî ne û ji wir venaqetin, lê di yên feqîran da carna melayek jî li cihê sersaxîyê nayê dîtîn (Ç10; Ç22; Ç50). Melayên ku ji bo pereyan diçin sersaxîyan tên naskirin û civak bi giştî ji vî tiştî aciz e (Ç7; Ç22; Ç66), jixwe divê bê gotin ku melayên weha pir kêman in.

Sersaxîya mirovên feqîr û yên ku di nav civakê da zêde nayên naskirin ne qerebalix e. Mitirb sersaxîyên xwe weke “pezekî bê şivan” pêname dikin (Ç31). Ji bo ku zêde naçin sersaxîyên wan, mitirb gazinan ji civakê dikin. Herweha dibêjin mela jî kêman tên sersaxîyên me û yên ku tên jî zêde namînin, wazan nakin û weke mêvanekî fatîhaya xwe dixwînin û diçin. Yanî li gorî wan civak bi giştî ferqîyê dixin nav sersaxîyên wan û yên din û ew ji ber vî tiştî xemgîn in (Ç31).

Qerebalixî, ji bo xwedîyên mirîyan cihê şanazîyê ye, bi vê qerebalixê kêfxweş û serbilind dibin (Ç4; Ç8; Ç41). Lewra malbatin jê bi tiştên weke sersaxîyê cihê xwe yê di civakê da dibînin, bê ka gel ji wan hez dike û hesabê wan dike yan na (Ç8; Ç34). Li gorî wan sersaxîya wan çiqasî qerebalix be, xwedîyên wan çiqasî li wan kom bibin, ji bo nîşandayîna mezinahî û tifaqa malbatê hewqasî girîng e (Ç8; Ç41; Ç50). Ne tenê ji bo nîşandayîne herweha ji bo endamên malbatê jî ev tişt girîng e, lewra têdigihin ku ne bi tenê ne, ne bêxwedî ne û di derîyên teng da hindêke ku bi hawara wan ve bêt hene (Ç41). Li alîyê din xwedîyên mirîyan derfetê dibînin ku xemgînî û liberketina xwe bi xwedî, heval û dostên xwe ra parve bikin û bi vî awayî asta kerba wan hindêkî kêman dibe.

Bi giştî li gorî berê qerebalixa sersaxîyan gelekî zêdetir bûye. Sedemek jê li gorî berê zêdebûna mirovan e. Li gorî berê ji ber karê xwe, ji ber meqamê xwe û ji

ber gelek tiştan derdora mirovan ferehtir û têkilîyên wan bêtir bûne û gelek ji wan tèn sersaxîyê (Ç26). Dema ku hin xwedîyên mirîyan li gundekî bin hemû gundîyên wan, li sazîyekê bin hemû hevalên wan, li apartmanekê bin hemû şênîyên apartmanê pêra yan jî peyra diçin sersaxîyê (Ç4; Ç43; Ç57). Li gundan, berê derfet nebûn ku gelek pevra çûbane, lê îro erebe pir bûne, rê xweş bûne û mirov jî halxweş bûne, ev jî sedemek e ji bo zêdebûna mêvanên sersaxîyan (Ç50). Herweha li herêmê bandora sîyasetê jî li ser mirovan zêde heye, ji ber nasnameya mirovan ya sîyasî têkilîya wan bi xwedîyên sersaxîyê ra nebe jî ji ber ku ji alîyê sîyasî ve xwe nêzîkî hevûdin dibînin, diçin sersaxîyên wan (Ç19; Ç37; Ç41). Jixwe rêvebirên partî, komele û odeyan xwe ji sersaxîya tu kesî nahêlin û gelek caran li cihê sersaxîyê fotografan dikişînin û di medyaya civakî da parve dikin (Ç39; Ç50). Rêvebirên sazîyên dewletê yê weke miftî û qaymeqaman diçin sersaxîyên dewlemend, malmezî, kesên xuya û karmendên dewletê (Ç39; Ç50). Sedemeka qerebalixîya sersaxîyan jî ew e ku, mirovin jê nas bikin jî û nas nekin jî çî sersaxîya ku çêdibe diçinê, lewma li gorî bawerîyê çûyîna sersaxîyan gelekî xêr e (Ç36; Ç48).

Li herêmê heta ku dê û bav sax bin ji bo neçûna sersaxîyan gel gazinan ji zarokên wan û heta ji bûkên wan nakin, lewra dê û bav malbatê temsîl dikin. Lê piştî ku dê û bav mirin gel hêvîyan ji zarokan dike ku bî sersaxîyên wan. Ji bo vê yekê jî piştî mirina dê û bavan; metik, xaltîk, ap û xal zarokan bi xwe ra dibin sersaxîyên xwedî û dostan, da ku wan bi hevûdin bidin naskirin (Ç37; Ç41). Lewra di sersaxîyan da dût-nêzîk hemû endamên malbatê li hevûdin kom dibin û zarokên wan hevûdin nas dikin (Ç19; Ç41).

Bi xêra sersaxîyan dilmayînên di navbera mirovan da ji holê radibin, lewra mirov ji hev xeyidî bin, dilê wan ji hev mayî be jî, xwe ji sersaxîyên hevûdin nahêlin û diçin (Ç1; Ç20). Keç û xort li cihên sersaxîyê xizmetê dikin û adetên malbata xwe û yê civakê li wir fêr dibin (Ç8; Ç41). Lewra li cihê sersaxîyê herkes hewl dide ku li gorî adetên wê derê tevbigere û kes naxwaze ji rêzê derkeve. Xwedîyên mirîyan û mirovên xêrdîn kêmasîyên cihên sersaxîyê û heger peve bin kêmasîyên mizgeftê dibînin û li gorî qeweta xwe wan kêmasîyan temam dikin (Ç37; Ç50).

Ji ber ku li herêmê hejmara êzidîyan gelekî kêr bûye têkilîyên wan bi hevûdin ra xurt in. Jixwe çend gundên êzidîyên derdorê, mirîyên xwe li Goristana

Hesen Begê ya di ser gundê Mezrika Mihokan ra vedişêrin. Dema ku yê/ya mirî tînin goristanê, êzidîyên hemû gundan li goristanê kom dibin. Piştî ku rîtûela veşartinê xelas dibe, wê rojê jî û rojên peyra jî diçin sersaxîya xwedîyên mirîyî/yê. Gelek mêvanên wan ji Ewropayê jî tînin sersaxîyê. Merasîma veşartinê û dayîna sersaxîyê ji bo êzidîyan derfetekê derdixe holê ku êzidîyên herêmê hemû li hev bicivin, li hal û wextê hevûdin bipirsin, derheqê pirsgirêkên xwe da biaxivin, alîkarîya hev bikin. Herweha êzidîyên herêmê û yê Ewropayê jî bi vê helkeftê hevûdin nas dikin. Ne tenê êzidî herweha misilman û suryan jî diçin sersaxîyên wan (Ç27; Ç28; Ç30).

## 4.2.ŞÎN

Piştî mirina kesekî/ê, xwedîyên mirîyî/yê xemgînî û liberketina xwe bi helwest, tevger û hin nîşanên cuda didin xuyakirin. Ev tişt bi giştî weke şîne tê binavkirin. Şîn ji bo mirîyan jî nîşaneka rêzgirtinê ye. Lewra kesên ku li gorî rêgezên civakî şîna mirîyên xwe nekişînin ji alîyê civakê ve tînin şermezarkirin. Lewma jî di civakê da ji bo kesên ku şîna wan nayê kişandin bi maneya ku tu kes li ber neket, biwêja “ji kîsî xwe çû” tê bikaranîn. Lewma Butler dibêje jîyana ku şîna wê neyê kişandin weke jîyan nayê hesibandin û nehêja ye (Butler, 2005: 49).

Dema ku mirovek dikeve ber xetereya mirinê da qehr, êş û liberketina xwedîyan dest pê dike lê divê bê gotin ku ev ne weke şîne ye. Lewra çiqas biçûk jî be hîn hevî heye ku nexweş li jîyanê vegere. Nexwe divê bê gotin ku şîn bi windahîyê ango bi bûyera mirinê dest pê dike.

Mirov dikare ji du alîyan ve li mijara şîne binêre, ji alîyê nasnameya yê/ya mirî ve û ji alîyê yê mayî ve. Yanî şîna kîjan mirîyî/yê girantir e û kî bêtir şîne dikişîne, mijar li dor van herdu pirsan bê vegotin dê baştir be.

Divê bê gotin ku yê ku herî zêde li ber mirîyan dikevin û şîne dikişînin malbatên wan û xwedîyên wan in, yanî di şîne da têkilîya dîyarker xwedîtiya ji xwînê ye (Ç9; Ç15). Elbet dost, heval, gundî, cîran û heta mirovên ku mirîyî/yê nas dikin jî şîne dikişînin lê asta wê li gorî ya xwedîyan gelekî nimz û ji alîyê demê ve jî pir kin e (Ç24). Dema ku mirovekî/a ku civak jê hez dike dimire, civak jî şîna wî/wê dikişîne, lê şîna mirovên ku civak ji wan hez nake ji alîyê civakê ve nayê kişandin (Ç37). Ç8

got li sersaxîyekê, dema ku mela behsa yê/ya mirî dikir, digirîya û hêstirên xwe paqij dikirin.

#### 4.2.1. Mirinên Ku Mirov Gelekî Pê Têşin

Illich dibêje di sedsala nozdehemîn da mirin tenê di kesên nexweş û yixtîyar da normal tê dîtin û ji bilî vê her mirin bêwext e (Illich, 2004: 114). Lê dîsa jî mirin di ser hev ra ne û hindêk jê bandoreka mezin li ser kes û civakê çêdikin.

Ç18 got “Mirin hemû ne weke hev e, li bal Xwedê yek e lê li bal evdan ne yek e”. Yanî hemû mirin weke hev bandorê li ser yên mayî nakin. Li gorî gelî tu tişt ne barê kezebê ye, yanî mirina herî zehmet ya zarokan e (Ç4; Ç9; Ç13; Ç33). Gökka jî dîyar dike ku ji roja roj da êşa herî mezin êşa mirina zarokan e (Gökka, 2010: 168).

Ji bo zarokan jî, heger ne zêde yixtîyar û di ber destan da be, mirina dê ji hemû mirinan zehmettir e. Heta di nav gelî da gotinek heye ku dibêjin “Derdê kezebê da ser siwarê neqebê” (Ç24; Ç36). Li vir siwarê neqebê “bira” ye, yanî mirina bira gelekî zehmet e, lê ya zarokan ji ya bira jî zehmettir e. Ç33yê têkildarî vê mijarê ev tişt gotin:

“Bira û kurê xesûya min herdû di erebeyê da bûn û erebeya wan qulipî. Wextê ku xesûya min giha cihê qezayê, birayê wê miribû û kurê wê birîndar bû. Xesûya min di ser laşê birayê xwe ra qevast û baz da kurê xwe bir qîstexaneyê Dîyarbekirê.”

Di civakê da mirina mêr û semyanê malê jî ji bo jina wî gelekî zehmet e. Dema ku semyanê malê dimire peyva “Derîkê wan hat girtin.” tê bikaranîn. Lewra jin ne tenê li ber mêrê xwe dikeve, di heman demê da li jîyana xwe ya nû difikire û li ber xwe jî dikeve (Ç24; Ç34). Ç2 dibêje dema ku bavê zarokan dimire, jina wî li ber dikeve û şîna wî dikişîne, lê zarokên li malê ji bo dêya xwe mecbûr dimînin ku şînê bikişînin. Ji ber vê yekê ye ku di civakê da gotinek heye ku dibêjin “Kezeb xîşt e, bira pişt e û malxerabûn hemû tişt e” (Ç2; Ç9; Ç33). Li vir ji malxerabûnê mebest mirina semyanê malê ye. Divê bê gotin ku îro jina ku mêrê wê dimire weke berê şepirze nabe û mala wê xera nabe, lê dîsa jî jê ra zehmet e.

Bê çawa piştî mirina mêrê xwe, jin li ber xwe dikeve û li ser pêşerojê dikeve nav fikaran, endamên malbatê hemû jî hem li ber mirîyên xwe û hem jî li ber malbata xwe dikevin.

Wekî din, mirinên ji nişkê ve, mirinên li xerîb û xurbetê, mirinên komî (Ç1; Ç24), mirinên ciwanan jî gelekî zehmet in û liberketina xwedîyan jî li gorî vê yekê zêdetir e. Herweha heger laşê mirîyî/yê parçe bûbe, ev mirin jî di nav civakê da bandoreka mezin çêdike û gelekî pê têşin (Ç23; Ç24). Lê bi qasî ku me lê kola di nav gelî da mirina herî zor ya bi destê mirovan e (Ç1; Ç4; Ç13; Ç18; Ç24), lewra malbat vî tiştî ne weke kuştina kesekî lê weke kuştina malbatê hemûyî dibînin (Ç9).

#### **4.2.2. Bertekên Şîne Yê Pêşî**

Şîn, bi bûyera mirinê dest pê dike û ev destpêk gelek caran rewşeka trawmatîk derdixe holê. Bi dîtî yan bihîstîna bûyera mirinê ra xwedî û hezkirîyên mirîyan dikevin nav derûnîyeka pir cuda û di wê kêliyê da asta şîne gelekî bilind e. Ew kêliya ku mirov xebera mirinê dibihîze demeka pir taybetî û cuda ye. Lewra çî bê serê mirovan jî hêvî qut nabe, lê dema ku mirov dimire, êdî hêvîya ku careka din li jîyanê vegere tune ye û mirin xelasek e, dawîyeka teqez û misoger e.

Her xebera mirinê bi heman bertekan nayê pêşwazîkirin. Mirina yekî/a ku ketibe ber destan da, mirina yekî/a ku ji zû ve nexweş be, mirina yekî/a yixtîyar di civakê da weke tiştêkî awarte nayê dîtî (Ç4). Xwedîyên wan li ber wan dikevin û li ser wan digirîn, lê di heman demê da ew gotina “ji xwe ra xelas bû” (Ç11; Ç59; Ç63) jî tê gotin û mirin bi rêzdarî tê qebûlkirin.

Lê xebera mirinên ji nişkê ve û yê bi destê mirovan pir giran in û bandoreka mezin li xwedîyên mirîyan dikin. Gelek kes wê kêlika pêşî vî tiştî qebûl nakin û li hemberî vê xeberê bertekên cuda nîşan didin. Nexasim ku yê/ya mirî nestêlih be, bi heyf û hêja be ew xeber hîn bêtir mirovan têşîne û wan dixê rewşeka xerab da. Ji peyva nestêlih û bi heyf mebest mirovên ciwan, yê ku bi miradên xwe şa nebûne, yê nûzewicî, yê xwedî zaro, yê semyan, yê xuya, û hwd. ne.

Dema ku xwedîyên mirîyan xebera mirinê distînin, gelekî li ber wan dikevin û vê liberketina xwe bi van bertekan nîşan didin: Digirîn (Ç2), dikin hawar

(Ç31;Ç38), li paq û kabokên xwe dixin (Ç4), li tepê sînga xwe dixin (Ç9; Ç13), li milên xwe dixin, li serê xwe dixin (Ç44), şeqaman (Ç1; Ç68), neperûşkan li rûyê xwe dixin (Ç1; Ç8; Ç63), cil û pêşîra xwe diqetînin (Ç8), pora xwe dikişînin (Ç36), pora xwe hildikin (Ç24), pora xwe vediçirin (Ç31), firaxan li erdê dixin û dişikînin (Ç44). Van bertekan bêtir jin nîşan didin, lê carna mêr jî digirîn (Ç8; Ç37) û ji qehra pora xwe hildikin (Ç23). Hindek jê xwe winda dikin (Ç44), aqil tavêjin, xeberan didin (Ç24), dikenin, şaş dibin, dikevin şoqê (Ç18), dilê wan têşe (Ç38). û hindek jê jî yeqîn nakin (Ç24).

Bertekên herî dijwar li ser gorê û ji aliyê jinan ve tên nîşandan. Lewra yên ku dilê wan gelekî bi yê/ya mirî ve be, xwe li erdê dirêj dikin (Ç8), xwe li erdê digevêzin (xwe di axê didin) (Ç1), axa gorê bi serê xwe dadikin. Ç33 li ser vê mijarê weha axivî: “Xortekî me yê 18 salî mir, dêya wî hat û li ber koma xwelîyê (li vir xwelî bi maneya axê hatîye bikaranîn.) rûnişt. Hemû xwelî bi serê xwe dakir û li ser xwe kom kir.” Çavkanîya me got ev adet li cem me hebû û dema ku yekî nestêlih miribaya dêya wî yan jî xweha wî ev tişt dikir. Bazîdî jî behsa vî tiştî dike û dibêje jinên xwedîyên mirîyî li ser gorê xwelîyê bi serê xwe dadikin (Bazîdî, 2010: 77). Divê bê gotin ku xwedîyên wan kesên ku ji aliyê hêzên ewlehîyê yên dewletê ve tên kuştin, van bertekên tund nîşan nadin.

Hindek jî xwe tavêjin ser gorê yan jî bi ser gorê da dikevin (Ç24), xwe li ser gorê dirêj dikin (Ç36). Ç1ê têkildarî vê mijarê weha got:

“Di qezayeka terefiqê da ji mala apê min 7 kes mirin û gorên her heftan li ba hev çêkirin û veşartin. Hingî kezeba jinapa min şewitîbû, kela wê hînik nedibû. Lewma jî xwe bi ser tîrbên wan da digindirand û digot “Rebî ez jî bi ser we bigerim”\* Û ji aliyekî ve jî axa ser tîrba wan tavêt devê xwe û dixwar.”

Herweha derheqê bertekên zêde yên li ser goran da Ç13ê jî ev agahîya balkêş da me: “Kurê keçka xweha min kuştibûn. Wextê ku laşê wî anîn ku veşêrin, berî ku mirîyî daxin tîrbê, dêya wî çû ser tîrbê û xwe avêt hundirê wê. Dûvre ew ji tîrbê

---

\* Ez jî di demeka nêzîk da bimirim

derxistin û kurê wê veşartin.” Bi vê hereketê mebesta dêya mirîyî ew bû ku, berî wî yan jî bi wî ra bê veşartin.

Carna jî xwedîyên mirîyan bûyera mirinê qebûl nakin û bawer dikin ku yê/ya mirî çûye derekê û dê bê. Piştî ku demek diçe û yê/ya mirî nayê jinûve ji mirinê yeqîn dikin (Ç1; Ç19; Ç68).

Ç52 dibêje ola îslamê rê dide ku mirov bêdeng bigirî û li ber mirîyê xwe bikeve, lê olê girîyê bideng û tiştên zêde qedexe kirine. Dîsa tê bawerkirin ku ji ber van tiştên zêde, êş û ezab li mirîyan dibare, cihê wan di gorê da namîne û mirîyên wan nema tên xewna wan (Ç6; Ç24; Ç32). Bawerîyeka din ya di nav gelî da jî ew e ku mirî her êvarên inîyan (li gorî çavkanîyan her êvar) tên devê derîyê mala xwe, kêlîyekê li kufletên xwe dinêrin û diçin. Lê li gorî vê bawerîyê heger xwedîyên mirîyan bideng bigirîn û zêdegavîyan bikin ew mirî nema tên mala xwe (Ç31; Ç51). Yanî ji bo rê li ber zêdegavîyên xwedîyên mirîyan bê girtin gelek bawerîyên bi vî awayî di nav gelî da hatine derxistin.

Digel ku ola îslamê ji bo şînê nîşandana bertekên tund qedexe kiriye û bi qasî ku me dît li sehaya xebatê ev qedexe ji alîyê mêr û jinan ve xweş tê zanîn jî bi taybetî jin piranîya caran bi xwe nikarin, li ser mirîyên xwe digirîn, helwestên cuda nîşan didin û ji sînoren ku olê xêz kiriye derdikevin derve. Jixwe dema ku hindêk zêde li ser mirîyên xwe nagirîn, gel dibêje li ber mirîyên xwe nakevin (Ç1). Divê bê gotin ku ev yek jî weke zexteka civakî bandorê li ser bertekên jinan dike.

Divê bê gotin ku ev bertekên navborî li cem kurdên misilman û yên êzidî tevde tên dîtin. Piranîya van bertekan li nav gelên cîhanê û herweha li nav civaka kurd jî tên dîtin. Weke nimûne Izady derheqê bertekên şînê yên jinên kurd da weha dibêje: “Jin her daîm neperûşkan li rûyên xwe didin, xwînê ji dem û anîyên xwe tînin.” (Izady, 2011: 424). Allison jî dibêje piştî mirina yekî/a ciwan, jinên êzidî li sîng û çavên xwe dixin (Allison, 2007: 138).

### **4.2.3. Qusandina Por û Kezîyan**

Dema ku birayê wan yê ciwan dimir, keçikan kezîyeka xwe jê dikir. Ev kezîqusandin îro gelekî nayê dîtin, lê heta berî bi 50-60 salî di nav kurdên herêmê da

û bi taybetî jî di nav koçeran da gelekî dihat dîtin. Xwehên mirîyî kezîyeka xwe jê dikirin (Ç45) û li deverinan tavêtin ser darbest û tabûtê (Ç2), li deverinan tavêtin ser gorê (Ç1; Ç45), li deverinan bi kêlên goran vedikirin (Ç9), li deverinan jî ber kêla gorê dikolan û ew kezî dixistin bin erdê (Ç33). Heger yê mirî kesekî ciwan û xwedî zarok baya, wê demê keçên wî yên xort jî kezîyên xwe jê dikirin (Ç24). Têkildarî kezîqusandina jinan da di civakê da çend biwêj hene. Yek ji van biwêjan “Li min kezî qusandê” (Ç1) yan jî “Li min porkurê” (Ç36) ye ku dema ku hindek ji hev diqeherin weke nifirekê weha ji hevûdin ra dibêjin. Yanî dixwazin bibêjin ku xwezî tu bimirî û ez li ser te pora xwe biqusînim û kezîya xwe jê kim. Dîsa bi heman maneyê biwêja “Li min kezî kurê, dûrî serê bav û bira.” (Ç1) jî heye, di vê biwêjê da jî xuya dibe ku kezî ji bo mirina bav û bira tên qusandin. Ç33yê behsa berê kir û got:

“Dûr ji vada, guhê şeytên ker bê, tê bira min, kurê xaltîka dêya min mir, 3 keç û 3 kurên wî hebûn. Piştî mirina wî nêzîkî 50 mirovî kezîyên xwe jê kirin. Her sê keçên wî, metik, xweh û yên nêzîk hemûyan kezîyên xwe jê kirin.”

Weke jinên kurdên misilman, jinên êzîdî jî heta berî bi 20 salan, piştî mirina yekî bi heyf û nestêlih qembûra\* xwe jê dikirin. Piştî ku qembûra xwe jê dikirin, bi darekî vedikirin û ew dar di ber kêla gorê da diçikandin. Heta berê keçikên êzîdîyan ne ku li ser mirina mêran bane tu carî pora xwe jê nedikirin. Carna ku jinên êzîdî ji mêrinan diqeherin weke nifirekê “Rebî li ser te min xwe qusando” yan jî “Rebî li ser rihê te ez xwe biqusînim” dibêjin (Ç28; Ç30). Li cem jinên êzîdî por yek ji wan tiştên herî biqîmet e û liberketina xwe bi qusandina kezî û qembûran didin xuyakirin.

Ev adeta kezîqusandinê ji berê da di çanda kurdî da tê dîtin. Bedirxanî di Hawarê da behsa mirina Şêx Evdîrehmanê Garisî dike û weha bangî jinên kurdan dike: “Keç û bûkên Kurdistanê, gulîyên xwe kur bikin, xwelî li serên xwe bikin, reşa xwe girêdin, şîn...şîn bikin, bi ax û zarîne bigirîn.” (Bedirxan, 1998: 225). Bazîdî jî behsa kezîqusandinê dike û dîyar dike ku piştî mirina yên nestêlih jin, keç û xwehên mirîyî gulîyên xwe jê dikin û wan gulîyan bi kêla gorê ve didaleqînin (Bazîdî, 2010: 52). Allison jî dema ku behsa jinên êzîdî dike dibêje dema ku yekî ciwan dimire kezîyên xwe diqusînin û heta dîyar dike ku li cem jinên kurd bi giştî ev adeteka

\* Kezîya piştî serî ya sitûr.



berbelav e (Allison, 2007: 138). Lê divê bê gotin ku îro ev adeta kezîqusandinê li cem kurdên misilman jî û li cem kurdên êzidî jî zêde nayê dîtin (Ç28; Ç30; Ç31; Ç33; Ç45).

#### 4.2.4.Dûrik

Li hin deverên herêmê di nav kurdên misilman da ji bo wan stranên ku tavêjin ser mirîyan “dûrik” tê gotin (Ç4). Li deverinan jî navekî li van stranên nayînin û wan weke “avêtina ser mirîyî/yê” bi nav dikin. Kurdên êzidî ji wan ra “dilo” yan jî “diloyê pîreka” dibêjin (Ç28; Ç30). Ji bo wan kesên ku dûrikan dibêjin tu nav nayê gotin, lê di xebata xwe da em dê peyva “dûrikbêj” bi kar bînin.

Di dûrikan ango diloyan da behsa qencî, merdbûn, xweşikayî, mezintî û biçûkanî, mêranî û şervanîya mirîyî/yê tê kirin. Wekî din behsa awayê mirina yê/ya mirî jî tê kirin û naveroka dûrikan gelek caran li gorî vê yekê teşe digire. Herweha digel pesnê mirîyî/yê, di dûrikan da derheqê jîyana rojane, rêgezên civakî û têkilîyên mirovan da jî gelek agahî û rexne tên dîtin. Dûrik ji pêş da nayên hazirkirin û jiber nayên gotin, ya dûrikbêj li gorî hestên xwe yê wê kêlikê gotinan li hev tîne û dibêje (Ç9; Ç33). Dema ku mirov bala xwe dide dûrikên herêmê, peyva sereka “birawo” ye. Ev peyv ji zayend û asta xwedîtîya yê/ya mirî bêrî ye û tê pêşîya hemû xîtaban. Weke nimûne; birawo yabo, birawo yadê, birawo xwehê, birawo keko, birawo metikê, birawo xaltîkê û hwd. Gelek caran dûrikbêj hewl didin ku dawîya hevokan li hev bînin û dûrik ne weke helbestan lê weke stranên tên gotin. Taybetîyeka dûrikên herêmê jî ew e ku tu carî bi zimanekî din nayên gotin û teqez bi kurdî tên gotin (Ç4; Ç8; Ç9; Ç24; Ç31; Ç33; Ç42).

Melayên herêmê dibêjin li gorî ola îslamê avêtina ser mirîyan heram e (Ç6; Ç52; Ç64), lê li gorî zanyariyên ku çavkanîyên me dan me di ola êzdayetîyê da ne heram e (Ç28; Ç29). Çavkanîyên me yê misilman herambûna wê qebûl dikirin û ev heramî tanîn zimanî. Mêr di vê mijarê da gelekî hişk bûn lê jinan digot hingî kezeba me dişewite em nikarin xwe û em dûrikan dibêjin.

Hindek îstîsnayên wê hebin jî dûrik ango dilo bêtir ji alîyê jinan ve tên gotin. Dema ku me sebeba vê yekê pirsî hat gotin ku ji ber cihê wan yê di civakê da mêr

fedî dikin ku dûrikan bibêjin (Ç9). Carna heger yê mirî gelekî bi heyf û hêja be bira, bav û kalik jî tavêjin ser mirîyê xwe û di ber ra jî digirîn (Ç8; Ç37). Ç31ê derheqê gotina mêran ya dûrikan da weha got:

“Carê zanayên me tavêtin ser mirîyên xelkê, lê netavêtin ser mirîyên xwe. Tê bîra min, berê ji malekê yek hatiba kuştin, dihatin cem bavê min. Navê mirîyê xwe, awayê kuştina wî û di heqê mirî da hinek tiştên dî jî ji bavê min ra digotin û dixwestin ku bavê min bavêjê ser mirîyê wan û wî jî tavête serê. Ji bo vê yekê jî pere didan bavê min. Lê îro hew kes dibêjê bavêjin ser mirîyê me.”

Yaşar Kemal jî behsa mêrên dûrikbêj dike û dibêje li nav kurdên Tirkîye, Îran, Îraq û Sûrîyeyê di wê kêlîya ku mirî dibirin goristanê da mêran bi hevûdin ra dûrik digotin (Kemal, 2004: 23). Li gorî ku Kemal ev pirtûk di sala 1943yan da nivîsiye tê famkirin ku wê demê mêrên kurdan jî di pey mirîyan ra û hem jî darî çavê civakê dûrik digotin.

Bi qasî ku me lê kola li herêmê tu kesên ku bi pereyan dûrikan dibêjin tunene, lê jinên ku gelekî dizanin bibêjin hene û di nav civakê da jî ev kes tên naskirin. Piranîya kesên dûrikbêj di jîyana xwe da gelek êş kişandine, gelek mirîyên wan çêbûne û kezeba wan gelekî şewitiye (Ç13; Ç17; Ç23).

Dûrik wê kêlîya pêşî li cem mirîyî/yê, li ser goran, li cihê sersaxîyê û li mala mirîyî/yê tên gotin. Li cihê sersaxîyê yan li mala mirîyî/yê, xwedîyên mirîyî/yê yên herî nêzîk yên weke dê, xweh, keç, metik, xaltîk, pîrik, keçap, jintî, jinbir û jinên xwedîyên wan dûrikan dibêjin (Ç11; Ç24; Ç59). Di şîna kesên ku ji alîyê hêzên ewlekarîyê yên dewletê ve tên kuştin da dê û xwehên mirîyî/yê dûrikan nabêjin, lê carna jinên xerîb tavêjin serê (Ç15). Yek dest bi dûrika xwe dike, dema ku betilî bangî yeka din dike û dibêje filankesê tu jî dengê bavêje serê û dorê dide wê (Ç1; Ç11). Ne tenê xwedîyên mirîyî/yê dûrikan dibêjin, carna hindêk nizanin dûrikan bibêjin û ji jinên zana dixwazin ku bi xêra xwe bavêjin ser mirîyên wan (Ç11; Ç13). Bi vî awayî avêtina ser mirîyî/yê didome û jinên rûniştî jî di ber ra li ser mirîyî/yê digirîn. Ne ku tenê li ser mirîyê/ya wê malê digirîn, herweha dema ku dûrik tên gotin mirîyên wan tên bîra wan û li ser mirîyên xwe jî digirîn. Jixwe ji gotina dûrikan mebest ew e ku xwedîyên mirîyan bigirîn û bêhna wan derkeve (Ç9; Ç16). Li ser vê

mijarê Ç9ê got ku heger dûrik neyên gotin girîyê jinên rûniştî nayê. Dema ku jinin jê nagirîn yên din dibêjin “Rebenê, filankesê çi dilqewîn bû, hêstirek jî ji çavê wê nehat!” (Ç1; Ç16).

Heta jinin jê hingî dizanin dûrikan bibêjin, mêrên ku dibihîzin jî xwe nagirin û digirîn (Ç9; Ç13). Ç28ê êzidî di vê bareyê da weha axivî: “Di tu olan da kesek nikare weke pîrekê êzidiyan bavêjin ser miriyan. Go pîrekê me bêjin, însanê çiqasî mêr bê, mêrxas bê, nikarê xwe ragirê û digirî.” Weke ku di beşa rîtûela veşartinê da jî me gotibû, berovajî misilmanan, jinên êzidiyan tên ser gorê û raserî gorê disekinin. Neh-deh jinên reşgirêdayî li alîyekî gorê ligel hev disekinin û ji destpêka rîtûela veşartinê heta dawî bê navber diloyan dibêjin. Bi dorê nabêjin û li hêvîya hevûdin nasekinin, heryekî jixweber bi dengê bilind dibêje û di ber ra jî digirî (Ç27; Ç28; Ç30).

Bazîdî dîyar dike ku jin, keç û xwehên mirîyî/yê bi dengê bilind dûrikan dibêjin (Bazîdî, 2010: 52). Dema ku Şerefxan behsa mirina Siltan Selahedîn dike dibêje piştî mirina wî herkesî dûrik digotin (Şerefxan, 2009: 79). Weke ku ji çavkanîyên nivîskî jî dîyar dibe adeta dûrikgotinê di nav kurdan da ji berê da heye û ev adet îro jî dewam dike. Em dê li jêr cih bidin çend dûrikên ku me li sehaya xebatê berhev kirin.

Nimûne-1: Bira û kurê jinekê herdû di erebeyê da ne û erebeya wan diqulipe. Dema ku jin digihe cihê qezayê, dinêre ku birayê wê mirîye û kurê wê birîndar e. Ew jî di ser laşê birayê xwe ra diqevêze û baz dide cem kurê xwe û wî dibe nexweşxaneyê Dîyarbekirê. Heta ku ji Dîyarbekirê vedigere dinêre ku laşê birayê wê hatîye veşartin. Diçe nav jinan û weha tavêje ser birayê xwe:

“Lê lê mala bavê xopanê xwehê.

Ez çûme vî çîyayî,

Min dît taveka xunava barana hûr

Li vê porkur û vê serdena xweha te dayî.

Wele gelî jinên didin rîyano,

Tu kes li min lom û gazindan nekin.

Hingî derdê kezeba mala xweyî şewitî har bû,

Nehîşt ez bigihîjim hawar û himdada vî birayî.” (Ç33)

Nimûne-2: Mixaletîyê jinekê yê ciwan û bavê sê zarokan li Çîyayê Erebanê li ser cadê qeza dike û dimire. Ew jî bi dû mirina mixaletîyê xwe ra vê dûrikê dibêje:

“Wayê wayê wayê wayê wayê

Lê hima li min korê li min nemayê

Ez dê piştta xwe bidim vê sibekê stûna stêre

Wele min berê xwe da serê çîyayê Erebanê

Ez nizamim gilî û gazindê xwe bikim ji kê ra

Wayê hewaye xopana Erebanê diketim

Min go hazê li min hazê

Wele min dî sibeka va sibê zû kula dilê min giran e

Dîkê avête ser gopika vê sorazê

Wele li min korê li min nemayê

Wayê dilê vê jara dayîka wek qetran e

Wele min dî alîkî deşt e,

Ji kula dilê vê dêya we ra yek zozan e

Wele dibê ne derd e ne derman e

Hingî kula dilê dêya we giran e

Wele vê sibekê ne hekîm e ne luqman e

Min go hîv î vêce sed caran li min hîv î

Wele vê sibekê bîrê gundê me çikîyane, gihane nîvî

Wele di mala bavê min rebena Xwedê da

Neman sûndê van serîyan.

Wele kula dilê dayîka we giran e  
Îro xwedîyê xencerê karan zîvî...” (Ç33)

Nimûne-3: Jineka êzidî tavêje ser dîya xwe:

“Wey birawo yadê, wey birawo yadê,  
Wey birawo yadê, wey birawo yadê...  
Wey lê dêya min berberê heft mêran bû,  
Ez qurbana bejn û bala zirav bim  
Wa yadê! Destê min û te ji hev qut bû yadê,  
Ez bi qurbana dêka xwe me.  
Navê yadê çiqas şêrîn e yadê,  
Navê yadê çiqas xweş e yadê,  
Wa yadê, wa delalê, wa bûkê,  
Qurbana te me yadê,  
Ez rebena kebanîya mala bavê xwe me yadê,  
Wê bavê min li malê li hêvîya kê bê yadê,  
Te qewêtîya bavê min li min kiro,  
Ez rebena kula dilê te me yadê,  
Wa xaltîkê, va xweha te hate cem te,  
Ez rebena dêya Sîyamend im  
Weleh dîya min lê hêja bû  
Bêrvana vê sibekê, ji xem û xeyala dilê min û te ra,  
Wele bejn û bala dêya min dirêj e lê lê.  
Wey birawo yadê, wey birawo yadê,  
Wey birawo yadê, wey li minê...” (Ç30)

#### 4.2.5. Nîşanên Şînê

Dema ku yek ji malekê dimire li wê malê jîyan bi awayekî din diherike. Li wê malê heta demekê kêf û şahî nema tê dîtin û bihîstin. Lewra dilê wan bi kul e û şîna mirîyên xwe dikişînin. Ji bo mala mirîyan gotinên weke “di şînê da ne”, “di reşê da ne” tên bikaranîn. Ji bo jinên di şînê da jî “reşa xwe girêdan” tê gotin.

Şîna yên yixtîyar û ji zû da nexweş zêde nayê kişandin (Ç4; Ç51) û ji ber wê yekê jî di demeka kin da yên mala mirîyî/yê li jîyana xwe ya rojane vedigerin. Ç28ê derheqê mirina yixtîyaran da weha got: “Em zêde li ber nakevin, çênabê ku em bêjin mala Xwedê ava, lê em dibêjin Xwedê mistek ax dayê û em şîna wan zêde nakişînin.”

Pêvajoya şînê ji bo jin û mêran ne weke hev dimeşe. Jin cilên spî, rengîn, bi qeseb, bi gul, beriqandî, beloq, nû û paqij li xwe nakin (Ç2; Ç13; Ç38), heta rojên cejnan jî cilên nû li xwe nakin (Ç23). Li herêmê herçiqas rengê şînê reş be jî rengên qehweyî, lacîwert û tarî jî weke rengên şînê tên qebûlkin û jin weke nîşana şînkîşandinê cilên ji van rengan li xwe dikin (Ç1; Ç11). Ji bo vê yekê li herêmê “Xwe reş girêda, Reşa xwe girêda” (Ç1; Ç2; Ç16; Ç24; Ç26; Ç28; Ç31) tên gotin. Bazîdî û Bedirxan jî behsa cilên serdema şînê dikin û dibêjin kurd piştî mirinê cilên reş li xwe dikin (Bazîdî, 2010: 52; Bedirxan, 1998: 231-232). Li welatên Rojhilata Dûr û hin deverên din rengê şînê spî ye (Jones, 2004: 345) û Halse dibêje li piraniya welatên cîhanê rengê reş weke rengê şînê tê bikaranîn (veguhêzer Hacıgökmen, 2013: 398).

Jin cil û çarikên xwe naşon û naguherin, heger gelekî bilewitin, bêhn ji wan bê û mecbûr bimînin, ji bo ku tu kes nebîne bi şev dişon, zuwa dikin û bi roj dîsa wan cilan li xwe dikin (Ç2). Çarikên bi morîk nadin serê xwe û xizmeyên xwe jê dikin (Ç30). Heta di nav jinan da gelek caran peyvên weke “Ji mirina filankes ve min morîk bi çarikên xwe ve nekirine.” (Ç11; Ç48) tên bikaranîn. Hindek jî ji ber ku nema wan bi kar tînin piştî mirinê morîk û xemlên xwe hemûyan li jinên derdorê belav dikin (Ç18; Ç23). Jinên di şînê da xwe naedilînin, li xwe nanêrin (Ç36), pora xwe naşikinin, pora xwe hine nakin (Ç2; Ç11; Ç30), çavên xwe kil nakin (Ç23), zêrên xwe bi xwe ve nakin.(Ç1; Ç30).

Jina ku mêrê wê dimire nema xwe diedilîne, ji mêrên xwedîyên mirîyî pêve zêde nikare bi mêrên xerîb ra bide û bistîne (Ç9; Ç25; Ç36). Lewra çavên malbata mêrê wê ji berê bêtir li ser in û li gorî xwe *guhdarê namûsa xwe ne*.

Wekî din heta hefteyekê-deh rojan karên giran yên weke şuştina merş û rûyê lihêfan, dotina şîr nakin, lewra dibêjin “destê me li me nagerê, destê me lê naçê” (Ç1; Ç16; Ç24). Havînî jî dema ku li ser textan radizin, perdeyên textên xwe yên spî pêve nakin (Ç11).

Carna li mala mirîyî/yê, yên ku gelekî li ber mirîyî/yê dikevin heta çend rojan dilê wan naçe xwarinê û xwarinê naxwin (Ç8). Li alîyê din xwarinên weke rovîyê îşandî, kutilk, serûpê, û hwd. li herêmê pir bi qîmet in û ji alîyê civakê ve pir tîn hezkirin. Şeva ku ev xwarin tîn çêkirin şênîyên malê pir bi kêf in, lewma di pêvajoya şîngirtinê da ev xwarin li deverinan nayên çêkirin (Ç24). Li hin gundên çîyayî jî benî nayên çêkirin (Ç16). Hindek jê piştî mirîyên xwe dibêjin “Filankeso/ê ji filan xwarinê gelekî hez dikir, piştî wî/wê ew xwarin li min heram bê” û nema wê xwarinê dixwin (Ç1; Ç11).

Mêran berê heta hefteyekê-deh rojan riha xwe nediqusandin û cilên xwe nedişuştin û nediguhertin (Ç15; Ç21; Ç31; Ç48). Wan jî weke jinan heta çend rojan karên giran yên weke çûna cot û çandinîyê nedikirin (Ç15). Herweha berê ji ber mirinê dikan dihatin girtin û li ser dikanan nivîsa “Ji ber sersaxîyê girtî ye!” gelekî dihat dîtin lê van salên dawî ew nivîs pir kêmtê dîtin. Lewra li gorî berê îro, ne yekî/a gelekî nêzîk be, ji bo mirîyî/yê dikan zêde nayên girtin. Li gorî berê mirov zêde bûne, derdora mirovan ferehtir bûye û mirin zêdetir bûye, lewma heger ji bo mirinê mirov dikanên xwe bigirin dibe ku di mehekê da nivê rojan dikan girtî bimînin. Jixwe kirêyên dikanan biha ne, mal di wan da heye û heger girtî bimîne xera dibe û sedemên weke van rê nadin ku mirov dikanên xwe bigirin (Ç7).

Hin tişt hem ji alîyê mêran ve û hem jî ji alîyê jinan ve tîn kîrin. Heta hefteyekê-deh rojan mêr jî û jin jî ser û cilên xwe naşon. Mala mirîyî/yê bi giştî xwe ji kêf û şahîyê dûr dixê, zêde deng ji mala şînê nayê, heta demekê teyb, radyo û televizyonên wan girtî dimînin (Ç2; Ç4; Ç13; Ç24; Ç29; Ç59). Heta ku mêvan ji bo sersaxîyê bîn, ser û cil nayên şuştin, televizyon û radyo venabin, rih nayê qusandin.

Lewma ji ber ku li gorî berê sersaxî zû xelas dibe dema van tiştan jî kin bûye. Herweha zarok jî ji bo televizyonê israr dikin û li gorî berê televizyon zûtir tîn vekirin (Ç9; Ç31). Li deverinan bi qewimîna mirinê ra cilikekê bi televizyonê dadikin, heger hebe cilikekê bi wêneyê mirîyî/yê yê daleqandî da jî dikin (Ç36). Sebeba pêdakirina vê cilika ser wêneyî ew e ku dema ku li pêşberî wî wêneyî bikenin û kêfê bikin da ew wan nebîne (Ç19; Ç36). Bi cilika ser televizyonê jî liberketina xwe ya ji bo mirîyî/yê nîşan didin û dixwazin mêvanên ku bîn jî vî tiştî fam bikin. Ev pêdakirina cilikan heta ku mêvan xelas dibin dewam dike. Jixwe dema ku li malekê yek dimire, piştî demekê, heger li malê nebe jî sûretê wî/wê mezin dikin û bi dîwarî ve didaleqînin.

Xwedîyên mirîyan zêde nakenin, madê wan giran e, henekan nakin, zêde naçin nav civakê, naçin dawet û şahîyan, naçin ger û piknîkan û dawetan nakin (Ç17; Ç30). Heger ji mecbûrî biçin dawetekê jî li wir nakevin reqsê. Hindek jê jî çend şevên pêşî ranazin yan jî ji qehran xewa wan nayê (Ç1).

Jinin jê heta demekê li ser doşekên hirî rûnanin û ranazin û serê xwe nadeynin ser balgihan (Ç18; Ç30). Bi vê hereketa xwe liberketina xwe ya ji bo mirîyî/yê nîşan didin û dixwazin bibêjin “piştî ku tu nema li ser van rûdinî û radizî ez jî xwe tebayî te dikim.” Ç18ê li ser vê mijarê weha got: “Piştî mirina birê min, jinbira min heta mir jî li ser doşekê neraza, ji malê derneket û neçû sikakê.”

Xwedîyên mirîyan yê gelekî nêzîk weke xatireyekê cil û firaxine yê/ya mirî ji xwe ra dibin û dihilînin (Ç8; Ç16; Ç47). Ji bo ku her cara ku lê binerin yê/ya mirî bê bîra wan, van tiştan dihilînin. Ji bo vî tiştî bêtir tizbeh, saet, hungilîsk, guhar, qotîya cixarê, mûçink, gopal, eynik û tiştên weha tîn hêlan. Dema ku zarok dimirin, carna dêya wan fanêreyekî yan jî pantorekî wan yê neşûştî ji xwe ra dihêle û carê bêhn dike (Ç36). Derheqê hilanîna tiştên mirîyan da Ç24ê ev zanyarî bi me ra parve kirin: “Pora xalê min zer bû, piştî ku mir, xalê min yê mezin hinek ji pora wî ya zer jê kir û xiste nav paçikekî. Serê çend rojan ew paçik tanî û vedikir, hemûyan li wê porê dinêrî û digirîyan.” Weke ku di vê nimûneyê da jî tê dîtin ne tenê cil û firaxên mirîyî/yê tîn hilandin herweha tiştên weha balkêş jî tîn hilandin.



Yên ku zêde li ber mirîyê/ya xwe dikevin û jê hez dikin heta hefteyekê, hindêk jê jî heta mehekê her sibeh û her êvar diçin ser gora wan (Ç4; Ç19; Ç24; Ç47). Bi vî awayî bêhna wan derdikeve û pêvajoya şîne ji bo wan parîyekî hêsantir dibe (Ç49). Lewra li gorî bawerîyê, yên ku diçin ser gorê, ji alîyê mirîyan ve tên dîtin û mirî dengê wan jî dikin. Herweha ji bo ku hezkirina xwe ya ji bo yê/ya mirî nîşan bidin gorên wan spehî çêdikin.

Dema ku zarokek dimire û di peyra yekî/a din çêdibe, heger zayenda wan yek be, malbat navê yê/ya mirî li zarokê/a nûçêbûyî dike (Ç8; Ç37; Ç47). Bi vî navlêkirinê malbat dixwaze hezkirina xwe nîşan bide û nav û xatireya zarokê/a mirî li dinyayê bimîne.

Berî bi 40-50 salî li bajarî û gundinan jinên mala mirîyî/yê li cihê sersaxîyê çarikên spî didan serê xwe û desmalek yan jî yazmayeka reş di ser çarikê ra li anîya xwe girêdidan lê îro ev adet rabûye (Ç13; Ç36). Yên ku hatibane sersaxîyê ji vî girêdanê fam dikir bê ka kî xwedîyên mirîyî/yê ne. Heta carna mêvanên ku dihatin sersaxîyê jî weha dikirin, lê piştî ku rûdiniştin yeka ji xwedîyên mirîyî/yê ji wan ra digot “Hûn li ber me ketin û we desmala reş qulipand, mala we ava lê desmalên xwe jê kin.” û diçû desmalên wan yên reş vedikirin (Ç13).

Dema ku mirovek bi kuştinê diçe xwedîyên wî/wê gelekî li ber dikevin û şîna wan jî gelekî giran e. Xwedîyên yê/ya kuştî li ber xwe dikevin, lewra ew malbat di nav civakê da kêmtê dîtin, heta ku heyfa xwe nehilînin jî gel tana dide wan û dibêjin hûn bi kêrî hilanîna heyfa xwe nayên. Xwedîyên yê/ya kuştî di nav civakê da bikenin, henekan bikin, kêfekê bikin gel ji wan ra dike kêmasî (Ç19; Ç24; Ç41). Dema ku bi hindêkan ra bikevin nîqaşekê yan jî pevçûnekê, tana didin wan û weha dibêjin: “Bi kêrî hilanîna heyfa xwe nayên, mêranîya xwe li me dikin, heke tu mêr î here heyfa xwe hilîne.” (Ç15; Ç18). Xwedîyên kuştîyî/yê di nav civakê da qels û bêdeng in, lewma jî ev awayê mirinê ji malbatekê ra gelekî zehmet e. Berê nêteka xwedîyên mirîyan nebane jî ji ber tanên civakê carna xwe mecbûr didîtin û kujerên mirîyên xwe dikuştin (Ç18; Ç20).

Li deverinan dema ku yek tê kuştin xwehên yê kuştî pora xwe weke ya kurikan kur dikin û cilên yê mirî li xwe dikin (Ç24; Ç36). Sûnd dixwin ku heta heyfa

xwe nehilînin dê weha bin. Carna bav yan jî birayê yê kuştî dibêjin “Heta ku ez heyfa wî nehilînim livîna jina min li min heram bê!” (Ç8; Ç18) û jinên jî ji bo ku birayê wan bêmirad diçe, sûnd dixwin ku piştî kuştina birayên xwe nezewicin (Ç46). Li deverinan heger ji gundî yan cîranan yên ku dijminatîyê dikin, yên ku ji xwedîyên yê/ya kuştî hez nakin hebin yan jî heger malên xwedîyên yê/ya kujer li nêzîk hebin, berî ku laşê mirîyî/yê ji malê derxin jinên malê dilîlîyênin. Bi vê lîlandinê dixwazin peyamekê bidin dijminên xwe û bibêjin ku bi vê mirinê kêma nabin û zêde ne xema wan e (Ç53).

Divê bê gotin ku îro gelek caran mirovên bi xatir, yên xuya, şêx, mela û sîyasetmedar dikevin navbera malbatan û nahêlin ku kuştinên nû çêbin û wan li hev tînin (Ç36; Ç52). Ev levanîn berê jî hebû, lê dikare bê gotin ku li gorî berê, van salên dawî bêtir encam tê standin û rê li ber kuştinan tê girtin. Ev levanîn ji bo mirinên ku bi qezayên terefiqê qewimîne jî tê kirin. Malbata yê/ya kuştî “heqê xwînê” distîne û levhatin çêdibe. Hindek dibêjin qey qedera Xwedê bû, em tê bihûrtin û em heqê xwînê nastînin. Heqê xwînê mîktarek pere ye, piranîya caran ev mîktar li gorî qeweta malbata kujerî tê hesabkirin. Carna jî ji bo ku levhatin misoger bibe xwedîyên kujerî keçeka xwe didin xwedîyên kuştîyî û li kurekî wan mahr dikin (Ç45). Şerefxan balê dikişîne ser kuştina zêde ya li nav kurdan û dibêje berdêla kuştina mêrekî keçeka xort, hespek yan jî çend sewal in (Şerefxan, 2009: 33-34). Mîktara heqê xwînê ji bo zarokan hindekî kêmtir e û bi piranî ji bo yixtîyaran heqê xwînê nayê standin.

Berê gora kesên ku dihatin kuştin, heta ku heyfa wan nehatiba hilanîn xweşik nedihat çêkirin û heta navê yê kuştî jî li ser kêla gorê nedihat nivîsîn (Ç20). Lewma ji ber ku tiştêk li ser kêla gora yê kuştî nedihat nivîsîn dema ku mirovek hatibaya kuştin gotina “Kêla wî spî kirin.” (Ç18) dihat bikaranîn. Ev adet îro li deverinan rabûye û li deverinan jî dewam dike (Ç36).

Bi qasî ku me li sehayê dît, di nîşanên şînê da tu cudahîyên berbiçav di navbera kurdên misilman û yên êzîdî da tunene û jixwe tiştên ku heta niha me rave kirin, tiştên hevbeş in. Lê weke cudahîyekê ku mirov bikaribe bibêje, li nav êzîdîyan li cihê sersaxîyê, digel jinan xwedîyên mirîyî/yê yên mêr jî cilên reş li xwe dikin. Yan bedlekî reş, yan gumlekekî reş li xwe dikin û carna jî paçikekî reş bi sînga xwe

ve dikin. Vî tiştî hem ji bo ku şîna xwe nîşan bidin û hem jî ji bo ku mêvan bizanibin bê xwedîyên mirîyî/yê kî ne dikin (Ç28).

#### 4.2.6. Helwesta Civakê Di Serdema Şînê Da

Gundî û cîran li mala şînê miqate ne û dema ku diçin sersaxîyê, li gorî xwedîyên mirîyî/yê ew jî madê xwe giran dikin, henekan nakin, cilên rengîn û berîqonkî li xwe nakin (Ç2; Ç46), zêrên xwe bi xwe ve nakin (Ç11), xwe derman nakin û pora xwe hine nakin (Ç36). Li deverinan jin bi şev pora xwe hine dikin û ji bo ku kes pê nehise û ji wan ra neke kêmasî dema ku hineyê distirin û li pora xwe dikin lepikan dixin destên xwe, da ku destên wan sor nebin (Ç9).

Berê xwedî, gundî û cîranan li malên xwe, televizyon û radyoyên xwe venedikirin (Ç15; Ç18), cil û merşên xwe nedîşûştin (Ç13; Ç24), heger şûştibana jî bi şev dişûştin da ku mala mirîyî/yê nebîne (Ç2; Ç4; Ç45). Îro hem mala mirîyî/yê û hem jî gundî û cîran ji bo ku bêhn ji wan neyê û li hember mêvanan fedîkar dernekevin ser û cilên xwe dişon û mala xwe paqij dikin. Yanî bi gotina Ç13ê “Berê xweşûştin eyb bû, îro xweneşûştin eyb e!” Melayên herêmê jî paqijîyê pêşnîyar dikin (Ç6; Ç52) û civak jî ji alîyê hişmendîya paqijî û hîjyenê ve li gorî berê gihaye asteka bilindtir. Li gorî bawerîyekê, gemara bi ser û cilên xwedîyên mirîyan ve li dinyaya din diguvêşin devê mirîyên wan û ji bo ku ev tişt pêk neyê jî, divê mirov di pêvajoya şînê da xwe paqij bike (Ç24).

Jinên ku diçin cihê sersaxîyê yan mala mirîyî/yê, li wir bi xwedîyên mirîyî/yê ra digirîn. Jin ji vê yekê ra dibêjin “Em ê arî wan girîn” û yên ku li wir negirîn jî, weke ku li ber mirîyê/ya wan neketibe ji alîyê jinan ve tèn şermezarkirin (Ç1; Ç4; Ç24).

Yanî xwedîyên mirîyî/yê çî bikin û xwe ji çî dûrbixin gundî û cîran jî darî çav weha dikin û rêzê li wan digirin. Civak ne tenê xwedî, gundî û cîranan herweha heger li gorî usûla şînê tevnegerin mala mirîyî/yê bi xwe jî rexne dikin, heta mala mirîyî/yê di nav xwe da jî carna hevûdin hişyar dikin (Ç23; Ç33). Li gorî hin çavkanîyên me, ji dilê mirovinan neyê jî, ji bo ku civak dev neavêje wan û nebêje li ber mirîyê/ya xwe neketin, tiştinan dikin û xwe ji tiştinan dûr dixin (Ç1; Ç8; Ç24; Ç34). Ç13 dibêje yên

ku dilê wan dişewite hay ji şîna mala mirîyî/yê hene û yên ku dilê wan naşewite ne xema wan e.

Îro li herêmê piştî mirina jinê, mêrê wê dizewice; lê piştî mirina mêrê, jina wî nazewice. Bi gelemperî weha ye lê ji bo herdu rewşan jî bêguman îstîsna hene. Di civakê da gazin ji mêran nayê kirin, lê zewicîna jinê weke tiştê kirêt û sosret tê pêşwazîkirin û şermezarkirin. Tê gotin ku mêr şikestî ye (Ç9) yanî bi kêrî xwe û zarokên xwe nayê, bi kêrî danîn û hilanîna malê nayê, bi kêrî çêkirina xwarinê û lînêrîna zarokan nayê (Ç1; Ç11; Ç32; Ç59).

Herçiqas civak zewicîna mêrê weke tiştê normal dibîne jî, mêrên ku zû dizewicin ji aliyê civakê ve tîn rexnekirin. Ji bo mêrên ku zû dizewicin di nav civakê da gotinên weke “Xwelî li sero, jina wî nû miribû.” (Ç1), “Hê kefenê jina wî şil e, çi zû zewicî.” (Ç36) û “Filankeso hê li nav mezêl çavê xwe digerlandin.” (Ç38) tîn gotin.

Ji bo jinê rewş hindekî cuda ye, lewra hebûn û nebûna zarokan di zewicîna jinê da pêkera herî dîyarker e. Jina ku zarokên wê nebin li mala xezûrê xwe bêqîmet e (Ç11). Jixwe qîma mala bavê jinê jî nayê ku keça wan li mala xezûrê xwe bimîne (Ç13) û jin jî diçe mala bavê xwe. Piranîya wan, demekê li mala bavê xwe dimînin û dûvre dîsa dizewicin (Ç1; Ç11; Ç13; Ç24), lewra li gorî jinan malê mêran bêminet e (Ç11).

Jina ku zarokên wê hebin, dixwaze bere yekî/a tenê jî hebe ew jin *li ser zarokên xwe dimîne* (Li deverinan dibêjin *li ser namûsa xwe dimîne*) û nazewice (Ç1; Ç2; Ç9; Ç11; Ç13; Ç18; Ç24; Ç38). Li gorî zanyarîyên ku Bazîdî dide me ev adet ji berê da li nav kurdan heye û jinên bî, li ser zarokên xwe dimînin û nazewicin (Bazîdî, 2010: 55).

Biqasî ku Buhârî ji pêxemberî neqil dike ola îslamê rê daye ku jinên bî piştî 4 meh û 10 rojan bizewicin (Kırış, 2017: 46) jî ev yek ji aliyê civakê ve zêde nayê xwestin. Zewicîna jina xwedî zarok ji bo malbata mirîyî weke kêmasiyekê tê dîtin, lewma jî malbat naxwaze ku bûka wan bizewice (Ç2). Derheqê vê mijarê da Jones dîyar dike ku malbatên mirîyan naxwazin ku yên bî tu carî ji şînê derkevin û ev yek

wan ditirsîne (Jones, 2004: 363). Yanî xuya ye ev tişt ne tenê li nav kurdan herweha li nav gelek civakên cîhanê jî heye.

Li gorî berê û îro ji bo mêran tu ferq tune, lê ji bo jinan rewş ne weke berê ye. Berê, jina ku mêrê wê dîmir, ji ber du sedeman mecbûr dima ku bizewice: Sedemek jê aborî bû yanî jê nedihat ku zarokên xwe xwedî bike (Ç9; Ç13; Ç24), sedema duyem jî zora ku ji alîyê malbata mêrê wê ve dihat kirin bû (Ç1; Ç2; Ç13; Ç58). Ji ber aborîyê jinê xwe mecbûr didît kû bizewice da ku bikaribe zarokên xwe xwedî bike, ji alîyê din ve jî qîma malbata mirîyî jî nedihat ku bi yekî xerîb ra bizewice. Ji ber vê yekê jî gelek caran piştî salekê duyan bûka xwe li kurekî xwe mahr dikirin (Ç2).

Îro ji ber alîkarîyên madî yê dewlet û sazîyên sîvîl, rewşa jinê ya madî heta radeyekê têrê dike ku li zarokên xwe binêre û wan xwedî bike. Herçiqas hindik be jî, îro dewlet meaş dide jinên bî û zarokan û herweha şaredarî û sazîyên sîvîl jî alîkarîyên madî didin feqîran û bi taybetî jî didin zarokên sêwî (Ç9; Ç13). Digel rewşa aborî ji ber guherîna binyada civakî û guherîna cihê jinê yê di civakê da, zora civakê ya li ser jinên bî pir kêmtir bûye. Herweha li herêmê asta perwerdehiyê bilind bûye û hejmara kesên xwende jî zêde bûye, lewma îro xort jî nema dixwazin bi jinbirên xwe ra bizewicin (Ç1; Ç58). Ji ber van sedeman li gorî berê, îro piraniya jinên xwedî zarok nema dizewicin.

#### **4.2.7. Paşxistina Dawet û Şahîyan**

Dema ku yek dimire xwedîyên mirîyan nêzikî salekê dawetan nakin, lê ji bo yê yixtîyar ev dem hindekî kintir dibe (Ç1; Ç8; Ç18; Ç22; Ç24). Dema ku hindeke bi heyf dîmirin xwedîyên mirîyan heta demeka dirêj dawetan nakin (Ç1; Ç11). Berê, gundî û cîranan jî yan daweta xwe betal dikirin, yan daweta xwe paş dixistin û yan jî tenê mewlûda xwe didan û bê kêf û şahî bûka xwe diguhastin. Ji ber ku berê dawet li sikakan dihatin çêkirin betalkirina wan hindekî hêsan bû lê îro berî bi çend mehan salon tîr kirêkirin û heqê wan tê dayîn. Lewma jî betalkirina dawetê ji bo mirovan xisareka mezin bi xwe ra tîne. Heger ji bo dawetê kara xwe kiribin û gelek di ser mirinê ra derbas nebûbe gundî û cîran bêyî destûra mala mirîyî/yê dawetên xwe çênakin. Diçin mala mirîyî/yê û weha dibêjin: “Heyran me bûka xwe xwestîye û me

kara xwe kirîye, mala bûkê jî dawê li me dikin. Heke bi dilê we bê em ê daweta xwe bikin û heke na em nakin.” (Ç1; Ç10). Dilê mala mirîyî/yê jî bi vê helwestê xweş dibe û vê yekê ji bo xwe û mirîyê xwe weke qedirdayînekê dibînin. Mala mirîyî/yê jî li hember vê ricayê kêr daran ji mala dawetê dixwazin ku çendekê xwe li wan ragirin û daweta xwe paş bixin (Ç15) lê bi piranî bi gotinên weke “Bê çawa ji mirinê ra divê, ji dawetê ra jî divê. Xort jî guneh in, carek e, daweta xwe bikin” (Ç1; Ç8) destûra çêkirina dawetê didin.

Çiqasî xwedîyên mirîyan destûra çêkirina dawetê dabin jî heger gelek di ser mirinê ra derbas nebûbe mala dawetê nalîlyênin, sazbandan nayînin û nareqîsin, li çepikan naxin, erebeyên konvoyê li qorneyê naxin û kêfa zêde nakin. Heger van tiştan bikin xwedîyên mirîyan xemgîn dibin û li ber xwe dikevin (Ç10; Ç11; Ç26; Ç34). Lê ji ber ku îro dawet li salonan tên kirin, gelek daran, cîran li mal û sikakê hay ji xwe hene û kêfê nakin lê piştî ku diçin salonê daweta xwe li gorî dilê xwe dikin. Lê xwedîyên mirîyan bi piranî weha nakin û li salonê jî hay ji mala mirîyî/yê hene.

Ne tenê xwedîyên mirîyan, civak jî vî tiştî şermezar dike. Berê gundên cîran jî hay ji hev hebûn, dawetên xwe kiribane jî rêz li mirîyên hevûdin digirtin û dengê mûzîkê ranedikirin da ku deng neçe gundê din (Ç2; Ç10). Îro jî li gundan ev hesasiyet heta radeyekê li ber çavan tê girtin lê li bajarî rewş hindêkî cuda ye. Gelek daran mirov cîranên xwe jî nas nakin lê dîsa jî heger di sikakekê da kesek miribe şênîyên sikakê hay ji hevûdin hene (Ç8) lê wekî din li bajarî, ne ku yên xwedîyên mirîyan bin, dawet nayên betalkirin. Ji ber mirina zêde jî civak nema weke berê gazinan ji mala dawetê dikin, lewra meh naçe ku ji gundekî yan ji sikakekê mirovek namire (Ç4; Ç24).

#### **4.2.8.Cejna Pêşî**

Cejna pêşî dilê xwedîyên mirîyan şikestî ye û weke roja pêşî ya sersaxîyê kufletê malê di şînê da ne û heger gelek di ser mirinê ra derbas nebûbe digirîn jî (Ç2; Ç4). Ji bo ku şûna mirîyî/yê ji alîyê xwedîyan ve neyê hîskirin û xuyakirin xwedî, cîran û dostên mala mirîyî/yê wê rojê tên mala wan.

Di lêkolînên xwe da em rastî navekî nehatin ku li cejna pêşî ya piştî mirinê tê kirin. Herçiqas du çavkanîyên me yên li bajarî ev cejn weke “cejna xatira” bi nav kirin (Ç1; Ç2) jî li gundan û li bajarî tu kesî din ev yek piştrast nekir. Jixwe erebên bajarî vê cejnê weke cejna xatira bi nav dikin (Ç40) û xuya ye çavkanîyên me jî ev nav ji ereban wergirtine. Herweha erebên bajarî ji bo vê cejnê navê cejna xatira û ji bo cihê sersaxîyê jî navê “cihê xatir” bi kar tînin. Lewra ev çavkanîyên me nêzîkî 40-50 salî li bajarî mane û bi qasî ku wan got têkilîyên wan bi ereban ra zahf bûne.

Heta berî bi 15-20 salan ji bo cejnê li mala mirîyî/yê tu amadekarî nedihat kirin (Ç24; Ç33; Ç45). Şekir, paste, qola û tiştên weha nedihat kirin (Ç15; Ç18), paqijîya malê nedihat kirin (Ç24), cilên nû nedihat lixwekirin û xwarinên giran nedihat çêkirin. Li deverinan xwedî yan jî cîranan xwarin çêdikirin û dibirin mala mirîyî/yê (Ç15; Ç26; Ç33). Jinan zarokên xwe şîret dikirin ji bo ku neçin mala mirîyî/yê û şekir nexwazin (Ç24). Li kêm deveran ev adet bidomin jî li piranîya herêmê di van adetan da gelek guhertin çêbûne.

Îro bêtir ji bo ku zarok ji devê derîyî destvala venegerin şekir tê kirin (Ç4; Ç31; Ç47), lewra tê bawerkirin ku xêra mirîyî/yê pê dikeve. Ne weke cejnên din be jî ji bo ku mêvan henekên xwe bi wan nekin, malên mirîyan paqijîya malên xwe jî dikin (Ç13; Ç24). Weke berê, îro jî ji bo mêvanan xwarinên giran nayên çêkirin û mêvanên ku diçin bi vê yekê dizanin û lewma jî gelekî rûnanin. Heger mêvanên wan zêde bin ji bo jin û mêran li malê du ode tên amadekirin.

Şênîyên mala mirîyî/yê naçin cejna tu kesî û ji bo pîrozkirina cejnê li malan nagerin (Ç13; Ç15). Lê cejna pêşî divê hemû xwedîyên mirîyî/yê, gundî û cîran biçin mala mirîyî/yê (Ç2; Ç4; Ç11; Ç24; Ç31). Heger xwedîyên nêzîk neçin, eynî weke ku nehatibin sersaxîyê dilê mala mirîyî/yê ji wan dimîne û dibêjin xatirê me û mirîyê me negirtin (Ç1; Ç4). Bi taybetî divê jin yan roja berî cejnê yan jî roja cejnê biçin mala mirîyî/yê û bi jinên wan ra biçin ser gorê (Ç11; Ç35; Ç36). Mêr, piştî nimêja cejnê bi hevra diçin goristanê û ji wir dîsa bi hevra diçin mala mirîyî/yê, cejna wan pîroz dikin, fatîhayê dixwînin û diçin (Ç11; Ç26; Ç34). Ev adet bêtir li gundan heye û îro jî dewam dike. Mêvanên ku hatin mala mirîyî/yê weha dibêjin: “Eyda we pîroz bê. Careka din serê we sax bê, Rebî tu eydên din yên weke vê bi ser we da neyên.” (Ç24; Ç36). Dûvre fatîha tê xwendin û mêvan zêde rûnanin û diçin.

Di pêşwazîkirina cejnan da di navbera kurdên misilman û yên êzidî da tu cudahî nehat dîtin. Berê di Cejna Batizmîyê ya êzidîyan da dahol û zirne dihat anîn û hefteyekê dihat lêdan (Ç29). Îro herçiqas hefteyekê dahol û zirne neyê lêdan jî ev cejn bi kêf û şahî derbas dibe. Lê heger berî vê cejnê kesek miribe li wê malê kêf nayê kirin û cejn weha sar û bêdeng derbas dibe (Ç28).

#### 4.2.9. Pêvajoya Şînê

Derheqê dema bidawîbûna şînê da zanyaran li hev nekirîye û her yekî li gorî xwe ji bo şînê demek dîyar kirine. Jones dîyar dike ku heger bîranîna mirîyan ji êşê bêtir kêfxweşîyê bide me, ev tê wê maneyê ku şîn bi dawî bûye (Jones, 2004: 377). Göka ji bo şînê demek dîyar kirîye û dibêje şîn di nava salek du salan da bi dawî dibe (Göka, 2010: 163). Digel vê yekê Volkan destnîşan dike ku mirî tu carî nayê jibîrkirin û dibêje şîn qet bi dawî nabe (Volkan, 2017:18). Örnek dibêje li Tirkîyeyê pêvajoya şînê bi demeka dîyar nehatîye sînorkirin û şîn ji sê rojan heta bi çend salan dewam dike (Örnek, 2000: 223). Bazîdî di pirtûka xwe da behsa dema şînê dike û dibêje jinên kurd heta şeş mehan yan jî salekê di şînê da dimînin (Bazîdî, 2010: 53).

Jixwe mirov nikare bersiva pirsên “Şîn çiqasî dewam dike?” û “Kî çiqasî di şînê da dimîne?” bi hevokekê bide. Lewra gelek pêkerên ku vê demê tayîn dikin hene û jixwe ji bo pêvajoya şînê tayînkirina demeka teqez gelekî zehmet e. Di mijara pêvajoya şînê da pirsgirêkek jî tevlihevkirina dema sersaxî, girî û şînê ye. Lewra dema ku me ev pirs ji çavkanîyên xwe kir, me dît ku ji alîyê teqezîyê ve dema sersaxî û girî hindekî zêde e. Digel îstîsnayan îro sersaxî sê rojan û girîyê zêde jî nêzîkî hefteyekê dewam dike. Divê bê gotin ku sersaxîya li cihê sersaxîyê sê rojan dewam dike lê li mala mirîyî/yê heta demekê çûn û hatina mêvanan didome. Ji bo pêvajoya şînê mirov nikare behsa demeka dîyar û teqez bike û di vê beşê da em dê li ser pêvajoya şînê rawestin.

Li cem êzidîyan bi piranî, şîn heta dayîna nanê salê (xêra mirîyî/yê ya salê) dewam dike û bi dayîna vê xwarinê ra şîn radibe. Lê ji bo mirinên bi destê mirovan, yên xwekujî û yên komî ev dem dirêjtir dibe (Ç28).



Divê bê gotin ku şîn tiştêkî piralî ye û bi derbekê ra nayê rakirin. Yanî di beşa borî da me behsa nîşanên şînê kiribû, li vir tiştê ku em dixwazin bibêjin ew e ku ji bo rakirina her nîşana şînê di civakê da kêr û zêde demek hatîye dîyarkirin. Lewma jî şîn ne bi derbekê ra lê gav bi gav yan jî qonax bi qonax tê rakirin. Weke nimûne berê heta hefteyekê-deh rojan mirovan serê xwe nedişûştin û riha xwe jê nedikirin, dikanên xwe venedikirin, heta 20 rojan yan mehekê teyb û televîzyonên xwe venedikirin. Dîsa heta salekê-du salan dawet çenedikirin û nediçûn dawet û şahîyan. Jinan pora xwe hine nedikirin, kil nedixistin çavên xwe û cil û desmalên reş ji xwe nedikirin. Lê carna heta mirinê jî hindek pora xwe hine nakin, kil naxin çavên xwe û cil û desmalên reş ji serê xwe nakin. Îro ji aliyê demê ve weke berê dirêj dewam nekin jî ev adet li nav civakê hebûna xwe didomînin.

Worden pêkerên ku bandorê li pêvajoya şînê dikin weha destnîşan dike: “1-Nasnameya Mirîyî/yê, 2-Têkilîya bi yê/ya mirî ra, 3-Awayê mirinê, 4-Hebûna windahîyên berê, 5-Taybetîyên kesayetî, 6-Alîkarîya civakî, 7-Pirsgirêkên dema şîngirtinê.” (veguhêzer Cesur, 2012: 20). Li vir em dê li ser hindek pêkerên ku di tayînkirina vê demê da rola xwe dilîzin bisekinin û wan ji çend alîyan ve binirxînin. Ji aliyê nasname û rewşa yê/ya mirî ve, ji aliyê yên mayî ve, ji aliyê awayên mirinê ve, ji aliyê guherîna binyada civakî ve.

#### **4.2.9.1. Ji Alîyê Nasname û Rewşa Yê/YaMirî Ve**

Pêkera pêşî ku em dê li vir li ser bisekinin temenê mirîyan e. Weke ku di beşa borî da jî me gotibû dema ku yekî/a yixtîyar dimire xwedîyên wî/wê zêde şînê nakişînin û zû vedigerin jîyana xwe ya rojane. Heger yê/ya mirî zarokê/a biçûk be xwedî û nasên wî/wê dilqewînîyan didin xwedîyên mirîyî/yê û dibêjin dê dîsa zarokên we çêbin û jixwe zarok bêguneh in û dê biçin cenetê (Ç15; Ç24; Ç48). Yanî zarok ne weke mezinan e, dema ku dê, bav, xweh, bira, mêr yan jina hindekan dimire, herkes dizane ku nema vedigere û kesek jî nikare bikeve dewsa wan. Lê ji bo zarokan ev tişt ne derbasdar e û lewma jî şîna zarokên biçûk zêde nayê kişandin. Şîna kesên ku demeka dirêj di ber destan da mane jî weke ya yixtîyaran e û zêde dewam nake (Ç13; Ç36).

Heger mirî ciwan be, xwedîyên wan zêde li ber dikevin. Lewra di pey wan ra weha tê gotin: “Bi miradê xwe şa nebû, bi ciwanîya xwe şa nebû (Ç8), bê mirad çû, berê xwe nebire serî, kewna wî/wê ma nîvrê, xêr ji xwe nedît (Ç23)” . Şîna ciwanan hem girantir e û hem jî heta salekê-du salan dewam dike, heta li gorî pêkerên din carna heta mirinê jî diçe. Heger yê/ya mirî semyanê/a malê be, nûzewicî be, xwedî zarok be, û hwd. Şîna wan jî heta salekê-du salan dewam dike.

Zayenda mirîyî/yê jî di pêvajoyê û rakirina şîne da pêkereka girîng e û şîna mêran ji ya jinan bêtir dewam dike. Li nav civakê xweh şîna birayên xwe gelekî dikişînin, lê bira şîna xwehên xwe hewqasî nakişînin. Jixwe li malekê jî mirina keçekê xort û kurekî xort bi heman bertekan nayê pêşwazîkirin û şîna wan ne weke hev giran e.

#### **4.2.9.2. Ji Alîyê Yên Mayî Ve**

Dema ku em li gorî yê mayî li pêvajoya şîne dinêrin dîsa zayend weke pêkereka girîng li ber çavan disekine. Li gorî ya mêran şîna jinan girantir e, xuyatir e û dirêjtir dewam dike, heta dikare bê gotin ku *şîna barê jinan e!* (Ç47). Piranîya jinan piştî mirina mêrên xwe nazewicin û heta mirinê şîna mêrê xwe dikişînin, lê mêr heger ne zêde jîderbketî bin piştî mirina jina xwe dîsa dizewicin.

Jina ku zarokên xwe yê ciwan yan jî mezin wînda dike gelekî li ber dikeve û gelek caran heta mirinê jî şîna wan dikişîne. Pêvajoya şîne ji bo dê gelekî dijwar e, lewra hertim li mal e, bav û zarok derdikevin û ew bi tenê dimîne û yê/ya mirî her kêlî tê bîra wê. Lewma jî “Yê go lêket, li dê ket!” tê gotin (Ç9). Bav weke dê şîna zarokên xwe nakişîne û nikare bikişîne, bikişîne jî nikare bide xuyakirin. Çiqas dilê mêrî bişewite jî zêde nade der, kula xwe tavêje nava xwe û şîna xwe di dilê xwe da dijî (Ç2; Ç33; Ç51). Ji ber vê yekê jî nîşanên şîne zêde li ser mêrî xuya nakin. Lewra divê biçe karê xwe, divê biçe nav mirovan, divê danûstandinê bike û bi van tiştan hem êşa xwe hindekî ji bîr dike û hem jî her ku diçe êşa wî kêmtir dibe. Lewma li gorî ya dê, şîna bavî siviktir û kintir e.

Di mijara şîne da temen jî ji bo yê mayî pêkereka dîyarker e. Mirovên temenmezî li gorî yê temenbiçûk bêtir şîne dikişînin.

Li gorî mirovên zewicî şîna mirovên azib dirêjtir dewam dike. Yê zewicî bi zarok û hevjinên xwe ra mijûl dibin, xwe ji bîr dikin û şîna wan zû diqede (Ç19). Lê yê azib tenê ne, bêtir mirin tê bîra wan, zarok û hevjinên ku bi wan ra eleqedar bin û kula wan bi wan bidin jibîrkirin tunene. Ji ber vê yekê jî şîna wan hem zehmet e û hem jî dirêjtir e.

Pirsên weke “Yê/ya mirî di jîyana yê mayî da valahîyeka çawa dihêle, şîna yê/ya mirî di jîyana yê mayî da çiqasî xuya ye?”, û hwd. asta şînkîşandina yê mayî dîyar dikin. Weke nimûne, ji ber ku dê hertim li malê ye, ji aliyê hestîyarîyê ve zêde nêzîkî hemû endamên malê ye, di kar û barên malê da xwedî biryar e, di malbatekê da piştî mirinê şîna dê ji ya bav bêtir xuya dike û kêmasîya wê bêtir tê dîtîn (Ç20; Ç36). Yanî di malekê da şîna kê bêtir bê xuyakirin şîna wî/wê bêtir tê kişandin û bêtir tê bibîranîn.

Dema ku semyanê malê dimire kurê wî yê mezin dikeve şîna wî û malbat jî wê hêvîyê jê dike ku şîna bavê xwe bigire. Ev yek li herêmê bi gotinên weke “Bere kes nebêjê malbata xwe muhtacê tu kesî kir û bere miradê pîsan li me neyê” tê ravekirin. Yanî dîsa berê xwedîyên mirîyan li civakê ye û helwesta civakê, nêrîna civakê jî bo xwedîyên mirîyan gelekî girîng e.

Li malekê, heger berî hingî kes nemiribe û ew mirin ya pêşî be, wê demê pêvajoya şînê ji bo malîyan gelekî giran derbas dibe û zêde dirêj dewam dike. Hindek jê heta ku mirîyekî/a din ji wê malê çenebe ji şînê dernakevin, dema ku yekî/a din mir şîna yê/a din xelas dibe û ya mirîyê/ya dawî dest pê dike (Ç18; Ç23; Ç33).

#### **4.2.9.3. Ji Alîyê Awayên Mirinê Ve**

Her mirin bi mirovan giran tê, lê li gorî awayên mirinê mirov bi hin mirinan bêtir têşin û şîna wan jî dirêjtir dewam dike. Mirina bi emrê Xwedê yanî mirina di nav cihan da yan jî mirina bi nexweşîyê, li gorî mirinên din zûtir tê qebûlkirin û şîna wan jî zûtir tê rakirin. Li herêmê bi qasî mirinê *kuştin* jî heye (Ç15) û yê ku tên kuştin jî bi piranî keç û xortên ciwan in û şîna wan gelekî dewam dike.

Ji hemûyan, mirina bi destê mirovan di nav civakê da weke mirina herî zor tê dîtîn û heta ku heyfa mirîyî/yê neyê hilanîn şîna wî/wê dewam dike. Xwedîyên mirîyî/yê bixwazin şîna xwe bişikînin jî awira civakê hertim li ser wan e û rê nade wan ku ji şîne derkevin. Heyf bê hilanîn jî û neyê hilanîn jî yan levhatin çêbe jî û çênebe jî piranîya caran şîna kuştîyan heta mirinê dewam dike.

Bandora mirinên komî ji bo malbatan zêde zehmet e û zû bi zû nayê jibîrkirin. Ne tenê malbat herweha civak jî di bin bandorê da dimîne û ev bûyerên mezin di hiş û bîra civakê da jî cihê xwe digirin. Di van rewşên weha da heta çend salan ne tenê mala mirîyî/yê, xwedîyên wan jî şîne girê didin û dawet û şahîyan nakin (Ç1; Ç2).

Piştî xwekuştina endamekî/a malbatê, heta mirinê ev bûyer nayê jibîrkirin û pêra şîn jî dewam dike (Ç24). Ji ber ku piranîya caran nayê zanîn bê çima yê/ya mirî xwe kuştîye û xwedîyên wî/wê dikevin nav fikaran da. Xwe sûcdar dibînin, di nav civakê da li ber xwe dikevin, fedî dikin û heta mirinê jî ji bîr nakin.

Ol, di pêvajoya şîne da roleka girîng dilîze. Li gorî ola îslamê di pêvajoya şîne da zêdegavî qedexe û guneh e. Heta astekê destûra girî heye lê jê zêdetir weke îsyaneke li hemberî Xwedê tê dîtîn. Li gorî ola îslamê mirin bi emrê Xwedê ye, hemû mirov dê bimirin û peyra dîsa dê bîn vejandin û li cenet yan jî cehenemê jîyaneka nû bidomînin. Mirovên ku ji alîyê bawerîya olî ve qewîn bin li hember mirinê jî qewîn in û şîna zêde nakişînin.

Ji ber ku ola êzdayetîyê şîn qedexe nekirîye û ji alîyê civaka êzidî ve jî kesên şîngir nayên şermezarkirin, êzidî çawa hîs dikin şîna xwe weha dikişînin.

#### **4.2.9.4. Ji Alîyê Guherîna Binyada Civakî Ve**

Binyada civakî hertim di nav guherînê da ye û di vê guherînê da gelek pêkerên bandorker hene. Ev guherîn di pêvajoya şîne da jî guhertinan çêdike.

Yek ji van pêkerên ku bandora wê li ser civakê heye alavên ragihandinê yê weke televizyon û înternetê ne. Hingî mirov di televizyonan da û bêtir jî di medyaya civakî ya înternetê da laşên mirîyan û vîdyoyên kuştina mirovan dibînin, mirin weke tişteki ji rêzê tê dîtîn û li gorî berê zûtir tê qebûlkirin (Ç4; Ç15). Li alîyê din, li gorî

berê ji ber zêdebûna mirovan mirin jî zêde bûye û di civakê da gotina “Mirin erzan bûye!” tê bikaranîn (Ç4; Ç13). Ji ber mirina zêde pêvajoya şîne kintir û siviktir bûye, lewra mirov nema di ber mirinê ra dikine der û têgeha tebayîbûnê cihê xwe di hişê civakê da girtîye. Yanî dema ku yek ji malekê dimire, dibêjin “Bere tebayî filankeso/ê bê” û ev gotin di dûrikan da jî gelekî tê bikaranîn (Ç2; Ç9).

Weke ku li jor hat gotin mirinên herî zehmet yên ciwanan û yên bi destê mirovan in. Van salên dawî li herêmê gelek xortên ciwan bi kuştinê çûn û lewma jî derheqê mirinê da li nav civakê gelekî tê axaftin. Li alîyê din ji ber rewşa sîyasî malbatên wan, liberketina xwe zêde nadin der û şîna xwe di dilê xwe da dijîn (Ç33). Ji ber zêdebûna mirinê û mirinên bi vî rengî, mirina mirovên din weke berê bandorê li malbatan nake.

Rola olê di pêvajoya şîne da jî xuya dibe. Ji ber ku mirina zarokan bi mirovan gelekî zor tê, derheqê vê cureya mirinê da ol bi wadinan dilê dê û bavên xweş dibe. Li gorî ku Kırış ji Buhârî û Nesâî neqil dibe pêxemberê îslamê mizgînîya cenetê dide dê û bavên ku zarokên xwe winda dikin (Kırış, 2017: 46). Lewma jî di nav civakê da bi taybetî jî di nav mirovên ku ji alîyê olî ve hestiyar in da kişandina şîne weke tiştê baş nayê dîtin. Lewma jî gotinên weke “Tifaq di ser tifaqan ra hene”, “Xwedê li yekî digirê” (Ç11), “Xwedê yekî diceribînê”, “Xwedê me ji ya mestir bistirînê!” (Ç16; Ç24), “Şîn, şîne dikişînê” (Ç11; Ç13) û hwd. tên bikaranîn. Bi van gotinên weha tê xwestin ku rê li ber şîna giran û dirêj bê girtin.

Li gorî berê van 20-30 salên dawî di civakê da rola jinê guherîye. Di nav jinan da bi giştî rêjeya xwendin û nivîsandinê gihayê asteka bilind û heta piranîya malbatan keçên xwe heta zanîngehê jî didin xwendin. Vê pêşketina jinan ya di qada perwerdihîyê da rê li ber gelek rûdanên nû vekirîye. Bi taybetî di sîyasetê da, li herêmê, jinan di her astê da cihê xwe girtîye. Sê şaredarên dawî yên bajarî jin bûn û di çend hîlbijartinên dawî da jinên nisêbînî weke parlamenter hatin hîlbijartin û ketin meclîsê. Di sazîyên sivîl da jî jin bi rêjeyeka bilind cihê xwe digirin. Herweha li dibistan, nexweşxane û hemû sazîyên dewletê hejmara karmendên jin gelekî zêde bûye. Herçiqas ne têrker be jî, îro jinan di hemû qadên jîyanê da cihê xwe girtine. Yanî weke berê, berê wan ne tenê li hundirê mala wan e, berê wan li civakê, li pirsgerêkên civakê, li karê wan û li derdora wan ya fereh e. Ji ber vê rewşa wan ya nû

mirina xwedîyekî/a wan, weke berê bandorê li jinan nake ango şîna wan weke berê dirêj dewam nake. Helbet ji bo hemû jinan ev tişt ne derbasdar e lê di vî warî da guherîneka berbiçav jî heye.

Berê dema ku hindêk dizewicîn di nav malê da diman û ji alîyê aborî ve girêdayî dê û bavê xwe bûn. Lê van salên dawî piranîya xortên ku dizewicin ji malê vediqetin, cihê dibin û dibin semyanên malên xwe. Yanî weke berê malbatên qerebalix nema gelekî tînin û malbat ji alîyê hejmara endaman ve biçûk bûne. Lewma mirina endamên malbatê li gorî berê bandorê li herkesî nake. Endamên ku bi yê/ya mirî ra di heman malê da dijîn li gorî yê cihê bêtir li ber mirîyên xwe dikevin û şîna wan bêtir dewam dike, lewra di jîyana wan da şîna yê/ya mirî bêtir xuya dike (Ç19; Ç20).

Li bajarî, van salên dawî gelek avahîyên bilind tînin çêkirin û di her avahîyê da bi qasî gundekî mirov dijîn. Lê ferqa avahîyan ji gundan ew e ku gelek caran yê di heman avahîyê da zêde hay ji hevûdin tunene û gelek ji wan hevûdin nas nakin. Ji ber vê yekê ew qedirdayîna mirîyan ya berê li van deveran xuya nake û cîran ji bo cîranan zêde şîne nakişînin û li gorî wê yekê tevnagerin.

Rîtûela veşartinê ji bo şîngiran tiştêkî sûdewer e. Lewra bi xêra hatina xwedî, dost û hevalan xwedîyên mirîyan xwe ji bîr dikin, ji bo ku tenê nehatine hêlan kêfa wan tê û mirinê hêsantir qebûl dikin (Ç4). Qerebalixa ser goran çiqas zêde be xwedîyên mirîyan xwe hewqasî serbilind hîs dikin (Ç10; Ç15). Herweha hatina mêvanan ya ji bo sersaxîyê jî xwedîyên mirîyan kêfxweş dike, bêhna wan derdikeve û xwe ji bîr dikin (Ç50). Bi mêvanan ra eleqedar dibin, derheqê mirîyên xwe da agahîyan didin mêvanên ku dipirsin. Mêvanên ku tînin, gotinên dilxweşkirinê ji wan ra dibêjin, dilqewînîyan didin wan û bi vî awayî van rojên pêşî ku gelekî zehmet in hêsantir derbas dikin. Piştî ku di dema sersaxîyê da kela wan hindêkî hînik bû, her ku diçe hejmara mêvanan kêmkirî dibe û xwedîyên mirîyan jî hêdî hêdî fêrî jîyana xwe ya nû dibin û bi vî awayî pêvajoya şîne siviktir dibe.

#### 4.2.10. Rakirina Şînê

Li herêmê derketina ji şînê bi çend awayan tê vegotin: “Şîna xwe şikand (Ç15), şîna xwe rakir (Ç13; Ç24; Ç32; Ç36), reşa xwe hila” (Ç28;Ç30).

Şîna mirîyekî/ê, gelek caran heta yekî/a din ji wê malê bimire dewam dike û wê demê xelas dibe. Yanî mirineka nû şîna yê/ya kevin radike (Ç18; Ç23; Ç33). Di mirinên bi destê mirovan da, di mirinên ciwanan da xwedîyên mirîyî/yê û bi taybetî jî dêya mirîyî/yê carna heta mirinê jî şînê dikişîne û şîna xwe naşikîne. Ç32 ji bo vê yekê dibêje “Encex Xwedê şînê rakê û dilê yekî xweş bikê!”.

Carna jî xewnek şînê radike ango em bibêjin jin xewnekê ji xwe ra dikin hincet û şîna xwe bi dawî dikin (Ç18; Ç31). Yanî yê/ya mirî tê xewna wan û ji bo girî û reşgirêdana wan gazindan ji wan dike û dibêje ji ber van tiştan di gorê da ezab dikişîne. Jin vê xewnê ji melayekî ra yan ji mirovên dora xwe ra vedibêjin û bi pêşniyara wan şîna xwe dişikînin. Yanî dikare bê gotin ku jin bi rêya xewnê, xwe bi xwe dawî li şîna xwe tînin.

Rakirina şînê ji bo mêr û jinan ne weke hev e. Me gotibû gundî û cîran hay ji mala mirîyî/yê hene û darî çav ew jî şîna mirîyê/ya wan dikişînin. Berê heta ku mala mirîyî/yê şîna xwe neşikandibane, gundî û cîranan jî li gorî wan hereket dikir. Lewma yekî ku destê wî/wê li mala mirîyî/yê dibihûrt piştî mirinê bi hefteyekê-deh rojan diçû mala wan û weha digot “Xelk li ber we sekinîye û em ji xelkê fedî dikin. Riha xwe biqusînin, ser û cilên xwe bişon û karên xwe bikin da ku xelk jî zêde aciz nebê” û bi destên xwe televizyona mala mirîyî/yê vedikir (Ç15; Ç26). Hin kesan berber bi xwe ra tanîn yan jî mêrên malê dibirin berber (Ç33) û hindekan jî cilêt bi xwe ra tanîn (Ç28) da ku riha mêrên malê bidin qusandin. Bi vî awayî riha mêran bi wan didan qusandin û cilên wan didan guhertin û darî çav şîna mêran dihat rakirin. Piştî ku mêrên malê şîna xwe radikirin ji bo rakirina şîna gundî û cîranan yek ji wan bi piranî roja îniyê di xudbeyê da diçû mizgeftê û bi van gotinan ji wan dixwest ku ew jî şîna xwe bişikînin: “Heta niha we şîna me kişand, mala we ava, we qedrê me girt, hûn li ber mirîyê/ya me ketin. Lê vêce bes e, em dixwazin hûn şîna xwe bişikînin.” (Ç11; Ç15; Ç65). Ne weke berê jî be îro jî civak hay ji mala mirîyî/yê

heye û rêzê nîşanî wan û mirîyên wan didin û ev adeta navborî hîn jî li gundinan dewam dike.

Şîna jinan weke ya mêran zû nayê rakirin. Ji bo rakirina şînê di demeka guncaw da, jina melayî yan jî jineka ku qedrê wê li cem wan hebe hineyinê dinimîne, distire û dibe mala mirîyî/yê û di serê jinên wan dide (Ç1; Ç2; Ç24). Ji bo rakirina şîna jinan ev qonax girîng e lê ne qonaxa dawî e. Lewra ji bo hilanîna cil û desmalên reş jî hindê ricayê ji wan dikin, lê divê bê gotin ku avêtina reşan weke ya hineyê zû pêk nayê. Jinin jê heta mirinê jî reşa xwe naavêjin (Ç11; Ç33). Jixwe hilanîna reşê darî çav tê maneya şikandina şînê. Dema ku jinan hine li serê xwe kir, cil û desmalên reş avêtin û çûn dawetan tê famkirin ku şîna wan teqez hatîye rakirin (Ç1; Ç24). Lê rakirina şînê nayê wê maneyê ku mirîyên xwe ji bîr kirine û kula dilê wan derman bûye. Ç2 ev yek weha rave dikir: “Serê min kitan e, lê nav û dilê min qetran e.”

Weke ku li jor me destnîşan kir şîn ji bo herkesî di heman demê da ranabe. Şîna mêran di civakê da berî ya jinan tê rakirin. Jin jî hemû bi hevra şîna xwe naşikînin. Dê, piştî jinên malê hemûyan reşa xwe dihilîne û şîna xwe radike. Di çavnêrî û hevpeyvînên xwe yên sehayê da me dît ku, jinên ku ji bo şînê cil û desmalên reş girêdabûn hemû dê, xweh û jinên bî bûn. Li vir divê ez bibêjim ku ev tespît ne ji bo mirinên nêzîk, lê ji bo mirinên ku herî kêr salek di ser wan ra bihûriye, hatîye kirin.

Divê bê gotin ku şênîyên mala mirîyî/yê xwe bi xwe şîna xwe ranakin û divê yekî/a ku jê fedî dikin biçe mala wan û daxwaza rakirina şînê li wan bike. Yanî şênîyên mala mirîyî/yê ji ber xwe ve riha xwe jê nakin, serê xwe naşon, televîzyona xwe venakin, pora xwe hine nakin, reşa xwe naavêjin. Bi piranî hin mirovên ku destê wan li wan diçe ricayê ji wan dikin û bi vî awayî rê li ber wan vedikin. Îro ne bi qasî berê asê be jî ev adet li nav civakê hebûna xwe didomînin.

### **4.3.GOR Û GORISTAN**

Gor û goristan li herêmê weke cihên girîng tên dîtin û gel rêzeka mezin ji bo wan cihan nîşan dide. Di vê beşê da em dê derbareyê rîtûelên ku li goristanê tên kirin



da agahîyan bidin û ji ber ku guherîna gor, goristan û kêlên goran derheqê binyada civakî da hindê agahîyan didin me, em dê li ser wan jî bisekinin.

### 4.3.1. Rewşa Gor û Goristanên Herêmê

Herçiqas melayên herêmê dibêjin li gorî mezhebê şafi divê gor ji bostekê ne bilintir bin jî (Ç6; Ç52) em dikarin bibêjin ku gel zêde guh nade vê hişyarîyê. Heta yên ku gora mirîyên xwe çenekin carna ji alîyê civakê ve tên şermezarkirin. Ji bo wan kesên ku gora dê û bavê xwe çenakin weha tê gotin: “Xwelî li serê wan bê, bi kêr nayên gora dêya/bavê xwe jî çêkin”. Tu kes naxwaze kêmi hevalên xwe bimîne û çiqas feqîr jî be ji fêhtîya civakê hewl dide ku gora mirîyên xwe xweşik çêke (Ç31). Gelek mirov jî ji bo forsê van gorên biha û xweşik didin çêkirin (Ç5; Ç10; Ç31; Ç50).

Dikare bê gotin ku gorên herêmê li gorî rewşa siyasî û aborî, li gorî hişmendîya olî û li gorî asta perwerdehîya civakê teşe girtine. Lewra dema ku em gorên berê û yên niha didin ber hev, çend tişt tên xuyakirin.

Gorên berê li gorî bawerîya olî bostekê-du bostan ji erdê bilind in, bi keviran hatine çêkirin û heta kêlên wan jî ji keviran in û tu tişt jî li ser wan nehatîye nivîsîn. Li jor me got ku hejmara kêlên mêr û jinan ne weke hev in û sedema wê jî naskirina goran e. Berê hejmara mirovên xwende pir kêmi bû, lewma jî bi vî awayî gor dihatin naskirin û kêlên goran bê nivîs bûn. Îro nav, paşnav, dîroka jidayîkbûnê, dîroka mirinê, navên dê û bavên mirîyan jî li ser kêlan tên nivîsandin. Wekî din ji nivîsên li ser kêlan bavik, leqeb, gund û hwd. yên mirîyan jî diyar dibin.

Sedemeka din jî aborîya mirovan bû ku qeweta wan nedigiha ku gorên xweşik û biha çêkin. Paralelî xaniyên herêmê çiqas bi vir da tê xweşikahî û estetîka goran jî ji alîyê erênî ve hatîye guhertin. Gorên berê bi kevirên nav erdan hatine çêkirin, dûvra bi pirîkêtan, piştra jî bi kevirên xweşik hatine çêkirin. Îro jî bi mermer, granît û fiberê tên çêkirin. Li sehayê tê gotin ku herkes li gorî rewşa xwe ya madî û cihê xwe yê di civakê da gora mirîyên xwe çêdike (Ç31; Ç34; Ç36; Ç60).

Dema ku mirov li kêlên gorên berê dinêre nivîsên li ser wan hemû bi erebî û tirkî ne. Lê dema ku em li nav goristanên ku van salên dawî hatine avakirin gerîyan,

herweha dema ku me li gorên van salên dawî nêrî tişteki bala me kişand. Ew jî nivîsên kurdî bûn û li gorî dîroka goran her ku çûye rêjeya nivîsên kurdî zêde bûye. Ne tenê li bajarî herweha li gundan jî ev yek li ber çavan e. Yanî di gelek kêlan da danasîna mirîyan bi kurdî hatîye kirin û herweha helbest û gotinên kurdî û heta yê sîyasî jî li ser kêlan gelekî tên dîtin.

Gelek simbol û nîşan li ser goran tên xuyakirin. Bi van nîşanan mirov derheqê mirîyan da gelek agahîyan distîne. Yê ku seyid bin cilikeka kesk bi kêla wan ve ye yan jî bi darekî ve ye û li ber serê gorê daçikandî ye. Gorên wan kesên ku ji aliyê hêzên ewlekariyê yê dewletê ve hatine kuştin, bi rengên kesk û sor û zer hatine boyaxkirin. Herweha li ser kêlên zarokinan sewîlkên avê neqîşandî ne. Yanî dema ku mirov li goran dinêre, tê famkirin bê ew gor yê kê ne.

Tiştên ku me li ser gorên kurdên misilman gotin ji bo yê kurdên êzidî jî derbasdar in. Bi gotina êzidîyan, şiklê gorên wan weke heca êzidîyan ya li Laleşê bi qube ne. Cudahîyeka din jî ew e ku, nivîsên erebî li ser kêlên gorên êzidîyan tunene. Herweha divê bê gotin ku li ser piranîya kêlên gorên êzidîyan wêneyê rojê hatîye danîn û li ser qubeyên goran jî peykerê teyrê tawis hatîye çêkirin. Xaleka din ya girîng jî ew e ku piranîya nivîsên li ser kêlên wan bi kurdî ne.

Weke berê, îro jî goristanên nû li dûrî bajarî tên çêkirin. Sağır sebaba vî tiştî weha rave dike: “Goristan dûrî malan û li cihên bidar tên çêkirin da ku mirî zerarê nedin jîndaran (Sağır, 2017: 18). Lewra weke ku berî niha jî me bahs kiribû li gorî bawerîya gelî, mirî li goristanê diçin civatên hev û heta rojînan vedigerin malên xwe jî. Ev yek jî bûye sebaba tîrsa ji mirîyan û mirovan goristanên xwe dûrî jîngehan çêkirine.

Goristanên gundan jî bi piranî li serê girikan hatine çêkirin û Aristova jî di xebata xwe da vê rastîyê tîne zimanî (Aristova, 2002: 142). Berê kepçe nebûn û gelî gorên xwe bi destan dikolan, lewma jî goristanên xwe li cihên ku erda wê nerm bû çêdikirin (Ç10; Ç12). Herweha li gelek deveran jî goristan li ser rêyan ango nêzîkî rêyan hatine çêkirin. Mebest ji vê yekê ew e ku kesên ku di ber ra biçin û bên fatîhayê li ser mirîyan bixwînin. Lewra li herêmê kî di ber goristanekê ra derbas dibe

teqez fatîhayekê li ser rihê mirîyan dixwîne, dîyarî rihê hemûyan dike û daxwaza efûkirina wan ji Xwedê dike.

### 4.3.2.Zîyaretkirina Gor û Goristanan

Li herêmê zîyaretkirina gor û goristanan adeteka kevin e û îro jî dewam dike. Ji roja veşartinê û pêve xwedîyên mirîyan gorên wan zîyaret dikin. Jones dibêje ev zîyaret ji bo axaftina bi mirîyan ra tên kirin û ji alîyê ve jî xwedîyên mirîyan rehet dikin û bêhna wan derdixin (Jones, 2004: 371). Dikare bê gotin ku ev tespîta Jones di cih da ye û di hevpeyvîn û çavênîyên me yên sehaya xebatê da jî ev yek hat dîtin.

Roja pêşî, piştî ku telqîna mirîyî/yê hat xwendin û mêr ji ser gorê veqetîyan, dor tê jinan. Li deverinan jin roja pêşî, piştî veşartinê naçin ser gorê (Ç1; Ç4; Ç13; Ç35; Ç37) û li deverinan jî diçin (Ç9; Ç18; Ç26; Ç31; Ç33). Li deverinan jî berê dihat hêlan ku jin roja pêşî biçin ser gorê lê îro nayê hêlan (Ç15; Ç22; Ç45). Ç49ê derbareyê çûyîna jinan ya ser gorê da weha got: “Heta ku jin neçin ser gora mirîyên xwe, kerba dilê wan naşikê û dilê wan hînik nabê”. Heger mirî sibehê yan jî li dor nîvro hatibe veşartin li cihinan jin piştî esrê diçin ser gorên mirîyên xwe. Heger jin roja pêşî biçin jî gelekî namînin, lewra li malê yan jî li cihê sersaxîyê mêvan li hêviya wan in. Roja pêşî yanî roja ku mirî tên veşartin jin tiştêkî bi xwe ra nabin ser gorê û tiştêkî li zarokan belav nakin.

Derheqê zîyaretkirina jinan ya roja pêşî da Bazîdî zanyarîyanan parve dike û dibêje jinên kurdan roja pêşî piştî esrê bi hevûdin ra diçin ser gorê (Bazîdî, 2010: 77). Li gorî vê zanyarîyê û li gorî zanyarîyên ku çavkanîyên me yên sehayê dan me, ev adeta ku jin roja pêşî nema diçin ser gorê van salên dawî derketîye û du sebebên wê hene. Yek jê bandora mihelmîyên bajarî ye ku li gorî zanyarîyên ku me ji çavkanîyên mihelmî standin ew ji berê da roja pêşî naçin ser gorê (Ç40). Sebebeka din jî ew e ku li gorî berê mêvanên sersaxîyê gelekî zêde bûne û jin nema digihin ku roja pêşî dev ji mêvanan berdî û biçin ser gorê.

Roja pêşî biçin jî û neçin jî, roja piştî veşartinê, berî ku roj bihile xwedîyên mirîyî/yê bi hevra diçin ser gorên mirîyên xwe (Ç4; Ç13; Ç33; Ç42; Ç48; Ç63) û ev zîyaret li deverinan heta sê rojan (Ç9) û li deverinan jî heta hefteyekê (Ç1; Ç24) tên

kirin. Dema ku nû dikevin nav goristanê silavekê didin hemû mirîyên li wir veşartî (Ç2; Ç42), lewra tê bawerkirin ku mirî zîyaretvanan dibînin. Ev zîyareta pêşî ji yê din cudatir e, lewra hîna hestên xwedîyên mirîyan germ in û kerba wan dijwar e. Di vê zîyareta sibehê da ji bo ku li zarokan bê belavkirin tiştek nayê birin, lewra herkes di xew da ye. Hindek digirîn, hindek sûretê yasîn, fatîha û îxlasê dixwînin û hindek jî salewatan didin û diayan dikin. Cara pêşî girî zêde ye, lê her ku diçe girî kêmtir dibe. Li gorî bawerîyê heger hêstirên jinan bikevin ser gorê, yê/ya mirî nema tê xewna wan û di gorê da ezab dibîne (Ç24; Ç36). Carna jî ji bo her tiştê ku tên xwendin keviyekî biçûk dixin destên xwe û dema ku destê wan tije dibe tavêjin ser gorê (Ç1).

Bi dû zîyareta berê sibehê ra, piştî esrê xwedîyên mirîyî/yê careka din diçin ser gorê. Vê carê tiştekî şêrîn bi xwe ra dibin û ji bo xêra mirîyê/ya xwe li zarokan belav dikin. Ji xwe roja pêşî û dema melayê sibehê ne têda, xwedîyên mirîyan kengî diçin goristanê ji bo xêra mirîyên xwe tiştekî şêrîn li zarokan belav dikin. Heger neçin goristanê jî li nav gundî yan li taxa xwe şêranîya xwe belav dikin.

Êvara îniya pêşî xwedîyên mirîyî/yê yê nêzîk hemû tên ser gorê, heta yê hindekî dûr jî wê rojê tên, lewma êvara îniya pêşî ser gorê gelekî qerebalix e. Mela jî dibêjin ku êvara îniyê mirov gorên mirîyên xwe zîyaret bikin baş e (Ç6). Heta 3-4 êvarên îniyên pêşî jî xwedîyên mirîyan yê nêzîk tên ser gorê, dûvra nema tên. Li gorî zanyariyên ku Bazîdî dide me kurdan berê heta panzdeh rojan, sibeh û êvaran gorên mirîyên xwe zîyaret dikirin (Bazîdî, 2010: 52). Îro jî yê ku gelekî li ber mirîyên xwe dikevin li gorî hestîyarîya xwe heta demekê her roj gorên mirîyên xwe zîyaret dikin.

Hindek jê rojên şemîyan berî roj bihilê jî diçin ser gorê (Ç1; Ç24). Li gorî bawerîyekê heger dema ku mirov çûn ser gorê, berî ku fatîhayê bixwînin, kêlîkekê li ber lingê mirîyî/yê bêdeng bisekinin, dê mirî wan bibîne (Ç1; Ç15; Ç24). Lewma hindek jê weha dikin, kêlîkekê li ber lingê mirîyî/yê bêdeng disekin, dûvra Quranê dixwînin, dia dikin û berî ku ji ser gorê veqetin fatîhayê dixwînin û diçin.

Ji bilî wan rojan, êvara cejnê û sibeha cejnê jî gel tevî zarokên xwe diçin ser gorên mirîyên xwe û cejna wan pîroz dikin. Li gelek gundan piştî nimêja cejnê digel melayî hemû cemaet bi hevra diçin goristanê û pêşî jî diçin ser gora mirîyên nû û

fatîhayê li ser mirîyên goristanê hemûyan dixwînin (Ç11; Ç18; Ç34; Ç37). Dûvra herkes diçe ser gorên mirîyên xwe û yasînan dixwînin. Ji van rojan pêve kî, kengî dixwaze diçe ser gorên mirîyên xwe.

Li çend goristanên bajarî qotîkên yasînan hatine çêkirin û devê wan vekirî ye. Yên ku tên goristanê ji wir radihêjin yasînekê, li ser mirîyên xwe dixwînin û dîsa datînin cihê wê.

Ji ber ku êvara îniyê ji bo êzidiyan jî pîroz e heta mehekê-du mehan her êvara îniyê gorên mirîyên xwe zîyaret dikin. Xwarin û şêranîyê bi xwe ra dibin goristanê û bi rê da bigihin kê van tiştan didin wan. Piştî ku mirîyên wan kevin dibin êdî her êvara îniyê naçin, dilê wan kengî xwest wê demê diçin ser gorên mirîyên xwe (Ç27; Ç28; Ç30).

Li gorî çavnêriyên xwe û li gorî zayariyên ku çavkanîyan dan me, îro gor ji berê bêtir tên zîyaretkirin. Êvarên îniyan û nemaze êvarên cejnan goristan bêtir qerebalix dibin. Hem hejmara mirîyan zêde bûye û hem jî li gorî berê mirov zêdetir qîmetê didin gorên mirîyên xwe. Kulîlk û daran li ber goran diçînin û her ku zîyaret dikin wan av didin.

Li herême, ji bo goristanan xelk rêzeka mezin nîşan dide. Yên ku di ber goristanekê ra derbas dibin teqez fatîhayekê li ser mirîyên wê goristanê dixwînin. Mirov di hundirê goristanê da bi dengê bilind nakenin û herçiqas li bajarî hindekî sist bûbe jî hem ji ber şîretên melayan û hem jî weke nîşaneka rêzgirtinê dema ku jin dikevin goristanê ser û çengên xwe dinixumînin. Pêlêkirina goran jî guneh tê dîtî û dema ku mirov diçin ser gorên xwedîyên xwe bi baldarî di nav goran ra derbas dibin.

### **4.3.3.Gor û Zîyaretên Pîroz**

Li Nisêbîn û gundên wê gelek gor hene ku ji aliyê gelî ve weke zîyaret tên binavkirin û tên zîyaretkirin. Ne tenê kurdên misilman herweha kurdên êzidî jî gorinan pîroz dibînin û wan zîyaret dikin. Di nav zîyaretên misilmanan da Girnewaz, Silotkîna Mirada, Pîrkemal, Zîyareta Dêdivên, Şe'reş û Zeynelabidîn dikare bê hejmartin. Û di nav zîyaretên êzidiyan da jî Keleha Şêx Bil Qasim û Zîyareta Spî dikare bê gotin.

Mirov dikare sedemên van zîyaretan weha rave bike. Gelî; nexweşên xwe dibe da ku rehet bibin, yên dîn dibin da ku ji dînîtyê azad bibin û baş bibin, yên ku zarokên wan çenabin dibin da ku zarok ji wan ra çêbin, yên ku miradên wan hebin dibin da ku miradên wan pêk bên, û hwd.

Dema ku mirov bala xwe didîyê, tê xuyakirin ku di rîtuêlên hemû zîyaretan da tiştên hevbeş hene. Tiştê ku pêşî balê dikişîne ew e ku piraniya van goran di demsala biharê da tîz zîyaretkirin. Wekî din li cihê zîyaretê; heywanekê digurînin û dixwin, kêf û şahîyê dikin, heft caran li dora gorê dizîvirin, ji xwe ra dia dikin û “xwe tavêjin” zîyaretê (ji bo ku daxwaza wan pêk bîne xwe tavêjin bextê wan). Li zîyaretinan jî li amûrên muzîkê yên weke def û zirneyê jî dixin û ji bo ku daxwaza wan pêk bê bi şev li hindekan jî radizin. Li hindekan terîşkan bi darên li dora gorê ve dikin û herweha terîşkekê jî jê dikin û bi xwe ve dikin. Divê bê gotin ku mirov bi hin zîyaretan sûnd dixwin û di nav gelî da ev weke sûndeka mezin tê qebûlkirin. Ev tiştên navborî hem ji alîyê kurdên misilman û hem jî ji alîyê kurdên êzidî ve tîz kirin.

Digel ku mela gelek sepandinên ku li van zîyaretan tîz kirin rexne dikin, red dikin û heta tiştinan jê bi kufrê tawanbar dikin jî, gel dev ji van tiştan bernade û îro jî ev der tîz zîyaretkirin.

Derheqê mirî û goristanan da li herêmê bawerîyên balkêş hene. Weke nimûne; tê bawerkirin ku mirî di bin erdê da (li goristanê) diçin civat û şevbuhêrkên hev û dema ku mirîyekî/ka nû tê veşartin xwedîyên wî/wê kêfxweş dibin û dibêjin “Va ye mêvanekî/a min hat.” Herweha tê bawerkirin ku êvarên îniyan, rojên berî cejnan û rojên cejnan mirî li hêvîya xwedîyên xwe ne û heger neyên ew mirî xemgîn dibin û li hember civata mirîyan li ber xwe dikevin.

Bawerîyeka din jî alîkarîxwestina ji mirîyan e. Bi gotinên weke “Ya Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, were bi hawara me ve!” bangî şêx û mişayîxên mirî tê kirin û ji wan tê xwestin ku wan ji zor û zehmetîyan xelas bikin. Ev tişt li herêmê û bi taybetî jî li gundan û di nav jinan da gelekî tîz dîtin. Yanî tê bawerkirin ku mirî dikarin bi hawara wan ve bên, alîkarîya wan bikin û dikarin zerarê jî bidin wan.

## ENCAM

Di vê xebatê da em li ser adet û rîtûelên têkildarî mirinê yên li nav kurdên herêma Nisêbînê sekinîn. Bi xebatên sehayê me ew adet û rîtûel tespît kirin, teswîr kirin, guherînên di wan da û sedemên guherînan rave kirin. Herweha, me rol û fonksiyona wan ya di jîyana şexsî û civakî da jî raxist ber çavan. Bi vî awayî derheqê binyada civakî ya kurdên Nisêbînê da jî me zanyarîyên girîng bi dest xistin. Daneyên ku ji sehayê xebatê hatin berhev kirin bi adet û rîtûelên civaka kurd ya giştî ra hatin berawird kirin.

Di rîtûelên têkildarî mirinê da pêkera sereke ola wê civakê ye ku jê bawer dikin û kurdên herêmê jî bi qasî rêjeyeka mezin misilman in û rêjeyeka biçûk jî êzidî ne. Li gorî van herdu olan jî mirin ne weke dawîyeka teqez lê weke derbasokeka di navbera du dinyayan da tê dîtin. Tê bawer kirin ku li gorî gotin û tevgerên xwe, dê mirov biçin cenetê yan jî cehenemê. Lewma jî xwedîyên mirîyî/yê dixwazin bi rêya hindek rîtûelan kêfxweşîya yê/ya mirî ya li dinyaya din dabîn bikin. Di rojên weke 3, 40, salvegera mirîyî/yê, cejn û rojên girîng yên olî da jî xêr li mirîyan tên dayîn.

Li sehayê hat dîtin ku li gorî berê hindek adet û rîtûel bi temamî ji holê rabûne û hindeke nû jî derketine. Lê divê bê gotin ku rêjeya van herduwan jî ne zêde ye. Bêtirê adetan li gorî şert û mercên civakê teşe guhertine, veguherîyane şeweyeka din û bi vî awayî hebûna xwe domandine. Di vê guherînê da gelek pêkeran rola xwe lîstîye.

Zêdebûna gelheya bajarî, geşedanên di warê alavên ragihandin û veguhastinê da, geşedanên di warê tenduristîyê da, guherîna aborîya gelî, bandora ola ku jê tê bawer kirin, guherîna rola melayan ya di nav civakê da, pêşketina asta perwerdihîyê û bi taybetî jî ya jinan, bandora sîyaseta li herêmê, bandora mirina zêde ya ciwanan, guherîna cihê jinê yê di civakê da, nêrîna civakê ya li jinê, têgihîştina civakê ya paqijî û hîjyenê, û hwd. di guherîn û veguherîna van adet û rîtûelan da bi awayekî rola xwe lîstine. Bi taybetî divê bê gotin ku bi pêkanîna sersaxîyan ya li cihên sersaxîyê, di hindek adetan da wekhevî çêbûye û ji ber van sedemên navborî îro di navbera rîtûelên bajarî û gundan da cudahîyên mezin nemane. Yanî dikare bê gotin

ku, guherînên di binyada civakî ya gelî da, guhertinên di adet û rîtûelên mirinê da jî bi xwe ra înanê.

Ji ber ku çanda îslamê li hemû herêmê serdest e, tiştêkî asayî ye ku civakên ku ji olên din bawer dikin di bin bandora vê çandê da bimînin. Lê digel têkilîyên xurt yên di navbera civakên misilman û êzidî yên kurd da jî, hat dîtin ku êzidîyan adet û rîtûelên xwe yên têkildarî mirinê heta radeyekê parastine û lê xwedî derketine. Lê ji ber bandora civaka misilman, di hindêk adetan da jî guhertin çêbûne.

Adet û rîtûelên têkildarî mirinê, di jîyana civakî da xwedîyê çend fonksiyonên cuda ne. Berî her tiştî, bi bihîstina xebera mirinê ra gundî, cîran û xwedî dev ji karên xwe berdidin û li mala mirîyî/yê dicivin da ku liberketina xwe bînin zimanî û xemgînîya mala mirîyî/yê parve bikin. Xwedî, gundî û cîran di amadekirina mirîyan da, di çêkirina xwarinê ya ji bo mêvanên mala mirîyan da, di kirina kar û barên mala mirîyan da û di xizmetên cihê sersaxîyê da alîkarîyê bi wan ra dikin. Wekî din çî yên li bajarî û çî yên li gundî, hemû xwedîyên mirîyî/yê li cihê sersaxîyê kom dibin, hevûdin nas dikin, li hal û wextê hevûdin dipirsin. Bi xêra vê yekê keç û xortên malbatê hemû endamên malbata xwe nas dikin û têkilî di navbera wan da çêdibe. Herweha keç û xortên ku tên cihê sersaxîyê û li wir xizmetê dikin jî li wir fêrî adetên civaka xwe, fêrî berpîrsîyarîyên xwe yên di civakê da dibin.

Ji bo ku em adet û rîtûelên mirinê yên kurdên Nisêbînê bi yên civaka kurdî ra bidin ber hev, pêdivî bi xebatên zanistî yên derheqê mirinê da hatî kirin, hebû. Weke ku me di xebata lîteratûrê da jî anîbû zimanî, di vê qadê da li nav civaka kurdî ya giştî xebatên berfireh zêde nehatine kirin yan jî di lêkolînên xwe da em zêde li xebatên bi vî rengî rast nehatin. Bi qasî ku me ji çavkanîyên li ber destan sûd wergirt, gelek hevbeşî di navbera adetên kurdên nisêbînê û yên civaka kurdî ya giştî da hene. Weke xwendina telqînê, çêkirina goristanan ya li serê girikan, qusandina porê ya piştî mirina ciwanan, xwelîliserêxwekirina jinan ya piştî bihîstina mirinê, dayîna xêran ya di rojên dîyar da, alîkarîdayîna xwarinê ya ji bo mala mirîyî/yê, lixwekirina cilên reş ya di pêvajoya şînê da, û gelek manendîyên din. Li gorî daneyên li ber destan, bi rehetî mirov dikarê bibêje ku kurdên Nisêbînê di pêkanîna adet û rîtûelên mirinê da pêgirîyê bi sepandinên civaka kurdî ya giştî dikin.



Biqasî ku li sehayê hat dîtîn, gelek adetên ku ji aliyê ola îslamê ve nayên qebûlîkirin, di jîyana gelî da cihê xwe girtine. Jixwe tê zanîn ku piştî guherandina ola xwe, civak bi temamî dev ji adetên xwe yê berê bernadin. Û heger ev adetên kevin li rêgezên ola nû neyên, wan di nava formên cuda da vedijînin û sepandina wan didomînin. Yanî, bi qasî ku hat dîtîn, hindêk adetên ku cihê wan di ola îslamê da tune, bi baweriyên kurdan yê berê ra eleqedar in. Lê ji ber lîteratûra kêma ji ber ferehbûna vê mijarê, di vê xebata xwe da em nikarin bigihîjin darazên giştî û ji bo vê yekê pêdivî bi xebatên berfirehtir heye.

Divê bi xebatên weha, adet û rîtûelên li derdora têgeha mirinê saz bûne bînin tomarkirin, bînin parastin û ji bo pêşeroja çanda kurdî û bi taybetî jî ji bo çanda Nisêbînê bînin dîyarîkirin. Lewra ev, ji bo nîfşên nû mîrateyeka çandî ne û derheqê mirinê da bi qasî ku me lê kolaye berî niha li Nisêbînê xebateka akademîk nehatîye kirin. Em hêvî dikin ku ev xebata me, rê li ber xebatên nû veke û ji bo xebatên nû bibe çavkanîyeka bikêrhatî. Û herweha bi zêdebûna xebatên bi vî rengî yê di kurdî da, dê derfet çêbe ku lêkolîner derheqê adet û rîtûelên mirinê da xebatên berawirdî jî bikin. Em hêvî dikin ku ev xebat bi taybetî ji bo çanda Nisêbînê û bi giştî jî ji bo çanda kurdî sîdewer be.

## ÇAVKANÎ

- Abuzar, C. (2010). Şanlıurfa'da Değişen Toplumsal Yapıda Taziye Geleneği. *Din Bilimleri Akademik Araştırma Dergisi*, 10(2), 259 - 274.
- Aksoy, G. (2006). *Dersim Alevi Kürt Mitolojisi Raa Haq'da Dinsel Figürler*. (1.Baskı). İstanbul: Komal Basın Yayın Dağıtım.
- Allison, C. (2007). *Yezidi Sözlü Kültürü*. F. Adsay (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Ammann, B. (2014). Kürt Yahudi Toplulukları - Sonsuza Dek Kaybolmuş. K. Omarkhali. Di nav *Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana-Akım Dışında Kalanlar* (1.Baskı) da (397-436). İ. Bingöl (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Aristova, T. F. (2002). *Kürtlerin Maddi Kültürü*. İ. Kale û A. Karabağ (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Aydın, A. (2016). Ölümün ve Hayatın Üretimi Üzerine. E. C. İflazoğlu û A. A. Demir (Ed.). Di nav *Öteki Olarak Ölmek* da (1 - 12). Ankara: Dipnot Yayınları.
- Barık, M. (2003). *Kevneşopiyên Kurdan*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Baudrillard, J. (2008). *Simgesel Değiş Tokuş ve Ölüm*. O. Adanır (Çev). (2.Basım). İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- Bauman, Z. (2012). *Ölümlülük, Ölümsüzlük ve Diğer Hayat Stratejileri*. N. Demirdöven (Çev). (2.Basım). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Bazîdî, M. (2010). *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*. Z. Avcı (Wer). (Çapa Yekemîn). İstanbul: Weşanên Lîs.
- Bedirxan, C. E. (1998). Şêx Evdirehmanê Garisî Çû Rehmetê. *Hawar*. F. Cewerî (Amd.). Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Bell, C. (2009 a). *Ritual Perspectives And Dimensions*. New York: Oxford Universtity Press.
- Bell, C. (2009 b). *Ritual Theory, Ritual Practice*. New York: Oxford Universtity Press.
- Burcu, E., û Akalın, E. (2008). Ölüm Olgusu Üzerine Sosyolojik Tartışmalar. *Türkiyat Araştırmaları Dergisi*, (8), 29-54.
- Butler, J. (2005). *Kırılğan Hayat: Yasın ve Şiddetin Gücü*. B. Ertür (Çev). İstanbul: Metis Yayınları.

- Can Emmez, B. (2015). *Batman Ezidilerinin Defin Pratikleri Üzerine Etnografik Değerlendirmeler*. Dema Gihîstinê: 14.02.2019, <http://dergiler.ankara.edu.tr/dergiler/71/2001/20905.pdf>.
- Cesur, G. (2012). *Yetişkinlerde Travmatik Yasın ve Travma Sonrası Büyümenin Psikososyal Belirleyicileri*. Teza Lîsansa Bilind Ya Neçapbûyî. Ankara: Hacettepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Fakültesi.
- Connerton, P. (1999). *Toplumlar Nasıl Anımsar?*. A. Şenel (Çev). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Çevik, A. (2009). Ortaçağ İslam Coğrafyacılarına Göre Nusaybin. K. Z. Taş (Ed.). *Di nav Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (65 - 75). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Ştd.
- Dalkılıç, N., & Halifeoğlu, F. (2009). Nusaybin'deki Kültür Varlıklarının Değerlendirilmesi ve Koruma Önerileri. K. Z. Taş (Ed.). *Di nav Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (417-429). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Demir, A. (2009). Eyyubiler Devrinde Nusaybin. K. Z. Taş (Ed.). *Di nav Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (99 - 114). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Demir, S. T. (2017). Modernite ve Ölüm: Açık Erişimli Ölüm Döşeginden İzole Yoğun Bakım Ünitelerine Bedenin ve Ölmenin Değişen Yüzü. *Global Media Journal TR Edition*, 7(14), 190-202.
- Demirci, K. (2013). *Eski Mezopotamya Dinlerine Giriş: Tanrılar, Ritüel, Tapınak*. (1.Baskı). İstanbul: Ayışığı Kitapları.
- Dikmen, A. (2015). Değişik Din ve Mezhep Müntesiplerinin Ölümle Gelen Sosyal Birliktelik Algıları ve Ölümü İçselleştirme Uygulamaları (Diyarbakır Örneği). *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 8(40), 458-465.
- Diyanet İşleri Başkanlığı. (2008). *Cenaze Hizmetleri Rehberi*. Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları.
- Dorson, R. (2011). *Günümüz Folklor Kuramları*. S. Gürçayır û Y. Özay (Çev). Ankara: Geleneksel Yayınları.
- Duman, S. (2009). Yabancı Seyyahlara Göre Nusaybin. K. Z. Taş (Ed.). *Di nav Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (151 - 157). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Ece, E. (2017). *Monografiya Çanda Gel A Dêrika Çiyayê Mazî*. Teza Lîsansa Bilind Ya Neçapbûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artûklûyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yê Li Tirkiyeyê.

- Ekici, M. (2015). *Halk Bilgisi (Folklor) Derleme ve İnceleme Yöntemleri*. Ankara: Geleneksel Yayınları.
- Elçin, Ş. (2004). *Halk Edebiyatına Giriş*. (8. Baskı). Ankara: Akçağ Yayınları.
- Emiroğlu, K. û Aydın, S. (2003). *Antropoloji Sözlüğü*. Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Eren, M. (2010). *Van Gölü Havzası Ölüm Gelenekleri Ve Türk Kültür Ekolojisi İçerisindeki Yeri*. Teza Doktorayê Ya Neçapbûyî. Van: YYÜ Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Erkanal, H. (2009). Mezopotamyaya Açılan Kapı: Nusaybin. K. Z. Taş (Ed.). Di nav *Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (5 - 16). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Erpolat, M. S. (2009). XVI. Yüzyıl Arşiv Kaynaklarından Tahrir Defterlerine Göre Nusaybin. K. Z. Taş (Ed.). Di nav *Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (135 - 150). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Ertan, M. H. (2012). Sosyolojik Açıdan Batman ve Yöresindeki "Taziye Geleneği" ve Bu Geleneğin Anadolu Taziye Kültürü ile Karşılaştırılması. *Batman Üniversitesi Yaşam Bilimleri Dergisi*, 1(1), 949 - 962.
- Êsî, M., Girdarî, M. û Bêrkevanî, M. (2014). *Wergera Maneya Qur'ana Pîroz Ser Zimanê Kurdî*. (Çapa Çarê). İstanbul: Şura Yayınları.
- Farqînî, Z. (2000). *Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük*. (Çapa Yekem). Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Feqîrê Telqînbêj, "Telqîna Êzidîyan", *Hawar*. F. Cewerî (Amd.). Stockholm: Weşanên Nûdem, 2(49), 1062.
- Frazer, J. G. (2004). *Altın Dal Dinin ve Folklorun Kökenleri I*. Mehmet H. Doğan (Çev). (2. Basım). İstanbul: Payel Yayınevi.
- Göka, E. (2010). *Ölme: Ölümün ve Geride Kalanların Psikolojisi*. İstanbul: Timaş Yayınları.
- Göyünç, N. (1969). *XVI. Yüzyılda Mardin Sancağı*. İstanbul: İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayınları.
- Guest, J. (2012). *Yezidilerin Tarihi: Melekê Tavus ve Mıshefa Reş'in İzinde*. (3 Baskı). İ. Bingöl (Çev). İstanbul: Avesta.
- Güler, A. (1998). *Mardin Folkloru Gelenekler - Görenekler*. Ankara: MAREV Ankara Şubesi Kültür Yayınları.

- Günay, R. (2009). Cumhuriyet Döneminde Nusaybin. K. Z. Taş (Ed.). Di nav *Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (443 - 460). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Günay, Ü. (2008). *Din Sosyolojisi*. İstanbul: İnsan Yayınları.
- Güvenç, H. *Büyük Şafî İlmihali*. İstanbul: İlim Yayınları.
- Hacıgökmen, M. A. (2013). Türklerde Yas Âdeti Temelleri ve Sonuçları. H. Bahar, M. Toker, M. A. Hacıgökmen û H. Küçükbezci (Ed.). Di nav *Tarihçiliğe Adanmış Bir Ömür: Prof.Dr.Nejat Göyünç'e Armağan* (6.cilt) da (393-422). Konya: Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Yayınları.
- Halm, H. (2014). Ahlê Haq. M. Bayrak. Di nav *Êzidî - Kızılbaş - Yaresan Kürtler (Belgelerle Kürdistan'da Gizli Dinler)* da (383 - 385). Ankara: Özge Yayınları.
- Honko, L. (2014). Ritüellerin Oluşum Süreci. M. Oğuz, S. Gürçayır Teke û S. Akkaya (Ed.). Di nav *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3* da (199 - 212). R. Ersoy (Çev). Ankara: Geleneksel Yayınları.
- Hooshmandrad, P. (2014). Ayinsel Olarak Hayat: Guran Bölgesindeki Kürt Ehli Hak'ın İbadet Uygulamaları. K. Omarkhali. Di nav *Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana-Akım Dışında Kalanlar* (1.Baskı) da (103 - 126). İ. Bingöl (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Hökelekli, H. (1991). Ölüm ve Ölüm Ötesi Psikolojisi. *Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 3(3), 151 - 165.
- Illich, I. (2004). Ölümüne Karşı Ölüm. . E.Ç.Ç. (Çev). *Cogito*, (40), 107 - 120.
- Izady, M. (2011). *Kürtler: Bir El Kitabı*. İstanbul: Doz Yayınları.
- Izady, M. (2014). Kürtler'in Din ve İnanç Yapısı. M. Bayrak. Di nav *Êzidî - Kızılbaş - Yaresan Kürtler (Belgelerle Kürdistan'da Gizli Dinler)* da (497 - 546). Ankara: Özge Yayınları.
- İzgöer, A. Z. (1999). *Diyarbakır Salnameleri*. (Cilt 1). İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi.
- Îzolî, D. (2000). Ferheng. Stenbol: Weşanên Deng.
- Jones, C. (2004). *Huzur İçinde Yatsın: Ölümüne Dair Her Şey*. M. Gürsel (Çev). İstanbul: Dharma Yayınları.
- Kara, Z. (2009). *Ölüm Fenomeni Üzerine Bir Din Sosyolojisi Araştırması - Kayseri Örneği*. Teza Doktorayê Ya Neçapbûyî. Kayseri: Erciyes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

- Karaman, K. (2010). Ritüellerin Toplumsal Etkileri. *SDÜ Fen Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi*, (21), 227 - 236.
- Kaya, H. (2006). Çok Kültürlülüğün Sıfır Noktası: Nusaybin. *Nusaybin*, (2), 46 - 47.
- Kemal, Y. (2004). *Ağıtlar*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Keskin, N. (2014). *Akışkan Kimlikler: Etnik ve Dini Kimlik Arasında Becirman Seyyidleri*. Teza Doktorayê Ya Neçapbüyî. Ankara: Hacettepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Antropoloji Anabilim Dalı.
- Keskin, N. (2015). Tûd Abdin'de Bir Kimlik ve Anlatım Biçimi: Mıtrıblar ve Mıtrıplık. *Folklor / Edebiyat*, 21(84), 57-72.
- Keskin, N. (2017). Pirsgirêkên Giştî Yê Xebatên Folklorê Kurdî û Çend Pêşniyaz. *The Journal Of Mesopotamian Studies*, 2(1), 1-15.
- Keskin, Y. Z. (2006). Şanlıurfa Halk Kültüründe Ölüm. *Harran Ün. İlahiyat Fak. Dergisi*, (16), 7-41.
- Kılıç, T. (2009). Nusaybin'in Fiziki ve Coğrafya Özellikleri. K. Z. Taş. Di nav *Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (391 - 401). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.
- Kırış, Ş. (2017). Hz.Peygamber'in Cenaze İle İlgili Uygulamaları. *Turkish Academic Research Review*, 2(2), 41 - 61.
- Kreyenbroek, P. (2014). Ehli Hak (Yaresan/Kakailer) Kürdistanlı Yaresanlar. K. Omarkhali. Di nav *Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana-Akım Dışında Kalanlar* (1. Baskı) da (45 - 57). İ. Bingöl (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Kreyenbroek, P., Allison, C. (2008). *Kürt Kimliği ve Kültürü*. Ü. Aydoğmuş (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Kreyenbroek, P., Reşow, X. C. (2011). *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur*. İ. Bingöl (Çev). (1. Baskı). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Kurdo, J. (1993). *Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kürdistan*. H. T. Özkurt (Çev). Ankara: Öz-Ge Yayınları.
- Kütük, A. (2018). *Nisibis (Nusaybin) Kadim Bir Şehrin Hikayesi*. İstanbul: Divan Kitap.
- Lafli, E. (2009). Hellenistik, Roma İmparatorluk ve Geç Roma-Erken Bizans Dönemlerinde Nusaybin ve Çevresi Arkeolojisi: Şavi Höyük VI Roma ve Geç Roma Erken Bizans Çağları Pişmiş Toprak Buluntuları. K. Z. Taş. Di nav *Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (17 - 40). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.

- Malinowski, B. (1990). *Büyü, Bilim ve Din*. S. Özkal (Çev). İstanbul: Kabalcı Yayınları.
- Marshall, G. (2005). *Sosyoloji Sözlüğü*. O. Akınhay û D. Kömürcü (Çev). Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Minorsky, V. (2014). Ahl-ê Haqq Tarikatı. M. Bayrak. Di nav *Êzidî - Kızılbaş - Yaresan Kürtler (Belgelerle Kürdistan'da Gizli Dinler)* da (391 - 396). Ankara: Özge Yayınları.
- Mir Hüseyini, Z. (2008). Ehl-i Hakk'ta İnanç, Ayinler ve Kültür. P. Kreyenbroek û C. Allison. Di nav *Kürt Kimliği ve Kültürü* da. Ü. Aydoğmuş (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Moradi, D. (Eylül 2014). Ehl-i Hak'ın Kutsal Kitabı: "Zebûr-ê Hakikat". M. Bayrak. Di nav *Êzidî - Kızılbaş - Yaresan Kürtler (Belgelerle Kürdistan'da Gizli Dinler)* da (439-465). Ankara: Özge Yayınları.
- Noyan, S. (2009). *1950 Mardin İlinin Monografisi*.
- Nusaybin Belediyesi. (2001). *Tarihin Tanığı Nusaybin*.
- Nusaybin Belediyesi. (2006). Yüzyıllardır Devam Eden Kültür: Miştağ. *Nusaybin*, (2), 34-41.
- Nusaybin Belediyesi. (2010). Gulşilav Kadın Evi. *Nusaybin*, (5), 42-45.
- Nusaybin Belediyesi. *Sosyal ve Ekonomik Durum*. Dema Gihîştinê: 19.08.2018 <http://www.nusaybin.bel.tr/tr-tr/sosyal-ve-ekonomik-durum>
- Nusaybin Belediyesi. *Tarihi ve Coğrafya Yapısı*. Dema Gihîştinê: 19.08.2018 <http://www.nusaybin.bel.tr/tr-tr/tarihi-ve-cografi-yapisi>
- Nusaybin Belediyesi. (tarih yok). *Ulaşım*. Dema Gihîştinê: 19.08.2018 <http://www.nusaybin.bel.tr/tr-tr/ulasim>
- Nusaybin İlçe Milli Eğitim Müdürlüğü. Dema Gihîştinê: 19.08.2018 <http://nusaybin.meb.gov.tr/#prettyPhoto/2/>
- Nusaybin Nüfusu. *Nusaybin Nüfusu*. Dema Gihîştinê: 20.04.2019 [https://www.nufusu.com/ilce/nusaybin\\_mardin-nufusu](https://www.nufusu.com/ilce/nusaybin_mardin-nufusu)
- Omarkhali, K. (2014). SUNUŞ: Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana-Akımın Dışında. K. Omarkhali. Di nav *Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana-Akım Dışında Kalanlar* da (15 - 44). İ. Bingöl (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Omarkhali, K. (2014). Yezidiler: Yezidilerin Dini Bilgileri Aktarma Sisteminde ve Ruhani Otorite Statüsünde Bugün Meydana Gelen Değişimler. K. Omarkhali. Di nav *Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana Akım Dışında Kalanlar* da (127 - 141). İ. Bingöl (Çev). İstanbul: Avesta Yayınları.

- Örnek, S. V. (1971). *Anadolu Folklorunda Ölüm*. Ankara: Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih - Coğrafya Fakültesi Yayınları.
- Örnek, S. V. (1995). *100 Soruda İlkelerde Din, Büyü, Sanat, Efsane*. (3. Baskı). İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Örnek, S. V. (2000). *Türk Halkbilimi*. (II. Baskı). Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları.
- Öz, Y. (2007). *Mardin Yezidileri, İnanç, Sosyal Hayat ve Coğrafi Dağılım*. Teza Lisansa Bilind Ya Neçapbûyî. İstanbul: Marmara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Parin, S., Bilgili, A. E., û Menak, Z. (2012). Kent(li)leşme Pratiğinde Yeni Bir Olgu: Taziye Evleri ve Farklılaşan Sosyo-Kültürel Pratikler. *YDÜ Sosyal Bilimler Dergisi*, 5(2), 212-229.
- Propp, V. (1998). *Folklor Teori ve Tarih*. N. Hasgöl û T. Tanyel (Çev). (1. Baskı). İstanbul: Avesta Yayınevi.
- Rappaport, R. A. (2006). Ritüel. M. Oğuz, M. Ekici, N. Özdemir, G. Öğüt Eker û S. Gürçayır Teke. Di nav *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1* da (187 - 200). K. Korkmaz (Çev). Ankara: Geleneksel Yayınları.
- Sağır, A. (2012). Toplu Merasimlerden Belediye Hizmetlerine Kurumsallaşan Ölüm Bağlamında Bir Ölüm Sosyolojisi Denemesi. *Turkish Studies*, 7(2), 903 - 925.
- Sağır, A. (2016). Ölüm Sosyolojisi Bağlamında Yemek, Cenaze ve Ölümün Sofra Pratikleri Üzerine. *Türkiye Sosyal Araştırmalar Dergisi*, (1), 271 - 298.
- Sağır, A. (2017). *Ölüm Sosyolojisi*. Ankara: Phoenix Yayınevi.
- Sami, K. (2017). Göç ve Kent(li)leşme Bağlamında Taziye Ev(ler)inin Toplumsal, Kültürel ve Mekânsal Dönüşümleri-Diyarbakır Kent Örneği. *Electronic Turkish Studies*, 12(3), 457-475.
- Sarı, E. (2010). *Mardin'de Kültürlerarasılık*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Snoek, J. (2006). Defining Rituals. J. Kreinath, J. Snoek, M. Stausberg (Ed.). Di nav *Theorizing Rituals* da (3-14). Leiden-Boston: Brill.
- Şerafeddin Han. (2009). *Şerefname - Kürt Ulusunun Tarihi*. C. Kabadayı (Çev). İstanbul: Yaba Yayınları.
- Tan, A. (2011). *Turabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kültürler*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Taşgın, A. (2001). Anadolu'da Yok Olmaya Yüz Tutan Dini Topluluklardan: Yezidiler. Ö. Acar, S. Akdemir û ynd. Di nav *Uluslararası Anadolu*



*İnançları Kongresi 23-28 Ekim Ürgüp/Nevşehir, 13-28 Ekim 2000* da (731 - 752). Ankara: Ervak Yayınları.

Taşğın, A. (2005). Geri Dönüş: Yezidilerde Ölüm. *Türk Dünyası Araştırmaları*, (154), 195-204.

Taşğın, A. (2009). Dini-Sosyal Grupların Kaybolması: Nusaybin Örneği. K. Z. Taş. *Di nav Geçmişten Günümüze Nusaybin Sempozyum Bildirileri* da (383 - 389). Ankara: Noel Yayın Dağıtım Ticaret Ltd. Şti.

Tuncel, M. (2007). Nusaybin. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (Cilt: 33) da (269 - 270). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

Turan, A. (2015). *Yezidiler*. Ankara: Hitabevi Yayınları.

Türbedar, Ö. (2011). *Düzce Halk Kültüründe Geçiş Dönemleri (Doğum-Evlenme-Ölüm)*. Teza Lîsansa Bilind Ya Neçapbûyî. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Türk Dil Kurumu Sözlüğü, Dema Gihîştinê: 05.05.2019 <http://sozluk.gov.tr/>

Türkiye İstatistik Kurumu. *TÜİK*. Dema Gihîştinê 20.04.2019 <http://tuik.gov.tr/Start.do>

Vali, S. (2018). *Kurdên Yarsan Dîrok û Mîtolojî*. S. Orak Reşitoğlu (Çev). (Çapa Yekem). Stembol: Avesta.

Volkan, V. (2017). Hevpeyvîn. S. Özmen (Çev). *Psychology Kurdi*, (3), 16-21.

Yalçın-Heckmann, L. (2006). *Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkileri*. G. Erkaya (Çev). İstanbul: İletişim Yayınları.

Yeşilmen, H. (2016). Etno-Dini Kimlik Açısından Mahallemler. *Artuklu Akademi*, 2(3), 1-40.

Yıldırım Tanhan, E. (2005). *Kaniyek Ji Mezopotamyayê - Nisêbîn*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Yıldırım, K., Pertev, R. û Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

Yücel, M. (2006). *Kına ve Ayna Kürtlerde Ölüm ve İntihar*. İstanbul: Do Yayınları.

**Tablo 1: Lîsteya Kesên Çavkanî**

	Nav û Paşnav	Temen	Perwerde	Pîşe	Cihê Hevdîtînê	Dîroka Hevdîtînê
Ç1	Pakize Acar	55	Xwende	Bermalî	Navend	14.04.2018
Ç2	Emine Baysal	73	Nexwende	Betal	Navend	14.04.2018
Ç3	Ayşe Bostan	65	Nexwende	Mirîyan Dişo	Navend	14.04.2018
Ç4	Azize Özsoy	68	Nexwende	Bermalî	Navend	15.04.2018
Ç5	Musa Özügüzel	62	Xwende	Tirban Dikole	Navend	15.04.2018
Ç6	Selim Akıncıoğlu	29	Medrese	Mela	Navend	22.04.2018
Ç7	Metin Seçili	70	Xwende	Cotyar	Navend	22.04.2018
Ç8	Bilal Kara	37	Zanîngeh	Tenduristvan	Navend	27.04.2018
Ç9	Emine Baykaralı	47	Xwende	Dûrikbêj	Girefşê	28.04.2018
Ç10	Osman Gizlican	68	Xwende	Cotyar	Girefşê	28.04.2018
Ç11	Hasibe Çetinceviz	53	Xwende	Bermalî	Girêmara	28.04.2018
Ç12	Mustafa Ağıröz	57	Xwende	Esnaf	Girêmara	28.04.2018
Ç13	Azize Öztunç	80	Nexwende	Betal	Tilyaqûbê	29.04.2018
Ç14	Şevket Oğuzgil	58	Nexwende	Cotyar	Tilyaqûbê	29.04.2018
Ç15	Ahmet Özgüneşli	71	Xwende	Cotyar	Cibilgirawê	05.05.2018
Ç16	Azime Toparlı	58	Nexwende	Bermalî	Cibilgirawê	05.05.2018
Ç17	İsmail Yılmazoğlu	33	Xwende	Cotyar	Cibilgirawê	05.05.2018
Ç18	Fevziye Su	64	Nexwende	Bermalî	Talatê	05.05.2018
Ç19	Rasim Aydınlık	28	Xwende	Cotyar	Talatê	05.05.2018
Ç20	Hüsnu Atınç	60	Dib.Seretayî	Cotyar	Talatê	05.05.2018
Ç21	İsmail Gazioğlu	75	Nexwende	Betal	Talatê	05.05.2018
Ç22	Nezir Ağır	78	Xwende	Cotyar	Gundikê Celal	06.05.2018
Ç23	Aliye Sakin	69	Dib.Seretayî	Bermalî	Gundikê Celal	06.05.2018
Ç24	Hediye Öztuna	36	Xwende	Bermalî	Bamdê	06.05.2018
Ç25	Azize Adıgüzel	66	Nexwende	Bermalî	Stililê	12.05.2018
Ç26	Alican Çelikli	67	Dib.Seretayî	Fotografkêş	Stililê	12.05.2018
Ç27	Yunus Araslı	32	Lîse	Cotyar	Geliyê Sora	13.05.2018

Ç28	Şevket Erdi	68	Xwende	Cotyar	Mezrika Mihoka	13.05.2018
Ç29	Adil Bülbül	79	Xwende	Cotyar	Mezrika Mihoka	13.05.2018
Ç30	Ayşe Yağızalp	75	Nexwende	Bermalî	Mezrika Mihoka	13.05.2018
Ç31	Mustafa Yılmaz	51	Dib.Seretayî	Çawîşê Karkeran	Navend	19.05.2018
Ç32	Ayşe Gergin	70	Nexwende	Betal	Navend	19.05.2018
Ç33	Şükriye Demiroğlu	70	Nexwende	Bermalî	Navend	19.05.2018
Ç34	Mehmet Ali Topal	42	Zanîngeh	Mamosta	Têzxirab	20.05.2018
Ç35	Esmâ Saygılı	34	Lîse	Mewlûdxwên	Têzxirab	20.05.2018
Ç36	Latifa Özsoy	55	Nexwende	Bermalî	Navend	25.05.2018
Ç37	Ercan İş	43	Lîse	Karker	Gundikê Hemza	25.05.2018
Ç38	Sabire İş	35	Xwende	Bermalî	Gundikê Hemza	25.05.2018
Ç39	Arif Altunkaynak	36	Zanîngeh	Rojnamevan	Navend	26.05.2018
Ç40	Mihdiye Karalı	65	Nexwende	Bermalî	Navend	26.05.2018
Ç41	Bilal Gürbüz	38	Lîse	Ajovan	Kertwênê	26.05.2018
Ç42	Yüksel Gürbüz	37	Dib.Seretayî	Bermalî	Kertwênê	26.05.2018
Ç43	Ali Kendigüzel	34	Zanîngeh	Mamosta	Gundikê Xêlit	24.06.2018
Ç44	Mehmet Özübelli	62	Lîse	Şifêrê Ambûlansê	Navend	27.05.2018
Ç45	Murat Sarıgül	63	Xwende	Esnaf	Navend	27.05.2018
Ç46	Berivan Baykara	31	Lîsansa Bilind	Mamosta	Navend	27.05.2018
Ç47	Nurten Toprak	38	Lîse	Bermalî	Navend	01.06.2018
Ç48	Fatma Çetinçalı	51	Xwende	Bermalî	Tilminarê	01.06.2018
Ç49	Muhammet Çetin	56	Lîse	Gorçêker	Navend	02.06.2018
Ç50	Mevlüt Cengiz	57	Dib.Seretayî	Mixtar	Navend	03.06.2018
Ç51	Zeynep Avşarlı	57	Nexwende	Bermalî	Tilyaqûbê	29.04.2018
Ç52	Celal Özkırmımlı	72	Medrese	Mela	Navend	17.06.2018
Ç53	Hüseyin Çelik	28	Zanîngeh	Hemşîr	Gundikê Celal	06.05.2018
Ç54	Hüseyin Yılmaz	82	Xwende	Betal	Navend	08.06.2018
Ç55	Bilal Alacalı	40	Lîse	Esnaf	Navend	26.05.2018
Ç56	Reşit Elveren	35	Lîse	Esnaf	Navend	26.05.2018

Ç57	Celal Yılmaz	44	Zanîngeh	Mamosta	Navend	08.06.2018
Ç58	Halil Dinçoğlu	49	Zanîngeh	Mamosta	Bawernê	23.06.2018
Ç59	Zekiye Tepeli	74	Nexwende	Betal	Tilminarê	09.06.2018
Ç60	Hikmet Adıbelli	65	Dib.Seretayî	Betal	Navend	23.06.2018
Ç61	Ahmet Artukoğlu	45	Zanîngeh	Midîr	Navend	22.06.2018
Ç62	Metin Tekelioğlu	40	Lîse	Cotyar	Bawernê	23.06.2018
Ç63	Seher Yılmaz	31	Lîse	Bermalî	Navend	10.06.2018
Ç64	Abdullah İçiyank	52	Lîse	Mela	Gundikê Xêlit	24.06.2018
Ç65	Abdullah Tunç	79	Xwende	Teqawîtbûyî	Cibilgirawê	05.05.2018
Ç66	Adnan Altunköy	41	Zanîngeh	Mamosta	Navend	10.06.2018
Ç67	Daniel Çepe	45	Dib.Seretayî	Berpîrsîyarê Dêrê	Navend	02.06.2018
Ç68	Esra Aydınlik	18	Lîse	Xwendekar	Bamdê	06.05.2018

# PÊVEK


**Pêvek-1:** Ferhenga Mirinê Ya Gelî

**Pêvek-2:** Telqîna Kurdên Misilman

**Pêvek-3:** Qewlekî Kurdên Êzidî

**Pêvek-4:** Wêneyin Ji Sehayê Xebatê

**Pêvek-5:** Nexşeya Nisêbîn û Gundên Wê



## **Pêvek-1: Ferhenga Mirinê Ya Gelf**

**Cihê Sersaxîyê:** Cihên ku sersaxî lê tîn danîn û mêvan lê tîn pêşwazîkirin; mala sersaxîyê, cihê teazîyê, mala êzidîya.

**Darbest:** Depê ku mirîyan datînin ser û dibin goristanê; çardar, nehş.

**Dehî:** Xêra ku li mezinan didin (heywana mezin e); xêra mirî.

**Dûrik:** Ji stranên ku tavêjin ser mirîyan ra tê gotin; dilo.

**Erebeya Mirîyan:** Erebeya ku mirîyan pê dibin goristanê.

**Ferşê Şuştinê:** Ew kevirê ku mirî li ser tê şuştin; textê şuştinê.

**Genim Hejandin:** Genimê ku di ber rojî, sûnd û derewên mirîyan da tê dayîn; genim daleqandin, kufaret.

**Gor:** Çal ango koncala ku mirî têda tê veşartin; tirb.

**Goristan:** Cihê ku gor lê tîn kolan; mezel.

**Heqîqe:** Xêra ku li zarokan didin (sewalek tê gurandin).

**Kefen:** Ji wî qimaşê spî ku piştî şuştinê li laşê mirîyan tê pêçan ra tê gotin.

**Mirî:** Mirovên ku jîyana wan bi dawî bûye; cenaze.

**Sekerat:** Êş, ta û jixweçûna berî mirinê; zikrat.

**Sersaxî:** Bi gotinên xweş, teselîkirina xwedîyên mirîyan; serxweşî, teazî.

**Şîn:** Nîşandana liberketina ji bo mirîyan û xwedûrxistina ji kêfê; hezn.

**Telqîn:** Piştî veşartinê, axaftina ku ji alîyê melayî ve li ser gorê tê kirin. Di vê axaftinê da bersivên pirsên ku dê di gorê da ji mirîyan bîn kirin hene; Terqîn.

**Veşartin:** Xistina bin erdê ya laşê mirîyan; defînkirin.

**Xwedîyên Mirîyî/yê:** Mirovên ku bi rêya xwînê digihin kesên mirî.

## **Pêvek-2: Telqîna Kurdên Misilman**

“Ey filankesê/a kurê/keça filankesê! (heger navê dêya wî/wê bizanibin navê dêya wî/wê, heger nizanibin navê Hawa dibêjin)

Silava Xweda li te be, tu ji ometa pêxemberê me Muhamed î.

Hêvîya me ji Xweda ev e: Bi fasl û kerema xwe ceneta xwe ya xweş ji bo te bike cih û war.

Libasê rehmeta xwe li te bike.

Tu qenc bizane bê guman mirin li pêş me hemûyan e.

Çi kesê bi nav û deng be çi belengaz,

Çi qenc be çi gunehkar, çi axa be çi geda,

Mirin para herkesî ye, tu kes jê nafilite.

Melaîket çiqas nêzîkî Xweda ne,

Pêxemberên Xweda çiqas li bal wî birûmet in jî, lê tu kes ji wan ji mirinê xelas nabe.

Ey Filankes,

Niha te ji vê mala biqirêj û keşmekeş bar kir,

Tu gihîştî alema axiretê ya ebedî.

Te ji vê mala teng û fanî û xapînok bar kir,

Tu gihîştî alema binaz û nîmet û xweşî.

Ev saet dawîya jîyana te ya dinyayê ye.

Destpêka alema ebedî ya axiretê ye.

Êdî li pey wê mirin tune.

Ey filan

Niha dê du melek ji melaîketên Xweda (Nekîr û Munker) dakevin bal te.

Tu ji wan qet netirse û xemgîn nebe.

Bi rastî ew her du jî evdên Xweda ne.

Ji bo te wezîfedar in ji bal Xweda.

Dê ew herdu ji te pîrs bikin û bêjin:

Xwedayê te kî ye, pêxemperê te kî ye,

Dînê te çi ye, qibleya te çi ye, reberê te çi ye,

Xwişk û birayên te yên dînî kî ne?

Êdî tu bi zimanekî vekirî, bi dilekî xweş û bi gotinên zelal bersiva wan bide û bêje:

Bi rastî Rabê min Xweda ye ku Xwedayê hemû aleman e,

Pêxemberê min hazretî Muhamed e ku pêxemberê dawî e,

Dînê min îslam e, rêberê min Quran e, qibleya min kabe ye,

Xwişk û birayên min yên dînî jî hemû misilman in.

Ey filan,

Wê gotina ku te li vê cîhanê pê bawer dikir bîne bîra xwe:

Eşhedû en la îlahe îlallah we eşhedû enne Muhammeden Resûlullah.

Tu bi dil û can bawer bike mirin rast e,

Daketina nav qebrê rast e,

Pirsa nekîr û munker di qebrê da rast e,



Heşr û neşr yanî rabûna ji goran rast e,

Dîtina cemala Xweda di cenetê da ji bo misilmanan rast e,

Qîyamet li pêş me ye bê şek dê rojekê bê,

Wê Xweda hemû mirîyan rake, zindî bike

Û li rasta heşrê bicivîne bal hev.

Lewra ew bixwe ferman dike û dibêje:

Me hûn hemû ji axa rûyê zemînê afirandin,

Em dê we bimirînin, dîsa veogerînin bal wê axê

Û paşê careka din em dê we ji wê axê zindî bikin

Derxînin meydana heşrê.

Ew kesên ku bi hebûn û yekîtîya Xweda bawer kirine

Û karên baş bi cih anîne

Xweda hem li vê dinyayê û hem li alema axiretê

Lingê wan li ser rastê bi cî dike,

Lê zalim û Xwedanenasan di delaletê da dihêle,

Xweda çi hukmî bivê û îrada wî çi tiştî bixwaze wê pêk tîne.

Îlahî ya Rebbî

Niha daxwaza me ji te ev e:

Tu cewaba vî birayê me (xwişka me) bi zimanekî xweş û rast pê bidî gotin,

Tu me digel wan bi xatirê pêxemberê Xwe Muhammed û al û eshabên wî

Ji ezabê qebirê û ji agirê cehenemê xilas û dûr bike.

Amîn.

Bî rahmetîke ya erhemerrahimîn, we selamun alel murselîn, welhemdû lillahî Rabbil alemîn.”

*(Ev telqîn ji aliyê Mela Mehdîyê Lîceyî ve hatîye nivîsîn û li herêmê ji aliyê melayan ve tê tercîhkirin.)*



### **Pêvek-3: Qewlekî Kurdên Êzîdî**

“Rojekê ji rojane wele gelê êzdî zane, ji mirinê bilind beyane

Xwedê gelê êzdî zane beyane bifikirin hizrê bikin

Kurê'm mirinê hilgirin rojekê ez nebûm

Ez ji hinika ji qewle bûm

Ber medhê xaliqê xwe bûm

Ew bû sira min bû ji derd û kêser û talib im

Min jî bidîyane ko hino min jî

Wele bizinî sirê îlahîyo te baş em afirandin

Gelek pê qayîl im heger hindik e û heger pir e

Mane hebû tilî neh meha lê sekinîm

Qudretê d'fikirîm, çi qudreta tamam e, çi bareke xumam e

Gelek hene miskîn in bûne xulam e,

Fikirîm ez ji fikarê mesûl bûm min ji ber warê

Barî qet kir min j'barê barî qet kir mi'j makê

Em tev wilo em avêtine sikakê, avêtine ber bedena makê

Îce me çû xistibû lêzim bû cînar bav minetkar e

Mîrê ji mîra şahid be xulamê feqîra, şahid be dê û bava

Te maliştine tev û şibaba

Îlahîyo te bi tewafa xinê kirin te em xinê kirin

Berî roja em bimrin zarokekî neyê şa kirin

Çi zarokekî miskîn e, da tî nenê tabûteke darî da

Bi şevê rojê dihejînin vî zarokî xew lê tune

Ev mîsal heybetê îlahî ne

Îlahîyo pir kerem e, şifqet e

Xwe da bin Adem e, rakirine ser qedem e

Ser qedemê xwe digerîya, rih berda nav dest û pêya

Îlahîyo te dibirîya ser qedemê xwe dibezin

Sira mîrê xwe bi lez in, pisporê bavê xwe ez im

Çi lawikekî ser mestep sirra mîrê xwe yî bi hewes da

Bavê min malê jê ra xwesta

Mala min ra û tekbîr

Lê tê werî şewqet û feqîr

Pê ra hebûn nîşanên mîr

Nîşanên mîr încele baxlî van hewala ye

Îlahîyo te em kirne malxwê mal e

Ma em bişepirin zêrîn malî bikin

Dirin da em yekê bixwin, yekê bidin heta roja em bimrin

Sibehekê ji tarî bavê te em kirine vê binî avê

Ya Îlahîyo tu me xelas kî ji vê tavê

.....

Me dîyar û birayê axretê nasî yê ser me dibirê nasî

Me sond birî kirasî hin vî zebûnî hin pêxwasî

Ma em hengî temîze bûn

Ya Îlahîyo te dame erdekî ez nebûm

Xêr û şerê min bi destê te bûn

Heger xêr e û heger şer e hîmeta te hebê bi me ra

Wek go qey em in derwêş, rêya heqê dikine berpêş

Navê te bi av êş

Saw û heybetê te bi me dikirin saw û heybetê te difikirin

Wade hatî em dê bimirin

Ez î nexweş bûm, nehiş bûm, ketime nav livîna

Banga min Melekê Erş e

Nexweş bûm, nehiş bûm

.....”

#### **Pêvek-4: Wêneyin Ji Sehaya Xebatê**



**Wêne 1:** Hevpeyvîn Bi Abdullah Tunç Ra (Gundê Cibilgirawê).



**Wêne 2:** Hevpeyvîn Bi Fevziye Su Ra (Gundê Talatê).



**Wêne 3:** Darbest.



**Wêne 4:** Ferşê Şuştinê.



**Wêne 5:** Piştî Ku Mirî Hat Bicihkirin Kepçe Axê Tavêje Hundirê Gorê.



**Wêne 6:** Jin Di Zîyareta Pêşî Da Li Ser Gorê Yasînan Dixwînin û Dia Dikin.



**Wêne 7:** Dîmenek Ji Cihê Sersaxîyê û Hewşa Wê (Ya Li Taxa Dîcleyê).





**Wêne 8:** Jin Li Cihê Sersaxîyê Quranê Dixwînin û Tizbehan Dikişînin.



**Wêne 9:** Li Cihê Sersaxîyê Sêroka Mirîyî/yê Tê Xwarin.



**Wêne 10:** Êvara Îniyê Li Goristanê Şêranî Li Zarokan Tê Belavkirin.



**Wêne 11:** Dîmenek Ji Zîyareta Goristanê Ya Êvara Cejnê.



**Wêne 12:** Goreka Kurdên Misilman.



**Wêne 13:** Goreka Kurdên Êzîdî.



**Wêne 14:** Dîmenek Ji Goristana Mohriz Ya Li Navenda Bajarî.



**Wêne 15:** Dîmenek Ji Goristana Tilyaqûbê (Misilman).



**Wêne 16:** Dîmenek Ji Goristana Hesên Begê Ya Mezrika Mihoka (Êzîdî).

## Pêvek-5: Nexşeya Nisêbîn û Gundên Wê



Nexşe-1: Nexşeya Nisêbîn û Gundên Wê

T.C.  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
**İNTİHAL RAPORU**

Tez Başlığı: ADET Û RÎTÛELÊN TÊKILDARÎ MIRINÊ LI HERÊMA NISÊBÎNÊ

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 148 sayfalık kısmına ilişkin 15/07/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından *TURNITIN* adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dâhil % 1

**Uygulanan Filtrelemeler:**

**Kaynakça hariç**

**Alıntılar dâhil**

**5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar**

**Açıklamalar:** Mardin Artuklu Üniversitesi TURNITIN adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Şükrü Yılmaz

Öğrenci No: 14711033

Tarih ve İmza

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

A.B.D. Başkanı Onayı



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**NUSAYBİN BÖLGESİNDE ÖLÜMLE  
İLGİLİ ADET VE RİTÜELLER**

Şükrü Yılmaz

14711033

Danışman

Doç. Dr. Mustafa Aslan

Mardin 2019